

ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA ZIMAN Ü ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA BILIND

ROMANA KURDÎ (KURMANCÎ) YA DÎROKÎ: BÎRA
CÎVAKÎ Ü NASNAME

FAHRIYE ADSAY

10711009

ŞÊWIRMEND

DOÇ.Ê ALK. DR.

HAYRULLAH ACAR

MÊRDÎN, 2013

KURTE

Di nav romana kurdî de, romana dîrokî wek cureyekê cihê xwe girtiye ku hêja ye bibe mijara lêkolînan. Ev tez armanc dike ku ji destpêka salên 1950yan heta sala 2010an romanê kurdî (kurmancî) ên dîrokî bide ber xwe û wan di nav peywenda sosyolojîk û dîrokî de binirxîne. Ev tez îddia dike çawa ku pêdiviyêن îroyîn û dahatûyê civak an rewşenbîran sewqî lêkolînen li ser rabirdûyê dikin û nivîsandina romanê dîrokî jî ji vê armancê ne dûr in. Romanûsên kurd jî ji ber pêdiviyêن îroyîn ên siyasî û çandî romanê dîrokî wek amûrekê bikartînin û car bi car romanê xwe bi wê armancê dinivîsînin ku dîrokê bi nifşen nû bidin fêrkirin. Tevî vê, ev romanê dîrokî dikare bê gotin ku ji rabirdûyê bêtir îro (an vêga) ji xwe re dikin mijar û dibin amûra sazkirina nasnameyek kurd a siyasî û bîra civakî.

Îddiayek vê tezê ya din ew e ku rewşa siyasî a civakê di tayinkirina naverok û çawaniya berhemên wêjeyî de rolek mezin dileyize. Çiqas ku di meseleya kurd de guherîn çêdibin di romanê kurdî yên dîrokî de çawaniya berheman zêdetir dibe û romanûs ji mijarêن giregir ber bi mijarêن cûr be cûr diçin.

Ev xebat ji destpêk û sê beşan pêk tê. Di beşa destpêkê de pêwendiya roman û netewê, roman û dîrokê tê izehkîrin; mijar û armanca tezê tê rave kirin. Di binbeşa rîbazê de, ji danasînek kurt a romanê dîrokî û herwiha rîbazêن ku di nirxandina romanen de hatine bikaranîn, pêk tê.

Di beşa yekem de, wek cûreyek romanê taybetmendiyêن romana dîrokî û di pê re li Rojava peydabûna romana dîrokî bi mînakên ji wêjeya îngilîzî, frensî, almanî û ûrisî tê vegotin. Ji bo derfeta beramberkirinê çê bibe û romana dîrokî ya kurdî di nav peywendekê de bide rûniştandin, pişti destpêka romana dîrokî a li Rojava, di wêjeya farisî û tirkî jî de cihê romana dîrokî tê çavdêrîkirin. Di vê binbeşê de xuya dibe ku di her civakê de pêwendiyek nêz di navbera roman, dîrok û netew/netew-dewletê de heye. Lê li Rojhilat, ku van salên dawîn, ligel pirsgirêkên modernbûna “derengmayî” û li hember Rojava bi windakirina qaweta xwe re, romana dîrokî bêtir dibe amûra nîqaşa meseleyêن îroyîn û lêgerîna rabirdûyek pak û xwedîhêz.

Beşa duyem, ji nirxandina yanzdeh romanê dîrokî yên kurdî di nav peywenda dîrok, nasnameya netewî, bîra civakî, rabirdû û dahatûyê de, pêk tê û şes binbeşen wê hene. Her binbeşek ji bo romanûsekî hatiye vejetandin. Ewilî kurtejiyan û berhemên romanûs cih digre û paşre berhemên wan.

Di beşa sêyem de, wek encam li ser hemû romanan wê nixandinek bi giştî bê kirin.

Romanûsê ewil Eliyê Ebdilrehman û romanên wî *Xatê Xanim* û *Ser Li Çiya* bi taybetmendiyêñ xwe balê dikşînin ku perspektîf û meseleyêñ îroyîn çawa di rabirdûyê de bi cih dikin.

Di binbeşa duyem de romana *Biro* a *Yılmaz Çamlıbel* bêtir bi endîşeya fîrkirina dîrokê derdikeve pêş û ev endîşê dikeve pêşıya endîşeyêñ estetîkî. Xalek berbiçav jî ew e ku di vê romanê de di dema serhildana Agiriyê de kurd bi giştî wek netewek yekgirtî tê teswîr kirin.

Romanûsê sêyem Erebebê Şemo û romana wî *Dimdim* e ku mijara xwe ji destana Kela Dimdimê girtiye. Di *Dimdimê* de jî endîşeya fîrkirina dîrokê û çêkirina bîreka civakî a netewî serdest e. Ya din, di vê romanê de ew bandora pêla sosyalizma realîzmê ku di wê dewrê de li Sowyetê serdest bû, bi hêsanî xuya dibe.

Tosinê Reşîd, nivîskarekî din Qafqasyayê, bi romana *Mestûreyê* ji vê xebatê re dibe mijar. *Mestûre* bi serlehenga xwe ku jineke helbestvan û dîroknas e, derdikeve pêş ku piştî *Xatê Xanim* ev serlehenga jin a duyem e.

Mehmed Uzun bi sê romanên xwe, *Siya Evînê*, *Bîra Qederê* û *Hawara Dicleyê* cih digre. *Siya Evînê*, *Bîra Qederê* du romanên biyografîk in ku bi armanca bibîrxistina du lehengên hemû jiyana xwe ber bi têkoşîna kurdayetiyê de dane, hatine nivîsandin. Mijara romana sêyem a Uzun, *Hawara Dicleyê*, di dewra Mîr Bedirxan Paşa de derbas dibe. Digel ku dewr nîvê yekem a sedsala 19. e, em di romanê de teswîrek heqîqî a vê dewrê nabînin û roman teví anakronîzmayêñ xwe, bi perspektîfa xwe ya îroyîn balê dikşîne. Hewldana nivîskar ku dixwaze “îroya xwe” di rabirdûyê de piştrast bike bûye armanca nivîsandina vê romanê.

Romanûsê dawîn Jan Dost e ku li gor wî jî bo sazkirina “îro” û dahatûya kurdan dîroknasî pêdiviyek pir acil e û lewma romanûsiya xwe ji bo vê terxan kiriye. Ji xwe hilbijartina wî ya mijaran jî vê nîşan dide: Komara Mehabadê (*Mijabad*), serhildana Şêx Seîd (3gav û 3darek) û Ehmedê Xanî (*Mîrname*). Digel ku di romanên wî de meseleyêñ îroyîn ên siyasî, çandî, nasnameyî rû didin jî, Dost ew nivîskar e ku di berhemên wî de anakronîzm herî kêm xuya dike û endîşeyêñ estetîkî nabin qurbana wan. Di her berhemekê de şêweyek cûda ta’mek nû dide xwendevanêñ xwe.

ABSTRACT

Among the Kurdish novels, the historical novels have settled as a genre that deserve to be studied academically. This thesis aims to study the Kurdish historical novels written in the Kurmanci dialect that were published from the beginning of the 1950s until 2010, and evaluate them in a sociological and historical context. This thesis asserts that the needs of the present incline the societies and their intellectuals to study the past, and so writing historical novels, too, is not far from that aim. The Kurdish authors also use the historical novels as instrument because of the political needs of the present and they sometimes write historical novels to teach the history to the new generations. In addition, in those historical novels that were studied for this thesis, the present is the subject rather than past, and they have become the instrument for building the kurdish identity and social memory.

Another assertion of this thesis is that the political conditions of society play an important role in determining the content and quality of the literary works. Recent changes regarding the Kurdish Question have improve the quality of the Kurdish historical novel and authors are heading towards more diverse issues rather than the big issues like national identity, national struggle and rights etc.

This study consists of Introduction and three main chapters. In the Introduction, the relationship between novel and nation, novel and history, and aim of the thesis were explained. In the Methodology, as a subsection of Introduction, consists of a short presentation of Kurdish historical novels; which were discussed in this thesis and the critical methods were used for the evaluation of the novels.

In the first chapter, the features of historical novel as a genre and rise of the historical novels in the West together with some examples of British, French, German and Russian literature. In addition, the situation of historical novels in Persian and Turkish literature was studied in order to be able to make a comparison and to place the Kurdish historical novels in context. In this subsection it was seen that in every society there is a close relation between novel, history and nation/nation-state. However, since about two centuries the East has been faced for with problems resulting from late-modernisation and loss of power vis-a-vis the West, historical novel has been a tool for the discussion of present issues and for seeking a pure and powerful past. However Arabic historical novel couldn't be mentioned because of absence of resources related to this subject.

The second main chapter which consists of critical evaluations about eleven kurdish historical novels in the context of history, national identity, social memory, past and present, has been divided into six subchapters: one subchapter for each novelist. In each subchapter, the biography of novelist and his works are considered, and then the novels in question are studied.

In the third chapter, it will be a general evaluation about all the mentioned novels.

The first Kurdish historical novelist is Eliyê Ebdilrehman. His novels *Xatê Xanim* (Lady Khate) and *Şer Li Çiya* (War On the Mountains) are remarkable with that they situate the present perspective and the issues of the past.

The second subchapter is about *Biro* by Yılmaz Çamlıbel. It comes forward with its concern to teach history or to learn lessons from history. A further important point is that the Kurds are described as a united nation during Ağrı rebellion.

The third Kurdish historical novelist is Erebê Şemo and his novel *Dimdim* which takes its subject from the the Dimdim Castle epic (destana Kela Dimdimê). In *Dimdim*, aims of teaching history and building an social memory are important features. Moreover, the characteristics of socialist realism can be easily seen in that novel.

Another author from Caucasia (Armenia), Tosinê Reşîd is studied through his novel *Mestûre*. *Mestûre* is remarkable for its woman protoganist who is a historian and poet. She is the second woman protagonist after Xatê Xanim.

Mehmet Uzun is included in this study with his three novels: *Siya Evînê* (Shadow of Love), *Bîra Qederê* (Well of Fortune) and *Hawara Dicleyê* (Appeal of Tigris). The first two are biographical and are written with the aim of reminding the reader of two Kurdish politicians, Celadet Ali Bedirhan and Memduh Selim Bey, and to build a place in national social memory for these two politicians. The third novel is about the period of Mîr Bedirhan Pasha. It has been noted that although it was setting in the middle of the 19th century, one cannot see a description of that period. In addition to serious anachronisms, it has been noted that the present perspective was reflected to the past by the author and he tried to verify his present in the past.

The last novelist is Jan Dost who thinks that historiography is a necessity for Kurds to be able to build both their present and also their future, and who built his authorship on this theme. His novels' subjects confirm that foundation and collapse of the Republic of Mahabad (Mijabad), the Sheykh Seîdre bellion (3gav û 3darek) and Ahmedî Khanî (Mîrname). Despite the fact that political, cultural and identity issues

appear in his novels, he is a writer who has the minimum number of anachronisms in his works and does not sacrifice the aesthetic values to cultural and political concerns.

مَهْوَ النَّامَهُ كِتَابٌ

ÖZET

Kürt romanı içinde tarihsel roman bir tür olarak yerini almış ve araştırmalara konu olmayı hak etmiştir. Bu tez, 1950'li yılların başından 2010 yılına kadar yayınlanmış olan Kürtçe'nin Kurmancı lehçesinde yazılmış tarihsel romanları ele alarak, onları sosyolojik ve tarihsel bir bağlam içinde değerlendirmeyi amaçlamaktadır. Bu tez, bugünün ihtiyaçlarının toplum ve entelektüellerini geçmiş araştırmaya sevk ettiğini, tarihsel roman yazarlığının da bu amaçtan uzak olmadığını iddia etmektedir. Kürt romancılar da bugünün siyasi ve kültürel ihtiyaçlardan kaynaklı olarak tarihsel romanı araşslaştırmakta ve zaman zaman tarihsel romanı yeni nesillere tarihin öğretilmesi amacıyla doğrultusunda yazmaktadır. Bununla beraber denilebilir ki söz konusu tarihsel romanlar geçmişten ziyade şimdidiyi konu edinmekte ve Kürt kimliği ve toplumsal hafiza inşasının bir aracı olmaktadır.

Bu tezin diğer bir iddiası da, toplumun içinde bulunduğu siyasi koşulların edebi ürünlerin içerik ve niteliğini tayin etmekte önemli bir rol oynadığıdır. Kürt meselesinde yaşanan değişimler Kürt tarihsel romanında niteliği artırmakta ve içeriğin büyük meselelerle sınırlı kalmayarak daha geniş bir çeşitlilik kazanmasına vesile olmaktadır.

Bu çalışma giriş ve üç ana bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde roman ile ulus, roman ile tarih arasındaki ilişki, konu ve tezin amacı ele alınmaktadır. Ayrıca, metod altbaşlığı altında, çalışmaya konu olan Kürtçe tarihi romanlara dair kısa bir tanıtım ve romanların değerlendirilmesinde kullanılmış olan eleştiri metodlarını içermektedir.

Birinci bölümde, bir roman türü olarak tarihi romanın özellikleri ve Batıda tarihi romanın ortaya çıkışını İngiliz, Fransız, Alman ve Rus edebiyatlarından örneklerle açıklanmaktadır. Bir karşılaştırma imkanının doğması ve de Kürtçe tarihi romanın bir bağlam içine yerleştirilebilmesi için, Batı'da tarihi romanın ortaya çıkışının ele alınmasından sonra Fars ve Türkçe edebiyatlarında da tarihi romanın yeri üzerinde duruldu. Bu alt bölümde de görüldüğü gibi her toplumda roman, tarih ve ulus/ulus-devlet arasında yakın bir ilişki sözkonusudur. Ancak Doğu son iki yüzyıldır gecikmiş modernleşme ve Batı karşısında uğradığı güç kaybının doğurduğu sorunlarla karşı karşıya kaldığı için, tarihi roman daha ziyade bugünün sorunlarını tartışmanın, saf ve güçlü bir geçmiş arayışının aracı olmuştur.

İkinci anabölüm, on bir Kürtçe tarihi romana dair tarih, ulusal kimlik, toplumsal hafiza, geçmiş ve bugün bağlamında yapılan değerlendirmelerden oluşmakta ve altı alt

bölüme ayrılmaktadır. Her bir yazara bir alt bölüm ayrıldı. Öncelikle her bir roman yazarının biyografisi ve eserleri, ardından sözkonusu romanlar incelenmektedir.

Üçüncü bölümde, sözkonusu romanlara dair genel bir değerlendirme yapılacaktır.

İlk kürt tarihi roman yazarı Eliyê Ebdilrehman ve *Xatê Xanim* (Hatê Hanım) ile *Ser Li Çiya* (Dağlarda Savaş) adlı romanları günümüz perspektifini ve günümüze dair sorunları geçmişte konumlandırmalarıyla dikkat çekmektedirler.

İkinci alt bölümde Yılmaz Çamlıbel'in *Biro* adlı romanında tarihi öğretme ya da tarihten ders alınması kaygısı öne çıkmakta ve bu estetik kaygıların önüne geçmektedir. Diğer bir önemli nokta da, bu romanda Ağrı İsyani döneminde Kürtler birleşik ve bütün bir ulus olarak betimlenmektedir.

Üçüncü roman yazarı Erebê Şemo ve konusunu Kela Dimdimê (Dimdim Kalesi) destanından alan *Dimdim*'dır. Dimdim'da yine tarihi öğretme ve ulusal bir toplumsal hafiza oluşturma kaygıları ön plandadır. Ayrıca bu romanlarda dönemin Sovyetler Birliği içinde hakim olan sosyalist gerçekçilik akımının etkileri de kolayca görülmektedir.

Kafkasya (Ermenistan) kökenli diğer bir yazar, Tosinê Reşîd *Mestûre* adlı romaniyla bu çalışmaya konu olmaktadır. Mestûre, kahramanının tarihçi ve şair olan bir kadın olmasına öne çıkmakla beraber bu *Xatê Xanim*'dan sonra ikinci roman kahramanıdır.

Mehmed Uzun üç romaniyla, *Siya Evînê* (Yitik Bir Aşkın Gölgesinde), *Bîra Qederê* (Kader Kuyusu) ve *Hawara Dicleyê* (Dicle'nin Yakarışı) ile yer almaktadır. İlk ikisi biyografik olup, bütün hayatlarını Kürt davasına adamış iki kahramanın hatırlatılması, toplumsal hafızada yer edinmeleri amacını taşımaktadırlar. Üçüncüsü, Mîr Bedirhan Paşa devrinde geçmektedir. Dönem 19. Yüzyılın ortaları olmasına rağmen, romanda o dönemin gerçek bir tasvirini göremiyoruz. Ciddi anakronizmaların yanısıra, günümüz perspektifinin geçmişe nasıl yansıtıldığı ve yazarın kendi bugününe geçmişte doğrulatmaya yönelik çabası üzerinde duruldu.

Bu teze konu edilen son roman yazarı, Kürtlerin bugün ve yarınlarını kurabilmeleri için tarihçiliğin bir gereklilik olduğunu düşünerek roman yazarlığını bunun üzerine kuran Jan Dost'tur. Konu seçimleri de bunu göstermektedir: Mahabad Kürt Cumhuriyet'inin kuruluşu ve yıkılışı süreci (Mijabad), Şeyh Said ayaklanması (3gav û 3darek) ve Ahmedî Hanî dönemi (Mîrname). Her ne kadar romanlarında günümüze dair siyasi, kültürel ve kimliksel meseleler yer alsa da Dost romanlarında

anakronizmi en alt düzeyde tutan bir yazar olup ve estetik değerleri siyasi, kültürel kaygırlara feda etmemesiyle dikkat çekmektedir.

مَوْلَانَةُ الْأَنْجَامِ كِتَابٌ

PÊŞGOTİN

Li Tirkiyê, Enstituya Zimanê Zindî ya Zanîngeha Artukluyê ya li Mêrdinê yekem saziya fermî ye ku tê de xebatê akademîk ên li ser wêjeya kurdî dest pê kiriye. Ev tez yek ji wan tezêni ji dewra ewilî ye.

Di destpêka sedsala 21an de wêjeya kurdî bi giştî hê warekî beyar e û li benda ajotinê ye. Romana kurdî, li gor temenê romanê li Rojava û welatên cîran, temenê wê kurt e. Temenê xebatê bi awayekî akademîk gelekî kurttir e û li ser romanê kurdî yên dîrokî heta vêga (li Bakur) li gor zanîna me tu xebat nehatine kirin.

Ji ber sedemên curbecur ên siyasî û çandî çawa ku wêjeya kurdî ya modern derengmayî ye, xebatêni li ser wê jî elbet derengmayî an nûzayî ne. Di vî warî de kitêba Haşim Ahmedzade ya bi navê *Roman ve Ulus, Fars ve Kürt Anlatışal Söylemi Üzerine Bir Çalışma* di kurmancî de yekem berhema akademîk a li ser romana kurdî bû. Wek berdewamiya xebatêni Ahmadzade, di sala 2011an de hin gotarêni wî yên li ser romana kurdî bi navê *Romana Kurdi û Nasname* çap bû. Hin gotarêni Remezan Alan ên li ser romana kurdî di nav kitêba wî ya *Bendame* de cih girtine ku di sala 2009an de çap bûne. Digel ku sal bi sal hejmar û çawaniya romana kurdî zêde dibe ewqas xebat di vî warî de valahiyek mezin nîşanî me dide.

Ger ku em bêni ser romana kurdî ya dîrokî, di vir de valahiyek mezin tir heye. Di vî warî de li ber destê me xebatek nîne. Ji ber ku di destpêka çêbûna hişmendiya netewî de, ev ji bo hemû miletan wisa ye, dîrok û romanêni dîrokî cihekî wan ên girîng hene. Fîkr û ramanêni siyasî ji bo belavkirina wan pêdivî bi romanê heye. Ev tê wê wateyê ku roman jî bi serê xwe xwedî vegotinekê (söylem, discourse) ye û divê ev vegotin bi alîkariya disiplînen din ên civakî bê vekolandin. Lewma li her welatî di nav xebatêni li ser wêjeyê de romanêni dîrokî her tim cih girtine. Xebatêni bi vî rengî gelek caran ji bo ravekirin an deşîfrekirina hişmendî an armancêni siyasî yên dewrekê gelek caran romanêni dîrokî hatine bikaranîn. *Genesis, “Büyük Ulusal Anlatı” ve Türklerin Kökeni ya Murat Belge* bi vî rengî ye.

Armanca amadekirina vê tezê jî ew e ku bi rêya romanêni dîrokî hişmendiya kurdan a sedsala dawîn qismek jî be bê analîzkirin û kîmasiyek di wêjeya kurdî de bê berteref kirin. Ez hêvî dikim ku ev tez wê rê li ber xebatê berfirehtir veke û di tijîkirina valahiyekî de, biçûk be jî, rolek wê hebe.

Elbet ger ku Enstituya Zimanê Zindî ya Zanîngeha Artukluyê nîn bûya ev tez nedihat amadekirin. Beriya her tiştî xwendekariya min a li Enstituya Zimanê Zindî

meyla min a li ser wêjeyê bi giştî û bi taybetî jî li ser wêjeya kurdî xurt kir ku vê him di asoya min de deriyên nû vekirin û him sînorêن fîkr û ramanêن min firehtir kirin. Di pêvajoya amadekirina vê tezê de şêwirmendê min Doçentê Alîkar Dr. Hayrullah Acar bi rexne û pêşniyariyêن xwe yên hêja asoyê teza min mezintir kir. Bi alikariya xwe di peydabûna hin çavkaniyêن ku ez jê ne haydar bûm karê min gelekî sivik kir. Lewma ez beriya her tiştî spasiyêن xwe yên jidil pêşkeşî wî dikim. Divê ez spasiya Prof. Dr. Kadî Yıldırım û Doçentê Alîkar Dr. Abdurrahman Adak jî bikim. Ji ber ku di destpêkê de hemû barê Enstitutiyyê û yê me xwendevanan li ser milê wan bû. Û sohbetê bi Remezan Alan re ku me li ser rêya Diyarbekir-Mêrdînê û di dersan de dikirin hewesa min li ser vê xebatê zêde kir. Tevî vê ji bo çavkaniyêن ku wî pêşniyarî min kirin an wî bi xwe dane min ez gelekî minetdarê wî me, gelek spas.

Fahriye Adsay

مەھۇنامەدى كېتىپ

NAVEROK

Kurte.....	I
Abstract.....	III
Özet.....	VI
Pêşgotin.....	IX
Naverok.....	XI
Kurtebêje.....	XII

DESTPÊK

I. Roman û Netew.....	3
II.Roman û Dîrok.....	5
III.Rêbaz.....	7

BEŞA YEKEM

I. Taybetmendiyên Romana Dîrokî.....	10
II. Di Wêjeya Cîhanê de Romana Dîrokî.....	12
1. Romana Dîrokî li Rojava.....	12
2. Romana Dîrokî ya Tirkî.....	16
3. Romana Dîrokî ya Farisî.....	23

BEŞA DUYEM

I. Romanûs û Romanên Kurdî yên Dîrokî (Kurmancî).....	27
1. II.Eliyê Ebdilrehman.....	34
a. Jiyan û Berhemên Wî.....	34
b. Xatê Xanim.....	35
c. Şer Li Çiya.....	38
d. Nirxandinek Hevpar Li Ser Xatê Xanim, Şer Li Çiya	44
2. Yılmaz Çamlibel	
a. Jiyan û Berhemên Wî.....	49
b. Biro, Romana Serhildana Agiriyê.....	49

3. Erebê Şemo	
a. Jiyan û Berhemên Wî.....	61
b. <i>Dimdim</i>	61
4. Tosinê Reşîd	
a. Jiyan û Berhemên Wî.....	69
b. <i>Mestûre</i>	69
5. Mehmed Uzun	
a. Jiyan û Berhemên Wî	78
b. <i>Siya Evînê û Bîra Qederê</i>	79
c. <i>Hawara Dicleyê</i>	83
6. Jan Dost	
a. Jiyan û Berhemên wî.....	92
b. Di nivîskariya Jan Dost de Aciliyeta Dîroknasiyê.....	92
c. <i>Mijabad</i>	95
d. <i>3gav û 3darek</i>	99
e. <i>Mîrname</i>	104
III. ENCAM.....	109
ÇAVKANÎ.....	112
ÇAVKANIYÊN INTERNETÊ.....	115

KURTEBÊJE

- amad.**: amadekar
b.n.: berhma nav borî
bnr.: binêrin
c.: cild
ç.: çap
ed.: edîtor
h.b.: heman berhem
h.m.: heman malpêr
hwd.: her wekî din
j.: jimare
r.: rûpel
vgz.: veguhêzer
wer.: wergêr

هەوالمامەى كىتەب

DESTPÊK

Peydabûna romanê bi qasî ku bi peydabûna takekes ve tê girêdan, peydabûna netewê jî bi romanê ve tê girêdan. Lewma di peydabûna netewê de rola romanê hêjayî niqaşê ye. Roman her çiqas vegotineke sade û têr-wate ya ezmûnên mirov be, em dikarin vê tarîfê ber bi ezmûnên netewekê ve berfirehtir bikin. Bi qewlê Ian Watt¹, di şêwaza romanê de pêşane (öncelik)² an teamûlek heye ku roman bi xwe neqirkirinek bêkêmasî û heqîqî ya ezmûnên mirov e. Ligel vê, wek konsesusekê tê qebûl kirin ku wêje, bi taybetî jî roman, amûreke ifadekirina karakter û rihê netewekê ye. Roman ne tenê amûrek ifadekirinê an temsiliyeta netewê ye, li gor Benedict Anderson³, beriya wê ew amûreka texeyulkirina cimaeteke muxayel e. Ji ber ku bûyerên romanê nikare di nav cimaeteke piçûk ku hemû ferdên wê hevdû nas dîkin derbas bibe; di nav civakekê de ku ferdên wê rûbirû hevdû nas nakin, derbas dibin. Ferdên vê civakê dikarin kêm kesan nas bikin, tenê dikarin ên din texeyul bikin. Tiştê ku sînorên vê cimaeta muxayel tespît dike zimanê romanê ye. Ziman jî bi xwe xwendevanê xwe diyar dike ku xîtabî wî/wê dike.

Ev tez, di wêjeya kurdî de romanên dîrokî ji xwe re dike mijar. Bi rêya van romanen pêwendiya di navbera roman û dîrokê de wê bê nîqaşkirin. Çawa me got roman amûreke texeyul û temsiliyeta netewê ye, romanen dîrokî, ji bo analîzkirina hişmendiya netewekê amûreke girîng e. Mijarên dîrokî her tim îlham dane romannûsan lê ne ku tekiliya wêje û dîrokê bi romanê dest pê kiriye; beriya romanê jî bûyerên dîrokî her tim daxilî wêjeyê bûne. Di vir de cûdatiya ku di romanê de derketiye pêş ew e ku têkiliya di navbera dîrok, roman û nasnameyê tev de tê rojevê. Roman, di vê xebatê de romana kurmancî, êdî ne tenê amûreke temsiliyeta civaka kurd e, lê ew di nav hewla çekirina nasnameyê de ye an dibe amûreke tesewirkirina dahatûyê.

Romanen ku di vê xebatê de jê hatine îstîfade kirin, yên ku bi zaravayê kurmancî ne. Zaravayên din derveyî vê xebatê mane. Sedema hilbijartina vê mijarê ew e ku ev romanen dîrokî ji bo analîzkirina hişmendiya civaka kurd amûrek pêewle ye. Wêje bi

¹Ian Watt, *Romanın Yükselişi: Defoe, Richardson ve Fielding Üzerine İncelemeler*, çev. F. Burak Aydar. Metis Yayınları, İstanbul, 2007, r. 30.

² Di kurdî de nivîsandina deqêن akademîk ji bo bakûrê Kurdistanê hê nû ye. Girêdayî vê di nav zimên de bikaranîna gelek têgehîn razber baş rûnenistiye. Lewma di vê tezê de ji ber xema ku hin peyv ji aliyê xwendevan nê famkirin, tirkî an îngîlîziya wan, carina her du jî, di nav kevanê de hatine raberkirin.

³Benedict Anderson: *Hayali Cemaatler*, wer. İ. Savaşır. Metis Yayınları, İstanbul, 1995, r. 39.

xwe bi tevahî ji bo naskirina hişmendiyek dewrekê, ji bo analîzkirina nexşeya zihنî ya rewşenbîr û civaka wan têra xwe materyal dide dest. Di nav sînorêن vê xebatê de ez ê hewl bidim ku di warê nasnameya netewî û bîra civakî de zihniyeta romanûsêن romanêن dîrokî yên kurdî analîz bikim. Bi rêya romanân nêrînêن wan ên li ser civaka wan, dahatuya ku wan texeyul kirine, di nav texeyula wan de tarîfa wan a nasnameya kurd û bîra civakî ku wan pêşniyar kirine wê bêن nîqaşkirin. Di romanân de civaka kurd çawa hatiye texeyulkirin û temsîlkirin û di vegotinêن derheqê nasnameyek neteweperwer de romanûsan rolek çawa girtine ser xwe, wê bê tespitkirin. Ev xebat armanc dike ku ka ew nihiçkên (gündü, motive) ku romanûsêن kurd ber bi mijarêن dîrokî ve dikşîne keşif bike û bersiva van pirsan bide: Gelo ji bo romanûsêن kurd dîrok tenê dekorek e an ji wê wêdetir e? Di romanêن dîrokî yên kurdî de endîşeyêن nivîskaran ci ne? Endîşeyêن ku berê romanê diguhere ber bi aliyekî ve dibe ci ne? Divê ev çawa bêن fam kirin an analîz kirin? Gelo dema romanêن dîrokî têن xwendin xwendevan tenê li ser rabirdûyê difikire an bêtir li ser dahatûyê difikire? Di her serdemê de, an em dikarin bêjin ji destpêka peydabûna disiplîna dîrokê ve, di navbera dîrok û siyasetê de tekiliyek xurt hebûye. Di romanêن kurdî yên dîrokî de gelo cihê siyasetê ci ye? Siyaseta îro ci bandor li ser romanêن dîrokî kiriye? Di meseleya nasname û bîra civakî di romanêن dîrokî de çawa hatiye bicihkirin? Netewa ku romanûsêن kurd texeyul dikan di nav kîjan sînoran de ne an bi gotineke din welatekî wan heye? Ku hebe ew kuder e? Bi kurtasî armanc ew e ku di berhemekê de ci tê vegotin, ci diqewime û çima wisa dibe, dixwaze bêje ci, dixwaze ci bê fam kirin. Elbet hemû endîşê an armancêن nivîskaran li ser çawaniya romanê wan bandor kirine û gelek caran ketine pêşıya endîşeyêن estetîkî. Ev jî yek ji meseleyêن ku wê bê analîzkirin.

Ji bo em bikaribin derbasî romanêن dîrokî bibin, wê berê behsa pêwendiya roman û netewê bê kirin. Peywenda derçûna herdû têgehan çima û çawa gelekî nêzî hevdu ne, wê bê ravekirin. Roman û dîrok di vê tezê de du têgehêن sereke ne. Di romanê de cihê mijarêن dîrokî ku qasî navê xwe bide cureyek romanê, girîng e. Ev di kîjan peywendê de têن ba hev an gelek caran çawa hevdu temam dikan, wê bê izehkirin. Di binmijara rîbazê de, rîbaz û pêvanêن nirxandina romanêن dîrokî û sedemêن wê wê bê nîqaşkirin.

I. Roman û Netew

Şert û mercên derçûna romanê û modernîteyê nêzî hev in an tezên ji bo derçûna modernîteyê tê iddiakirin ji bo romanê jî derbasbar in. Beriya her tiştî her dû jî di encama guherîna epîstemolojîk a di sedsalêن 17mîn û 18mîn de peyda dibin. Berhemên Cervantes ên sedsala 17, ên Fielding û Defoe yên sedsala 18mîn û berhemên Descart û Kant di nav heman peywenda epîstemolojîk de cih digrin. Çawa ku Descart wek avakerê felsefeya nûjen encama guherînên epîstemolojîk ên serdema nû ye, roman jî encama guherînên epîstemolojîk ên vê serdemê ye. Her cureyek wêjeyî di nav pêvajoyêن dîrokî de dikare bêن famkirin. Her cure, awayek nêrîne ye ku çarçoweya wê bi cih û demê hatiye diyarkirin. Wek mînak romans awayek vegotinê ye ku dikare encax di nav çarçoweya serdema navîn de bê vegotin. Romana *Don Quixote* (Don Kîşot) a Miguel de Cervantes ku di sala 1605an de hatiye çapkiran wek yekem roman tê qebûlkirin. Li gor Jale Parla *Don Quixote* meydan xwendinek li hemberî qeyrana epîstemolojîk a di cûreyêن wêjeyî bû⁴. Lê ew li hemberî rewşa siyasî bû jî ew jî qasî ev cûreyan kevn bûbû. Mîlan Kûndera ji bo balê bikşîne ser nêzîkahiya epîstemolojîk a di navbera roman û modernîteyê de dibêje sedsala 18mîn ne tenê sedsala Rousseau, Voltaire, Holbach e, di heman demê de sedsala Fielding, Sterne, Goethe, Laclos e jî.⁵ Li gor vê nêrînê, mirov dikare bibêje ku roman encama takekesiya serdema modern e. Ji ber ku roman li ser takekes ava dibe; ev takekes gelek caran mirovê ji rêsê ye. An li dora qehremanekî mirovên ji rêsê ji aliyê nivîskar jî û xwendevan jî eleqeyek mezin dibînin. Eleqeya romanê a di derbarê jiyana rojane ya mirovên ji rêsê xwe dispêre du şertan. Yek, divê civak jiyana mirovên ji rêsê ewqas hêja bibîne ku ew dikaribe bibe mijara wêjeyek ciddî. Du, dema jiyana mirovên ji rêsê bi hûrgilî hate neqilkirin, di jiyana wan de divê bi qasî ku bala mirovên din yanê xwendevanêن romanê bikşîne tiştên balkêş hebin. Ev her du şert beriya van sedsalan nîn in, ji ber ku ji bo herduyan jî civakeke ku ‘takekesî’yê ku girêdayî gelek hokerên têkel e û xwedî naverokeke berfireh e, mohra xwe lê xistibe, lazim bû. Bê guman beriya vê serdemê jî ‘mîrov’êن takekes ku xwebîn (benmerkezci), bêemsal, ji bawerî û qaîdeyêن heye azade tevdigeriyan hebûn, lê têgeha ‘takekesîtî’yê tiştékî ji vê berfirehtir e. ‘Takekesîtî’, di civakeke ku tê de her takekes him ji yên din him ji ‘kevneşop’, kiryar û dîtinêن rabirdûyê dikaribin azade bin de, îfadeya xwe dibîne. Civakeke bi vî rengî jî îdeolojiyek nû jê re lazim e. Bi gotineke

⁴ Jale Parla, *Don Kişot’tan Günümüze Roman*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010, r.53-54.

⁵ Haşim Ahmedzade, *Uluslararası Roman*, wer. A. Ziya Gündoğan, Weşanen Periyê, Stenbol, 2004, r.21.

din, rêxistîbûnek siyasî û aborî ku ji endamên xwe re alternatifên cûr bi cûr pêşkeş dike û îdeolojiyeke ku girêdayî xweseriya takekes be (ne ku girêdayî kevneşopêن rabirdûyê be), lazim e. Lewma li gor vê pêvanê civaka modern heta bêje takekesî (bireyci) ye û du şertên dîrokî ku rê li ber takekesîtiyê vekirine ev in: kapitalîzma modern a pîşesazî û belavbûna protestaniyê.⁶

Eger em bi awayekî kurt netewê, bi gotina Anderson, wek ‘cimaetek muxayel’ ku endamên wê ji sedegetên xwe yên malbatî, olî û eşirtî wêdetir sedegetên wan ï bi cimaetek muxayel re hene, tarîf bikin, pêwendiya netew û takekesîtiyê derdikeve pêş. Ji bo ku mirovên civakekê xwe wek endamên netewekê muxayel bikin divê taybetiya takekesîtiyê bi wan re hebe. Yanê, dikaribin ji sedegetên kevneşopî yên wek malbat, ol û eşîr wêdetir biçin û sedeqeta netewî di ser wan re bigre. Civak an şert û mercen aborî û siyasî jî divê bikaribe vê alternatifê an bawesînkek (yelpaze) tercîhan ji endamên xwe re pêşkeş bike. Ji vê tarîfê jî em tê ser pêwendiya roman û netewê an hevedemîtiya roman û netewê ku hebûna herdulan jî girêdayî hebûna ‘takekes’ e. Ji vir û wêde, rola romanê a di şewandin û meşrûkirina netewê de ku piştî salên 1990î bûye mijara xebatên dîrokî, çandî, civakî û siyasî, derdikeve holê. Girîngiya wêje û siyaseta di nav wê de, êdî ne tenê bala teorîsyenên wêjeyê, bala civaknasên jî dikşîne û di çêbûna hişmendiyek netewî de girîngiya romanê tê qebûlkirin. “Wêje jî saziyek civakî ye, lewma bi rêya îmkan û kategoriyên analîtik ên sosyolojiyê bê vekolandin.”⁷ Li gor analîzek sosyolojîk, honak, wek alamet-î farîqakaya netewên modern, di anonîmtiya civakekê de baweriyeke saz dike û bi awayekî bêdeng dinizile nav rasteqîniyê (gerçeklik). Li gor Anderson roman û cimaeta muxayel, yanê netew analoziyên hevdemî ne. Anderson rojnameyê jî dixîne nava vê tesbîta xwe û iddia dike wek cimaetek muxayel, ev herdû, amûrên teknîkî yên teswîirkirina netewê ne. Ligel taybetiya xwe ya teswîirkirina netewê, wê wek hokareke sazker a netewê jî dibîne. Roman wê neteweyê li hemberî yeka din tarîf dike, cudatiyên wê ya li hemberî ‘ya din’ derdixîne pêş, û dost û neyaran diyar dike. Heta romanê wek pêsemerekî hebûna neteweyekê qebûl dike. Lewma bi qasî belgeyên dîrokî an analîzkirina şerd û mercen siyasî, aborî û civakî, romanên dîrokî yên kurdî jî ji bo ravekirina netewperweriya kurdî elzem in. Em ê bibînin ku romanên dîrokî yên kurdî jî bi naveroka xwe hebûna netewa xwe çawa teşwîk dike, meşrû dike, dişêwîne û biheq derdixînin.

⁶ Watt, h.b., r.69.

⁷ Parla, h.b., r.36.

Bê guman, gelemperekirineke ku ‘cimaeta muxayel tenê encama romanê ye, wê perçeyek ji rastiyê be. Bi qasî ku romanê, di îmkandayina texeyulkirina pêwendiyek berwarî (yatay) ya di navbera endamên neteweyekê de rolek leyistiye, hin hokarêñ din ku di vê pêwendiyê de rol leyistibin jî wê hebin. Tevî cûreyêñ wêjeyî yên din, jimartina nufûsê, nexşe, teknolojiyên modern (wek televizyon, medyaya sosyal) di texeyulkirina netewperweriya fermî û di yê populer de jî rol girtine.⁸ Ji ber sînorê vê xebatê, di nav gelek hokaran de tenê romana kurdî ya dîrokî çiqas neteweyê xwe temsîl like ew ê bibe meseleya vê xebatê.

II. Roman û Dîrok

Eger ku mirov wê qala romanên dîrokî bike divê beriya her tiştî qala pêwendiya di navbera roman û dîrokê de bê kirin. Têkiliya nivîskaran her dem bi dîrokê re hebûye. Ev diçe heta serdema Yewnanistana Antîk, lê elbet ev ji têkiliya di navbera roman û dîrokê ya îro gelekî cuda ye. Ew ne pexşan in; bi awayê lîrîk an epîk hatine vegotin. Li vir mînaka ku herî zû tê bîra mirov, destanêñ epîk ên Homeros, bi navê *İlyada* û *Odyesûs* in. Ji ev herdu destanan *İlyada* mijara xwe ji şerê Truwayê digre. Şerê Truwa ku di destpêka B.Zyê sedsala 13mîn de qewimiye, wî B.Zê di sedsala 8mîn de derbasî nivîsê kiriye û şer bi hemû hurgiliyên wê vegotiye. *Odyesûs* jî serpêhatiyêñ vegera lehengê wê Odyesûs ku qralê İthakayê ye û çûbû şerê Truwayê, vedibêje. Romanên şowalyeyî yên Fransaya serdema navîn ku wek pêşaneyâ romanê tên qebûlkirin jî bi awayekî lîrik dihatin nivîsandin. “Berhemekê ku mijara xwe ji dîrokê girtibe, ev tenê bi serê xwe wê nake romaneke dîrokî. Berhemên ku beriya Walter Scott hatine nivîsandin, tevî yên serdema antîk û serdema navîn, romanên sedsala 17mîn û 18mîn jî ji taybetiyêñ romanên dîrokî bêpar in.”⁹ Scott cara yekem, kirasekî ji çrokek honakî pêk tê, li bûyerek ku di rabirdûyê de qewimiye, kiriye. Ev ceribandina wî yekem car dîrok û honak anije ba hevdu. Bi vî awayî, malzemeyên dîrokî êdî tenê ji bo berhemek wêjeyî ne dekorek e, ew êdî di seranserî berhemê de serdest e û xwe her daîm dide hîskirin. Yanê êdî, romana dîrokî ne tenê wek romanekê ne jî wek berhemek dîrokî dikare bê xwendin. Ji aliyê estetîkî ve çiqas serkeftî be jî wê êdî li gor rastiyêñ dîrokî jî bê nirxandin.

Pîvanên estetîkî û dîrokî, barê rexneya romana dîrokî girantir dîkin û nîqaşen li ser vê cûreyê jî gur dîkin. Gelek rexnegir hemfikirin ku di romanên dîrokî de aliyêñ

⁸ Ahmadzade, h.b., r.25.

⁹ Gögebakan, Turgut, *Tarihsel Roman Üzerine*, Akçağ Yayımları, Ankara, 2004, r.16.

estetîkî lawaz in. Heta romanê Scott jî ketiye ber vê rexneyê. Ev nayê wê wateyê ku romanê dîrokî nikare ji aliyê wêjeyî xurt be. Ev tesbîta lawaziya ji ber pêwendîya wê ya nêz a bi dîrokê re ye ku bivênevê endîşe an armancê derveyî estetîkî bi xwe re tîne. Lewma komek rexnegirê serdema Scott ku wek ‘Yên Ezîz’ dihatin naskirin ji ber pîvanêwan ên xwerû estetîkî ew neecibandine û derêkirine (dışlamak). Lîkolînerê Alman Hugo Aust erka romana dîrokî li ser du xal an hedefan zelal dike; fîrkirina dîrokê û vejandina wê.¹⁰ Ev herdu hedef ji Scott û vir de hê neguheriye. Ev rê li ber şîroveyekê vedike ku xala destpêkirina nivîskarê romanê dîrokî ji yên romanê din cuda ye. An dema romana dîrokî mevzubahis be, nivîskarekî ku armancek daye ber xwe û li gor wê romana xwe saz dike jî mevzubahis e. Pîvan an armanc ne tenê afirandineke estetîkî û hunerî ye. Îcar armanc her çiqas xurt be dibe ku aliyê estetîkî jî ewqas lawaz bibe. Di romanê dîrokî yên kurdî de ev hevsengiya estetîkî û mebestyariyê xaleke girîng e ku balê dikşîne.

Nivîskara/ê romaneyeke dîrokî pêşekiyê bide pêvanêne estetîkî jî wê dîsa ji rexneyan azade nebe. Ji rexneyen estetîkî azade bibe jî wê bi rexneyen ‘çima’yên di warê dîrokî de rû bi rû bimîne. Çawa ku di warê bûyerên dîrokî de fîkr û ramanê cuda, cihêrengî û pirdengiyek heye, li gor pozisyonâsiyasi, çandî û îdeolojîk a nivîskar, a xwendevan û a rexnegirê romana dîrokî jî wê ewqas cihêrengî an pirdengî hebe. Ji ber ku di romana dîrokî de bivênevê nêrîna nivîskar a di derheqê bûyer an serdema ku ew çîroka xwe tê de dihûne, her daim balê dikşîne. Mebestyariya roman dîrokî vê rewşê normalize dike.

Nivîskarê romana dîrokî li gor nêrîn û helwesta xwe mijara xwe hildibijêre û ev karakterê romanê yê îdeolojîk diyar dike. Dema mirov bi perspektîfa sosyolojiya wêjeyî lê binêre, gelek caran nivîskar xwe mecbûr dibîne xwendevanêne xwe jî tetmîn bike an di hedefa wê/wî de girseyek heye ku xitab dike. Gelo nivîskar bandor li xwendevanêne xwe dike an xwendevan bandor li nivîskar dike an nivîskar çiqas dikare ji rewşa sosyolojîk a civaka xwe dûr bimîne, di nirxandina berhemê de rexnegir wê çawa ji peywenda civakî, siyasî û çandî dûr bimîne, ev hemû xal di nirxandina romaneyeke dîrokî de divê her tim li ber çavan be.

Di nirxandina romaneyeke dîrokî de perspektîfek dîrokî, an zanîneke gelempêrî jî be, li ser teoriya dîroknûsiyê elzem e. Ya rast, ji bo dîroknasekî pîvanê hilbijartina bûyerên dîrokî, diyarkirina çarçoweya xebateke dîrokî, an sedema dîroknûsiya wê/wî ci

¹⁰ Gögebakan, h.b., r.53.

be kêm zêde pîvanê nivîskariya romanên dîrokî jî ew e. Bi gotinek e din, mebest an endîşeyê rojane yên siyasî, çandî, civakî, ya bi giştî yên îdeolojîk ji yên dîroknasekî ne pir dûr in. Ev pêwendî an nêzîkaya di navbera dîrok û romanê de, îdeolojîkbûna nivîskarê romanê dîrokî jî piştrast dike.

Tarîfa dîrokê her çiqas wek ‘zanista rabirdûyê’ tê kirin jî li tu welatî mijarê dîroknasan ji meseleyê dewra wan ne dûr in. Dîrok bêtir ji bo famkirin an şîrovekirina ‘îro’ ya me tê lêkolandin û aliyê wê yê balê dikşîne pêwendiya wê ya bi ‘îro’ re ye. Lewma dîrok derbas nabe an em nikarin wê li pey xwebihêlin. Li gor pêdiviyê dewra xwe em wê her dem ji nû de şîrove dikin, fêr dîbin û didin fêrkirin. Nivîskarê romanê dîrokî jî bûyer an qewimandineke ku ‘îro’ya me an xwendevanê xwe eleqeder neke hilnabijêre. Romanek dîrokî ku ew li ser ‘îro’ tiştekî îma neke, şîrove, pêşniyar, reddiye, berzkirin an rexneyê wê li ser ‘îro’ nîn be zehmet e ku cih ji xwe re bibîne. Em ê bibînin ku romanê dîrokî yên kurdî bi rêya bûyerên berê ji bo ‘îro’ya kurdan û ‘yên din’êwan ci dibêjin. Ji ber ku bi gotina Carlo Ginzburg, ‘dîrok, di wateya nivîsandina dîrokê de, gelekî deyndarê hiqûqê ye. Heqîqet, bi rêya retorîkeke parastinê ku hewl dide guhdarvanan an juriyekê di derheqê masumiyet an tawanbariya bersûcekî de iqna bike, di eywanê dadgehan de tê diyarkirin. Ji ber vê yekê, belavkirina edaletê ji bo sazkirina serpêhatiya dîrokî bûye model.’¹¹ Yanê dîrok qadek e ku kêmtirîn du alî li ser şerê diyarkirina heqîqetê dikin. Romanê dîrokî jî ji vê taybetiya nivîsandina dîrokê azade nayê nivîsandin. Her yek ji wan delîlên iqnakirina masumiyet an tawanbariya rewşeke ‘îro’ tê nivîsandin, tê dîtin an tê şîrovekirin.

III. Rêbaz

Ev tez şes romanûs û yanzdeh romanê kurdî (kurmancî) yên dîrokî ji xwe re dike bingeh: *Xatê Xanim* û *Şer Li Çiya* yên Eliyê Ebdilrehman, *Dimdimma Ereb Şemo*, *Siya Evînê*, *Bîra Qederê* û *Hawara Dicleyê* ya Mehmed Uzun, *Mijabad*, 3 gav û 3 darek û *Mîrname* ya Jan Dost, *Mestûreya Tosinê Reşîd*, *Biro: Romana Serhildana Agiriyê* (ji vir pê de *Biro*) ya Yılmaz Çamlibel. Tu neqandin nehatiye kirin. Ev hemû romanê dîrokî yên bi zaravayê kurmancî ne. *Xatê Xanim* (1959) li gor tarîxa weşanê wek romana yekem a dîrokî dikare bê binavkirin. *Dimdim* (1966) ya duym e. Ev herdû roman jî li Ermenîstanê hatine çapkiran. Di serdemeye ku li Kurdistanê kurmancî di bêdengiyeke kûr de bû li Ermenistanê çap bûne, taybetiyekê dide wan. Ji vî aliyê ve jî

¹¹ Enzo Traverso, *Savaş Alanı Olarak Tarih*, ç.1, wer. Osman S. Binathî, Ayrıntı Yayıncılıarı, İstanbul , 2013. r.195.

wê bêñ nirxandin. *Siya Evînê* (1989), *Bîra Qederê* (1995) û *Hawara Dicleyê I* (2002), *Hawara Dicleyê II* (2003) li derveyî welat li diasporayê hatine nivîsandin, û di nav romanêñ kurmancî de herî zêde belav bûne. *Mijabad* (2004), *3 gav û 3 darek* (2007), *Mîrname* (2008) nivîskarê wan ji Kurdistana Sûriyê ye lê ew jî li diasporayê hatine nivîsandin û li Stenbolê hatine çapkiran. *Mestûre* (2010), xwedî lehengek jin e ku wek dîroknas û helbestvan tê naskirin. *Mestûre*, digel ku li welat hatiye çapkiran, li diasporayê hatiye nîvisandin. *Biro* (2010) wek berhema nivîskarekî diasporayî ye, lê li Diyarbekirê çap bûye, qaîdeyê xira nake.

Roman, wê bi rêza li jor tevî kurtejiyana nivîskarêñ wan bêñ nirxandin. Ji bo serdema nivîsandina romanan jî wê çarçoveyek dîrokî, çandî, sosyolojîk bê danîñ û wê roman di vê çarçovê de bê bicîhkiran. Ev rîbaz dikeve nav çarçoveya rexneya dîrokî. Ji bo armanc û sedema nivîsandina nivîskar an naveroka wê baştir bê ravekirin ev pêwîst e.

Rêbaza duyem rexneya sosyolojîk e. Li gor rexneya sosyolojîk wêje bi serê xwe dernakeve holê, di nav civakekê de peyda dibe û wê temsîl dike. Nivîskar, berhem û xwendevan di nav şert û mercêñ civakî de şikil digrin. Ji ber vê bêyî ku civak bê naskirin berhem nikare bê naskirin û bi saya vê him rê li minaqeşeyêñ li ser berhemê dawî tê him jî nîspeten dikare rê li ber subjektivîzmê bigre¹². Ya dawîn ev tez îddia dike ku berhem an deq (text) li derveyî peywendê tenê bi pîvanêñ wêjeyî nikare bê nirxandin, lê ku peywenda deqê, civak û çanda ku ew tê de hatiye hilberandin bê kolandin, wateya deqê encax bi awayekî rîkûpêk dikare bê fam kirin. Wê bal bêtir li ser têgehêñ wek çand, dîrok, peywendê bin ku kirpê didin ser derveyî deqê. Em dikarin vê wek rexneyek wêjeyî qebûl bikin ku bi lêkolînêñ civakî, çandî û dîrokî pêwendî datîne. Deqa wêjeyî, bêyî bandora nivîskar an civakê, tenê bi serê xwe ne hêmana rexneyê ye. Li gorî vê, kirp li ser wê serdema dîrokî ye ku berhem tê de hatiye nivîsandin. Di navbera berhemê û şertêñ dîrokî yê serdema mevzûbahîs de dîyalogek berdewam heye. Elbet di navbera şertêñ serdema ku deq tê şîrove kirin û yên serdema nivîsandina berhemê de jî dîyalog berdewam dike. Ev rîbaza rexneyî ji aliyê Stephen Greenblath wek Dîrokîzanya Nû (Yeni Tarihselcilik, New Historicism) hatiye binavkirin. Greenblath dibêje, wêje an hûner ne tiştekî derveyî dîrokê an civakê ye. Berovajiya dîroknasêñ klasîk ku berhemêñ mezin tenê wek encama dehaya nivîskaran dibînin, ew

¹² Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, İstanbul, İletişim, 2009, r. 83-86.

nivîskar û berhemêن wan jî wek encamek dîrokî ya demekê dibîne¹³. Moran tarîf dike ku “Dîrokînasiya Nû” ya Greenblath dikare wek kombînasyonek rîbazên dîrokî û sosyolojîk bê dîtin.

Di şîrovekirina romanêن jorgotî de, wê nêrînek siyasî hebe. Bi qewlê Fredric Jameson, nêrîna siyasî wê ne tenê nêrînek ilaweyî be. Hemû deq, rengekî wan a civakî, dîrokî û siyasî jî heye. Jameson îddia dike ev ne îddiyek e ku bes hemû kes li ser li hevdû bikin, lê ew pozisyonek jê wêdetir e; bê wê nabe. Ji hevdû veqetandina deqên çandî yên civakî, siyasî û yên ne civakî, siyasî ji xeletiyê xirabtir e. Ji xwe pirr zehmet e mirov qadek azadiyê ku ne di bin bandora dîrokê û ya civakî de be, texeyul bike. Divê bê qebûl kirin ku tiştekî ne siyasî û civakî be nîne; ya rast axir her tişt siyasî ye¹⁴. Lewma di nirxandina romanen de peywenda siyasî ya dewra nivîsandina wan an nêrîna nivîskar wê her tim li ber çavan bê girtin.

Rita Felski¹⁵ li ser meseleya pêwendiya di navbera siyaset û hunerê de xwedî helwesteke radîkal e. Rexnegirêن ku di hunerê de daxilkirina minasebeta siyasî biçûk dibînin ew bi xwe ji afireneriyê mehrûm in. Em hemû dixwazin, di cîhana ku me dorpêç dike de, bi her awayî dengvedana xwê bibînin. Tu sedem nîne ku siyaset derveyî hemûyan bimîne. Ger em qebûl bikin ku peywenda dîrokê bivênevê berê wêjeyê tayin dike, di têkiliya wêje û dîrokê de, bi rîya romanêن dîrokî, meseleya nasnameyê jî wek ji babetên girîng wê derkeve pêş. Wek ku berê jî hatibû gotin, em li Anderson guhdarî bikin roman ji xwe amûreke texeyulkirina netewekê ye, romanêن dîrokî bê nasnameya netewî nikarin bêş şîrove kirin.

¹³ Mehmet Fatih Uslu, “Greenblat’ın Yeni Tarihselci Eleştirisi,” di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011, r. 25-31.

¹⁴ Frederic Jameson, *Siyasal Bilinçdisi*, wer. Yavuz Alogan, Mesut Varlık. Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 20.

¹⁵ Rita Felski, *Edebiyat Ne İşe Yarar*, wer. Emine Ayhan. Metis Yayınları, İstanbul, 2010, r. 60.

BEŞA YEKEM

I.Taybetmendiyê Romana Dîrokî

Romana dîrokî, bi awayekî giştî, di nav çarçoweyeke dîrokî de honandina leheng û bûyeran e. Lehengên wê dibe ku yên dîrokî an ên honakî bin. Armanca romana dîrokî ne ew e ku bûyerên mezin ên dîrokî ji nû de vebêje, lê zindîkirina karakterên di nav bûyeran de cih girtine armanca romanên dîrokî ne. Roman, di nav sînorê honakê de li ser hûrgiliyêni di derheqê şexsan û bûyeran de ku di nav berhemên dîrokî de cih nagrin, disekine.¹⁶ Alfred Döblin, li hemberî tevlîhevkirina honak û dîrokê wek reaksiyonekê dibêje “Romana dîrokî, beriya her tiştî roman e; ya duyem jî, ew ne dîrok e.”¹⁷ Ji aliyê xwendevanan ve hêviyek heye ku dema romanek dîrokî dixwîne wê tenê wek roman nexwîne, an ne tenê li dû ta’mek wêjeyî ye. Dixwaze ji romanê wêdetir be û dîroka wê serdemê jî hîn bibe. Gelek caran ji bîr dike ku ew honak e, ne dîrok e. Dema mirov romanek dîrokî dixwîne divê bala xwe bide çi? An bi kîjan pîvanan romanê binirxîne? Di bersiva van pirsan de berhema Lukacs ya navdar *Historical Novel* (Romana Dîrokî) wê ciyekî mezin bigre. Li gor Lukacs di romana dîrokî de ya girîng ne ku bûyerên dîrokî ji nû de bê vegotin, lê bi awayekî poetîk vejandin mirovên ku di van bûyeran de cih girtine, ye. Romanûs, ji xwendevanên xwe re dide hîs kirin ku mirovên romanê di nav bûyeran de bi kîjan nihiçkên insanî difikirin, hîs dîkin û tevdigerin. Lehengên dîrokî-civakî çiqas tevî taybetmendiyêni insanî bênen vejandin an teswirkirin, roman ewqas serkeftî ye. Wî tenê girîngî nedaye serlehengê bûyerekê. Gelek caran lehengên talî bêtir balkêş in an dikevin pêşıya serlehengê bûyerê. Ji bo Lukacs tişte Walter Scott serkeftî kiriye ev e ku lehengên wî yên talî wek insanî ji lehengê weset girîngtir in. Karakterên xwe yên mezin jî qet romantîze nake, wan berz nake, bi wesfîn wan ên insanî, yên baş-nebaş, tevî fezîlet an qelsbûnên wan teswîr dike. Lê wan qet

¹⁶ Sedat Adıgüzel, “Bakı-1501 Romanının Tarihsel Boyutu Üzerine Bir İnceleme”, http://www.sosyalbil.selcuk.edu.tr/sos_mak/makaleler/Sedat%20ADIG%C3%9CZEL/ADIG%C3%9CZE L,%20Sedat.pdf, 02 Pûşber 2013.

¹⁷ Erol Köroğlu, “Milli Hakikat” Üzerine Tezler: Attila İlhan’ın Gazî Paşa’sında Tarihyazımı ile Tarihsel Roman Arasında Sınır İhlalleri”, di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayıncılığı, İstanbul, 2011, r. 209.

bêqîmet nave. Ev gotina Felskî¹⁸ wek ku ji bo Scott hatibe gotin “berhemên wêjeyî ne ku ew piştgiriya îzetînefsa me dikin, lê ji ber ku ew me bi qisûr û aliyêne yêne qels jî re rûbirû dikin, em qîmetê didin wan.” Lehengêne wî bes ne ji nav şexsêne mezin in jî, ew ji nav şexsêne weset in ku çîna xwe temsîl dikin. Ew ne elît in, lê wesetêne maqûl in. Dibe ku yê herî bindest bin jî, leşkerek revok jî be, gundiyeke reben jî be. Bi rêya van lehengan krîzêne mezin yêne dîroka îngilîzî bi awayekî hunerî teswîr dike¹⁹.

Lukacs bi awayekî giştî vê dibêje; hunandina romana dîrokî rasterast ji vegotina bûyer an şexsiyetekî/a dîrokî pêk nayê, lê divê derûn û tevgerêne lehengan, orf û adetêne civakê, atmosfer û hişmendî xwedî taybetmendiyêne wê demê bin, ne ku rûdana serdema nivîskar be.

Di nav çarçoveya wêjeyê de ne mumkin e ku nivîskar bûyerê bi her awayî teswîr bike. Ji bo haletî ruhê gel vebêje dêvla ku şerekî mezin teswîr bikin, ew vê bi lihevxitinêne biçûk dikare teswîr bike. Hin epîzodêne rasthatî ku ji bo geşadanêne insanî yêne serlehengan girîng û karakteristîk in, derdi Kevin pêş. Wek mînak Tolstoy bi van epîzodan haletî ruhê artêşa rus û ya hemû gelê rus bi awayekî xurt vedibêje²⁰. Veguherînen dîrokî yêne girîng li ser jiyana mirovîne ji rêzê çawa bandor dike, ci veguherînen civakî û manewî bi xwe re tîne; ev xala destpêkê ya herî girîng e.

Tarîfek din a bikêrhatî ji bo romana dîrokî, ji aliyê Avrom Fleishman hatiye vegotin. Li gor tarîfa wî di romana dîrokî de divê kêmterîn şexsiyetekî dîrokî hebe. Ger ku jiyan di peywenda dîrokê de bê dîtin, ev tê vê wateyê ku ev romanek e; ger ku karakteren romanê bi şexsiyeten dîrokî re di heman cîhanê de bijîn, ew çax ev romanek dîrokî ye²¹.

Taybetiyek romana dîrokî heye ku wê ji dîroknûsiyê vediqetîne. Romana dîrokî honaka bûyerê li ser “takekes” ava dike. Ew bûyerê ji serî heta dawiyê venabêje. Giranîne li ser temamiya bûyerê ye. Ew giraniyê dide ser jiyana takekes ku di demeke dîrokî de çawa şikil digre û ev şikilgirtin taybetiya wê demê çiqas radixîne ber çavan. Ya din, serbestiyek romana dîrokî heye ku dikare karakteren honakî jî bîne ba yêne dîrokî, lê wan dixe nav kirase wê demê. Nivîskarê romana dîrokî dikare nifûzî zihnen şexsêne dîrokî jî

¹⁸ Felski, *Edebiyat Ne İşe Yarar*, r. 65.

¹⁹ György Lukacs, *Tarihsel Roman*, wer. İ. Doğan. Epos yayınları, Ankara, 2008, r. 40-53.

²⁰ H.b., r. 51.

²¹ Vgz. Körögü, “Milli Hakikat” Üzerine Tezler: Attila İlhan’ın Gazî Paşa’sında Tarihyazımı ile Tarihsel Roman Arasında Sınır İhlalleri”, r. 218.

bikin. Ji dîroknas cudatir, ew dikare bê belge jî şexsê dîrokî bipeyivîne an em dikarin zihنê wî/wê bixwînin²².

Nivîskarê mezin Lev Tolstoy di pêşgotina romana xwe ya navdar *Savaş ve Barış/Şer û Aştî* de hewce dibîne ku cudatiyên di navbera dîroknûsî û romanûsiya xwe vebêje. Xuya ye ku tirsa wî ji ber talûkeya ku xwendevan wê wek pirtûkek li ser dîrokê bixwîne, ye. Dibêje, dîroknas şexsekî dîrokî bi her awayî, di nav tevlîheviya jiyanê de têkiliyên wî yên bi her aliyên jiyanê re nanivîsîne. Hunermend, di nav jiyanê de wî/wê bi her awayî vedibêje. Dîroknas bi encamên bûyeran re mijûl e; hunermend bi bûyerê re, bi taybetî bi hurgiliyên wê re eleqedar dibe²³.

II. Di Wêjeya Cîhanê De Romana Dîrokî

1. Romana Dîrokî li Rojava

Li Rojava dîroka romanê her çiqas biçe heta destpêka sedsala 17yan jî romana dîrokî di destpêka sedsala 19mîn de derdikeve holê. Romana Walter Scott *Waverley* di 1814an de hatiye çapkiran. Dîrok her tim jî bo nivîskaran bûye mijar. Lê beriya Walter Scott nivîskaran ew tenê wek dekorekê bikaranine. Çi psîkolojiya lehengan be, çi nirxên exlaqî bin aîdî serdema nivîskaran bûye. Ew taybetmendiyên serdema bûyerê nîşan nadin. Yanê di romana dîrokî de aliyê wê yê dîrokî tinebû²⁴. Ji xwe heta wê demê zanista dîrokê bi xwe jî li Rojava hê nû cihê xwe girtibû; bi awayekî zanistî û pîsporî bûbû qadeka lêkolînê.

Bi awayekî giştî pêşketina zanista dîrokê bi xwe bi pêşketina modernîzmê û qewimînên siyasî re ji nêz ve eleqedar e. Dikare bê gotin tiştê ku mirovan sewqî rabirdûyê dike guherandinê mezin û radîkal ên di serdema wan de ne. Dema di guherandinê mezin de gelek tişt li nav guhê hevdû dikevin rabirdû jî dikeve rojevê. Sedsalê 18 û 19mîn jî wisa ne. Sedsalê guherandinê mezin ên civakî, aborî û siyasî ne. Bi taybetî destpêka sedsala 19mîn. Ewrûpa ji aliyê siyasî ve serobin dibû û şerên

²² H.b., r. 219, 226.

²³ Leo Tolstoy, *Savaş ve Barış*, wer. A. Tokatlı, Sosyal yayınları, İstanbul, 1984, r. 9-10.

²⁴ Lukacs, *Tarihsel Roman*, r. 21.

Napolyonî kîşwer (continent) kiribû yekperçe, dewra serxwebûna netewî vebûbû û her yek netewe ji xwe re ketibû pey rabirdûyek îlhamdar û watedar²⁵.

Ji aliyeğî ve dîrok dibe mifta têgihîştina guherandin an pêşketinan, ji aliyeğî ve jî dibe amûra meşrûkirina guherîn an (pêş)ketinan û heta dibe amûra reddiyeya pêşketin an guherandinan. Yek, ji bo meşrûkirin an qebûlkirina guherînan (an ji bo rexnekirina dema vêga) dibe qadek peydakirina delilan. Du, endîşeyên jibîrbûyina îro mirov sewqî bibîranîna do dike. Sê, ji bo tayinkirina berê guherînan jî dîrok amûreka girîng e. Her tim kêmtürîn du aliyeñ gûherînên civakî hene ku ew ji bo dahatûyê jî xwedî vîzyonêñ ji hev cûda ne. Dema her du alî dixwazin berê gûherînan an dahatûyê ber bi xwe ve dikşînin, serî li rabirdûyê didin. Mirov dikare bibêje ku ya rast dîrok ne zanista zanîna rabirdûyê ye, ew bêtir zanista têgihîştina îro an tayinkirina dahatûyê ye. Ji ber ev erkîn (function) wê dîrok, êdî di serdema modern de bi serê xwe dibe qadek lêkolîn û pîsporiyê.

Tevî guherandinêñ civakî û aborî, guherînêñ siyasî jî rê li ber zanista dîrokê vedike û ew pêdivî bi dîrokê re heye. Ev guherîna siyasî çêbûna netew-dewletan e. Peydabûna neteweyekê ji aliyeğî ve hêviya xwe ji îhyakirina îhtişama rabirdûya netewî digre²⁶. Divê rewşenbîrêñ netewî gelê xwe îqna bikin ku rabirdûyek wan a xwedî îhtişam heye û divê ev ji bo avakirina netew-dewletekê bibe hêzek. Dîrok ji bo dahatûyek hevpar bîra civakî jî divê ava bike. Ji ber ku bîra civakî îspata endamtiya komî û nasnameya civakî ye²⁷. Naveroka vê bîra komî, civakî an netewî bi mekanêñ hevpar an erdnigariyek hevpar an bi bûyer û şexsiyetêñ navdar ku hemû endam bikaribin li dor wan bibin yekpare, tê tijîkirin. “Ji bo komek mirovan ku xwe wek civak ava kirine du tişt girîng in: Xusûsibûna wê û berdewamiya wê. Li hemberî yêñ derve cudatiyêñ xwe derdixine pêş, lê cudatiyêñ hundirîn jî ewqas vedişire an bêhemîyet nîşan dide”²⁸. Ger em qebûl bikin ku netew-dewletbûn bi xwe daxwazkirina desthilatdariyek siyasî be, bi qewlê Assman²⁹ ev ji bo bibîranîne têra xwe teşwîqker e. Ji ber ku ji bo desthilatiyek siyasî perspektîfek demkî pêwîst e ku destpêkek wê, kûrahiyek

²⁵ Ömer Türkeş, “Romana Yazılan Tarih”, di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*. de, ç.1, İletişim Yayıncılıarı, İstanbul, 2011, r. 90.

²⁶ Lukacs, *Tarihsel Roman*, r. 25.

²⁷ Jan Assmann, *Kültürel Bellek*, wer. Ayşe Tekin. Ayrıntı Yayıncılıarı, İstanbul, 2001, 43.

²⁸ H.b., r. 44.

²⁹ H.b., r. 73.

wê hebe û di nav xwe de dabeşkirî be. Wek ku Haşim Ahmedzade ji Milan Kundera neqil dike:

... dahatû tenê valahiyek xemnexwir e ku tu kes guh nadiyê, lê rabirdû tijî jiyan e û çehra wê mirov ewqas fit dike, nexoş e, mirov diêşîne ku em dixwazin wê hilweşînin an ji nû ve boyax bikin. Em dixwazin bibin hosteyên dahatûyê tenê ji bo desthilatdariya ku em rabirdûyê biguherînin... em şer dikin da ku em wêneyên rabirdûyê rast bikin û biyografiyan û dîrokê ji nû ve binivîsinin.”³⁰.

Civak an komên ku texeyulek wan a li ser dahatûya wan hebe li rabirdûya xwe vedigerin. Heta ku texeyulek dahatûyê tunebe ne pêwîst e mirov li rabirdûya xwe bifikire, bikole, binivîsîne û li gor peywenda civakî biguherîne an ji nû ve çêbike.

Ji bo netew an netew-dewletan fonksiyonek dîrokê ev e ku bi bibîranîna rabirdûyê berpirsiyariya civakî xurttir dike³¹. Lê elbet rabirdû bi yekser nayê bibîranîn. Ew ne mimkun e ku rabirdû di sînorêñ zanista dîrokê de hilê jî. Dîroknas li gor paşxaneya xwe, peywenda civakî û siyasî bûyerên “girîng, pêwîst an guncav” dineqîne. Her divê çi bê jibîrkirin an çi bê bibîranîn ew li gor peywenda civakî û siyasî ya serdemê diguhere. Di dema avakirina nasnameya netewî an netew-dewletê de tenê bûyer an şexsêñ erêñî têñ neqandin. Bi gotineke din pîvanêñ neqandinê gelek caran tengtir an tûjtir dibin. Em avakirina netew-dewleta Tirkîyê wek mînak bidin meseleya pîvanê wê zelaltir bibe. Ji ber ku dewleta nû-ava ya Tirkîyê li ser reddiyeya mîrata Osmanî hatibû avakirin, serdema Osmanî ya divêbihata jibîrkirin an neyêñî bihata nîşandan. Ya din qirkirina ermenan hê heta îro jî di nav dîroknûsiya tîrkan de cihê xwe negirtiye û tenê hatiye (tê) hewildan ku bê jibîrkirin. Mijarek din ku gelek hewl hatiye dayin ku bi her awayî bê jibîrkirin hebûna kurdan bi xwe ye. Ya na hebûna kurdan ya di dîrokê de wê hebûna wan a îro tevî daxwazêñ wan ên çandî û siyasî jî meşrû bikira.

Pêwendîya di navbera modernîzm, netew-dewlet û dîrokê dike ku romana dîrokî jî cara ewil li Rojava peyda bibe. Divê ev neyê jibîrkirin ku *Waverleya* Walter Scott ku ji aliyê Lukacs ve wek yekem romana dîrokî hatiye pejirandin di nav şert û mercêñ avakirina netew-dewletê de nehatiye nivîsandin. Ew wek nivîskarekî brîtanî ku dergûşa şoreşa pîşesaziyê ye, bêtir ber bi bayê modernîzmê û encamên kapîtalîzma

³⁰ Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdi û Nasname*, wer. F. Adsay, Weşanxaneya Avesta, İstanbul, 2011, r. 208.

³¹ Assman, h.b., r. 34.

pîşesaziyê ketiye. Tiştê ku Brîtanya ber bi rabirdûyê ve dibe û têgihiştina rabirdûyê pêwîst dike, bicîhkirina teorîk a civaka burjuva û rexnelêgirtina wê, çêkirina qaîdeyên aborî û siyasî ya civaka nû ye³².

Li Rojava di sedsala 19mîn de ne tenê di romanê de, di qada hunerê de jî bi giştî serdemên borî dibe mijar. Dewrên rabirdûyê di huner û wêjeyê de dibe meseleyek navendî. Dîrok bi awayekî helbestkî dibe mijar. Li Almanya Goethe, bi dramaya xwe ya bi navê *Götz von Berlichingen* mînaka herî berbiçav e. *Götz von Berlichingen* navê lehengê dramayê û şowalyekî ku di sedsala 16mîn de li Almanyayê jiyaye û yek ji qehremanên netewî ye. *Götz von Berlichingen* ne tenê destpêka dramaya dîrokî temsîl dike lê bandorê li ser destpêka romana dîrokî ya Walter Scott jî dike. Ev eleqeya Goethe ya derheqê dîrokê bi rewşa Almanyayê ya paşdemayîna siyasî û a aborî ve girêdayî ye. Hêviya vejîna netewî hêza xwe ji îhyakirina rabirdûya mezin digre. Hewldana ji bo yekitiya Almanyayê an Almanyayek mezin îcab dike ku sedemên dîrokî yên perçebûna Almanyayê bê lêkolandin û bi awayekî hunerî jî bê teswîrkirin. Dema em li Fransayê dinêrin tevî guherandinên civakî, siyasî û aborî ku bi Şoreşê re hatine, guherandinên leşkerî jî bêemsal in. Îdî şer di navbera dewletan de bi artêşen girseyî têneş meşandin û leşkerî ji bo her hemwelatiyekî dike peywira mecbûrî. Ji bo rêexistîkirina artêşê sedem û armancêş şer divê ji bo gelbihata ravekirin. Di navbera şer û hemû jiyana gel de divê pêywendî bihata danîn³³. Bi kurtasî dem dema îqnakirinê ye. Ger ev îqnakirin ne bi darê zorê be wê bi rêya hûner û wêjeyê jî be. Lewma siya dîrokê ber bi hemû şaxêن hunerê ve dirêj dibe û dike bin bandora xwe.

Romanûsê îngilîz Charles Dickens, ku di romanên wî de bêtir ser sefalet û êşen şoreşa pîşesaziyê rû didin, tenê romaneye dîrokî nivîsandiye. Ev romana bi navê *Serpêhatiya Du Bajaran* (A Tale of Two Cities) (1859) Şoreşa Frensi kiriye mijar û di bin bandora kitêba dîroknas Thomas Carlyle ya Şoreşa Frensi maye, heta tezên di romanê de li ser îstidlalên (çıkaram) exlaqî yên Carlyle yên di derheqê Şoreşê de ava kiriye³⁴.

Yek ji nivîskarêñ herî mezin ê wêjeya almanî û klasîzmê Goethe (1749-1832) her daîm girêdayî fikra pêşketinê bû ku dîrok xizmeta fikra pêşketinê dike. Her çiqas ne li

³² Lukacs, h.b., r. 23.

³³ H.b., r. 25-26-27.

³⁴ Türkeş, h.b., r. 93.

ser xeta “romana dîrokî” ya klasîk bû jî, ew temsîlkarê bizava “Romana Çêbûnê” (Bildung) bû ku ew jî di xwe de qasî romana dîrokî dîrokê dihewîne³⁵.

Li Rusyayê ê ku pêwendiya dîrok û romanê dide dest pê kirin û hîmên romana dîrokî ava dike Alexandre Puşkîn e (1799-1837). Di romana xwe de ya ku raperîna Pûgaçev dike mijar (Keça Kapitan), dîroka Rusyayê tevî taybetmendiyê netewî nirxandiye û dîrok bi awayekî realist “ji tebeqeyên jêr” de tê destpêkirin û zindî dike. Lê di warê romana dîrokî de romanûsê ûris ê herî navdar bê guman Lev N. Tolstoy (1828-1910) û romana wî *Şer û Aştî* (1869) ye. Romana wî bi navgîniya şerên Napoleon ên di navbera 1805-1813 de dom dike, dîroka Ewrûpayê bi awayekî yekperçe û jiyana civakî ya Rusyayê bi awayekî mukemmel vedibêje³⁶.

Li Fransayê mînaka yekem a romana dîrokî *Piştixûzê Notre Damê* (1831) ya Victor Hugo ye. Serpêhatiya romanê di sala 1482an de li Parîsê dest pê dike. Bi katedrala ku ruhê Serdema Navîn temsîl dike û desthilatdariya dînî bi berfirehî vedibêje û bi hendazetî (meticulously, titizlikle) sadiqî dîrokê maye. Romana *Yên Hejar* (1864) serdemek nêztir dihewîne û heta rojê komunê didome. Li Fransayê nivîskarekî navdar yê din Flaubert e ku romana xwe *Salammbô* (1864) li ser serdemeye dûr li ser Qartacayiyan nivîsandiye. Flaubert li ser kevneşop, orf û adetên wê demê agahiyê berfireh dide. Honore de Balzac (1799-1850) ji 1300 heta 1845an bi piranî li ser hemû karakterên civaka fransî yên serdemên Napoleon, Louisê XVIII., Charlesê X. û Louise Philippe nivîsandiye. Alexander Dumas (1802-1870) ji hemû van romanûsên romanên dîrokî cudatir e. Dumas di vê dewra xwe ya ku dinya serobino dibe de, bi serpêhatiyê xwe yên ku ji rastiya dîrokî dûr, bê mentiq, ji kurahiya derûniya mirov dûr in; bûye destpêka wêjeya dûrketina ji rastiyê³⁷.

Dema em di wêjeya emerîkî de li roman dirokî dinêrin, di destpêkê de em *Taliya Mohîkaniyan* (1826) ya Fenimore Cooper (1789-1851) dibînin. Mixabin ev roman tu nîşaneyê nêrînek rexneyî û mixalîf tê de nînin. Bi destê mirovê spî kedîkirina xwezaya hov a Emerîkayê tê vegotin û desthilatdariya mirovên spî yên li ser vê axê tên meşrûkirin³⁸.

2. Romana dîrokî ya tirkî

³⁵ H.b., r. 93.

³⁶ H.b., r. 94.

³⁷ H.b., r. 94-95.

³⁸ H.b., r. 96.

Di tirkî de romana dîrokî di nîvê sedsala 19mîn de bi Ahmet Mîthat Efendî destpêdike. Jiyana civaka Împeretoriya Osmanî a di salêن pêşî ya di pêvajoya Rojavayîbûnê de, di nav peywenda medeniyata Rojava û Rojhilat de rê li ber roman dîrokî vedike. Ahmed Mîthat Efendî di nav vê peywendê de jiyana civakê bi çîrok û romanê xwe vedibêje. Ji bo Mîthat Efendî roman, bi rêya bûyerên dîrokî amûra vegotin û ragihandina binyada civakî, çandî û aborî ya civakê, û pirsgirêkên bingehîn ên di vî warî de ye. Ya din, amûra hişyarkirina civakê ye jî. Dewra nû ku bi Rojava re di nav têkiliyek nêz de ye, bi qismî, bi rêya romanê ji girseyêن gel re hatiye îzehkirin û agahiyêن nû hatiye neqlkirin. Di vî warî de deqa yekem çîroka dirêj a bi navê *Yeniçerîler* (1875) a Mîthat Efendî ye ku deqa yekem a honakî ku mijara xwe ji bûyerên dîrokî digre.³⁹ Li gor Kemal Erol ev di wêjeya tirkî de yekem romana dîrokî ye. Roman, binyada civakî, jiyan, saziya malbatî, orf û edetêن civakî ya di serdema Selîmê III. de ji xwendevanêن re vedibêje.

Piştî demeke kurt Namik Kemal romana xwe ya bi navê *Cezmî* (1880) diweşîne. Ev roman bi “berzkirina nirxên tirkan” û mijara xwe ya dîrokî di wêjeya tirkî de cihekî wê yî girîng heye. Tevî “berzkirina nirxên tirkan”, bi armanca pêşxistina yekitî û bihevrebûnê, erka “hînkeriyê” ya romana dîrokî derdixe pêş. Serpêhatiya romanê di sedsala 16an de derbas dibe, lê nivîskarê wê ku bi siyaseta dewra xwe re gelekî eleqedar e, wek aktorekî sazkirina netewekê her tim karakterên tirk û misilman derxistiye pêş, yên ji bilî wan jî wek neyarêن hundirîn û derveyî hatiye teswîr kirin. Kurd bin, ereb bin, rûm an ermen bin her kî qala azadî/netew/miletbûnê bike ew neyarek e ku divê ji holê bêن tunekirin⁴⁰. Li gor Fatih Altug⁴¹ *Cezmî* projeyek siyasî-wêjeyî ye ku ji bo astengkirina hilweşandina binyada civakî ya di nav qeyranekê de ye, palpiştîn pêwîst pêşkeş dike. Jixwe di dîroka tirkayetyî de Namik Kemal yek ji pêşengêن netewperweriya tirkan tê naskirin. Tevî vê romana xwe Kemal, ji bo pêwendîya nêz a di navbera netew û romanê de jî mînakek berbiçav e. Ji xwe li gor Kemal, roman amûra neqilkirina fîkr û ramanê nû, mirov û têgihîştina nû ye. Lehengêن romana wî, fîkrêن wî yên di warê siyaset, civak û çandê de radîgîhînin û xwendevanêن xwe fîrî têgehêن wek welat, netew, azadî, edalet û wekhevî dike. Roman bi lehengêن

³⁹ Kemal Erol, “Tarih ve Edebiyat İlişkisi ve Tarihi Romanların Tarih Öğretimine Katkısı”, <http://illesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>, 05 Pûşber 2013.

⁴⁰ Türkçe, h.b., r. 119.

⁴¹ Fatih Altug, “İstinat Duvarı Olarak Cezmi: ‘Tarihe Müstenit Hikaye.’” Di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayıncılı, İstanbul, 2011, r. 149.

welatperwer ên misyoner ku xwedî hişmendiyek dîrokî û netewî ne hatiye hûnandin. Ji xwe armanca nivîsandina romanê jî ev e.⁴²

Piştî sala 1908, Îlankirina Meşrûtiyetê re berhemên ku netewperweriya tirkî ji xwe re dîkin mijar zêde dibin. *Gönül Hanım* (Gonul Xanim) (1920) a Hikmet Müftüoğlu yek ji van berheman e ku tê de gelek bûyerên dîrokî jî tê vegotin. Tevî jêrenotên derheqê dîrok û zimanê Asyaya Navîn de, mebesta nivîskar ew e ku bi ciwanêñ tîrkan re alîkariya danasîna rabirdûya muhtesem û berzbûna hişmendiya netewî bike⁴³.

Di salêñ ewil ên Komara Tîrkiyê de romanûsêñ wek Halîde Edîp, Yakup Kadrî, Peyamî Safa, Reşat Nurî Güntekîn dewra Millî Mücadele (Têkoşîna Millî) di romanêñ xwe de dîkin mijar. Digel ku qala qehremaniyêñ di Şerê Cîhanê û Têkoşîna Milî dîkin, piranî li ser nêrînê rewşenbîran ên di derheqê civak û komarê de disekinin. Bi taybetî piştî salêñ 1950yan, I. Şerê Cîhanê careke din bala romanûsan dikşîne. Ahmet Hamdî Tanpinar *Sahnenin Dışındakiler* (Yên Derveyî Dikê) (1950), Oğuz Atay *Vatan Borcu* (Deynê Welêt) (1959), Kemal Tahir *Esîr Şehrin İnsanları* (Mirovîn Bajarê Dîl) (1956) û *Yorgun Savaşçı* (Şervanê Westiyayî) (1965), Tarık Buğra *Küçük Ağa* (Axayê Biçûk) (1963), Hasan İzzettin Dinamo *Kutsal İsyân* (Serhildana Pîroz) (1966-1968), *Kutsal Barış* (Aştiya Pîroz) (1972-1976), İlhan Selçuk *Yüzbaşı Selahattin'in Romanı* (Romana Sedvan Selahedîn) (1975), Büket Uzuner *Gelibolu* (2001) çend mînak ji wan in. Bi gelemeperi, analîzêñ di van romanen de piranî li dora îdeolojiya komarê û -yên vê îdeolojiyê rexne dîkin jî- dîroka fermî şikil digre û ji rabirdûyê bêtir pirsgirêkên dema nivîsandina wan derdikevin pêş. Lewma divê xwendina wan ne li ser rabirdûyê be lê ji iro -dewra nivîsandina wan- ber bi rabirdûyê ve divê bêñ xwendin⁴⁴.

Di destpêka Komara Tîrkiyê de erka romanen dîrokî ew bû ku ji bo meşrûkirina kevneşopiyâ netewî agahiyêñ dîrokî yên kevn têxin rojevê û şîara “Tirkek hêjayî dînyê ye” têxin tevgerê. Reşat Ekrem Koçu yek ji nivîskarêñ vê dewrê yên navdar e. Wek gelek romanûsêñ dîrokî wî jî romanûsiya wî pêşdetir bû, wî di romanen xwe de gelek belge û agahiyêñ dîrokî bikaranîye⁴⁵. Abdullah Ziya Kozanoğlu, Nizamettin

⁴² Erol, <http://jillesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>

⁴³ Türkçe, h.b., r. 120.

⁴⁴ H.b., r. 123.

⁴⁵ A. Şengül, J. Gülgün, *Reşad Ekrem Koçu'nun Tarihi Romancılığı*,

(<http://www.aku.edu.tr/AKU/DosyaYonetimi/> SOSYALBILENS/ dergi/ VIII2/asengul.pdf), Pûşber, 2012.

Tepedelenlioğlu, Turhan Tan, Necip Fazıl, Ziya Şakir Soku, Zuhuri Danışman, Saadettin Çulcu hin ji romanûşen din in ku serpêhatiyên dîrokî nivîsandine. Digel ku di nêrînêن wan ên derheqê kemalîzm û netewperweriya tirkî de cudafî hebûn jî, di hemûyan de vegotina dîrokî ya komarê serdest e. Wek hevtayê dîroknûsiya dewra xwe di romanên dîrokî de jî giranî li ser dîroka tirkan bû. Di serpêhatiyên dewra Osmaniyan de jî peyvîn wek tirk û tirkîye dihate bikaranîn. Lehengêن erêni hemû tirk in. Wek sedema hilweşandina Osmaniyan xwîna biyaniyan ku tevlî malbata padîşahan bûye dihate destnîşandan⁴⁶.

Di dîroknûsî û romanûsiya dîrokî ya di destpêka komarê de çînî wek “neyarê ebedî” xuya dikan. Ji aliyevêkî ve wek neteweyek nûava lêgerînek derî osmanî û îslamî jî heye, ji ber vê car bi car xwe nêzî moxoliyan û Cengîz Xan dikan lê di heman demê de ji ber îddiaya ku tirk perçeyek ji Rojava û nijada spî ne, pêwîst bû wan redd jî bikin. Piştî 1940an, taybetî bi destpêkirina dewra pir-partîtiyê senteza tirk-îslamê di berhemên Necîp Fazıl Kısakürek, Tarık Buğra û hin kovaran de berceste dibe. Di romana Buğra ya bi navê *Osmancık* (1983) de îddiaya ku dewleta osmanî, împeretoriya herî temen dirêj,bihêz û medenî, ji eşirekê derketiye, serdest e⁴⁷.

Di salêن ewil ên komarê de mirov nikare qala dîroknûsiyek marksîst an çepgir bike. Yêن marksîst ne dikarin xwe bi dîroka tirk, ne osmanî ne jî îslamî ve bigrin, lewma romanên ku îdeolojiya çep tê de rû didin kêm in. *Çikriklar Durunca* (Dema Gacik Sekinîn) (1931) ya Sadi Ertem di vî warî de ya yekem e. Mijara wî li gor nêrînêن wî yêن siyasî ye. Di dema osmaniyan de dezgehêن destan ên tevnê bi saya tevkârên biyanî li hemberî sîstema hilberîna Rojavayî nikare li ber xwe bide û iflas dikan. Romanek din a ku bi nêrîna çepgiriyê hatiye nivîsandin *Ekilmemiş Topraklar* (Erdêن Neçandî) (1945) a Orhan Hançerlioğlu ye. Serpêhatî di 1876an de dest pê dike, di 1945an roja ku bombeya atomê bi ser Hîroşîmayê ve tê avêtin, bi dawî dibe. Nivîskar bi nêrînek rewşenbîrî wateyek pêşketinxwaziyê dide dîrokê û xwendevan li çendîn dewrêن dîroka dinyayê digerîne. Bi vê rîbazê, di nav herikandina demê de ku mirovatî ewqas bi pêş dikeve, nivîskar rewşa Anatolyayê ku qet qedera wê naguhere, paşdemayina wê, êş û azarêن gundiyêن ku di navbera dewlet û axayan de mane, dest nîşan dike.⁴⁸

⁴⁶ Türkeş, h.b., r. 124.

⁴⁷ H.b., r. 127-128.

⁴⁸ H.b., r. 129

Di cenaha çepgiran de romanûsê dîrokî yê herî navdar û xwedî bandor Kemal Tahîr e. Li gor Erol⁴⁹ Tahîr hewl daye “tipolojiyek tirk” ku li hemû aliyê dinyayê xwedî qabiliyeta temsilkirinê be, saz bike. Romanûsiya wî dikare li ser sê hîman bê nirxandin: Yek, deqên ku bana wan li ser gundîtiyê hatine avakirin, wek *Sağır Dere* (Çemê Ker), *Yediçinar Yaylası* (Zozanê Yediçinarê), *Köyüñ Kamburu* (Pişxûzê Gund). Di van romanen de di dewrêñ jevketina dewleta Osmaniyan de Çorum û pêwendiyêن civakî yên li derdora wê li ser hîmê rabirdûyê, wek berdewamiya pergala aborî û siyasî ya osmaniyan vedibêje. Du, deqên ku tê de jiyana rojane ya mirovên bajarî tê dramatîzekirin, wek *Esir Şehrin İnsanları* (Mirovên Bajarê Dîl), *Hür Şehrin İnsanları* (Mirovên Bajarê Azad), *Bir Mülkiyet Kalesi* (Qelehek Milkiyetê). Sê, deqên ku tê de dewrek dîrokî tê hildibijêre û bi berfirehî lê hûr dibe, wek *Kurt Kanunu* (Qanûna Gurân), *Yorgun Savaşçı* (Şervanê Westiyayî), *Devlet Ana* (Dayika Dewletê).

Tahîr di van romanen xwe de qasî romanûsiya wî şert û mercên sosyolojîk yên Tirkîyê yên serdemê jî pir berbiçav in. Armanca wî, wek romanûsekî, derveyî nêrîn û rîbazêñ rojavayî, bi temamî li gor nêrînek rojhilatî û pratîka tirkîyeyî teswîrkirina resmekî ‘insanê tirkîyeyî’ ye.⁵⁰

Romana wî *Devlet Ana* (1967) li ser nêrînêñ ku ji tespîtên “Terza Hilberîna Asyayî” (Asya Tipi Üretim Tarzi-ATÜT) niziliye hatiye nivîsandin. Ev romana ku ya herî zêde tê naskirin û giranbariyek daye romana dîrokî, eleqeyek mezin dîtiye û ji berhemek wêjeyî bêtir wek berhemek dîrokî hatiye xwendin û bi ser de rê li ber nîqaşek li ser pergala aborî ya osmanî –ATÜT- vekiriye. Roman, li gor têzêñ xwe yên dîrokî serpêhatiya ku şaxa kayi ya oxuzan çawa ji eşîrekê împeretoriyek ava kirine, vedibêje⁵¹. Tevî vê, Ewrûpa wek neyar an “yê din” tê nîşandan û dijiyatiyek tûj serdest e. Ya balkêş ev e ku hemû neyiniyêñ –ku ew iddia dike- Ewrûpayê wek encama feodalîzmê, erêniyêñ tirkan jî wek encama ATÜTê şîrove dike⁵². Tahîr li pey gewherekî tayinker e ku bikaribe karakterê tirkan û “yên din”êñ wan bi hemû aliyêñ wan bikaribe rave bike.

Halîkarnas Balıkçısı (1890-1973) jî dîtinêñ xwe yên di derheqê dîrok û civakê de di nav qalibê romanê de gihandiye xwendevanan. *Uluç Reis* (1962) û *Turgut Reis* (1966) divê wek alegoriyêñ tesewira nasnameya tirk a Anatolyayiyêñ Şîn (Mavi

⁴⁹ Erol, <http://illesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>

⁵⁰ Erol, <http://illesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>

⁵¹ H.b., r. 129-130.

⁵² Murat Belge, *Genesîs, “Büyük Ulusal Anlatı” ve Türklerin Kökenî*. İletişim Yayınları, Stenbol, 2008, r.

Anadolular) bêñ xwendin. Di van berheman de kirpandina li ser gelperwerî û rewşenbîriyê derdikeve pêş û şarîstaniya îoniyan jî tê hêmbêz kirin lê wê ji nişka ve bi tirkan ve girê dide an wê dike malê tirkan. Kabaagaçlı ev herdû romanan di bin siya teza xwe ya dîrokî nivîsandiye. Li gor teza wî di navbera Îonya û Yewnanistana îro de cudatiyên çandî û rewşenbîrî hene. Felsefeya maddî malê Îonyayê ye lê ev felsefeya demokratik li Yewnenanistanê ji aliyê Sokrates û Platon bûye felsefeyek îdealîst û totalîter. Koka (genesîs) tirkan bi xwe digihêje şaristaniyên anatolî yên kevn. Tevî Yewnanistanê hemû ewrûpî û gelek caran hemû gelên ji bilî tirkan bi awayekî negatîf têñ teswîr kirin. Bi gotineke din ev teza wî dikare wek hewldaneke ku dixwaze teoriya kemalîst a Roj-Ziman (Güneş Dil) û Teza Dîrokî ya Tirkan (Türk Tarih Tezî) li ser hîmekî saxlemtir bide rûniştandin⁵³. Bi qewlê Belge, wek nivîskarekî deryahez, Kabaagaçlı di romanên xwe de rabirdûyeke ku tirk di deryavaniyê de gelekî biserketî bûn, ava dikir û ev wek genesîsa tirkan qebûl dikir. Wî li gor xwe pirsa “kîjan kok” (genesî) dibersivand.

Nîhal Atsiz (1905-1975) ku wek îdeologê tirkperwerî, tûranperwerî û netewperweriyê tê naskirin di wêje û hûnerê de dîtin û ramanên xwe bi rêya romanê vegotkiye. Ji şes romanên wî çar heb wek rêzekitêb hatine nivîsandin: *Bozkurtların Ölümü* (Mirina Gurên Boz), *Bozkurtlar Diriliyor* (Gurên Boz Vedijin), *Delî Kurt* (Gurê Dîn) û *Ruh Adamı* (Mirovê Ruhî). Di van romanan de temayêñ wek îdeala turanperweriyê, berzbûna nijada tirkan, pîrozkirina qehremanan, mirina ji bo netewa xwe, şervantî û evînêñ li gor orf û edetan hatiye vegotin.⁵⁴

Geliboluya (2001) Buket Uzunerê halê nû ya Anatolyayiyê Şîn e. Uzuner di romana xwe de dema nasnameyek “tirkiyeyî” texeyul dike, taybetiyêñ rojhilatî, yên herêma Behra Spî, balkanî, qafqasî lê herî zêde yên herêma Behra Spî dikirpîne (emphasize, vurgulamak) . Di nav vê nasnameyê de meziyetêñ rojhilatî, çeşîtdariya li tirkiyê, baweriyêñ kevnare yên tirkan û şamanîzm cih digre lê İslamiyet ku di dîroka Anatolyayê û tirkan de rabirdûyek wê ya bi sedan salan heye, tê de cih nagre. Ne ku ji bîr dike lê vê bi qesdî dike. Mebesta wê ew e ku “vêga”ya xwe di dîrokê de piştrast bike⁵⁵.

Romanên li ser dewra Abdulhamîdê II., Meşrûtiyeta II. û Îttihad Terakkiyê her tim hatine nivîsandin. Mithat Cemal Kuntay di *Üç İstanbul* (Sê Stembol) (1938) ê de di

⁵³H.b., r.313-353.

⁵⁴Erol, <http://illesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>.

⁵⁵Türkeş, h.b., r. 131.

perspektîfa îdeolojîk a komarê de rexneyên tûj li Îttihad Terakkî dike. *Abdulhamid Düşerken* (Dema Ketina Abdulhamîd) (1947) a Nahîd Sırri Örîk di vî warî de yek ji romanê herî serkeftî ye. Dewra Abdulhamîd bi awayekî bêalî nivîsandiye û giranî daye ser derûnî, nîqaşen hundirîn û aqil şixulandina karakterên xwe⁵⁶. Bi qewlê Hilmî Yavuz⁵⁷, Örîk di romana xwe de dîrokê tenê wek dekor bikarneaniye lê ji bo bi rêya kolandina dîroka meseleyekê, meseleyê rave bike, bikaraniye. Veguherandinê civakî di nav peywenda dîroka şexsiyetan de rave dike ku ev roman serketî tê qebûl kirin. Nihat Sırri Örîk tevî Abdulhak Şînasî û Ahmet Hamdî Tanpınar ne xeyalperestên rabirdûyê ne, lê bi kemalîzmê re jî lihev nekirine. *İsyancı Günlerinde Aşk* (Evîna Di Rojê Serhildanê De) (2001) a Ahmet Altan bi rexneya Îttihat û Terakkî re dest pê dike û bi hesap pirsîna ji kemalîzmê dom dike. Ji ber ku mijara romanê bûyera 31ê Adarê (31 Mart Vakası) û Abdulhamîd e ku herdu jî di nav civakê de pirr biîhtilaf in, û bi vî halên xwe derbasî dewra komarê bûne, ji berhemek wêjeyî bêtir wek berhemek dîrokî hate xwendin û hate nîqaş kirin. Di *İsyancı Günlerinde Aşk* de ku lehengên *Kılıç Yarası* (Birîna Şûr) (1999) jî tê de xuya dikin, bêyî belgeyên dîrokî, cih dide şexsiyetên dîrokî û derdikeve derveyî qalibê romanê. Her çiqas nivîskar dibêje ku ew dixwaze ser heqîqetên dîrokî kişif bike jî, qedroya nivîskar û meseleyên ku li ser disekine, nîqaşen aîdî iro ne. Hemû lehengên ji arîstokrasî û elîtên wê dewrê ne, mekanên wî jî qesr û koşk in. Bi vî awayî mirovên ji rêzê bê dîrok û mîkan hiştiye⁵⁸.

Taybetiyek romanûsên tirk ew e ku bi gelempêrî ji “mijarêni bi pirsgirêk” yêngi wek Serbest Fırka (Partiya Serbest), Dadgehêni Îstiqlalê, Varlık Vergisi (Baca Dewlemendiyê), Büyerên 6-7 Îlonê, qirkirina Ermenan, serhildanêni Kurdan dûr sekinîne. Berhema ku Partiya Serbest herî baş vegotkiye *Kavak Yelleri* (Bayê Spîndaran) (1950) ya Reşat Nuri Güntekin e. Nivîskar ê ku ji bo çapkirina berhema xwe li bendî desthilatdariya Partiya Demokrat sekinîbû, ji xeta modernîst a di romana xwe ya *Yeşil Gece* (Şevkesk) de derketiye û lehengê wî yê muftî ne temsîlkarê paşverûtiyê ye lê yê xwe ku serê xwe tewandiye temsîl dike. Kemal Tahîr *Kurt Kanunu* (Qanûna Gurân) ku mijara wê suîqesta Îzmirê, dadgehêni îstiqlalê û qedera trajîk a Kara Kemal e, di sala 1969an de daye çap kirin. Serhildana Agiriyê cara yekem di *Sevgim ve Izdirabım* (Hezkirin û Îşa Min) (1934) a Mükerrem Kamil Su de hatiye binav kirin. Ev romana evînî di salêni ku ji bo rewşenbîrên tirkan ên di bin kirasê Rojavayî de halê

⁵⁶ H.b., r. 134.

⁵⁷ Hilmi Yavuz, *Yazın Üzerine*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 1987, r. 53-54.

⁵⁸ Türkeş, r. 135.

“medenîbûn”ê bûbû fetîşîzmekê, bûbû amûreka tesewura elîtên tirkan a derheqê kurdan de. Kemal Bilbaşar di *Cemo û Memo* (1966-68) de, Kemal Tahir di *Kurt Kanunu* (1969) de, Demirtaş Ceyhun di *Asya* (1970) de cih dane serhildanê Şêx Seîd û Agiriyê. Kemal Tahir ê ku dibêje wî belgeyên dîrokî bikaranîne, îddia dike ku di serhildana Şêx Seîd de destê îngilizan heye. Ji xwe ev nêrîn him di romanên romanûsên rastgir him di yên çepgirên milî yên wek Atilla İlhan, Hasan İzzettin Dinamo de serdest e. Rola neyarê derive ku dixwaze tirkan bipeçikînin di romanên macerayî de, ya çîniyan bû, di dema têkoşîna milî de ev rol a rûm û ereban bû, di dawiya dewra osmanîyan de ya ermenan bû, îcar ev rol dibe ya kurdan û bi vî awayî neyarên hundirîn û derive yên tirkan di her serdemê de ji nû ve tên hilberandin⁵⁹.

Piştî salên 1960î romanên dîrokî cihê xwe ji romanên civakî re dihêle û heta 1985an ku romana Orhan Pamuk a bi navê *Beyaz Kale* (Keleha Spî) derdikeve, di warê romana dîrokî de bêdengiyek dest pê dike. Ji vê salê û vir ve pêwendîya wêje û dîrokê bi *Aşelaya* Zuhâl Kuyaş, *Boğazkesen* û *Resimli Dünyaya* (Dinyaya Biresim) Nedim Gürsel, *Yukarışehir* a (Bajarê Jorîn) Şemsettin Ünlü, *Hoca Efendinin Sandukası* (Sindoqa Mela) ya Emre Kongar, *Kara Kitap* (Kitêba Reş) û *Benim Adım Kırmızı* (Navê Min Sor e) ya Orhan Pamuk, *Puslu Kitalar Atlası* (Nexşeya Kîşwera Bimij) û *Kitab-ul Hiyel* a İhsan Oktay Anar, *IV. Murat û Mirgün Bahçeleri* (Bexçeyên Mîrgun) ya Adnan Özyalçiner, *Engereğin Gözündeki Kamaşma* (Qemişîna Di Çavê Margîsk De) ya Zülfü Livaneli, *Dağın Öteki Yüzü* (Rûyê Din ê Çiya) ya Erendiz Atasü, *Pinhan* û *Şehrin Aynaları* (Mirêkên Bajêr), *Patasanaya* Ahmet Ümît, *İsmaîla Reha Çamuroğlu* dom kir.

Di destpêka sedsala 21an de her cûre bûyerên dîrokî û şexsiyetên dîrokî dibe mijarên romanên dîrokî. Bi her awayî çesitdarî zêde dibe. Di *Kîrazeya* Kamuran Solmaz, *Pargalı İbrahim Paşa* Cahit Ülkü, *Nurbanuya* Teoman Ergül de entrîqayên qesra osmanîyan cih digirtin û xitabî hestên macerayê dikirin. *Mahrema* Elif Şafak û *Son Yeniçeri* (Yenîçeriyê Dawîn) û *İkiilebira* (Duûyek) Reha Çamuroğlu bi ciddiyeta dîroknasiyê hatine nivîsandin. *Mor Tecavüza* Handan Öztürk, *Mengene Göçmenleri* (Koçberêن Mengeneyê) ya Nermin Bezmen ji wan romanên ku bala xwe dane ser jiyanêni ji rêzê. Bi qewlê Türkeş (r. 145) eleqeya wêjevanan ya di derbarê dîrokê de di serî de hêviyek dabû ku çesitdarî wê herku biçe zêde bibe û bûyer û mirovên jibîrkirî wê ji bin toza dîrokê derkevin, vegotina jiyana mirovên ji rêzê wê têkeve dewsâ bûyerên mezin ên siyasî û bi vî awayî wê tevkariya demokratîzebûna dîroknasiyê bikin. Lê

⁵⁹ H.b., r. 136-140.

romanûs bêtir wek modayek populer bi romanên dîrokî re eleqedar bûn û ew vegotinêne mezin ên di paş metnan de ev hêvî vala derxistin. Di vegotina dîrokê de tu guherandin pêk neanîn.

3. Romana dîrokî ya farisî

Romana dîrokî ya farisî di çaryeka yekem a sedsala 20an de dest pê dike. Hasan-i Mîr Âbidînî⁶⁰ serencama romana dîrokî ya farisî li ser sê serdeman dabeş dike: ji Meşrûtiyetê heta sala 1941an, ji 1941an heta 1953an û ji 1961 heta 1978.

Di serdema yekem de, di navbera romana dîrokî û fikrên netewî û pirsgirêkên wê dewrê de pêwendiyek nêz heye. Li Ewrupayê lêkolînên dîrokî yên li ser Îranê tevkariya hişyarbûna hişmendiya netewî kiribû. Wek encama van xebatan û refleksên netewî rewşenbîrên Îranê êdî bêtir li ser dîroka xwe ya beriya Îslamê disekinîn. Ji ber nerazîbûnên li hemberî xanedana Qaçariyan, wan dewra beriya Îslamê wek serdemek zêrîn û pak ku divê ji bo “îro”ya wan bibe mînak derdixistin pêş. Lewma romanên dîrokî yên ewil li ser vê serdemê bûn. Nivîskarê van romanen hêviya Îraneke azad, serbixwe û xwedîhêz didan xwendevanên xwe⁶¹. Ji aliyê din gelê Îranê di salên 1905-1921an de piştî hewldanê damezirandina sîstema meşrutiyetê bi Şerê Cîhanê yê Yekem re rû bi rû mabûn. Di vî şerî de xela, nexweşî, xizantî û dejenerebûna siyasî zêde bûbû û qeyrana civakî û aborî kurtir bûbû. Piştî 1906an hêviyên meşrutiyêtê ji aliyê siyasî ve rê li ber reşbîniyek mezin vekiribû⁶².

Bi hêvîkestinan re êdî hemû awayên rêxistinî têr red kirin. Li gor netewperwerên modernîst, modernbûn bi netew-dewletê dikaribû biserkeve. Rizgarbûna Îranê girêdayî damezirandina dewletek bi hêz bû ku bikaribe têkeve dewsa sîstema kevn a burokratîk û hebûna neteweke yekgirtî ku li rabirdûya xwe xwedî derkeve. Têgîhênetew û yekbûna netewî ew in ku hişê rewşenbîrên Îranê herî zêde meşxul dikirin. Di vê serdema qeyranê de romana dîrokî dibe cûreya herî berbiçav a wêjeyî û dibe amûra vegotina mezinkirina hunermendî ya mirovdewletên “xelasker” ên Îranê. Bi kurtasî

⁶⁰ Hasan-i Mîr Âbidînî, *Îran Öykü ve Romanının Yüz Yılı*, C. I., wer. Derya Örs. Nüsha Yayıncılık, Ankara, 2002.

⁶¹ Mehmet Kanar, *Çağdaş İran Edebiyatının Doğuşu ve Gelişmesi*, İletişim Yayıncılık, İstanbul, 1999, r. 137-138.

⁶² Âbidînî, h.b., r. 13.

lêgerîna “nasname û ewlehiyê” sedema peydabûna romanên dîrokî ya di vê dewrê de ye⁶³.

Heta destpêka sedsala bîstemîn nasnameyên netewî û dînî yek bûn. Lê di romana dîrokî de dijayetiya qewm û dînên samî xuya dibe û welatperweriyek tûj û nijadperest derdikeve pêş. Romanûsên romanên dîrokî, di hilweşandina Îrana antîk de rola ereban ewqas mezin dikan ku hokarêن hundirîn qet nabînin û li ser nafikirin⁶⁴. Ji rastiyêن dewra xwe dûr dikevin û xwe dispêrên rojêن berê û dilê xwe xweş dikan.

Neqilkirina dîrokê an fêrkirina dîrokî dibe armanca herî girîng û estetîka wêjeyî di nav belgeyêن dirokî de winda dibe. Nivîskar xwe ji wêjevanekî bêtir wek dîroknûsekî dibîne û dixwaze kitêba wî jî wek kitêbek dîrokî bê xwendin. Nivîskarê *Şems û Tuğrayê* Muhammed Bâqir Mîrzayê Xusrevî ku di sala 1910an de hatiye çap kirin û li gor Kanar⁶⁵ romana dîrokî ya yekem e, xwe ne wek romanûs lê wek dîroknasekî dide nasandin⁶⁶. Di romanê de pergala civakî bi berfirehî tê teswîr kirin. Desthilatdar, mîr, mirovêن qesrê, eşraf, bajarî, gundî, eşqiya û yên bê çîn tê de cihêن xwe dignin. Nivîskar ji aliyekî ve bi dewrêن berê serbilind dibe, lê rexneyêن tûj jî li wan dewran digre. Yek ji romanên dîrokî yên ewil *İşq û Saltanat* an *Futûhat-i Kuruş-i Kebîr* e ku nivîskarê wê Şêx Musa ye. Di sala 1919an de hatiye çap kirin. Nivîskar qala dewra Kuruş-i Kebîr ê ku destpêka xanedana Haxamenîşî ye, dike. Ji zaroktiya wî heta ku qraliyeta Persî ava dike, vedibêje. Di beşen dîrokî de ji Heredot û Avestayê sûd girtiye û agahiyêن mîtolojîk, arkeolojîk û dîrokî dide. Romanek din a vê dewrê, *Dastan-i Bastan* an *Sergüzeşt-i Kuruş* ya Mîrza Hesen Xan Bedî ye ku di sala 1921ê de hatiye çap kirin. Ew jî li ser Kuruş-î Kebîr e. *Damgusteran* ya *İntiqamxahan-i Mezdek* a Abdul-Huseyn San'tîzade-i Kîrmanî yek ji romanên dîrokî yên ewil in ku di sala 1920î de çapkirin. Büyerêن selteneta Yezdigerdê III., dagirkirina Îranê ji aliyê ereban ve, şerên Qadisiye, Medayîn û Nihavendê û kuştina Yezdigerdê III. tê vegotin⁶⁷.

Di serdema duyem de (1941-1953) êdî romanûs xwe wek dîroknas nabîne, lê armanca wan a yekem kêfxweşkirin û bi bûyerêن nedîtî meşxulkirina xwendevanan e. Di vê serdemê de nivîskar, lehengên serketî, dinyaya jinêن bedew û evîndar ji xwe re dike mijar û xwendevanên xwe ji dinya rasteqîn a yeknesak, tijî derd û kul dibe dinyayeke kêfxweşiyê. Elbet di navbera hişmendiya civakî û van romanan de

⁶³ H.b., r. 14.

⁶⁴ H.b., r. 15.

⁶⁵ Kanar, h.b., r. 138.

⁶⁶ Âbidînî, r. 17.

⁶⁷ Kanar, h.b., r. 140-142.

pêwendiyek heye. Nivîskar di vê serdemê de, ji bo hukumdariya desthilatdaran bidome piştgiriya raya giştî daxwaz dike. Huseyn-î Mesrûr di *Deh Nefer-i Kızılbaş* de, ku romana dîrokî ya herî serkeftî ya vê demê ye, daxwazên desthilatdarên vê serdemê bi hostayî vedibêje. Mirov dikare bêje ku ev romanek siyâsî ye ku bi rêya hişyarkirina serdest û bindestan, li ser hîmê parastina statukoyê ava bûye. Mînakek din romana *Râbî'a* ya Huseynkulî Muste'an e ku li ser jiyana mîrekî ku du kurê xwe daye kuştin. Dijberiyêv evînî û tevî wan dîroka dewrê, zeafêv xelîfeyan, lêkdanêv dewletêv herêmî û hemû entrîqa ji bo dersgirtina encamek exlaqî ne. Ya rast, nivîskar çavêv xwe ji nakokî û lêkdanêv civakî re girtiye û bi dersêv exlaqî xwendevanêv xwe mijûl dike. Dika (sehneya) romana Îbrahîm-î Muderrîs *Dilşad Xatîn* qesra Ebû Seîdê hikumdarê Mogolan ê dawîn e. Nivîskar bi armanca dûrketina ji heqîqetêv dewra xwe dînyayek xeyalî ava dike û romantîzma takekesî xurtir dike. Ji jiyana civakî ya wê dewrê jî dûr disekeine, wê qet teswîr nake⁶⁸.

Di salêv piştî Îhtilala Mordadê (10 Tebax 1953) li Îranê jiyan ewqas yeknesak û acizker e ku romanêv evînî û macerayan zêde dibin. Xwendevan xwe li berhemêv ciddî nagirin; bi berhemêv sivik ku pê wexta xwe derbas dîkin dilê xwe xweş dîkin. Lî piştî 1961ê romana dîrokî careke din peyda dibe. Romanûs, bi dîrokê re wek serpêhatiya derd û kulêv gel eleqedar dibin. Roman careke din dibe amûra lêpirsîn û lêgerînêv civakî, û lêkolandina dîroka hemdem jî. Wek nifşen piştî Îhtilala Mordadê dikevin pê sedemêv cihgirtina sîstema heyî û daxwazêv guherandina civakî tînêv ziman. Romana dîrokî careke din dibe nîşaneyâ hişyarbûnê û lêgerîna rêya kişîfkirina nasnameya netewî û dîrokî. Ji dewra Meşrûtiyetê cudatir, êdî ne li ser dewrêv dûr lê li ser rabirdûya nêz disekevin û li sedemêv paşdemayinê digerin. Kesayetiya leheng wek tezahura dewrekê an şahidê dewrekê şikil digre. Dema nivîskar jiyana lehengê xwe vedibêje, rewşa civakî di hişê wî mirovî de çi bandor kiribe an ew çawa guherandibe, wê derdixîne holê. Romana farisî *Sevûşîn* a (1969) Sîmîn-î Dânîşver mînakek berbiçav a vê serdemê ye. Dânîşver, guherandinê salêv Şerê Cîhanê yê II. de li herêma farisan de pêk hatiye bi teswîrek hundirîn û bi hosteyî vedibêje. Her karakterek romanê haletî ruhiyeta beşeke civakê temsîl dike, digel vê jî her yek takekesiyek wan heye û bi hêsanî ji hevdû têv veqetandin. Fikra sereke ya romanê, vegotina di derheqê mirovê têkoşer de û nasandina wî ye. *Qissehâ-yî Kûçe-î Dilbexâh* (1969) ya Îslam-i Kâzimîye romanek dîrokî ya serkeftî ya vê serdemê ye. Nivîskar bîranînê di derheqê salêv Şerê Cîhanê yê II. û

⁶⁸ Âbidînî, r. 99-108.

ketina Rizâ Şâh, encamên xedar ên şer bi awayekî samîmî vedibêje. Kâzimiye, di çîroka “Gûlûmî” de, di nav *Qisseehâ-yî Şehr-i Hoşbbextî* de, li ser biserketina Rizâ Şâh, ketina wî, sircunbûna wî û hatina kurî wî disekine.

BEŞA SÊYEM

I. ROMANÛS Û ROMANÊN DÎROKÎ YÊN KURMANCÎ

Serpêhatiya romanên dîrokî yên bi kurdî, wek bi giştî romana kurdî li nav kurdên Qafqasyayê dest pê dike. Eliyê Ebdilrehman romana xwe ya bi navê *Xatê Xanimê* ku wek yekem romana dîrokî ya kurdî tê zanîn di sala 1959an de û *Şer Li Çiya* di 1989an de li Yêrîwanê çap kiriye. Li Yekitiya Sowyetan piştî Şoreşa Cotmehê di sala 1917an de kurdên li wê derê ji ber siyaseta Sowyetan ya çandî, dikaribûn ji hin mafêñ ziman û çandî îstifade bikin⁶⁹. Lewma romana kurdî ya yekem û yekem a dîrokî jî ji Qafqasyayê derketiye. Ji van romanên ku di vê xebatê hatine nirxandin, *Dimdim* a (1966) Ereb Şemo jî berhemek di nav şert û mercen Yekitiya Sowyetan de hatiye nivîsandin.

Kurdên li Rojhelat, Başur û Bakurê Kurdistanê hê demek dirêj ji vî mafî an peywendek hilberîna romanê bêpar mane. Ji romanên dîrokî yên ku ji vê xebatê re bûne mijar, *Siya Evînê* ya Mehmed Uzun di sala 1989an de li Swêdê hatiye nivîsandin. Yên di navbera sala 1995 û 2010an de hatine nivîsandin li Stenbol an Diyarbekirê hatine weşandin. Digel ku ew hemû ji aliyê weşanxaneyê li Stenbol an Diyarbekirê hatine çap kirin, nivîskarê wan Mehmed Uzun, Jan Dost, Tosinê Reşîd û Yılmaz Çamlibel li diyasporayê dijîn/dijiyan. Ev rewşa nivîskaran me bi meseleyê derî-wêjeyî rûbirû dihêle. Dema mirov qala derçûna romanê ya li Rojava dike bi şert û mercen civakî, aborî û siyasî dest bi ravekirinê dike. Derçûna modernîzmê, kapîtalîzmê, şêwaza

⁶⁹ Ahmadzade, h.b., r. 118.

hilberînê û di encama wan guherînan de veguherînen epîstemîk, derçûna takekes, awayên nû yên jiyanê, bêkêrbûna şêwazên wêjeyî yên pre-modern ji bo ravekirina peydabûna romanê hêmanên bingehîn in. Bi gotineke din ew hemû dînamîkên hundirîn in û wek mekan jî welatên wêjeya wan mevzûbahîs in û welatê nivîskar bi xwe mekanê peydabûna romananê nin. Lê dema qala romanê ya li welatên Rojhilata Navîn tê kirin, beriya dînamîkên hundirîn yên derveyî an yên Rojavayî dibin mevzûbahîs. Roman wek şêwazek vegotinê ya Rojavayî di encama hevbandoriya bi Rojava de derbasî Rojhilat dibe. Hevbandoriya siyasî, leşkerî, teknikî, zanistî, aborî û çandî ya di navbera Rojhilat û Rojava rê li ber guherînen wêjeyî û vê şêwaza vegotinê ya nû, romanê, vedike. Mekan dîsa di nav sînorênen welatên mevzûbahîs de ye. Cihê nivîsandin û çapkirina wan bi giştî welatê nivîskaran bi xwe ye.

Digel ku veguherînen civakî û aborî û hevbandoriya bi Rojava re li dewletên wek Tirkîye, Îran û piştî hilweşîna Împeretoriya Osmanî Iraq û Surî ji aliyê wêjeyî ve bandor li ser kurdan kiriye jî, ji bo rewşenbîrên kurd bi her awayî şert û mercên jiyan û nivîsandinê jî zehmettir kiriye. Ne tenê roman, pexşana modern û pêşengê rojnameya kurdî ya yekem *Kurdistan* jî ne di nav sînorênen Kurdistanê heta di nav sînorênen Împeretoriya Osmanî de derneketiye. Bi awayekî giştî girîngiya rojname û kovaran ev e ku belavbûna wan agahî dide xwendevanêن xwe ka li herêmên din ên “cimaeta muxayel” çi diqewime. Ya duyem, rojname û kovar amûrên standardbûna zimên in û erka “jinûde-pêşkeşkirin”a (re-presenting) netewê tînin cih. Lewma, destpêka rojnamevaniya kurdî, di heman demê de destpêka çêbûna hişmendiyek netewî û têkoşîna wan a ji bo mafêن netewî jî nîşan dide⁷⁰. Lewma çawa ku li Îran û Tirkîyê zimanê rojname û kovaran hîmîn peşxanûsî û romanûsiyê ava kiribe, di nav kurdan de jî di pêşketina zimanê peşxanûsî û romanûsiyê de kovar û rojname êwreke destpêkî ye.

Heta salêن 1990î li Bakurê Kurdistanê di warê kurdiya nivîskî de bi her awayî bêdengiyek kûr serdest e. Encax piştî van salan nivîskarêن kurd ku li ser axa xwe dijîn dikarin binivîsînin û berhemên xwe bidin çap kirin. Lê heta vê demê dema em qala wêjeyê bikin divê teqez em behsa welatên derveyî Kurdistanê û rewşa siyasî bikin. Digel ku ji van salan vir ve gelek çîrok û romanêن kurdî ku ji aliyê nivîskarêن li Kurdistanê dijîn hatine weşandin, hemû nivîskarêن ku wê bêñ nirxandin ji ber sedemêن siyasî li derveyî welat jiyane/dijîn.

⁷⁰ Haşim Ahmedzade, 2004, r. 182.

Rewşa siyasî ya Bakurê Kurdistanê û romanûsiyê dibe sedem ku mirov li ser pêwendiya romanên dîrokî û diasporayê bifikire. Gelo dibe ku jiyana li derve, ji welat dûr nivîskar bêtir ber bi dîrokê (û romanên dîrokî) ve dibe? Anglo dibe ku ew ji derve bêtir di texeyulkirina dahatûyê de dîrokê wek hêmanek girîng dibînin û ji bo vê armancê jî romanên dîrokî wek amûrekê hilbijartine? Em dikarin bibêjin “belê”. Nivîskarênu ku ji ber xebatêni siyasî derketine li diasporayê jiyane, nivîs ji wan re bûye him wek amûrekê û him jî qadeke têkoşîna netewî an berdewamiya xebata siyasî. Lewma divê erkeke (işlev, function) wê hebûya. Romanên dîrokî yek ji wan amûrên xwedî erk hatiye dîtin. Gotina rewşenbîrê Kenyayî Ngugî Wa Thiong ku Gregory Jusdanis neqil dike dikare ji bo rewşenbîrê kurda jî bê dubare kirin:

Li Efrîqayê nivîskar û siyasetmedar heman kes in. Nivîskar her tim tevlî têkoşînên siyasî dibe; ji bo wan çek, pêñûs û kursî ji yek armancê re xizmetê dikan, ji azadiya welatê wan re xizmetê dikan⁷¹.

Bi qewlê Thiong, madem çek û pêñûs ji yek armancê re xizmetê dikan, romana dîrokî ji vê armancê re amûrek têra xwe guncav e. Derûniya nivîskar bi xwe jî lazim e li ber çavan bê girtin. Hestêni mirovekî ku li diasporayê dijî carbicar ji yê li welat dijî cudatir e. Ew ji jiyana rojane ya welatê bindest û “rasti”yên wê dûr in. Ew bi xwe jî ji nav siyasetê hatine. Ew ji derve bêtir dikarin welat bêyî welatê serdest texeyul bikin û rabirdû û dahatûya wê bidin ber hevdû. Ya din ji ber ku ew nikaribûn li welêt bijîn ew bêtir bi heyecan in ku şert û mercên welat biguhere û bibe wenatekê ku ew jî dikaribin tê de bijîn. Ji bo vê armancê wan romana dîrokî wek amûrek perwerdekirina gel jî dîtine. Erê tê gotin kû romana dîrokî ne dîrok e jî, em ê bibînin ku nivîskar gelek caran nikare xwe bigre û peywirêni romanûsiyê yê dîroknûsiyê tevlîhev dike. Xwendevan jî dema radihêje romana dîrokî ew jî li bendî ye ku li ser dîroka serdemê an şexs tiştna fêr bibe, dersan jê derxe ku jê re bibe rêber. Li vir mirov dikare qala pêwendiye beramber a di navbera nivîskar û xwendevan bike. Bi qewlê Bakhtin⁷² yên ku wê peyamê bistînin an tê xwestin ku bistînin bandor li ser şiklê formulasyona peyamê dikan. Her gotin li gor ku wê kesê hember ve çawa jê bandor bigre, tê hisab kirin û tê gotin.

⁷¹ Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür: Millî Edebiyatın İcadı*, wer. T. Birkan, Metis Yayıncılıarı, İstanbul, 1998, r. 27.

⁷² Vgz. Jale Parla, h.b., r. 51.

Berhemên wêjeyî ji ber ku temasî aliyên me yên parçebûyî, xwedî endîşe dikan girîng in. Di afirandina her berhemê de endişeyek heye⁷³. Ji bo romanên dîrokî yên bi kurdî romanûsên kurd wekî din bi çi endişeyan tevgeriyane? Di dewra modern de ji çaxa ku dîrok wek hîmekî netew-dewletê hate qebûl kirin, li gor hin pîvanê etno-ewrûpî û kolonyalîst hin gel bê-dîrok hatin îlan kirin. Ev pîvan dem dem diguherî. Ji destpêka sedsala 16an, di dema kişkirina Emerîkayê de, ji bo berterefkirina xwecihêن kîşwera nû ev pîvan xwendin-nivîsandin bû. Di dema kolonyalîzma ewrûpiyan ya li Rojhilat ev pîvan ji aliyê Hegel ve wek “dewlet” hate îlan kirin⁷⁴. Ger di rabirdûya gelekî de dewlet nîn be ew bêdîrok e. Di pê re netew-dewletênu ku di sedsala 20î de hatin avakirin (Tirkiye, Surî, Îran û Iraq) û serdestî li kurdan dikirin jî ev argument domandin. Kurd gelekî bêdîrok bû û mafêن wan a dewlet avakirinê tûne bû. Ji ber ku ji aliyên serdestan ve dîrok wek mifta dahatuyê hatiye dîtin, îcar ew bi xwe bûye qada têkoşîn û xwe ispatkirinê.

Dîrok ji bo hemû netew-dewletan re bi taybetî li hemberî serdestan bûye qadek têkoşîn û amûrek desthilatdariyê. Yek ji kirinênetew-dewletan a herî girîng avakirina pergala perwerdeyê ye. Îspata hebûna netew û endamên wê û berdewamiya netewê armanca yekemîn an perwerdeyê ye. Lewma dersên dîrokê di perwerdeyiyê de di rêza yekem de ye. Ji bilî perwerdeyiyê wekî din jî amûrên dewletan hene ku bîrek hevpar ava bikin. Ev rojêñ taybet ên netewî ne, peykerên li qadêñ giştî ne, çapamenî ye, televizyon e, hûner e, wêje ye hwd. Lê rewşenbîrêñ kurd wek endamên netewek bêdewlet ji hemû amûrên nasname-çêker an sazkerê bîra civakî mehrûm in. Amûr û saziyêñ ku bikaribin hişmendiyek kolektîf çêbikin nînin an têr nakin. Endîseya tinebûna desthilatdariyeke ku hişmendiyek hevpar, nasnameyek netewî bikaribe ava bike, berê wan ber bi romanên dîrokî ve dibe. Tevî vê, endîseylek din wendabûn an jibîkirina rabirduyê ye û vê xebatê li dijî vê rewşê wek peywîrek rewşenbîrî dibînin.

Bi qewlê Assman⁷⁵ desthilatdarî ji bo bîranînê hişyarker e. Civakêñ ku desthilatdariyek wan a navendî nîn be, agahiyêñ li ser dîrokê ji çendîn nifşan wêdetir naçe, hema di pê re wek ku hemû bûyer di heman serdemê de qewimîbin, di rabirdûyeke ‘efsanewî’ de winda dibin diçin. Gelêñ ku xwedî saziyêñ siyasî yên navendî ne, ew bêtir xwedî perspektîfek demkî ya tesnîfkirî ne. Pêwendîya di navbera

⁷³ Nurdan Gürbilek, *Kör Ayna, Kayip Şark: Edebiyat ve Endîse*, İstanbul, Metis, 2007, r. 13.

⁷⁴ Guha Ranajit, *Dünya-Tarihinin Sınırında Tarih*, wer. E. Ünal. Metis Yayınları, İstanbul, 2006, r. 21-23.

⁷⁵ Assman, h.b., r. 73, vgz. ji R. Schott, “Das Geschichtsbewusstsein schriftloser Völker”, *Archiv für Begriffsgeschichte* 12, 1968, r. 172.

desthilatdarî û bibîranînê, wek berê jî hatibû gotin, aliyekî wê ya prospektîf (ber bi dahatûyê de) jî heye ku ev endîşeyên rewşenbîran zêde dike. Rewşenbîrên kurd ên romanûs di vê tinebûna desthilatdariyek navendî de amurê li ber destê xwe, wêjeyê bikartînin ku ew her tim bêtir di nav xwendevanan de belav dibe û tê xwendin.

Tevî tinebûna sazî û pergalên perwerdeyiye netewî, saziyên dîroknasan bigihîne û bikaribin li dîroka xwe xwedî derkevin jî nîne. Dîrok tenê li ber destê dewletên serdest e, ew çawa bixwazin wisa tê şîrove kirin û tê berovajî kirin. Romanûsên romanên dîrokî vê berpirsiyariyê jî didin ser xwe. Ji xwe ji ber vê hemû mijarêwan şexsêngirîng ên di dîroka kurda de rolek mezin leyistine an bûyerên sereke yê dîrokek netewî ne. Nivîsandina li ser van şexs û bûyeran refleksek xwedîlêderketina rabirdûyê ye. Azadî û xwedîlêderketina rabirdûyê, bi hevdu re gelekî eleqedar in⁷⁶. Bêyî azadî civakek çawa nikaribe li îroya xwe xwedî derkeve û bibe hukimdarê xwe, li rabirdûya xwe jî nikare xwedî derkeve, li ser hukim bike, wê bîcole, fêr bibe û bide fêrkirin. Ew civak her tim mehkûm e ku yên din hukim li ser îroya wan jî û li ser rabirdûya wan jî bikin û di encamê de ya wan bêdîrok ûlan bikin an li gor berjewendiyê xwe rabirdûya wan bişêwînin.

Ji ber hestê berpirsiyariyê ye ku romanûsên romanên dîrokî yên kurdî her tim bersivek wan ji bo rewş an bûyerên îroyîn hene. Ji ber ku endîşeya wan ne tenê bibîrxistina rabirdûyê ye, lê endîşeya serekî li ser siyaseta îroyîn e. Dixwazin wê rexne bikin, ji xwendevanan re rîbertiyê bikin, wan hişyar bikin. Bi qewlê Benjamin ji bo sazkirina iro di nav daristanê rabirdûyê de derketine neçîrê.⁷⁷ Ji bo rewşenbîrên kurd nivîsandina romanên dîrokî rîbazeka berxwedenâ li hemberî iro ye. An reddiyeya iro ye. Pêşniyazkirina alternatifâ iro ye. Bi gotineke din li dijî perçebûna îroyîn romanên dîrokî qadek e ku kurd tê de di rabirdûyê de “piştevaniyek muxayel”⁷⁸ (iro nîn be jî dijîn. Berovajiya perçebûna îroyîn di rabirdûyê de xwe dikarin wek gelekî hevdûgirtî texeyul bikin.

Di navbera romanûsî û dîroknasiya kurdî de jî manendiyek xurt heye. Li gor Boarslan di dîroknûsiya kurdî de bi giştî hewldanek derdikeye pêş. Ev, li hemberî perçebûn, bêtifaqî û şerên navxweyî, berpirsiyariya ispatkirina hebûna kurdayıtiyek yekpare û hevgirtî û wateya wê ya ji bo iro bû. Bozarslan li ser dîroknûsiya kurdî vê jî lê zêde dike:

⁷⁶ Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, amad. Nurdan Gürbilek, Metis Yayıncılıarı, İstanbul, 2008, r. 40.

⁷⁷ H.b., r. 47.

⁷⁸ Jusdanis, h.b., r. 44.

Baweriya bi hebûna dîrokek hevpar û watedar, di têkoşîna li hemberî dewletên dagirker de rolek diyarker leyist. Ya din, ji bo ku milîtanê kurd bikaribin ji heq têkçûnê sedsalêñ derbasbûyî bêñ der –belkî ya girîngtir- digel birakujiyêñ dehset ên sî salêñ dawî, ew bikaribin hesta aîdbûna heman civatê biparêzin, dîrok bû yek ji hokeran⁷⁹.

Ev mesele, hebûna kurdayetiyeck pare û hevgirtî, em bêjin di hemû romanêñ dîrokî de meseleyek berbiçav e. Tê hêvî kirin ku xwendevanêñ kurd bikaribin ji heq perçebûn, bêtifaqî, şerêñ birakujî derkevin û xwe aîdî netewek yekparce û hevgirtî hîs bikin. Xebata dîroknûsiyê di texeyulkirina civatekê de çawa wek hêmanekê tê pejirandin, roman bixwe di texeyulkirina civatekê de wek hêmanekê tê pejirandin. Romanêñ dîrokî yên kurdî vê civatê di rabirdûyê de jî texeyul dikin. Lê ev civak gelek caran ne civatek yekgirtî û yekperce ye; xwedî gelek kemasî ne. Rexnelêgirtina vê rewşê û pêşniyaz an çareseriyêñ nivîskar (gelek caran bi awayekî dîdaktîk) cihekî mezin digre.

Belê romana dîrokî ne dîrok e, lê dîsa jî romanêñ dîrokî yên kurdî, “wek pirsgirêkek siyasi ya heyatî ji bo venihêrtina (kontrolkirin) agahdarbûnê û xwedîbûna wê tertîpkirina bîra kolektîf” kiriye peywira xwe. Lewma xwe wek “mihafizê bîra civakek ku hatiye bêdengkirin” tevdigere ji ber ku “yên tevlî nîzameke civakî dibin divê bîranînê wan ên kolektîf hebin.”⁸⁰

Gotina dawî ya ji bo romanêñ dîrokî em dikarin bêjin ku bi qewlê Jameson ew “alegoriyêñ netewî” ne. Jameson⁸¹ di gotara xwe ya bi navûdeng “Di Serdema Kapitalizma Pirr-Netewî de Wêjeya Dinyaya Sêyem” de wêjeya dinyaya sêyem wek “alegoriyêñ netewî” binav dike. Li gor wî, di nav rewşenbîrêñ dinyaya sêyem de em tê derdixînin ku meseleya netewî bûye meseleyek navendî. Her tim navêñ welatan, “em”, “ew”, “divê em ci bikin, çawa bikin”, “em ci ji vî an wî welañ nikarin baştir bikin an em dikarin ci ji wan baştir bikin”, “taybetmendiyêñ me”, ew eleqeya ber bi “gel” ve di rojeva nîqaşen wan de ne. Ku pêwîst be em ji bo van hemûyan navekî hevpar bikar bînin, ew netewperwerî ye. Wek entelektuelekî Rojavayî dibêje ev her ci qas ji bo me

⁷⁹ Hamit Bozarslan, “Türkiye’de (1919-1980) Yazılı Kürt Tarih Söylemi Üzerine Bazı Hususlar”, di nav Abbas Vali: ed., *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, wer. F. Adsay, Ü. Aydoğmuş, S. Kılıç. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005, r. 37.

⁸⁰ Paul Connerton, *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer. A. Şener. Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 1999, r. 21.

⁸¹ Frederic Jameson, *Modernizm İdeolojisi*, ç. 1, wer. K. Atakay, T. Birkan, Metis Yayınları, İstanbul, 2008, r. 365-372.

mijareke paşdemayî be an me ew merhale ji zû de derbas kiribe jî, ew ji bo dinyaya sêyem hê ji girîngiya xwe tiştek winda nekiriye. Di berdewamiya gotinê dibêje ev rewş meşrû dike ku em pirsyar bikin netewperwerî bi rastî jî tiştekî ewqas xirab e an na. Ji xwe ew zanebûna dinyaya yekem ku netewperweriya dinyaya sêyem rexne dikan an wê biçûk dixin, hê nîşan nedaye ku wê çi têkeve dêvla van netewperweriyan.

A rast sedema ku Jameson vê teorîzasyonê dike hewla têgihîştineke berfirehtir a ber bi wêjeya dinyaya sêyem e. Bi gotineke din ew dixwaze rewşa vê wêjeyê baştir analîz bike û wê di nav şert û mercên wê de fam bike û vê rave bike ka “em” (Rojavayî) çima ew ta’ma wêjeyî ku em ji Proust an Joyce distînin, ji wan nastînin û hokarêñ cudatiya wêjeya sêyem çi ne. Li vê derê pêwîst e kevanek bê vekirin û qala helwesta hin xwendevanêñ kurd bê kirin. Di jiyana rojane de mirov gelek caran rastî hin xwendevanêñ kurd tê ku ew digel ku ji wêjeya dinyayê an zanistêñ civakî jî haydar in, ji wêjeya kurdî ne haydar in an naxwazin pê re eleqedar bibin. Sedema vê ev e ku di encama beramberkirina wê ya bi wêjeya dinyayê re tespîta nizmûna asta wê ya wêjeyî ye. Ez bawer im ev tespîta Jameson û roman û pêwendiya wê ya bi modernizm, takekesî, awayêñ jiyânê re ku Ian Watt⁸² di *The Rise of the Novel* (Geşbûna Romanê) de analîz dike, mifteyek din dide destê xwendevan ku deriyê romana kurdî veke û di dinyaya xwe ya entelektuelî de bicih bike. Li gor îddiaya Jameson, hemû deqêñ Wêjeya Sêyem, yên pirr şexsî û li ser qada taybet û libîdînal jî di awayê alegoriyek netewî de bivînevê aliyekî siyasî tê de rû dide. Ji ber ku

Serpêhiya qedera takekes, her tim alegoriyek rewşa wê ya di bin dorpêçandina çand û civaka Dinyaya Sêyem de ye. Tiştê ku di destpêkê de dibe sedema lomandina me ya ev deqna û ji ber vê yekê ku hînbûniyêñ xwendinê me yên Rojavayî tetmîn nake, eynî ev rêjeya siyasî-şexsî ye ku heta em bêjin ji hevdû cuda ne.⁸³

Ev gelempêkirin ji bo hemû Wêjeya Dinyaya sêyem, a kurdî jî tê de, dikare bê tettbîq kirin an na, ev hêja ye bê nîqaşkirin. Ev babet li derveyî sînorêñ vê xebatê dimîne, lê em bi rihetî dikarin bibêjin ku ev teorî qe ne ji bo romanêñ dîrokî yên kurdî dikare bê tettbîq kirin. Ji ber ku ew bi awayekî pirr berbiçav di bin barê babeta netewîtiyê de ne. Babetêñ wan hemû netewîne û bersivêñ “em çi, çima û çawa bikin?”, didin. Serpêhiya lehengêñ wan (ji xwe nivîskarêñ wan jî wisa ne) di bin dorpêçandina meseleyêñ siyasî

⁸² Watt, *Romanın Yükselişi*.

⁸³ Jameson, h.b., r.373.

de ne, ji aliyê şert û mercên siyasî şikil digrin. Heta ku dîroka kurdan “ji awayên qebûla raya giştî (public) mehrûm bin” romanên kurdî yên dîrokî “wê erka canxelas” bibîne. Ji ber ku “di dinyaya ku me dorpêç dike de em dixwazin dengvedana xwe bibînin.”⁸⁴

1. Eliyê Ebdilrehman (1920-1994)

a. Jiyan û Berhemên Wî

Eliyê Ebdilrehman romanûsê yekem ê romana dîrokî ya kurdî ye. Di sala 1920an de li navçeyeke Wanê hatiye dinyayê. Malbata wî di sala 1926an de ji ber zilm û zora dewletê bi 450 malbatên eşîra Birûkan re koçî Qefqasyayê, hêla Şewlikê ya di bin rêvebiriya Yekitiya Sowyetan de bû, kiriye.

Eliyê Ebdilrehman di sala 1932an de medreseyâ gundê Şawlîka Mintiqâ Nahçıvan xilas dike. Di 1937an de li Zanîngeha Êrîwanê beşa mamostetiyê diqedîne. Ji sala 1937an heta 1941ê li Mûsakendê ku gundekî kurdan e û di nav sînorê Ermenistanê de ye wekî mamosteyê zimanê kurdî û serwerê dibistanê dixebite.

Helbestên wî di sala 1932an de di rojnameya *Rêya Teze* de hatine weşandin. Piştî ku Şerê Cîhanê yê II. derdikeve ew di salên 1941 û 1942an de di dibistanê leşkerî de fêrî bikaranîna çekan dibe. Bi dil diçe şer û nava desteya partîzanan de li Kovpak û Karasiyêvê efseriyê dike, di desteya radyoyê de kar dike. Di nava desteya partîzanê şervan de ji Ukraynayê, Bêlorûsiyayê heta sînorê Almanyayê wek gelek kurdan li herêmên cur bi cur tev li şer dibe.

Piştî şer vedigere gundê xwe. Di sala 1945an de li Înstituya Dewletê ya Êrîwanê di dibistana pedagojiyê ya beşa Zanyariya Navnetewî dest bi teza bilind kir. Di pê vê re ji bo beşa Azerbaycanê tê qebûlkirin û di sala 1949an de li bajarê Bakuyê doktora xwe xilas dike. Di sala xwendinê ya 1949-1950 de li nehiya Basarkêçera Ermenistanê di dibistana gundê Çaxirlûyê de dersên têkiliyên navnetewî dide û wek rêveber jî dixebite. Di Gulana 1950an de wek serwer di beşa civaknasiyê ya sovyeta nehiyêye de dixebite.

⁸⁴ Felski, *Edebiyat Ne İşe Yarar*, r. 60.

Di sala 1953yan de wî vediguhêzînin bajarê Êrîwanê; di wezareta perwerdeyî ya Ermenistanê de dibe mufetîş. Di rojnameya *Rêya Teze* de dest bi xebata profesyonelî kir.

Eliyê Ebdilrehman di sala 1959an de bû berendamê Yekitiya Rojnamevaniya YKSS. Di sala 1960an de jî bû endamê Yekitiya Nivîskarê YKSSyê.

Di sala 1955an de gelek gotar, serpêhatî ji zimanê Azerî û zimanên din werdigerîne û ew di rojnameya Rêya teze de tê çapkiran. Di beşa kurdî ya Radyoya Êrîwanê de tê pêşkeşkirin⁸⁵.

Serpêhatiyê wî bi navê *Morof* di nav berhevoka *Nivîskarê Kurdê Sovyetê* de di sala 1957an de tê weşandin. Di sala 1959an de pirtûka pêşîn *Xatê Xanim* tê çapkiran. *Şer Li Çiya* di sala 1989an de li Êrîwanê tê çapkiran. Çapa *Xatê Xanimê* ku di vê xebatê de wê bê bikaranîn a di sala 2004an de ji aliyê weşanên Belkiyê li Diyarbekirê hatiye weşandin. *Şer Li Çiya* jî ji aliyê weşanên Periyê li Stenbolê di sala 2011an de hatiye weşandin. Berhemên wî yên ku din ev in: *Dê* (Serpêhatî, Helbest, 1958), *Hisyarbûn* (Serpêhatî-Helbest, 1959, Baku), *Gundê Mêrxasan* (Serpêhatî, 1968), *Gulistan* (Helbest, 1974, Rewan), *Hebandin* (Serpêhatî-Helbest, 1974, Baku), *Bîranîn* (1979), *Hesreta Min* (Helbest, 1984), *Murtule Beg* (Roman, çapbûna wê ne diyar e).⁸⁶ Ji van berheman *Gundê Mêrxasan* di sala 2012 meha Gulanê de ji aliyê weşanxaneya *Lîsê* li Diyarbekirê hate çapkiran.

b. Xatê Xanim

Xatê Xanim bi taybetmendiya xwe ya ku serlehenga wê jin e û navê romanê navê serlehenga wê ye, di nav romana kurdî de xwedî ciyekî taybet e. Roman çîroka Xatê Xanîma Dêrsimî ye ku piştî mirina mîrê xwe rîvebiriya eşîra xwe dixe destê xwe û li hemberî neyar (tirk) şer dike. Dema kurê wê Sultan dikeve ber destê qeymeqamê Ezirganê ew û eşîra xwe li hemberî zordariya dewleta romê serê xwe natewîne û bi hemû taqeta xwe şer dikin û bi ser dikevin. Xatê Xanim ji ber xeracê dewleta Osmanî û girtina kurê wê Sultan serî li hember dewletê radike. Eşîra xwe li dor xwe kom dike û bi aqilî û feraseta xwe bêyî ku şer bikin kurê xwe ji dewletê xelas dike. Roman bi azadbûna Sultan bi dawî dibe.

⁸⁵ Jînenîgariya Eliyê Ebdilrehman heta vê derê ji Karlanê Çaçanî hatiye girtin ku ji aliyê weşanxaneyê ew di destpêka *Şer Li Çiya* de hatiye bicihkirin. Weşanxaneya Periyê, Stenbol, 2011.

⁸⁶ Ev agahî ji kitêba *Xatê Xanimê* hatine girtin ku weşana Periyê ye, Diyarbekir, 2004.

Di *Xatê Xanimê* de, digel ku mijar di demek eşîrî de derbas dibe û em tu nîşaneyên rêxistin, sazî an şitilgehek hişmendiya netewperwer nabînin lê di seranserê romanê de ziman û hişmendiyek netewperwer serdest e. Li ser gotinê, digel ku ji Dêrsimê pê ve tu never nayê ber çavêن me jî mekan wek Kurdistan tê qal kirin. Hevjînê Xatê Xanimê û serokê eşîrê Têmûr dema li ber sikratê ye ji cimaeta xwe daxwaz dike wî derxînin derive:

... ez bi çavêن xwe cara paşîn çiya, mêsê, gelî û qeleçen kurdên mîrxas bibînim... min di wexta cahiltiya xwe de dîtibû, di nava van çend dequeyên ku min li derive li welatê kurdan ê şêrîn mêtê kir, giş niha li ber çavêن min têñ û diçin... Ax Kurdistana kurdan, de bi xatirê te! (r.16-17).

Wek mekan navê Kurdistanê û peyva welat derbas dibe, lê em nizanin ka sînorêñ wê kuder in. An ji bilî bajarekî erdnigariyek sînorêñ wê diyar nayê ber çavêن me. Gelo ew Dêrsim bi xwe ye? Ezirgan kuder e? Bajarêñ derûdora Dêrsimê jî Kurdistan be, çima navê wan derbas nabe? Mesele meseleyek netewî be çima danûstendinek bi eşîrêñ din re nîne? Lê tenê eşîra Xatê Xanimê di nav şer de ye. Ji xwe sedema şer xerc û xeracêñ giran in ku ji aliyê dewleta romê li ser wan hatine ferz kirin. Xuya ye ev ne cara pêsin e ku li ber dewletê û kirinêñ wê radibin. Têmûrê Eliyê Îsa jî ji bav û kalê xwe de li ber dewleta Romê şer kiriye. Tenê ne ji bo berjewendiyêñ eşîra xwe lê ji bo serbestiya kurdan jî şer kirine. Wî her tim şîret li kurê xwe kiriye ku ew mezin bibe, mîna kal û bavê xwe xwîna xwe bide bona serbestiya kurdan (r. 15).

Wek welatê Kurdistanê em nizanin kurd jî kî ne? Bi çi taybetiyan xwe ji neyarêñ xwe cuda ne? Zimanê kurdî, merdbûn, mirovatî, binamûsî û servantî nîşaneyên cudabûnê ne. Ji eşîrêñ Dêrsimê pê ve ji kê re kurd tê gotin? Çima tenê ne endamêñ eşîrekê ne, lê ew kurd in? Dema tê gotin “tifaqa kurdan” (r. 17, 65) qest tifaqa eşîrêñ qezaya Dêrsimê ye an tifaqa netewek muxayel ku derveyî Dêrsimê jî tê de ye, ev ne diyar e. Vebêjer ku şexsê sêyem e, di destpêka kitêbê de qala hejmara gund û eşîrêñ kurdan ên li qezaya Dêrsimê dike; eşîrêñ herî mezin binav jî dike û pesnê tifaqa wan a li hemberî neyaran dike (r. 9, 10), lê wekî din êdi wek nav qala eşîran nayê kirin. Gelê kurd ciyê eşîran digire. Ji ber ku qala eşîrêñ derveyî Dêrsimê jî nayê kirin, ew çax divê em ji “tifaqa kurdan” fam bikin ku ew tifaqa eşîrêñ kurdên Dêrsimê ye, ne jê zêdetir e. Ji derveyî Dêrsimê alîkarî tê xwestin? Tu nişaneyên vê nînin. Ger nehatibe xwestin, çima ev meseleya hemû kurdan e? Bi kurtasî, digel ku wek neteweke yekpare qala

kurdan tê kirin, tevgerek netewperwer nîne. Ev nikare hebe, ji ber ku nivîskar Ebdilrehman bi bîr û baweriyêن xwe yên nîvê sedsala xwe ev roman nivîsiye. Bi neynika roja xwe li bûyerê nêriye. Heta daxwaz û hêviyêن wî ew e ku kurd wek netewek modern bi yekgirtî tevbigerin, berjewendiyêن xwe yên eşîrî an malbatî dernexin pêş, li malbatek hê mezin û berfirehtir - netewa xwe- xwedî derkevin. Armanca netewî li pêşıya hemû armancêن “biçüktir” bin û “tifaqa kurd” çêbibe. Bi gotineke din, rastiya berojavî yanê perçebûna kurdan a di sedsala bîstan de dixwaze bi vê “tifaqa” muxayel a dîrokî berteref bike. Bi van hestan kirasekî netewî li şerekî lokal dike.

Di romana *Xatê Xanim* de babeteka ku rê li ber nîqaşê vedike ew pozisyonâ Xatê Xanima wekî seroka eşirê an wek desthilatdarekê ye. Ev têra xwe balkêş e ku Ebdilrehman hê di salên 1950yan de, bi taybetî ji bo wêjeya kurdî ev demeke pirr zû ye, şerekî di bin serokatiya jinekê vegotkiye. Piştî romana *Şivanê Kurmanca* ev romana kurdî ya duyem e. Di civakeke ku mêt bi her awayî serdest be, qe ne di destpêkê de ya mirov li bende ye, romanên lehengên mêt bên nivîsandin. Gelo dibe ku ev bandora ku Ebdilrehman di bin rejima Yekitiya Sowyetê de jiyaye? Her çiqas em nikarin bêjin ku di nav Yekitiya Sowyetan de wekheviyek zayendî hebû an dihate xwestin ku bê bicihkirin. Îhtimal heye ku Ebdilrehman wek rewşenbîrekî civaka xwe ew meyla wî hebe ku li hemberî qaîdeyêن feodal û “paşverû” qaîdeyêن modern derxîne pêş. Ji bo wekheviyek zayendî ya îroyîn bingehek dîrokî derxîne pêş dibe ku ev roman hatibe nivîsandin.

Di romanê de qala “jina kurd” (r. 46) tê kirin. Xatê Xanim ne wek lehenga vê romanê, lê wek nimûneyek hemû jinêن kurd derdikeve pêş. Hemû jinêن kurd wek ku bi awayekî gewherî têkoşer bin, wêrek in, dikarin her cûre biryaran bistînîn û rêvebiriyê ji koma mêtan re bikin. Çêbûna karakterê Xatê xanim, hokerên di şikigirtina karakterê wê de, şert û mercên çînî, malbatî, şexsî di romanê de nayêن rojevê û qet nabe babeteka analîzek derûnî. Refleksên bûka wê Zeynê jî piştî radeyekê dişibe yên wê. Kirasê jinantiyê ku civakê ji destpêkê de li wê kiriye diçirîne û ji bo demek pirr kurt be jî hewlek têyê ku wek takekesekê an wek kirde tevbigere:

Min hetanî roja îroyîn bûktî ji herkesî re dikir, çimkî Sultanê tayê tenê li malê bû. Roja îro *ez jî* di mala xwe de Sultan im. Ji şermkirinê tukes tiştekî nade min. Heta deqîqeya min a paşîn ez ê bona berdana Sultân tevî Kurdan şer bikim. Bila Xatê Xanima xesûya min rind bizanbe ku *ez ne jin im*, ez mêt im û li pişa wê sekinîme...

...Zeynê bi forma mêtê mewetê li derê malê peya bû. Bi hêrs gote merivên sekinî:
“Vî hespî bikişînin tewlê!”

....

Zeynê rast berê xwe da odê û çû nava koma mêtan. Silav da cimaeta rûniştî û li cem Xatê Xanimê rûnişt...

Ew dema ku rewşa Sultêr pirr nebaş e û guman heye ew venegere, beriya wê em qet Zeynê wek kirde nabînin. Ev beşa romanê nîşaneyek baş e ku jinê serokeşîr an desthilatdar tenê piştî mirina hevjîn/bavêr xwe derdikevin holê. Bi gotineke din şert û mercênen wan ên peydabûnê di tinebûna mêtrekî xwedî hêz an di valahiya mêtrekî muqtedîr de çêdibe. Di hebûna mêtrekî wisa de jin dernakevin pêş⁸⁷. Em nikarin bi temamî bizanibin, lê guman heye ku Ebdilrehman ji ew îmaja li ser civaka kurd ya pre-modern desthilatdar haydar bû ku di gernameyê gerokêr wek “Ewliya Çelebî û yên din, rojnameyê Rojavayî” de derdiket pêş ku jina kurd azad e, bi mêtan re wekhev in. Adîle Xanim, Fata Reş, Meyan Xatûn çend mînakêr herî zêde naskirî ne”⁸⁸. Lewma, di romana Ebdilrehman de wek netewperwerekî hewldanê wek xurtkirina vê îmaja “jina kurd” jî heye.

c.Şer Li Çiya

Ser Li Çiya ku di sala 1989î de li Êrîwanê hatiye çapkiran, mijara xwe ji Serhildana Agiriyê digre. Serhildana Agiriyê di sala 1927an de bi rêvebiriya rêexistina Xoybûnê dest pê kir. Fermandariya hêzên serhildanê İhsan Nûrî Paşa bû ku bi salan di artêşa Osmanî de wek efser kar kiribû. Gelek serokeşîr, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd ku piştî damezrandina Komara Tirkîyê li Iraq, Îran û Sûrî belav bûbûn tevlî vê serhildanê bûn. Serhildan kete rewşek wisa ku heta Komara Agiriyê û lijneya wezîran jî hate îlankiran. Di sala 1931ê de bi piştevaniya Yekitiya Sowyetan û Îranê ji aliyê Tirkîyê serhildan hate têkbirin. Gelek ji serhildêran hatin idamkirin, eşîrên di serhildanê de rola wan hebûn hatin sirgunkiran. İhsan Nûrî Paşa heta wefata xwe ya di sala 1976an li Tehranê jiyana xwe domand. Komkujiya Zîlanê ku di sala 1930î de tevî jin û zarokan

⁸⁷ Fahriye Adsay, *Kültürel Sınırların Edilgen Taşıyıcıları, Kadınlar: Viranşehir Yezidileri Örneği*. Teza Masterê ya neçapkirî. Diyarbekir: Zanîngeha Dîcleyê, 2011, r. 62.

⁸⁸ Martin van Bruinessen, “Adile Hanımdan Leyla Zana’ya: Kürt Tarihinde Siyasi Liderler Olarak Kadınlar,” di nav Shahrzad Mojtabi, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, de, wer. F. Adsay, E. Uşaklı, S. Kılıç Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005, r. 136.

bi hezaran kes hatibû kuştin û di bîra civakî ya kurdan de yek ji karesatê herî mezin e, perçeyek ji vê serhildanê ye.

Şêx Zayir yek ji qehremanekî bi navdar ê vê serhildanê ye. Di romana *Şer Li Çiya* de ji destpêkê heta dawiyê serpêhatiyên Şêx Zayir tê vegotin. Ji devê şexsê sêyem rola wî ya di serhildanê de, şexsiyet û kurdperweriya Şêx Zayir tê îdealîzekirin. Navê wî di bîranînên Îhsan Nûrî Paşa⁸⁹ û di bîranînên efserekî tirk⁹⁰ de jî derbas dibe. Lewma baş tê zanîn ku Şêx Zayir kesekî dîrokî ye. Ew wek nivîskar xwendevan agehdar dike ku ev du sal e li ser beşa duyem a vê romanê dixebite û di nav çend salan de xilas bike. Lê em nizanin ka ev beş jî xilas bûye an na.

Di vê romanê de eşkere ye ku Ebdilrehman ew bi hişmendiyek dîrokî nivîsandiye. Dixwaze Serhildana Agiriyê bi xwendewanên xwe bide zanîn. Şer li dora serlehengê wê Şêx Zayir diqewime, lê ji şer beşek hilnebijartîye. Ji destpêka şer heta dawiya wê daye ber xwe. Vê helwesta wî, ew ji meseleya wêjeyî bêtir ber bi endîşeyên dîrokî ve biriye. Vegotina bûyeran cih ji teswîrkirina leheng û mekanan re nehiştiye. Di dawiya kitêbê de wek nivîskarê romanê hin agahî li ser pêvajoya wê ya nivîsandinê daye xwendevanan. Xuya ye wî xwestiye cih bide serpêhatiya du lehengan, Şêx Zayir û Birahîm Axa⁹¹ ku herdulan jî di şer de rolek mezin leyistine. Lê di nava romanê de ev dijwar bûye. Lewma di derheqê Birahîm Axa û pêşengiya wî de kêm nivîsandiye (r. 349). Wî xwestiye piştî vê beşek din jî tenê li ser Îhsan Nurî û Biroyê Hesikê (Birahîm Axa) binivîsine⁹². Heta ji destê wî hatiye pêşekî daye agahdarkirina dîroka serhildanê û xwestiye ev şexsê dîrokî ku cangorî bûne têxe bîra xwendevan ku neyên jibîrkirin. Roman bi xwe hewldaneka ber bi sazkirina bîra civakî ye. Ji xwe piştî gotinên wî yên li jor ev pirs dikeve hişê mirov: Gelo kurd xwedî dewlet û sazî û amûrên din yên perwerdekirinê bûna, Ebdilrehman dê endîşeyek wî hebûya ku serpêhatiyên du cangoriyên serhildanê bike nav romana xwe û ku ew pêk nehat jî serpêhatiya yekî ji serî heta dawiyê dide ber xwe? Bi ser de wê dest bi beşa duyem jî bikiraya? Lokman Polat di nivîsek xwe ya bi navê “Romana Serhildanê “Şer Li Çiya” de pêwîst dibîne ku romanêni li ser serhildanê kurdan bêne nivîsandin. Her wiha romanêni serokên

⁸⁹ Îhsan Nurî Paşa, *Ağrı Dağı İsyani*, Weşanxaneya Med, Stenbol, 1992, r. 74.

⁹⁰ Rohat Alakom, *Bir Türk Subayının Ağrı İsyani Anıları*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2011, r.33.

⁹¹ Bnr, jêr. Romana Yılmaz Çamlıbel a bi navê *Biro* ku yek ji romanêni dîrokî ye ku wê di vê xebatê de bê nirxandin li ser *Biro Axa* ye.

⁹² Naci Kutlay, “Romana Kurdi”, *Kovara War. hej. 5-6*, r.125-135, Stenbol, 1998, r. 129.

Li gor agahiyêni ku Hejar Şamil da min, Ebdilrehman ev kitêb nenivîsandiye (F. A.)

serhildanê kurdan jî bêne nivîsandin. Nivîsa xwe bi hêviya ku *romanûsê* kurd dest bi kar û xebata nivîsina *romanê* serhildanê kurdan bikin⁹³. Ji vê nivîsê bi hêsanî tê fam kirin ku daxwaza Polat ne daxwazek wêjeyî ye, lê ya dîrokî ye. Mebesta wî fêrbûna/fêrkirina dîroka serhildanan e. Em peyva *dîrokê* li şûna *romanê* binivîsînin mebest wê çêtir zelal bibe. Nivîsa Polat mînakek e ku daxwaz an hêviyên xwendekarê romanê dîrokî bi armanca nivîskar re lihev in.

Hejarê Şamil ê ku tîpguheziya wê ya ji kirîlî bo latînî kiriye û editorê wê Ehmed Onal jî di pêşkeşîya kitêbe de bi taybetî aliyên wê yên dîrokî derdixin pêş. Li gor wan Ebdilrehman xwestiye tevgera azadîxwaz a Kurdistanê û fedayıyîn wê bidine naskirin. Ji aliyê dîrokî ve girîngiya romanê ev e ku bûyerên serhildana Kurdistaniyan bi awayekî zindî radixîne ber çavan. Bi vî awayî tevgera azadîxwaz û gelê kurd dikare ji van bûyeran ders bigire û dîroka xwe şîrove bike.

Ji aliyê tarîxî ve girîngiya romanê ev e ku bûyerên serhildana Kurdistaniyan a di navbera salên 1926 û 1930an ku li herêma Serhedê dest pê kiribû, bi awayekî zindî raxistiye ber çavan. Bi vî awayî bizava nişîmanperwer û azadîxwaz a gelê Kurd ji wan bûyeran pend bigire, bi van serpêhatiyan dîroka xwe şîrove bike (r.9).

Ev şîrove, têkiliya di navbera nivîskar û xwendevan ku li jor hatibû behs kirin, piştrast dike. Xwendevan jî dema romanekê ku babeta wê serhildana Agiriyê be dixwîne, li bende ye ku dîroka serhildanê fêr bibe, qe ne qismek be jî. Ev hêvî jî heye ku li gor agahiyên ku bi dest xistiye, ji bo tevgera îro dersan jê bigre û dîroka xwe şîrove bike.

Di romanê de yek nişaneyî wan endîşeyêni di derbarê dîrokê de bibîrxistina serhildana Şêx Seîd e. Di nava romanê de car bi car qala Şêx Seîd û darvekirina wî tê kirin (r. 20, 26, 192) û tê armanc kirin ku kûrahiyek an bingehek dîrokî bide serhildanê. Bi vê rîyê xwendevan ji vê serhildanê jî agahdar dibe û di hişê wî/wê de berdewamiya serhildan, şer an têkoşîna gelê kurd ji bo azadiya kurd û Kurdistanê ya li hemberî dewleta tirkan çêdibe. Bi taybetî jî dema qala darvekirina wî tê kirin berdewamiya zilm û zordariya dewleta tirkan jî tê zanîn ku qet tiştek jê kêm nebûye. Eşîra Qadirîyan jî ya ku Şêx Zayîr jê ye, di dirôka kurdan de her daîm li hemberî tirk, ereb û farisê dagirker

⁹³Lokman Polat, “Romana Serhildanê ‘Şer Li Çiya’”, <http://www.diyarname.com/news.asp?Idx=5584>, Çileya Paşîn, 2012.

ji bo namûs û rizgarbûna neteweya xwe şer kiriye. Bûne azadkarê neteweya xwe (r. 35). Şêx Zayir tenê karê bav û kalên xwe didomîne an kevneşopeke dide berdewam kirin. Şêx Zayir li ber sêdarê di axaftina xwe de dibêje “Neteweya kurd bi sedsalan bona azadbûn û serbestiya xwe çawa miqabilî tirkiya decal … şer kiriye (r. 345).” Ev balkêş e ku nivîskar behsa vê nake ku ka çima digel şerekî ewqas dûdirêj çima serkeftin an azadbûna “netewe”ya kurd pêk nehatiye. Li ser vê babetê şîrove an rexneyek berbiçav xuya nabe. Em ê bibînin ku ev xal di hin romanen de babeteke girîng e.

Di romanê de peyvek –netewe- heye ku ji bikaranîna wê em tê derxinîn ku nivîskar ew bi xwe dipeyive ya na leheng li gor paşxane û peywenda xwe napayivin. Nivîskar ne tenê vebêjerê şexsê sêyem ê ku ji me re bûyerê vedibêje; ew ji dêvla hemû lehengan ve dipeyive. Wisa xuya dike ku hemû leheng ji dayikbûna xwe de bi hestên netewperwer ve dorpêçkirîne. Ji ber vê tekamula şexsan ne mevzûbahîs e. Hewce nake em bizanibin ku di nav jiyanê de fîkr û armancêwan çawa şikl girtine, çima û çawa ev jiyan hilbijartine; an wan ev jiyan hilbijartine an mecbûrî mane ku hilbijêrin? Qet taybetî, midaxale an teşebusek şexsî rol neleyistiye di şikilgirtina fîkr û ramanên wan de. Wek mînak Simbil, hezkiriya Şêx Zayir û keça “kurdfiroş” Edoyê Hesen Axa, di dawiya nameye xwe ya ewil de ku ji Şêx Zayir re dişîne wek “keça neteweya xwe” (r.63) xwe binav dike û ev navkirin wê gelek caran derbas bibe. Di nameyê de hevokêñ wisa derbas dîbin: “Ez keça neteweya xwe ya kurd im. Bona neteweya xwe dikarim jiyana xwe bidim.” Xîtaba nameya duyem, “Ji lawê neteweya min, Şêx Zayir re.” ye. Ji bo îspat bike ku ew ne li ser rîya bavê xwe –ku tevkariya dewletê dike û neyarê serhildêran e- ye hevokêñ wisa rîz dîbin: “Dilê min wek av û çemên Kurdistanê zelal e.” “...wekî ez keça qîza xayinê Kurd û Kurdistanê me.” “...ez ne keça xayinan im.” “...tu jî netewehez î, cudahiyê danaynî navbera neteweyan, ji Kurd û Kurdistanê hez dikî.” “...di roja teng a neteweya xwe de...” “Heke goştê min dîrhem dîrhem bi kelpedanê hilkin, dîsa jî ez keça neteweya xwe me” (r.75).

Ji temamiya nameyê tê fam kirin ew Şêx Zayir pirr baş nas dike. Hemû fîkr û ramanê wî dizane, lê kengî derfet dîtin ku hevdu nas bikin, ew çawa ewqas tişt dizane, em nizanin. Ew wek keça dibistanê ku temenê wê ne zêde mezin e jî, di jiyanê de rastî çi hatiye, di bin bandora çi, kê de maye, ne diyar e wê çi tecrube kiriye ku dikare ewqas li dij bavê xwe derkeve, heta wî wek bav hisab neke. Tenê em dizanin ew netewperwerek pirr bibiryar e; tu tişt nikare wê vegerîne, wek ku cewhererek nedinyayî pê re hebe. Miqabilî wê Şêx Zayir û lehengên ku dîbin têkoşerên serhildanê jî bi vî rengî

ne. Qet tu cudahî di navbera fîkr û ramanê wan û şexsiyata wan de nîne. Hemû bi yek dengî dipeyivin.

Ebdilrehman wek rewşenbîrekî ku di bin rejima Yekitiya Sowyetan de jiyaye li derveyî bandora hûner û wêjeya propagandîst nemaye. Ew pergala sosyalîzmê bû ku partî û rewşenbîrên wek lazim wek propagandîstên realîzma sosyalîst kar bikin û wek pêşengêن civakê rêya rast û mînakêن rast li ber civakê raxînin. Lehengêن berhemêن bi vî rengî bi awayekî giştî reş û spî ne; ya pirr baş ya jî pirr xirab in. Yêن baş mirovêن îdeal in; her daîm ya herî rast dizanin; kirinêن wan bêqisûr in; ji aliyê şexsiyet an ji aliyê kirinêن xwe ve bê kêmasi ne; bê teredûd in. Ji wan tê hêvî kirin ku bibin rol-modelêن civakê an xwendevanan. Simbil bi vî awayî jî dikare bê şirove kirin. Lê mînaka yekem serleheng Şêx Zayir e. Şêx Zayir û birayê xwe Üsiv dema ew hê zarok bûn bavê wan hînî siwarîtî, guleavêtin, şûrbazî û qemanbaziyê dikir. Ji ber pevçûneka wî ya bi birê xwe re diya wî gelekî hêrs û aciz dibe. Ji bo ber dilê diya xwe bide wisa dipeyive:

...Bavê min Şêx Emer dibêje. Gereg em lazimê neteweya xwe bêñ. Di xêr û şera wê de bisekinin. Navê xelkê xwe li erdê nexînin... divê ez navê kalikê xwe û keko bilind bikim... em êdî ne zarok in. Em her tiştî fêm dikin... ew mîrê nava meclîsan e, ne yê dawe û dozan e ... ew sibe dê dest ji vê yekê bikşîne û di nava gelê xwe de wexta xwe derbas bike. (r.42)

Şêx Zayir ji bo xwendinê dema wê biçe Wanê, gelê gund kom bûne ku wî birêkin. Şêx Zayir li vir mîna mîrekî navsale, dinyadîtî û xwedî gelek tecrubeyan axaftinekê dike ku ji bo dahatûyê tu pirs di serî kesî de nemîne, bi taybetî ji bo kesên ku alikariya pereyan dane wî bo xwendinê:

... Apo digot wekî ji zû ve Qulîxan Begê serkarê êla Heyderan ku kurê xwe dişîne Wanê wekî di dibistanê de bixwîne... Kur meha pêşîn rind dixwîne û rind jî peran xerc dike. Û paşê qumarbaz pê dihesin ku pere li cem wî hene, gede dikine telê, bi qisedan û dek û dolaban dikin bin bandora xwe. Hêdî hêdî pê re qumar dilîzin, berê şîr diidn gede; gede çend rojan ji wan dibe... pê re pê re pereyan ji qumarbazan deyn dike, ew jî jê diçe... Ew 150 zêr dibe deydarê wan. Wî mecbûr dikin wekî here deynî wan bîne. Ew diçe bi fêlbaziyêن cuda cuda diya xwe dixapîne, bê haya bavî zêran jê distîne... Gişk jê diçe Û qumarbaz di axiriyê de wî dikujin... Ne, xêr ez diçime xwandinê... (r.57).

Dibe ku hin tirs an şik di dilê hin kesan de hebin wan berteref dike. Mirovekî tam gihîşî ye, geşedana xwe ya şexsî xilas kiriye. Bîr û baweriyêne wî yên netewî rûniştîne, dîroka êla xwe baş dizane, xwedî hişmendiyek mukemmel e. Di berdewama axaftina wî û bavê wî de nasnameya wan a netewperwer di nav çarçoweya hişmendiyek dîrokî baş tê izehkirin. Dost û neyarêne xwe baş nasdikin. Ermen dostê wan in, divê di nav tevkariyê de bin; dewletên tirk, erek û faris “yên din” û neyar in, lê ne kedkarêne wan.

Di dibistanê de wek şagirt ji aliyê fîrbûnê tu kêmasiya wî nîne. Lê wek mirovekî netewperwer karê wî tenê ji dersan pêk nayê. Xebatêne netewî ji dersan pêştir tê û dikeve nav şixulên li dijî dewletê. Ji vî aliyê ve jî ewqas zana û jîr e ku rêvebirêne dibistanê qet şik nabin ser wî, heta ku serhildana Agiriyê dest pê dike û ew dev ji dibistanê berdide. Di nava şer de heta hikumeta tirk bi balafiran wan dorpeç dike û tu derfet ji wan re nahêle, ew di hemû êrişan de bi ser dikeve. Bi carekê be jî şâsiyek, kêmasiyek wî çenabe, tirs û xof nakeve dilê wî. Ji aliyê stratejî û plansazkirinê pir jîr e û dikare bi konebûn û biaqilbûna xwe neyaran bixapine û bigihîje armanca xwe. Heta li ber sêdarê jî planêne wî hene û wan pêk jî tîne.

Ebdilrehman tenê bi kirinêne lehengêne xwe ve eleqedar e. Nifûzî derûniya wan nake. Xwendevan carekê bi wî re tenê namîne û di dilê wî de çi derbas dibe wê naxwîne. Gelo tu carî neketiye dudilî an rewşek zehmet ku nikaribû ji bin rabe? Tirs an xofek qet neketibû dilê wî? Erê an na, xuya ye pêşekî ne li ser leheng an serleheng e. Derdê wî ya vegotina dîroka serhildanê bêtir li pêş e. Ya din, di dema şer de kesen ku herî nêzî Şêx Zayir, wek Xosrov, Elî, Etar û kurapê wî Şêx Ebdilrehman, heta rûpela 193yan navê wan derbas nabe. Ji vî rûpelê pê de çendîn carê din wek nav derbas dîbin. Ev lehengêne honakî ji bin siya Zayir nikarin derkevin û wek listikvanêne alîkar cihê xwe digrin. Mirov dikare bêje ku ev roman bi van aliyêne xwe ve bêtir dişibe kitêbek dîrokî. Di kitêbêne dîrokî de, bi taybetî yên dîroka siyasi de, yek kes li pêş ê û yên din wek siluet xuya dikan. Tê de derûnî an hestêne şexsan cih nagirin, ji xwe derfetêne dîroknasan nîne ku bi wan bizanibin an ew ji wan nayê xwestin jî. Ya girîng vegotina bûyerê ye, sedem û encamê wê ne. Ebdilrehman xwe ji wê avantaja romanûs ku “dikare nifûzî zihnen lehengêne xwe bike” û ji vegotina dîrokî dûr bikeve, mehrûm dihêle⁹⁴.

Em dîsa li Polat vegerin di wir jî de em ê bibînin daxwaza xwendevan jî bêtir agahiyêne li ser dîroka serhildanê ye. Polat wek ku nivîsa wî li ser berhemeka dîrokî be

⁹⁴ Erol Köroğlu, “Millî Hakikat” Üzerine Tezler:...”, r.210.

wisa dibêje “Xebat û têkoşîna Şêx Zayir bi berfirehî tê qalkirin. Lê belê di romanê de qet behsa *rêexistina* “Xoybûn”ê û pêşewa û fermandarê Serhildana Agiriyê Îhsan Nûrî Paşa nayê kirin.”⁹⁵ Rexneyek ku divê li berhemek dîrokî bê kirin bi rihetî li berhemek wêjeyî tê kirin û “sînorêñ di navbera dîroknûsî û romanûsiyê” ji aliyê xwendevan ve “tên ihlal kirin”⁹⁶. Digel ku roman ji aliyê nivîskar jî û ji aliyê xwendevan ve jî di wê meylê de ye ku wek bi kitêbek dîrokî bê xwendin, nivîskar rastiyêñ dîrokî kiriye qurbana îdealîzekirina lehengêñ xwe û ew tehrîf kirine. Li gor agahiyêñ Kutlay ku ji çavkaniyêñ herêmî yêñ wê dewrê wergirtiye, di rastiyê de Simbil û Şêx Zayir nagihêjin miradê xwe. Şêx Zayir Simbil bi zorê revandiye. Simbilê ev yek qebûl nekiriye û xwe bi tivinga Şêx Zayir kuştiye⁹⁷. Ev agahî bi vî awayî di *Bir Türk Subayının Ağrı İsyani Anıları/Bîranînen Efserekî Tirk di derheqê Serhildana Agiriye* de jî derbas dibe⁹⁸. Dikare bê gotin ku romanek dîrokî ne mecbûrî girêdayî rastiyê be, lê dîsa wek ku Köroğlu dibêje tehrîfkirina rastiyekê ku di nav gel de baş tê zanîn ne estetik e. Ya duyem, sedemê tehrîfkirina rastiyê jî ewqas aşîkar be, ev divê li ser bê sekinandin.

d. Nirxandinek Hevpar Li ser Xatê Xanim, Şer Li Çiya

Di romanûsiya Ebdilrehman de hin xal hene ku di herdu romanen de jî balê dikşînin. Ev kirpa li ser peyva “kedkar” an “tirkêñ kedkar”, sempatiya li hemberî Ermenan û di derheqê axayan de teswîrêñ neyêñî ne. Ev her sê taybetî careke din bi bîra me dixe ku Ebdilrehman di bin pergalek sosyalîst de emrê xwe derbas kiriye. Peyva “kedkar” an “xebatkar” ne tenê wek sifat tên bikaranîn. Ew wek çîn an tebeqeyek civakî tên bikaranîn. Digel ku di serdema bûyerêñ ku Ebdilrehman vedibêje de ev têgeh di nav civakê cihekî wan nîne û di nav metnê de beloq dimînin jî, wek nîşaneyek niyet an nêrîna nivîskar a îdeolojîk dikare bê xwendin. Zeynêya *Xatê Xanimê* di derheqê malbat û bavê xwe wisa dipeyive “Ew bavê min ê bêîman û bêînsaf çi aniye serê cimaeta Kurd a xebatkar (r.61).” Gelo di nav civaka kurdan de kengî çîn ewqas ji hev cuda bûn û tebeqeyek wek kurdêñ xebatkar hate binav kirin? An kurdêñ li dijî kurdêñ xebatkar kî ne? Ew axa û serokeşîr in? Na. Ji ber ku Têmûr Axa serokeşîrekî heta bêje

⁹⁵ Lokman Polat, “Romana Serhildanê ‘Şer Li Çiya’”, <http://www.diyarname.com/news.asp?Idx=5584>, 10 Çileya Paşîn 2012.

⁹⁶ Köroğlu, h.b., r. 207-250.

⁹⁷ Naci Kutlay, “Romana Kurdi”, *Kovara War.* hej.5-6, r.129.

⁹⁸ Alakom, *Bir Türk Subayının Ağrı İsyani Anıları*, r.33.

dostê feqîr û xizanan bûye (r.14). Ev peyva “xebatkar” li ser zemînekî rûnane û li hewayê aliqî dimîne.

Ebdilrehman gava dixwaze qala paşxaneya netewperwer a Xatê Xanim û eşîra wê bike bi hevjînê wê Têmûrê Eliyê Îsa dest pê dike, “Rast e ew di aliyê hebûnê de kesîb ne bû, lê dewletî jî ne bû. *Xudanê keda xwe bû* (r.14).” Serokeşîr çawa dibe xudanê keda xwe? Gelo wî bi xwe diçû erdê xwe diçand û bênder hiltanî an diçû pezê xwe diçêrand? Di serdemek pre-modern de di nav eşirtiyê de divê ne wisa be. Desthilatdariya serokeşirtiyê çawa di destê wî de be û tu ferqa wî ji yên din nîn be? Ji xwe balkêş e dema behsa wî tê kirin wek “Têmûr axa” an “serokeşîr” nayê qalkirin, tenê Têmûr an Têmûrê Eliyê Îsa tê gotin.

Têmûr serokeşîrekî wiha ye ku qîmetê dide wekhevî û dostanî û alikariya feqîran. Wek ku nivîskar bixwaze bibêje ew tenê netewperwer bû, şerkarê wekhevîtiyê jî bû. Ji ber ku li gor sosyalîzmê netewperwerî fikrek paşverû ye û gelan dike dijminê hevdû û yên di vê fîkrê de ne jî paşverû dihatin qebûl kirin. Dibe ku Ebdilrehman xwestibe bi dostaniya feqîran û wekhevîtiyê vî “guneh”ê Têmûr/xwe sivik bike. Ji bo amadekariya vegotina aliyê wî yê netewperweriyê ewilî qala pêwendiya di navbera wî û feqîran de tê kirin:

Wî gellekî ji kesîban hez dikir. Eger axa an begekî heqê rîncberan temam nedabûya wan, diçûn cem Têmûr û ew li wî şikyat dikirin... Heta şuxulê wî kesîbî dûz nekira, dest ji wî axayî nedikişand... Navê wî di nava kesîbên qezeya Dêrsimê de jî belav bûbû. Kesîban ji wî hez dikir, lê axa û dewlemend ji kirinê wî diteqîyan, wan gellek caran xwestibûn ku, Têmûr bidin kuştin, lê ev yek ji wan re li hev nedihat. Têmûr wisa bi xweşiya dewletê jî nedihat (r.14).

Paşre dest bi mîrxasiya wî ya li hemberî dewleta Romê ku ji bav û kalan tê, dike:

Bi *serkariya* Têmûr eşîretên Kurdên Dêrsimê çend caran alayên Romê kor û pûç kiribûn, lê dîsa welatê xwe bi destê wan re bernedabûn. Aha seba wê yekê jî dewleta Romê ji Têmûr hez nedikir.... Her tim şîret li kurê xwe yê deh-duwanzdeh salî dikir ku; “Tu mezin bibî, mîna kal û bavê xwe xwîna xwe bide bona serbestiya Kurdan (r.15).”

Têmur li vir serkar e. Em bi lehengekî derî-serdema xwe re rûbirû ne. Yek dikare bêje ku Têmûr şexsekî siyasetmedar e û serokatiya tevgerek siyasî dike. Elbet ji bo wê

serdemê em nikarin ne qala tevgerek siyasî bikin ne jî girseyên li dora wê bikin, lewma ew bi eşîran dide distîne û di nav eşîrtiyê de tevdigere.

Di *Şer Li Çiya* de li gor Xatê Xanim şer li ser erdnigariyeke mezintir diqewime û li dijî neyar li ser navê kurd û Kurdistanê tê şer kirin. Lewma peyvên netew, “em” (kurd), “ew” (tirk) cihê xwe girtine. Lê hesta netewperweriyê çiqas xurt bûye, miqabilî wê kirpa li ser peyvên “kedkar” jî xurttir bûye. Nivîskar heta ku ji dest hatiye hewldaye “me” “wan” zêde homojenîze neke. Kedkarên “me” û kedkarên “wan” jî hene. “Ew” çiqas aliyê xirab temsîl bikin jî kedkarên “wan” bêguneh û masûm in. Kedkarên “me” jî hene, lê ew wek kategoriiek li hemberî “xirab”ên me nayên nîşandan. Wek mînak di van gotinên Şêx Zayir de “netewa min” yekpare ye, lê netewa tîrkan ne wisa ye: “Bona di nava netewaya min û Tirkên kedkar de fîkr û mitalên bêkêr neyên, ji min re lazim e ku wexta li ber sêdarê ... (r.340)”, “Ez hezkiriyê netewa xwe û Tirkên kedkar im (r.341).” “Di Kurdistanê de Kurdan û Tirkên kedkar bona wî şixulên mîrxasiyê û birûmet qurban didan... (r.207)”. Lê ev pirs dikeve hişê mirov ku çima “baş”ên “wan” tenê kedkar in, nabe ku di nav tebeqeyên din de jî yên baş hebin? Li gor hişmendiya rejima sosyalîst ev nabe. Bivînevê ev rê li ber şîroveya netewperweriya Ebdilrehman vedike ku netewperweriyek fediyok be. Bi gotineke din dibe ku ji ber xezeba sîstemê an ji ber giraniya tarîfa çepgiriyê ya netewperweriyê nikare xilas bibe û pêwîst dibîne hin raveyan pêve bike.

Ji aliyekî din ve, ev eşkere ye ku Ebdilrehman ji homojenîzekirina neteweyekê wek baş an xirab direve. Zanistên civakî êdî di wê baweriyê de ne ku tu civat an netewe pê re gewherékî başî an xirabiyê nîne. Gewherxwaziyek di vî warî de encax dikare rê li ber nijadperestiyê veke. Ebdilrehman vê fîkrê bi çîroka lehengê xwe Elîqulî ku bi eslê xwe tirk e, piştrast dike. Lê mixabin ji sînorêna rasyonalîteyê gelekî wêdetir diçe. Elîqulî demekê li gundekî Wanê tevî kurdan di nav aramiyekê de dijiyan. Her du alî jî bi hezkirineke ku jê nayê bawerkirin, girêdayî hevdû bûne. Ewqas ku dewlet ji bo vê tifaqa wan xira bike dixwaze kurdan ji gund derxînin dewsa wan tîrkan bicih bikin. Elbet tirk li ber vê kirinê derdi Kevin û tevî birayên xwe kurdan li hemberî dewletê şer dikin û di dawiyê de tê nefîkirin bo bajarê İzmîrê. Vêga hatiye ji dil û can piştgiriya serhildanê dike (r.182-183).

Rojekê çendîn wekîlên kurd ku ji aliyê Şêx Zayir hatine şandin, piştî hevdîtina bi efserê tirk Qazî Paşa re ji aliyê parêzkerên Paşa tê birêkirin. Dema ji hevdû xatir dixwazin parêzkerên tirk bi awayekî zêde romantîk wisa dipeyivin:

“Gelî birayêne me yên kurd, em cînarêne hev ên dewr û sedsalan in, bav û kalên me di xêr û şerên hev de sekinîne. We alikarî daye me, me jî daye we. Niha, hinekan em herdu netewe ji hev re kirine dijmin. De ji we re oxir be.” Wekîlên kurdan jî bi dilovanî bersiva wan dide (r.222).

Ên ku herdu gel ji hevdû re kirine dijmin kî ne? Hindik dimîne ku bibêje ew hêzên emperiyalist û kapîtalîst in!

Ermen di nav romanê de tevahiya wan bi awayekî gelekî erêni cih dignin. Ebdilrehman wek rewşenbîrekî ku him li Yekitiya Sowyetan li Ermenistanê di nav ermenan de jiyaye şahidekî dîroka ermenan û trajediya wan jî bû. Di vî warî de em hakimî hurgiliyên dîtinên wî yên li ser trajediya ermenan in, lê bi ihtimaleke mezin wek kurdekî ku mecbûr mabû li derveyî welatê xwe bijî, li ber êsa wan diket û dilşewatiyê wan bû. Ji teswîrên lehengên wî yên ermen ev rastî xuya dibe. Di wêje an hûnerê de meylek wisa heye ku wek reflekseke li dijî mezlûmên wan mexdûr jî bi hêsanî tê homojenîze kirin; wek gel an komekê tê idealîze kirin. Ku ji ser trajedyê de demek jî derbas bûbe nostaljî lê zêde dibe û mexdûr wek mirovên ji xirabiyê azade bin an gewherê başiyê bi wan re hebin, tê berz kirin.

Di herdu romanê Ebdilrehman de ermen û kurd li dijî dewleta Romê an Tirk wek hevalbendên ideal têni nîşandan û ji teswîra dewrekê bêtir niyet an temeniya nivîskar a îroyîn derdikeve pêş me. Tê zanîn ku di serhildana Agiriyê de wek encama pêwendiyên di navbera rêexistinên Taşnaq û Xoybûnê de ermenan jî alîkarî dabûn serhildanê. Em di van romanen de dibînin wek ku kurd û ermen, qe ne ji ber sedemên olî jî be, qet di navbera wan de tu pirsgirêk çênebûbe, dîroka wan ji vî alî de tiştekî ji me re nabêje; her tim ermen amade ne ku xwe ber kurdan de canfida bikin. Dostaniyeke ezelî û ebedî mevzûbahis e. Di *Xatê Xanim* de Karapêt û malbata xwe lehengên bi vî rengî ne. Ew ji bo mala Têmûr her daîm amade ne ku her cure fidakariyê bikin. Du lehengên *Ser Li Çiya Şûşanîk* û Rîma ku dê û bavê wan ji aliyê tirkan ve hatine kuştin û hevalê Şêx Zayir ê ji dibistanê, Etar, bê tereddûd, bi serê xwe tevlî serhildanê dibin û heta mirinê ji dil û can têdikoşin. Di her firsetê de “Em kurd cudatiyê danaynin navbera neteweyan, bila tenê ew mirovê hêja be (r.58).”

Em û ermen cînarê hev û ê dewr û qurnan bûn ... Em di roja qenc û çetîn de li ba hev sekinîne. Me alîkarî daye hev. Em çûne şîn û şahiya wan, ew hatine ya me. Xwedê mala padîşahê Romê wêran bike. Wekî Bê sedem koka vê neteweyê ji vî welatî hildaye...(58).”

Ev herdu jêgirtinê jor jî ji tespîta rastiyekê bêtir wek temeniyek îroyîn û ji bo dahatûyê xuya dîkin. Di heman demê de nîşaneyâ hişmendiyek dîrokî ne jî.

Nivîskar Tosinê Reşîd ê ku ew jî li ermenistanê mezin bûye, di hevpeyvînek xwe de gazinek xwe ya ji ermenan anîbû ziman: “Gelek ermeniya ji bo gelkujiyên ermeniya yên salêن 1893 û 1915 an kurd tawanbar dikirin. Bi giştî ew bawarî serdest bû⁹⁹. ” Ji ber vê aloziya siyasî û dîrokî di mesela teswîrkirina ermenan de pirsek din dikeve hişê mirov. Gelo dibe ku Ebdilrehman ji ber tecrubeyê bi vî rengî dixwest bi vî awayî bersivekê bide gelê ermen an wek endamekî neteweya kurd ev tawanbarî bi qismî jî be bi heqî didît û ev lêborînek ji bo dahatûyê jî temeniyek bû? Me gotibû ku hunermend an nivîskarêن gelên bindest û elbet ên kurd ne tenê hûnermend in. Ew li dijî siyasetên dagirkaran sazkerêن nasname, siyasetmedar û xwediyyê texeyulêن dahatûyê ne jî. Bi qewlê Ernst Renan, ji bo texeyulêن civakî yên nû an dahatûyek aramtir her netew divê hin tiştan jibîr bikin an bi awayekî din şîrove bikin¹⁰⁰. Di rabirdûyê de her çi jiyabin bîra civakî divê hin ji wan bineqînin an ji nû de çêbikin. Ebdilrehman jî dibe ku xwestibe wisa bike.

⁹⁹ **Fatma Savcî**, “Piştî dîroka Mesture Xanbihist per û baskêن Tosinê Reşîd şînbûn” <http://www.rudaw.net/kurmanci/art/3680.html>, 01 Sibat 2012.

¹⁰⁰ Ernst Renan, What is a Nation, <http://ig.cs.tu-berlin.de/oldstatic/w2001/eu1/dokumente/Basistexte/Renan1882EN-Nation.pdf>

2. Yılmaz Çamlıbel (1938-)

a.Jiyan û Berhemên Wî

Yılmaz Çamlıbel nivîskarekî din e ku li ser serhildana Agiriyê romanek nivîsandiye. Çamlıbel di sala 1938an de li navçeya Agiriyê ya Bazidê hatiye dinyayê. Dema şes salî bûye malbata wî sirgunî Çorumê bûye. Piştî xilaskirina zanîngehê, wek endezyar di saziyên dewletê de wek burokrat xebitiye. Yek ji damezrênerên PSKÊ (Partiya Sosyalîst a Kurdistanê) ye. Di sala 1980an de hatiye girtin û 6 salan li Diyarbekirê de di girtîgehê de razaye. Piştî ku ji girtîgehê derket Weqfa Kurdî ya Çandî û Lêkolînî (KÜRT-KAV) damezirand. Ji ber xebatên wî yên siyasî di derheqê wî de gelek dawe vebûn û ji ber cezayên ku stend koçî Almanyayê kir. Ev 9 sal e li Almanyayê dijî.

Ji bilî romana wî ya *Biro, Romana Serhildana Agiriyê* kitêbek li ser dîroka serhildana Agiriyê bi navê *Gilîdax Bê Xwedî Nîne* heye. Di sala 2005an de li Stenbolê di nav Weşanêñ Deng de çap bûye.

b.Biro, Romana Serhildana Agiriyê

Ev roman di sala 2010an de li Diyarbekirê ji aliyê Weşanêñ Dengê hatiye çapkiran. Duyem romana ku li ser şerê Agiriyê hatiye nivîsandin. Mijara romanê bi bihara sala 1926an dest pê dike. Sibehekê ku dema Biro Hesikê Têlî keriyên xwe bi rê dike 20 efserên tirkan tê nav gund û li wî dipirsin. Ji ber di wê esnayê de Biro li derveyî gund e, efser wî bi dest naxin, xizmetakrê wî li derveyî gund agahdar dike û çekên wî jê re dibe. Em fêr dibin ku di serhildana Şêx Seîd de Biro û eşîra tevî serhildanê nebûne û li aliyê dewletê bûye. Digel vê dewlet vêga dixwaze wî û malbata wî sirgun bikin. Biro

li hemberî vê rewşê şaşwaz dibe û fam nake ku çima tê sircunkirin. Îdî birtyar dide li hemberî dewletê şer bike. Di demeke kurt de li dora xwe hêzek xurt dide hevdu. Ev hêz ji eşîrên ku piştî serhildana Şêx Seîd ji sircunkirinê filitîne an jê reviyane/direvin pêk tê. Ev dibe destpêka serhildanê Agiriyê ku wê heta 1931an bidome. Bi awayekî jin û zarokên xwe jî ji gund direvîne û bi xwe re dibe. Ji xwe gelek serekvanê serhildanê jin û zarokên wan bi wan re ne. Bi awayekî aktîf tevî şer nabin. Paşre rêexistina Xoybûnê ku di sala 1927an de li Libnanê ji aliyê netewperweren kurd ku mecbûr mane birevin Iraq, Îran û Sûrî û bi tevkariya neteweperweren ermen ên rêexistina Taşnaqê tê damezirandin, tevlî vê serhildanê dibe. Komara Agiriyê ku ala wê kesk, sor û spî ye e û li ser sembola çiyayê Agiriyê li ser zemîneke zer e, di sala 1928an de tê îlankirin. Serokê rêvebiriya artêşa komarê Îhsan Nûrî Paşa ye, serokê kar û barên sivil Biro Heskê Têlî ye. Ji bilî wan lijneyek wezîran jî heye. Piştî têkçûna serhildanê Biro ji aliyê leşkerên ecem tê kuştin. Beriya kuştina xwe pêşniyaza fermandarê Îranê ku bi şerdê çeka xwe radestî wan bike, wê bikaribe li Îranê bijî, napejirîne.

Lehengê romanê Biro an Biroyê Hesikê Têlî yek ji şervanê herî navdar ê serhildana Agiriyê ye. Em ji bîranînê İhsan Nûrî Paşa jî fêr dibil ku di jiyana xwe ya rasteqîn de jî Biro heta sala 1926an jî girêdayî dewleta tirk e. Dema serhildana Şêx Seîd de li aliyê dewletê bû. Beriya wê jî di Şerê Mezin de tevî eşîra xwe û li dijî artêşa ûrisan şer kiriye û nehiştiye ku têkevin Agiriyê. Piştî Şerê Mezin ku artêşa ûris ji şünde vekişyan ermen ketin şûna wan. Biro tevî zilamên xwe û Kor Hesa Qotkî vê carê li dijî ermenan şer kirin û bajarê Agiriyê teslîmî dewletê kirin ku hêzên wê çendîn roj piştre hatibûn. Lê digel hemû dewletparêziya wî piştî têkbirina serhildana Şêx Seîd, tevî serokeşîrên ku alîkarî dabûn serhildanê birtyara sircunkirina wî jî derdikeve. Lidijderketina wî ya sircunîyê dibe destpêka serhildana Agiriyê¹⁰¹.

Biro yek ji wan romanên dîrokî ne ku hêja ye li ser bê nîqaş kirin ku ew roman e an dîrok e. Çamlibel di sala 2005an de li ser serhildana Agiriyê kitêbek dîrokî ya bi navê *Gilîdax Bêxwedî nîn e* çap kiribû. Yanê him dîroknas e him romanûsê serhildana Agiriyê ye. Di hevpeyvîna wî ya ku bi Necla Morsünbül re kiriye¹⁰² tîne ziman ku wî ev ji ber berpirsiyariyek netewî nivîsandiye. Di berdewamiya hevpeyvînê de dibêje ku yên bi dîroka xwe nizanibin nikarin ji xwe re dahatûyekê ava bikin û bîra civakî ya kurdan gelekî qels e. Lewma kurd nikarin qedera xwe ya netewî tayin bikin. Ya din, ji ber vê

¹⁰¹ İhsan Nurî Paşa, h.b., r. 21-23.

¹⁰² **Necla Morsünbül**, “*Gilîdax Bêxwedî nîn e!*” <http://www.bydigi.net/sinirsiz-muhabbet-burada/31534-gilidax-bexwedi-nin-e-yilmaz-camlibel.html>, 01 Sıbat 2012.

ye ku hin kes radibin dîroka kurdan bi 1984an didin dest pê kirin (qesta wî PKK ye). *Gilîdax Bêxwedî nîn e* tenê ne dîroka serhildanekê ye, lê ew manifestoyek e li dijî dîroknûsiya fermî ya dewletê û vegotina dîrokî ya tevgera PKKê jî.

Piştî kitêba dîrokê ya li ser serhildanê di sala 2010an de jî romana xwe ya bi navê *Biro* çap dike. Ev ê ne şaş be ku em bibêjin rewşenbîrekî wek Çamlibel ku di nav siyasetê de gelek salên xwe derbas kiriye, bi çi mebestê dîroka serhildana Agiriyê nivîsandibe, romana serhildanê jî bi heman mebestê nivîsandiye. Cudatiya romanê ev e ku ew li dora lehengekî hatiye hunandin. Belgeyên dîrokî nehatiye bikaranîn. Jixwe “ruhseta edebî”¹⁰³ ya romanûs wî/wê mecbûr nake belgeyên xwe nîşan bide. Ji dêvla hurgiliyên serhildanê, ew li ser hurgiliyên bûyerên li dora Biro qewimîne kûr bûye. Cudatiyek din jî ev e ku nivîskar hewl daye di nav de xwendevanê xwe ji aliyê çanda gelêrî ve wek stran, gotinê pêşîyan, adetên kurdan û yên bav û kalan û tiştanokan jî agahdar bike. Materyalên bi vî rengî gelek cih girtine. Digel ku bi şêwaza romanê hatiye nivîsandin û ji serbestiya romanûsiyê hatibe îstifade kirin jî, wek me gotibû, dîsa jî hişmendiya dîrokî xwe gelekî xuya dike.

Nivîsek ku li ser *Biro* hatiye nivîsandin li ser mebesta romanê û bendewariya xwendavan an awayê nirxandina xwendevan hin fîkrêñ zelal dide me. Haluk Öztürk ku di malpêra Komeleya Nivîskarêñ Kurd Li Swêdê *nivîskar.se* de li ser romana *Biro* danasînek nivîsandiye cih daye hevpeyyînaka Çamlibel ya di radyoya *Çira Agiriyê* de. Çamlibel li ser serpêhatiya xwe ya nivîsandina vê romanê de wisa dibêje:

Ez merivekî teknokrat im, *di rewşeye normal de* ez ê hîç ne bi siyasetê, ne jî bi karê nivîsandinê mijûl bûma. Lê jiyanê ez dehfdam, û hinek heval û hogiran jî ez dehfdam ku ez vê romanê binivîsim.

Ci şert û merc an kê Çamlibel ber bi siyasetê dehf dabe, ew ber bi romanûsiyê jî dehf daye. Wek gelek qadêñ din, qadêñ dîroknaşî û romanûsiyê hê di nav civaka kurd de nebûne qadêñ pisporiyê. Bi gotineke din, di sosyolojiya civaka kurd a wek neteweke bê dewlet de pergalek karþeyê hê rûneniþtiye ku hin kes di qadekê de bibin pispor. Dîrok bi xwe jî qadeke herî siyasî ye ku ji ber rewşa siyasî ya heta îro de ew derfet çênebûye ku rê li ber dîroknaşen profesyonel veke û ev dîrok bi saziyên perwerdeyê bi nifşen nû bê hîn kirin. Lewma dîroka kurdan bi xetereya jibîrbûyinê an ìmhabûn an manîpulekirinê re rû bi rû ye. Ev di heman demê de tê wateya tinekirin an tehrîfkirina

¹⁰³ Türkeş, h.b., r. 230.

bîra civakî ku yek ji hêmanên hebûna nasnameyek netewî ye. Ev tiştê ku Çamlibel wek teknokrat û paşre wek siyasetmedarekî ber bi dîroknasî û romanûsiyê ve dehf daye ev kemasî ye. Öztürk jî di nivîsa xwe de vê hincetê wisa şîrove dike:

Wek tê zanîn Yilmaz Çamlibel çend sal berî nuha, xebateke lêkolînî li ser dîroka şoreşa Agirîyê weşandibû (Gilîdax bê xwedî nîne-2005). Wî bi berhevkirina gelek belgeyan û hevpeyvînên digel şahidên zindî yên şerê Gilîdaxê xebateke ciddî û hêja anîbû meydanê. Piştra jî ev roman... Anglo nivîskar bi du şêweyêng vegotinê yên cuda; lêkolîn (wek dîroknas) û roman (wek nivîskarê edebiyata bedew) pêvajoyêng vê bûyera dîrokî pêşkêşî me dike.

Heger ku di danasîna romanekê de wek ku ew berhemek dîrokî be, bi pêşkeşkirina bûyerên dîrokî bê pesindan, ewçax pirsgrêkek heye. Eger em romanê wek berhemek honakî qebûl bikin, her çiqas ku di nivîsê de tê îma kirin ku ew li ser belge û şahidiyan roman hatiye ava kirin, em ê çawa bizanibin ev roman yek bi yek vegotinek dîrokî be? Ku wisa be jî em çima jê re dibêjin ev roman e? Em ê çawa bizanibin nivîskar li kuderê “ruhseta xwe ya edebî” bikaraniye li kuderê ew bikarneaniye? Gelo rastiyêng dîrokî bi temamî ketiye nav honakê? Di vî warî de di destê me de tu delîl nîn in. Jixwe wek berhemeke honakî ne lazim e ev delîl hebin jî. Lê yek sedema lawaziya romanê ev e ku di romanê de bi qestî aliyê wê yê vegotina dîrokî ketiye pêşîya aliyê wê yê honakî.

Wek di gelek romanên kurdî yên dîrokî de derdikeye pêş, bi qewlê Türkes¹⁰⁴ ku ji bo romanûsiya Attila İlhan digot, “sînorêng di navbera dîroknûsî û romanûsiyê hatiye îhlalkirin.” Yek delîlê sînor îhlalkirinê ew *dehfdana* bi xwe ye ku ji bo berpirsiyariyekî bîne cih. Lê sînor ne tenê ji aliyê nivîskar ve lê ji aliyê xwendevan û raya giştî jî têng îhlal kirin. Ev nivîsa Öztürk ji ber vê jî mînakîk baş e:

Di herdukan de jî daxwaza sereke çêkirina şu’ura dîrokê di nav gelê kurd de ye. Ew hewl dide ku bûyereke dîrokî ya gelekî giring û manedar bi du şêweyêng vegotinê di hafiza me ya tevayî de binitirîne. Gelek caran tê gotin wekî “bîra (hafiza) kollektîf ya dirokî pêdivîyek e ji bona ku hovîtî û trajedîyêng dîrokê neyên dubarekirin. Yê ku dema buhurî ji bîr dike, dema nuha û pêşerojê jî ji bîr dike.

Roman û berhemek dîrokî bi rihetî di nav eyne çarçoveyê de tê nirxandin. Ti cudahiyê naxîne navbera wan. Ev dîtinêng Öztürk em dikarin wek nîşaneyâ meylekê jî binirxînin.

¹⁰⁴ H.b., r. 79.

Dîsa Türkeş di gotara xwe ya bi sernavê, *Romana Yazilan Tarih/Dîroka ku li ser romanê tê nivîsandin*¹⁰⁵ vê tespitê dike:

Lêkolînvanênu ku li ser wêjeyê bi awayekî empîrîk bi ezmûnan lêkolîn dikan, çi profesyonel be çi amator be, meylek wan heye ku karakterên (em dikarin *bûyeran* jî lê zêde bikin) wêjeyî wek ku ew yên rasteqîn bin bixwînin. Karakterên wêjeyî û yên rasteqîn bi awayekî ontolojîk ji hevdû veqetiyabin jî, xwendevanênu wêjeyê wan di heman lêlatê (düzlem) de dinirxînin (r. 211).

Îcar, bi ya min, ev meyl di nav xwendevanênu kurd de xurttir e, ji ber ku çavkaniyênu rasterast yên dîrokî kêm in an jî nînin û vê kemasîyê bi xwendina romanênu dîrokî “telaff” dikan.

Di derheqê pirsgirêka tevlihevkirina dîrok û romana dîrokî ya di wêjeya tirkî de Türkeş¹⁰⁶ hevokek Alfred Döblin ê ku ew jî bixwe romanûsekî romanênu dîrokî ye, neqil dike: “Romana dîrokî, berê berê, romanek e, di pê re jî, ew ne dîrok e.” Türkeş lê zêde dike ku her çiqas romanûsên romanênu dîrokî û lêkolînvanênu wêjeyê vê qebûl bikin jî, ew bawer nake ku girseya xwendevan ne diho ne jî îro vê rastiyê qebûl bikin. Em jî zêdehiyake din lê bikin ku di navbera romanûs û xwendevan de jî peymanek zimnî heye ku nivîskar bi xwe jî dixwaze kemasîyeke bi vî rengî telafî bike û ji wan re yên rast vebêje. An her du alî jî di wê ditînê de ne ku romana dîrokî dibe ku bi şewaza romanê hatibe nivîsandin, lê ew dîrok e jî. Mînakek din a vê meyla xwendevan nivîsa Nîhat Gultekîn a di malpêra *Bajarê Agîrî* de bi sernavê *Îhsan Nûrî Paşa* (1893-1976) ye. Di vê nivîsa bibliyografîk de nivîskar di nav çavkaniyênu de tevî kitêba Çamlibel a bi navê *Gilîdax bêxwedî nîne*¹⁰⁷, *Serhildana Çiyayê Agîriyê; Biro, Romana Serhildana Agîriyê* û romana Mehmed Uzun *Siya Evînê* jî nîşan daye. Di heman malpêrê de li ser berga romana *Biro* ev hevok heye: “Kurd êdî dîroka xwe bi xwe dinivîsinin”¹⁰⁸. Wekî din tu agahî li ser nayê dayîn û rasterast wek berhemeke li ser dîrokê be tê nasandin. Li gor wê peymana zimnî ye ku her çi romana dîrokî be, wek çavkanî tênu nîşandan û tê nasandin. Beriya romanê an wêjeyê xwendevan bi dîrokê têr bûbûya dibe ku qalîteya romanênu kurdî yên dîrokî ji aliyê estetikî ve cudatir bûya.

¹⁰⁵ H.b., r. 207-252.

¹⁰⁶ H.b., r. 209.

¹⁰⁷ Nivîskar di nav çavkaniyênu xwe de ev nav wek *Serhildana Çiyayê Agîriyê* nîşan daye.

¹⁰⁸ Nihat Gultekin, “Îhsan Nurî Paşa (1893-1976)”, <http://ararat-welat.blogspot.com/2010/11/nihat-gultekin-ihsan-nuri-pasa-1893.html>, 02 Sibat 2012.

Di romana Eliyê Ebdilrehman *Şer Li Çiya* de bilindkirina gelê ermenan û hevalbendiya di navbera gelê kurd û ermenan de wek pêwendiyek ezelî û ebedî cih girtibû. Digel ku zeman û mekanê *Biro* û *Şer Li Çiya* yek e, serhildaneke navdar kirine babeta xwe û bi refleksên mînanî hevdû hatine nivîsandin jî, di *Şer li Çiya* de ermenan gelekî bi erênî cih digirin, wek li jor hat qal kirin. Di *Biro* de mesela ermenan bi awayekî lihevker (uzlaşmacı) tê qal kirin. Di *Biro* de wek çandeke qedîm bibîrxistina çand û ola Îzidiyatîyê mevzûbehîs e. Beriya ku derbasî mesela Îzidiyatîyê bibe, em li ser cudatiya nêrînên li ser vê meselê binêrin. Ev bi ihtimaleke mezin ji cudatiya mekanên ku nivîskar lê jiyane û paşxaneya wan a çandî tê. Ebdilrehman li Yekitiya Sowyetê di nav ermenan de jiyabû, lewma jiyana di nav mexdûran de bandor li ser wî kiribû.

Cudatiya mekanên herdu nivîskaran di şikigirtina nêrînên wan ên rabirdûyê de rolek girîng leyistiye. Çamlibel bi xwe ji Bazidê ye. Lewma li gor nêrîna wî ermen ne tenê mexdûr in, di romanê de Îhsan Nurî Paşa vê wek “Em bi hev re di nav felaketek re derbas bûn... Ji hev mîr kuştin, malan talan kirin, jin revandin.” rave dike. Baron Vahonê ermen ku li ser navê Partiya Taşnaqê li wê derê ye vê meselê bi awayekî gelekî “objektîf” rave dike. Li gor wî ewlî ewrûpiyan ên xaçparêz tehrîk kirin û wan jî hucimî misilmanan kirin. Lewma padşayê Osmanî Alayên Hemidî ava kirin û li ser navê misilmantiyê bi destê kurdan ermen dan kuştin. Vêga, di serhlidana Agiriyê de bi rêya Xoybûnê ermen û kurd li hemberî dewleta tirk bi hev re şer dikin. Di vê navê de li ser salên borî dinirxînin û hewl didin jê dersan bigrin:

Baron Vahon got:

-... Bi izna xwedê, ji îro pêva emê bi hev ra xebatek bi rûmet bikin. Sebeba vê kîmasî, xeletî, şaşîtî û bêbextiyê ci ye, divê em ji hev ra bêjin. Bila di nav mejiyê me da tiştek di tariyê de nemîne.

...

Di destpêka qurna bîstan de, Împaratoriya Osmanî ber bi hilweşandinê diçû. Welatên Ewrûpî, dixwestin dest danin ser milkên Osmaniyan. Ji bo vê sedemê, Úris, Frans, Îtalî û Îngiliz, tev mileten Xaçparêz tehrîk dikirin. Ji ermeniyan re digotin, “Ev der, welatê kal û bavêن we ye... Padşahên Osmaniyan jî dest avêtin bisilmaniyê. Dînê Mihemed ji xwe ra kirin şûr û mertal û dane destê Kurdan... Ermenî, bi navê Xaçparêziyê hucûmê bisilmanan kirin. Gelek zirar dane can û malên wan... Osmaniyan emir dane Alayên Hemidî, gotin, “Ermenî kafir in, kî Ermeniyek bikuje, wê rast here

cinetê. Kuştina kafiran û talankirina mal û milkên wan, revandina jinê wan, li bisilmanan helal e...

Ferzende got:

-Hevalno! Divê merivên biaqil û xwedan feraset, quşûrên xwe dubare nekin. Divê em, him di nav xwe de, him jî bi qewmên dinê ra, bilasebeb şer nekin. Ger em tiştek wusa bikin, ev bêaqılı dibe. (256-258).

Dema em li jiyana rasteqîn an lehengê Çamlibel yanê Biroyê Hesikê Têlî dinêrin wî bi xwe di dema Şerê Mezin de bi ermenan re şer kiribû; Îhsan Nûrî Paşa bi xwe jî. Çamlibel wek nivîskarekî ku li ser serhildanê gelek lêkolîn kiriye, bi vê rastiyê baş dizane. Mesela ermenan wek şerekî dualî tê nirxandin. Rêyek lihevker tê tercîh kırın. “Em” û “ew” wek baş û xirab nayê teswîr kırın. Başı û xirabiyê herdu aliyan jî tê behskirin ku bi hev du re dahatuyekê bikaribin ava bikin.

Remezan Alan di nivîseka xwe ya bi sernavê *Kolajeke Netewî*¹⁰⁹ dibêje ku bi awayekî giştî di romana kurdî de ji ber temsiliyetekê netewî çandeke lokaltır derdikeye pêş û nirxandina vê çandê dibe tetbiqeke hevpar. Jıyan û baweriya qedîm, wek zêya çand û jiyana saf a kurdayetiyê tê pîrozkirin. Di *Biro* de wek nîşaneyeyeke netewperweriyê ji aliyê olî ve tê bibîrxistin ku beriya misilmantiyê kurd bi tevahî êzidî bûn. Her çiqas îro wek oleke marjînal bê dîtin jî, wek kok an çandek qedîm û hêmaneke cudatiya kurdan a ji misilmanan bi awayekî dîdaktîk û edayeke mamosneyî tê zelal kırın. Elbet di misilmantıya kurdan de hêmanêن wek nîşaneyâ êzdiyatîyê jî tê binxêzkirin:

Ehmedê Hecî Biro, li ser Biro zivirî, got:

-Birahîm Axa, ... Mîn dît ku dayka Mirdesî desmêj girt. Paşê çû ser zinarek rûnişt. Gava tav ji paş Agiriyê Piçûk derket, Mirdesî Xanimê kefa destêن xwe ber bi tavê zivirand û dua kir. Meraqa min bibexşîne, ev çilo duakirin e? Gelo pîrejinên Celalîyan wuha dua dikin? ...

Biro zûr bû ma. Nedizanî ku ci bêje. Şûna Biro, Nûman Efendî bersiva Ehmedê Hecî Biro da:

-Kekê Ehmed, Gava ez li Ûrisetê bûm, min di Ermenistanê, Tirkmenistanê û Qazakistanê da dît. Kurdêن me yêñ Êzdi wusa dua dikirin. Rojê du caran dua dikin. Gava roj hiltê û diçe ava, berê xwe didin tavê. Kefê destêن xwe dizvirînin aliyê tavê û dua dikin.

¹⁰⁹ Remezan Alan, *Bendname: Li ser ruhê edebiyatekê*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2009, r. 139-140.

Vêca Musayê Berkî pirsî:

-Bavo! Kurdên Serhedê ne Îzdî ne, gelo çima vek Îzdiyan dua dikan?

Vêca Baron Vahan bersiv da:

-Ezê nuha ji we re tiştek bêjim, dibe ku hinek hevalên me, ji vê gotina min aciz bin. Lê, rastî rastî ye. Hevalno! Berê Kurd bi tevayî Îzdî bûn. Dema Xelîfe Hezretî Omer da, leşkerên Ereban gelek caran êrişê Kurdistanê kirin. Kurd jî wek Tirk û Eceman hêdî hêdî, ji dinê kal û bavêن xwe bi dûr ketin, bûn bisilman... (r.271-272).

Di nav mesela şerê kurd û ermenan de êzidî jî nayêن jibîrkirin û qala neheqî û zilma ku li wan bûne tê kirin. Bimesafebûn û nealîkirina wan a ji bo osmaniyan, wek nîşaneyek sedema bilindkirina çanda wan tê nîşandan. Dîsa bi sohbeteke dîdaktîk zordariya misilmanan a li ser êzidiyan wek sedema koçkirina wan tê rexnekirin wek ku “lêborîneke îroyîn” ji êzidiyan bê xwestin:

Memo Beg got:

-Nuha em qala şerên eşîrên Kurdan û şerê Kurd û Ermeniyan dikan. Lê kes qala Kurdên Îzdî nake. Wek tê zanîn, him dewleta Osmanî, him jî Kurdên bisilman, li Kurdên Îzdî gelek neheqî kirine.

Hinek Îzdî hatin kuştin. Hinek jî ji ber tirsa zaliman, dinê xwe guhartin û bûn misilman. Hinek ji revîn çûne welatê Ûris û Ermenîyan cî war bûn. Hevalno, zulm zulm e, neheqî neheqî ye. Ha bisilman ha Xaçparêz. Ha Kurd, ha Îzdî, ha Ermenî, ferq nake. Divê em ji zulm, zordarî, neheqî û bêbextiyê dûr bisekinin (!) (r.258).

Mît û efsaneyêن ku têن texeyulkirin an ji nû de têن şîrovekirin, kişifkirin, popularîzekirina folklorê, orf û adetêن bav û kalan; dîrok çiqas bi van re di nav danûstendinekê de be ewqas watedar e. Dîroknasekî netewperwer kêm caran tenê dîroknaş e; ew pîsporekî folklorê, ziman, mîtolojî, stranêن gelêrî ye ku li ser kolandina *volkgeistê* gelekî hûr bûye¹¹⁰. Dema em bi vî çavî romanûsiya Çamlibel dinêrin, ev taybetya dîroknûsiyê di romanûsiya wî jî dide der. Çamlibel di nav serpêhatiya serhildanê de piştî teswîra hînbûniyêن jiyana rojane ya zivistanê, peyvê tîne ser sersalê û *kosegelî* gerandinê. Bicihanîna van adetan jî tiştekî elzem e, perçeyek ji jiyanê ye. Zilfo yek ji şervanêن ciwan e û li ser navê hevalên xwe ji mezinêن xwe destûrê dixwazin da ku sersalê pîroz bikin. Li ser hin teredûdêن wan ên ji ber şehîdêن şer, Ferzende:

¹¹⁰ Bozarslan, h.b., r. 38.

Eferim ji we ra, eferim ji aqil û feraseta we ra. Hûn bi rastî mîr û camêr in. Xwedan wujdan in, xîretkêş in. Kurê min, di nav me kurdan de şîn û şahî tevlihev in. Emê him şer bikin û him jî sersalê pîroz bikin. Kosegelî, şanoya kal û bavêne me ye. Emê çawa edetêne kal û bavêne xwe terk bikin? Herin we her sal ci dikir, îsal jî wisa bikin (r.217).

Di çarçoveya teswîra şahiya sersalê de bi berpirsiyariya etnologekî gotinêne pêşîyan têrêz kirin û cih dide tiştanok û teswîrên dirêj yên lîstikan. Ev teswîr bi metnê re nehatine sitran û ji bo jiyanâ dewra serhildanê li ber çavê me bê zindîkirin nehatine bikaranîn, lê bêtir wek îzahê antropolojîk xuya dîkin. Teswîrên li ser kilaman jî wisa ne. Dengbêj beriya ku dest bi kilama xwe bike, wek ku pêşperî komek biyanî rûniştibe, raveyek dirêj dike:

Hûn jî baş dizanin ku di nav şîn û şayiyêne miletê me da, daîm kilam têne gotinê. Di dema evîntiyê, kilam bi me re hevaltî dîkin. Em bûkêne xwe bi kilaman siwar dîkin. Jin dergûşen xwe bi kilaman mezîn dîkin... Kutasî, kilam û dengbêj, mejû û ruhê miletê me ne... Wek tê zanîn, di Serhedê de gelek dengbêjêne menşûr derketine. Evdalê Zeynikê yek ji wan e. Evdal him hozan bû, him jî dengbêj bû... (r.243).

Di nav axaftina xwe de bi dirêjahî jiyanâ tevî Evdalê Zeynikê, jiyanâ Feqiyê Teyran, çîroka *Zembîlfiroş* jî tê vegotin. Di pê vê ravekirinê re dengbêj dest bê stranan dike. Gotinêne stranan bi xwe nêzî pênc rûpelan dagir kiriye. (r.243-253)

Dema qala sifreya xwarinê tê kirin em dîsa hîs dîkin ku em bi dersek entnolojîk re rû bi rû ne. Bi qasî rûpelekî xwarinêne ji bo mîvanan hatiye amadekirin tê jimartin. Awayê amadekirina sifrê, birêkûpêkiya sifrê, ci çawa kengî tê xwarin an kirin, bi hûrgilî hatiye vegotin:

... Dewlemendiya şîva malbata Berzenciyan, bala mîvanan kişandibû. Di nav eywana Seyîd Resûlê Berzencî da, çar sifre hatibû danîn. Di bin sifran de patisqek sipî hatibû raxistin. Ji bo rûniştina mîvanan, di dora sifran de mînder hatibûn danîn. Qedera deh xulam, ji mîvanan re xizmet dikirin.

Berê nanê tendûrê, pîvazê teze û avdew hate ser sifrê. Paşê şorbe hat. Paşê, di nav siniyêne sifar da, çar berxên qelandî hat. Serê berxan li ser laşen wan bû. Di bin goşte berxan da, pilava savarê hebû. Pilav, bi rûnê nivîskî hatibû petin. Di nav pilavê da mewûc, behîv û kakilê gûza hebûn. Kurêne Seyîd Resûlê Berzencî, mîjî, ziman û goşte serê berxan, bi destê xwe îkramê kalemêran dikirin.

Di cem goştê berxan de, selate, balcanê sor, tivrê sor, baxdenoz, pîvaz û ava hinarêن tirş hebû.

Paşê di siniyan da, meywêن cur be cur hatin. Tev dendikêن wan hatibû derxistin. Wana di nav rûnê nivîşkî de qelandibûn, hingiv li ser wan hatibû rokirin.

Paşê petêx, zebeş û xoşav hat. Di dawiyê da, di nav sinîyek zîv da qehwe hat.

Xulam ji bo mêvanan, ji titûna Mûşê cixare dipêçandin. Di nav sinîyek neqîşkirî da, pêşkêşê mêvanan dikirin.

Paşê di nav semawerek mezin da çay hat (r.277)...

Paşre em têن agehdarkirin ku ev xwarina dewlemendan e û vêga derbasî tarîfa xwarinêن feqîran dibin. Wan yek bi yek dijmêre:

... Gelî hevalan! Gelo li seranserê Kurdistanê di çend malan de sifrek wuha dewlemend datînin pêşıya mêvanan?

Bixwe pirsî, bixwe jî bersiv da:

-Belku di sedî da yek.

Yekî dinê got.

-Gelo feqîren Kurdan ci dixwin û vedixwin?

Yekî bersiv da:

-EZ dikarim çend xwarinêن feqîran bijmêrim. Herle, şorbeya zivistanê ye. Rûn û ar tevlihev dikan, dibe hevir. Vê hevirê li ser êgir sor dikan. Paşê ava kelandî berdidin ser û hinek xwê davêjin navê. Jê ra herle tê gotin.

Nanê kartû, rûn, pîvaz, hêk, xwê davêjin nav ava kel, dibe xwarinek feqîran. Jê vê re dibêjin cilbir.

Boraniya hêka, wuha tê çêkirinê: Hêk dikelînin û hûr dikan. Mastê bi sîr û rûnê nivîşkî li ser dikan, dibe xwarinek feqîran.

...

-Hevrişk jî xwarinek feqîran e. Çêkirina wî jî gelek hêsa ye. Nanê teze germe germ hûr dikan, rûnê nivîşkî berdidine ser, dibe hevrişk.

Girar jî xwarinek feqîran e. Sê cûr girar tên çêkirin. Yek girara dew e. Pêşiyê, danê kutayî dikelînin, paşê mast û hinek ar tevlihev dikan. Ew rodikin nav danê kutayî û serda jî pûng dikan navê. Ev dibe girara dew. Dan, kartol û tirşok bi hev re dikelînin. Ger hebe, goşt, pincara nancivikê, di avê da dikelînin. Ji vê xwarinê ra dibêjin girara navcivikê.

Xwarinek jî heye, jê ra dibêjin keşk. Berê mast parzûn dikan. Şûjiya binî digvêsin. Di bin tavê da hişk dikan. Li zivistanê di nav avê da dihêlin, pê xwarinêن cuda çêdikin.

Yekî dinê got:

-EZ ji qala çend xwarinêن feqîran bikim ku bi ar têن çêkirinê. Yek ji wan xaşîl e. Ar di nav avê de da dikelînin, dibe xaşîl. Yek jî bişî ye. Di nav sêlek da, hevîrê tirşbûyî bi rûn diqelînin, dibe bişî. Nav avê da toxav û ar dikelînin, dibe jajî

Ar û hêk di nav ava sar da dikan hevir. Vê hevîrê di nav avê da dikelînin. Mastê bi sîr û rûn berdidin ser û ev dibe xengel.

Yekî dinê got:

-EZ jî dixwazim qala du xwarinan bikim.

Hasîde, xasima ji bo jinênu nû welidîne tê çêkirinê. Nanê kartû di nav rûn da diqelînin. Şerbet berdidin ser. Xaşîla dan jî heye: Danê kutayî di nav avê da dikelînin. Dixine nav tebaxek. Orta wî vedikin. Mastê bi sîr û rûn berdidin ser (r.278).

Yekî ku rojekê rabe li ser çanda vê serdemê lêkolîn bike dikare ji van materyalên folklorîk û etnografîk sôd wergire! Mêr -di nav şerekî de- li ser sifreyekê çawa dikarin li dû hevdu ewqas qala çêkirina xwarinan bikin, ew jî pir balkêş e. Di tevahiya romanê de qasî ku di carekê de qala xwarinan an materyalekî folklorîk dibe, bi yek carê jî be ewqasî qala derûniya lehengekî nayê kirin. Nivîskar bi qasî bala wî li ser agahdarkirin an perwerdekirina xwendevan e, bala wî ewqasî ne li ser derûniya lehengêن xwe ye an guh nade dengê wan ên hundirîn.

Di *Ser Li Çiya* de lehengêن jin ên şervan hebûn. Qala wêrekiya wan, şerên wan û kuştina wan dihat kirin. Di *Biro* de lehengêن jin ên wek ku şervan têن naskirin nînin. Lê di vê meselê de di nav lehengan de nîqaşek germ heye. Çendîn jin bi îsrar dixwazin rahêjin tivingan û li hemberî Romê şer bikin. Jin çi ciwan çi extiyar bin, bi hismendiyek netewperwer û modernîst dipeyivin. Piraniya mîran jî vê gelekî maqûl dibînin, li pêşıya wan nabin asteng. Di eweliyata vê nîqaşê de (r.121-122) di nav mîran de li ser gernas û “mîr”xasiya jinan sohbetek derbas dibe:

Ferzende got:

... Wellehî û billehî jinênu me jî wekê mîrên me gernas û mîrxas in...

Şêx Zahar zivirî ji ferzende Begê ra got:

-Wellehî gotina te rast e. Ci jin ci mîr, em hemû benîadem in. Jin çawa ditirsin, mîr jî wusa ditirsin. Mîr çawa qehremanî dikin, jin jî dikarin wek wan qehremanî bikin... Ez di huzûra we hemûyan da dibêjim, gava roj hat, jinbira min Hedê û jina kurapê min Bilbil, wê bi qehremanî şer bikin. Gava roj hat, hûnê qehremaniya jinêne me bi çavêن xwe bibînin (r.122).

Lê ev roja ku jin jî bi qehremanî şer bikin nayê. Nivîskarê ku nasnameyek kurdewar a asofireh û wekhevîxwaz teswîr bike, ji dêvla lehengên dipeyive. Lewma ev teswîra dûrî dewra xwe cihê xwe di nav romanê de nagire. Di vê navê de jin di bin konekî din de rûdinin. Jin û mîr tevî hevdû rûnanin. Di rûpelê 183yan de Şekir, biraziya Biro êdî tiving dixwaze da ku “bi Roma bêbext re şer bike.” Biro pê razî nabe; Mirdêsi, dayika wî ya extiyar midaxilî nîqaşê dibe:

Birahîm Axa, ev şer, ne şerê eşîran e. Ev şer, şerê milletê me ye. Gava yek got “Ez dixwazim bi Romê ra şer bikim” heqê tu kesî tune ku jê ra bêje, “Tu nikarî bikevî nav şer.” Madem ev keçika me dixwaze bi Romê ra şer bike, lazim e em wê hildin nav şervanên xwe (r.183).

Digel vê nîqaşa ku têra xwe netewperwer û wekhevîxwaz, di nava şer de wek şervan an navê jinek di şerekî de serkeftî bûbe derbas nabe. Rûpelên li ser şervaniya jinan de wisa di nav tekstê de hatiye bicihkirin ku li derveyî temamiya tekstê mane. Lewma ev beşa kitêbê bêtir xizmeta eşkerekirina manifestoya nivîskar û mebesta wî dike ku xwendevanên îro ji dîroka xwe ders bigrin.

Di romana *Biro* de tifaqa kurdan ku kurd her tim jê bêpar mane û hê jî jê bêpar in, pêk hatiye. Ew bêtifaqbûna ku ji Ehmedê Xanî û vir de bûye sedema gazinan û di her dewrê de wek sedema têkçûnan hatiye nîşandan, vê carê qet ne babeta gazinan e. Dema rêvebirêن serhildanê li hevdû dicivin û hin birtyaran distînin, ku dûbendiyekê çêbibe jî yek yê din bi du an sê hevokan îqna dike. Birtyar bi raya tevahiyen derdikevin. Du kesên ku ji hevdû hez nakin an ji hevdû didexisin, bi hevdû re di nav reqabetekê de bin, nîne. Yekî çêra wî/wê nexweş nîne. Di *Ser Li Çiya* de lehengên kurd ên ku alikariya dewletê dikirin jî hebûn û ew di dema serhildanê de dervediketin holê, hê ji beriya wê hebûn; her tim amadebûn ku tevkariya dewletê bikin. Di *Biro* de, ne wek şexs ne wek eşîr, em qet rastî kurdekî nebaş, ne neteweperwer û tevkarê dewletê nabînin. Hemû kurdan tifaqa xwe pêk anîne, bûne yekpare. Di serhildana Şêx Seîd de rewş ne wisa bûye. Lê hatiye fam kirin ku tu kesî wek şexs jî be ji tevkariya dewletê xêr nedîtiye; bûye poşmanî û li

wan vege riyyate. Vêga hemûyan ji wê dewrê dersa xwe hilanîne. Hatiye fam kirin ku armanca dewletê tinekirina kurdan e û her yek wek endamê vê netewê di hedefa dewletê de ne. Lewma hemû şervanên serhildanê li ber hevdû hurmetkar in, rêt li ber hevdû digirin, baş dizanin meselê bi hevdû bidin famkirin. Axir ew tifaqa ku bi sedan salan e kurd li bendê ne, pêk hatiye!

3. Erebê Şemo (1897-1978)

a.Jiyan û Berhemên wî

Erebê Şemo di dîroka wêjeya kurdî de wek bavê romana kurdî cihê xwe girtiye. Wî di sala 1935an de romana kurdî ya yekem *Şivanê Kurmanca* li Îriwanê daye çap kirin. Erebê Şemo di sala 1897an de, dema herêm di bin desthilatdariya ûrisan de bûye, li gundê Sûsizê ya girêdayî bajarê Qersê hatiye dinyê.

Demeke dirêj wek endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunist ya Ermenîstanê dimîne. Enstitutiya Lazarevskî ya li Îriwanê dixwîne, li ser rojhilatnasiyê dibe pîspor. Di pê re Akademiya Zanistî ya li Leningradê de doktoraya xwe temam dike. Di van salan de bi Hovsêp Orbelî û Qanatê Kurdo re li ser kurdnasiyê dixe bite. Bi Îshak Maragulov re di 1929an de elîfbayek ji bo kurdî amade dike. Di sala 1930an de dest bi weşana rojnameya *Rêya Teze* dike. Di vê navberê de li Leningradê û di Enstitutiya Dîroka Kulturê de dersên kurdî dide. Şanoya Koçekê Derewîn a Aleksandr Araratyan werdigerîne kurdî. Di salên destpêka 1930an de piştî *Şivanê Kurmanca*, *Li Ser Pêwendiyên Feodalî di Nav Kurdan de û Kurdên Elegezê* dinivîsîne¹¹¹. Di sala 1937an de, ji aliyê Stalîn ve tê sirgûnkirin, bo qeraxa Okêna Cemidî tê şandin; heta sala 1956an sirguniya wî didome. Piştî mirina Stalîn ew azad dibe, vedigere Ermenistanê. Sala 1966an, ew romana xwe ya dîrokî *Dimdimê* diweşîne. Di sala 1967an de jî li Moskowê berhevoka *Hikayetên Gelê Kurd* û romana xwe ya bi navê *Riya Bextewar* diweşîne. Romanên wî yên din jî, *Hopo* (1969) û *Berbang* (1958) e. Eskerê Boyik diyar dike ku bi

¹¹¹ Alan, h.b., r. 194.

senaryoya wî filmekî dokumentar bi navê Kurdên Ermenîstanê hatiye kışandin¹¹². Ereb Şemo 1978an de li Erîwanê ji vê dinyê koç dike.

b. *Dimdim*

Romana wî ya dîrokî *Dimdim* şerê sedsala 17mîn de ku di navbera kurdan û şahê safeviyan Şah Abbasê II. de derbas dibe, vedibêje. Di vê sedsalê de wek encama siyaseta dewleta Safeviyan a navendîbûnê, desthilatdariya navendî hêzên xwe dişîne ser mîrektiyan da ku xweseriya wan ji holê rake û têxe bin darê xwe. Di salên 1608-1610an de kurd li hemberî vê siyasetê li herêmên Tergewer, Mergewer, Biradost û Üşnûyê serî hildidin. Navenda vê serhildanê kela Dimdimê ya ku li herêma Mergewerê ye. Ev serhildan û dilêriya mirovên Kela Dimdimê di zargotina kurdî de bi awayê destankî bi navên *Dimdim*, *Dimdim Xanê Kurda*, *Beytta Xanê Kurda*, *Xanê Çengzêrîn*, *Xanê Lepzêrîn*, *Xanê Destzêrîn* di nav gel de her dem hatiye neqil kirin¹¹³. Şemo bi *Dimdimê* cara yekem zargotina kurdî bi awayekî modern ji bo romaneye kiriye bingeh.

Li serê çiyayekê herî asê Xanoyê kurd kelayek ava kiriye. Gelê kela Dimdimê ji desthilatdariya Şahê Îranê dûr, di nav aşitî û aramîyê de dijîn. Lê Şahê Îranê kela Dimdimê wek nîşaneyâ xurtbûna kurdan û ji xwe re wek gefekê dibîne. Bi çendîn caran êrişî ser kelê dike lê bisernakeve. Lê cara dawî Şah dîsa bi hemû hêzên xwe tê ser kelê, gelê Dimdimê berxwedaneke bêemsal nîşan didin. Ewqas ku dema tu çare namîne û têkdiçin jî ji ber ku bi destê hêzên Şah neyên kuştin ew xwe dikujin. Kurteya romanê ev e.

Ereb Şemo li ser zemînê bûyerek çarsed sal berê di şêwaza romanê de di perspektîfek îroyîn roman-dîrokek nivîsandiye. Wek ku Fatih Altug¹¹⁴ jî diyar dike, wexta nivîskarek bûyerek dîrokî di nav cûreya romanê de bi awayekî temsîl dike, bi qasî ku di derheqê rabirdûyê de vegotinekê hildiberîne, ew, li ser “vêga”ya nivîskar, yanê peywenda dîrokî ya ku roman tê de tê nivîsandin jî, midaxeleyek e. Ji ber ku sehkirina nivîskarekî romana dîrokî ya di derheqê dîrokê de ji aliyê peywenda dîrokî ya dewra wî/wê de tê şêwandin. Di eyn wextê de ji bo bandor li ser peywenda dîrokî ya fiîlî bike, veguherîna şert û mercên ku di romana xwe de vedibêje ji nû de dide şêwandin.

¹¹² Eskerê Boyik, “Erebê Şemo (1897-1978)”. *Kovara W. hej.15*, r.17-26. Diyarbekir, 2007.

¹¹³ Ordîxanê Celîl, *Kürt Kahramanlık Destanı Dimdim*, wer. İ. Kale, Weşanxaneyâ Avesta, Stenbol, 2001., r. 11, 37.

¹¹⁴ Altug, h.b., r. 157.

Di pêşgotina kitêbê de digel ku nivîskar wê wek roman binav dike, wek vegotina dîrokî tarîf dike ku xwendevan hay jê hebe û bi wî çavî bixwîne:

Ev roman nîşan dide wan tarîxa kurdan, wextê ku Kurdistan di halekî pirr giran de bû ... Em her didin nexşekî wan şerên kurdan, ên ku wan gelek qurnan, sal û zemanan dikir ji bo azadbûna xwe ji zulma dagirkaran û ew nasekinin, niha jî şer dikin ji bo azadbûna xwe (r.10-11).

Nivîskar bi hevoka dawîn wek dîroknasekî berdewamiya di navbera diho û îro de bi bîr dixîne û berxwedana Dimdimê wek xeleka yekemîn a şerên ji bo azadiyê nîşan dide ku heta îro jî didome. Di epilogê de vê yekê hê zelaltır nîşan dide û ji aliyekî ve li ber dilê xwendevanan dide, êş û kesera wan siviktir dike:

...Ev şer vala neçû, wexteke ne zehf dûr dîsa dest pê kir şer ji bo azadiya kurdan. Îcar Talorîk serarı li vî şerî kir. Lewma jî, kurdan navê wî şerî danî, şerê Talorîk. Di pey wî re, Bedir Xan, Êzdînşêr, Şêx Evdilah, Şêx Ubeydullah û Şex Mehmûdê Berzencî ji bo azadî û serbestiya welatê xwe şer kirin (r.253).

Madem ku nivîskar romana xwe bêtir wek vebêjek dirokî tarîf dike an dixwaze xwendevan wisa bixwîne, em jî ji perspektîfa wê dîrokê de binêrin, bê ka çawa ev niziliye nav tekstê. Li gor nivîskar, kurdan her tim xwe wek netewekê binav kirine. Digel ku *Dimdim* ji aliyê sosyolojîk ve di serdemeke eşirtiyê de derbas dibe jî gelê kelê kêm caran navê eşîra xwe bilêv dikin. Binavkirenaka ku ji hişmendiyek modern niziliye û derî-zemanê xwe dike ku xwendevan xwe di sedsala bîstemîn de bibîne: “em kurd... (r.41)”, “miletê kurda... (r.111)”, “Xayinê nav kurdan... (r.127)”, “ev ciyê kurdan... (r.167)”, “eskerê kurdan... (r.219)”. Dikare bê gotin ku cimaeta kurda ya muxayel tevî navê welatê xwe ji destpêka sedsala 17mîn û vir ve cihê xwe girtiye. Her çi qas di dema îperetoriyan de herêma ku kurd lê dijîn wek Kurdistan dihate binav kirin, divê neyê jibîrkirin ku gel xwe wek Kurdistanî binav nedikirin an xwe bi axa ku li ser dijîn tarîf nedikirin. Kurdistan navekî erdnigarî bu ku îperetoriyan ew wek navê yekeyek (birim) îdarî bikar dianîn. Nivîskar di romana xwe de vî navî, bêyî ku sînorê wê diyar bike, wek navê yekeyek siyasî bikar tîne:

Vir welatê Kurdan e, ne ciyê Şahê Îranê ye, wekî ew mele bişîne. Xêji wê yekê, em Kurd in û dînê me cuda ye; em Sunî ne, ne Şi'î ne, ji me re lazim e, wekî meleyê me jî

Kurd be û Sunî be. Lê tu Ecem ì, bicehime ji van deran! (r.35). Em giş xulamên te ne, em ê jî mîna mezinan, kal û bavan şer bikin ji bo welatê Kurdan (r.52).

Ev gotinênu ku Xano ji meleyê ku bi fermana Şah hatiye da ku li kela Dimdimê meletiyê bike, re dibêje wê tarîfa ku Ernest Gellner ji bo hestênetewî kiribû, tîne bîra mirov. Li gor tarîfa Gellner, ger rêvebirêne yekeyeke siyâsi ne ji netewa ku tê idare kirin yanê ne ji ya bindest be, ev nayê tehemulkirin. Netewperwerî daxwaz dike ku sinorêne etnik û yên siyâsi li hevdû rûnin; yek ji yekê ne zêdetir be¹¹⁵. Ya din, nivîskar unsurênu ku kurdan ji eceman vediqetîne binxêz dike: Ew tenê ne cudatiyek etnikî ye, ew mezhebî ye jî. Misilmantî bi serê xwe wan nêzî hevdû nake ku ev bersiveke li dijî ‘biratiya olî’ ku her tim li dijî netewperiya kurdan tê bikaranîn.

Wek ku di epîlogê de jî nivîskar diyar kiribû netewa kurd bi sedan sal e wek cimaetek muxayel a yekperce her tim şerê azadiyê kiriye. Awayê şerê azadiyê jî bi sedan sal e neguheriye. Sedema têkçûna serhildana Dimdimê xayıntiya şexsekî, Mehmûdî Mêrekanî bû. Bi giştî sedema têkçûnen serhildanen beriya Dimdimê jî hemû xayıntî ye:

Hinekên nepak û kirêt; axa, beg û mîrên kurdan xayînî li miletê xwe kirin û çûn bûn destayê Romê. Wekî wan jî, mîna Xanoyê Çengzêrîn, mezinê Hekariyê, Amediyê, Cizîra Botan û Şemzînanê şer bikirana, ne Rom, ne jî Îranê nikaribû lingê xwe bavêtana Kurdistanê (r.116).

Lê ev netewperperiya kurdan ku ji sedan salan û vir ve li ser linga ye çîma her tim xayinan ji nav xwe derdixe ev ne diyar e. Wek me li jor ji Bozarslan jî neqil kiribû di vegotina siyâsi û dîroknûsiya kurdan de di têkçûna gelek tevgerên siyâsi de xayıntî her tim wek sedemeke tayinker tê nîşandan. Lê meseleya herî girîng an ya bingehîn ku çîma ji nav kurdan de xayîn derdikeve an tenê xayînek çawa dikare hemû xebat û têkoşînê vala derxîne nayê rave kirin. Ev helwest di vegotina siyâsi ya îroyîn de jî hê berdewam e. Ew binyada ku ji nav xwe xayinan derdixîne bi çavekî binyadgerî nayê analîz kirin. Wek mînak di *Dimdimê* de sedema xayıntiya Mehmûdî Mêrekanî pir şexsî tê qal kirin. Em fam dikin ku Mêrekanî mirovekî gelekî cirnexwes û nepak bûye. Her tim qebîleya wî gazin jê dikirin û şikayeta wî li Xano dikirin. Xano ji ber nekiriye der û rabûye erdê wî jê stendiye, anîye nava kelê. Li vir jî rihet nesekiniye; tu kar nekiriye û dest bi

¹¹⁵ Ernest Gellner, *Uluslararası ve Milliyetçilik*, wer. B. Ersanlı, G. Göksu Özdoğan. Hil yayınları, İstanbul, 2008, r. 71.

qumarê kiriye û hemû hebûna xwe di qumarê de winda kiriye. Bi vî awayî kîna wî ya li hemberî Xano herku çûye mezin bûye.¹¹⁶ Lî ev mimkun e ku mirovên wisa her dem di her civakê de hebin. Çima ev mirov bi serê xwe dikare bibe sedema têkçûnek ewqas trajîk? Lazim e ku sedemên gewretir û bingehîn hebin. Pêwendiya dîrokî û siyasî ya wê dewrê divê bandorek wê hebe. Qey qet rola hêza Şah û dewleta wî û hevalbendiya wan a bi Împeretoriya Osmanî ya li ser kurdan û siyaseta wan a navendîbûna van dewletan tunebû gelo? Em dizanin ku sedsala 17mîn ji bo dewleta Îranê ew dem e ku navenda xwe xurt dike û tu şensê ji yên derveyî navendê dimînin re, nahêle. Mêrekanî nebûya gelo şensa gelê kela Dimdimê ya berxwedanê çiqas bû? Belê Erebê Şemo car bi car qala tifaqa dewletan jî dike. Li hemberî mîrektyîn kurdan ew çawa alîkariya hevdû dîkin, çawa bi peymanekê Kurdistan di nava xwe de perçê kirine (r.116), dijminê kurdan çima him padişahê Romê û Şahê Îranê ye (r.118), ev hemû têvî vegotin. Lî di dawî de ev di bîra xwendevan de dimîne ku sedema têkçûnê Mêrekanî ye.

Ji bilî şexsêن wek Mêrekanî axa, beg û mîrên kurdan jî xayintiyê li miletê xwe dîkin û diçin alîkariya Romê an Şahê Îranê dîkin. Ji xwe xala herî girîng jî ev e û her dem ev helwest, heta îro, xwe ji nû de hildiberîne. Divê ji bilî karakterên wan û sedemên şexsî sedeminê bingehîn an ravekirinek din hebe. Ev nayê nîqaşkirin ku di nav kurdan de ev hestênetewperweriyê ku bikaribe hemû kurdan di nav xwe de bihewîne, rê li ber xayintiyê bigre an bikaribe ji heqê wan bê der, tûne bûye. Vegotina siyasî û dîroknûsiyê ku kurdan wek netewekê nîşan didin, hesab nakin ku hestênetewî hebin jî ev wek îstisna maye û ji ber sedemên siyasî, aborî, dîrokî û sosyolojîk belav nebûne, nebûne malê gel. Bi nêrîneke din wisa xuya dike ku ev tunebûna hestênetewî tiştekî zêde eşkere ye, lewma nivîskarêñ kurd vê wek pêdiviyekê ewqas zêde derdixin pêş.

Ji bo li ser meseleyêñ dîrokî analîzêñ birêkûpêk bê kirin, divê li ser wan lêkolînêñ zanistî hatibin kirin. Di wê civakê de lazim e hin kesan bi van meseleyan re

¹¹⁶ Di versiyoneka destana Dimdimê de sedema xayintiya Mêrekanî hê besittir e: Çengzêrîn bi eskeran re şîv dixwe. Mehmûdê Mêrekanî dereng dimîne. Tenê perçeyek nan ji wî re maye. Dixeyide û di dilê xweda gefan dixwe. “Bila tenê bibe sibe.” Dibe sibe; bi dizîka ji eskerên Şah re li ser kaxezekê dinivîse ku serekânî li filan cî, bin filan kevirî de ye (Ordîxanê Celîl, h.b., r. 151).

Di versiyonek din de navê xayin wek Mehmûdê Elekanê derbas dibe. Mehmûd bi heman awayî xeberê ji eskerên Şah re dişîne. Di dawiyê de Şah gazî wî dike û dipirse ka çima wisa kiriye. Bersive wî ev e ku Xan her roj metaleg zêr didayê, lê wê sibehê nedayê. Lewma wî xayıntî lê kiriye (h.b. 105).

Di versiyonekê din de jî, pişti heft salan dorpeçkirî de nanê Xano xilas dibe. Tenê di qefesê de kewek, mistek birinc û bizinek wî heye. Xano ferman dide ku kewê serjêkin, bizinê bidoşin û girara birincê, Goştê kewê di rûn de sor bikin; wan ji Şah re bişînin û bibêjin ku ew teslim nabin. Şah lêdinêre ku pişti heft salan ew pirinc û goştê kewan dixwin, digihêje wê encamê ku ew teslim nabin. Biryar dide ku dawî li dorpeçkirinê bîne. Bi vê hinctê nameyekê ji Xano re dinivîsîne. Xano bi vê nameyê ewqas kêfxweş dibe ku deriyê xizneyêñ zêran vedike û wan di nav xizmetkaran de parve dike. Lî ew Mêrekanî jibîr dike. Dema Mêrekanî tê yek ji xizmetkaran fesadiyê dike ku Xano ji wî hez nake, lewma ew jibîr kiriye. Ji ber vê Mêrekanî nameyekê ji Şah re dinivîsîne ciyê kaniya avê tarîf dike (b.n. 173-174).

serê xwe êşandibin, xebatên piralî hatibin kirin. Di vê qadê de divê nîqaşek û di encama wê de danehevek (birikim) hebe. Lê di nav kurdan de zanista dîrokê bi xwe hê bi awayekî profesyonel û bi zanistî nayê kirin û neqirkirina bûyerên dîrokî bêtir romanûs didin ser milê xwe. Wek encam, hemû nîqaş hergav tê li bêtifaqî û xayintiya hin şexsan, axa û mîran asê dibe û wek çareseriya pirsgirêkên siyasî yê îroyîn jî bitifaqî (lê çawa? ev nayê zanîn) û yekgirtî tê pêşniyaz kirin. Bi rastî di vî warî de jî bersiva Ereb Şemo ne ku tuneye. Di nav romanê de li hemberî êrişên dewleta Romê û dewleta Şah alikariya mîrektî an eşîran ya di nav hevdû de ciyekî girîng digire. Carekê eşîra Şikakan ji ber serbazên Şah ketine tengasiyê. Li ser navê xercê ketine nav gel û wan talan dikan. Lewma eşîra Şikakan qasidê xwe dişînin da ku Xano alikariya wan a leşkerî bike. Li ser vê tê bîra Xano ku dema Şahê Îranê hatibû ser wan çawa eşîra Şikakan li hemberî Şah dest hilnedabû û bi ser de qurban serjêdikirin. Lê dîsa jî ji kurê xwe Sevdîn re dibêje “...Êla Şikakan ketiye tengasiyê, çawa hebe *miletê me* ye, eşîr in, pênc sed xortên cahil hilde, here (r.38).” Dema Mîrê Şemzinanê li hemberî dewleta Romê alikarî ji Xano dixwaze, ew wê gavê biryar dide ku hêzên xwe ji bo alikarî bişîne. “Nabe em mîna hinek began û axeleran xîretê û namûsê bihêlin. Divê em bizanibin ew roja ku niha li serê wan e, wê bê serê me jî (wek ku dizanibe di rojê pêşiyê de çi li ber wî ye). Em gerek wisa nehêlin, hema niha herin (r.130).” Diçe lê dema kela Dimdimê ji aliyê Şah ve tê xirab kirin tu kes nayê alikariya wî û gelê wî. Ligel xayintiyê, ev dikare wek sedema duyem a têkçûna kela Dimdimê bê binav kirin. Lê li jor jî hate gotin, bersiva “çawa” tenê hestiyarî ye an tenê girêdayî niyeta mirovan e. Ew sedemên antropolojîk ku nahêlin ew bêñ ba hevdû qet nayê rojevê an li ser nayê nîqaş kirin, tenê dibe sedema gazinan.

Perspektîfa nivîskar a îroyîn an midaxeleya wî li “vêga”ya xwe di teswîrên Xano de jî eşkere ye. Wek ku Remezan Alan bi heqî dibêje tevî *Jiyana Bextewar* û *Hopo*, *Dimdim* jî di çarçoveya wêjeyek partînost yanê di çarçoveyek realîzma sosyalîst an romantîzma şoreşgerî hatiye nivîsandin¹¹⁷. Lehengê *Dimdimê* Xano ji bo gel mirovekî ïdeal e an mînaka herî baş temsîl dike; ne tenê ji bo gelê xwe ji bo hemû kurdên iro jî an “vêga”ya nivîskar jî lehengekî ïdeal e. Bi her awayî, di siyasetê de, di mirovatiyê de xwedî ferasetek mezin e. Beriya her tiştî “Xanoyê Çengzêrîn ne beg e, ne axa ye, ne jî mîr e, Kurd e, lê ji began, ji axa û mîran jî zêdetir e û çêtir e (r.125).” Xano qet bi van rutbeyan nayê qalkirin, wek mirovekî ji hemû tebeqe û çînê civakî bi eyn mesafeyê dûr

¹¹⁷ Alan, h.b., r. 197.

be, tê teswîr kirin. Lê ji aliyê sosyolojîk ve di dewreke eşîrtiyê de çawa dibe ku yekî desthilatdar ne aîdî tu çîn û tebeqeyê be û nasnameya wî tenê bi hemanê netewî bê teswîr kirin? Ev ji rastiya dewra xwe gelekî dûr e. Ereb Şemo wek nivîskarekî di bin rejima sosyalîst de jiyaye û bawermendekî sosyalîzmê bûye, perspektîfa wî ya dewra wî bi eşkereyi derbasî berhema wî bûye. Di vê sîstemê de ku li dijî hebûna çînan bû, nivîskar xwe nikaribû ji pîvanêن wê xilas bike û şexsekî bi rûtbeya axa, mîr an beg nedibû ewqas pozitîf nîşan bide. Beg, mîr an axayek nedibû bêqusûr be, ji gelê xwe re bibe modelekî an rê li ber wan bixe. Eskerê Boyîk jî di nivîsa xwe ya li ser Ereb Şemo ya di Kovara Wyê de dibêje “Li cem wî hemû axa, beg, serekeşîr, dîndarêن êlan tev zulimkar, talanker, neheq, merivkuj û bêwîjdan in¹¹⁸. ”

Di romana *Dimdimê* de yek ji vegotinêن ku nivîskar wek midaxeleyekê li peywenda dewra xwe kiriye, nêzîkahiya di navbera kurd û ermenan de ye. Wek Eliyê Ebdilrehman, Ereb Şemo jî piraniya emrê xwe li Ermenistanê di nav ermenan de jiyabû û trajediya ku hatibû serê ermenan ji nêz ve dizanîbû. Ya din, her çi qas ew qet qal nake, ew bi xwe êzidî bû. Tê zanîn ku êzidî jî wek ji “yên din”êن misilmanan, ew jî rastî zordestiya misilmanan hatine û di wextê de ji ber vê koçî welatê ermenan kirine. Ev jî têra xwe balkêş e ku ne Ereb Şemo ne Eliyê Ebdilrehman di romanêن ku li vir tên nirxandin de, qet vê naynêن rojevê. Qasî ku di romanêن wan de xuya dibe, hestêن wan ên netewî nasnameya wan a olî bi temamî nixumandiye. Ji ber ku li ser vê meselê tu belge an nivîsêن wan nînin (an ne li ber destê me ne) em dîtinêن wan ên li ser êzdiyatîyê nizanîn, lê ev eşkere ye ku ew xwe bi nasnameya netewî tarîf dikin. Gelo sedema vê ev bû ku bikaribin di bin nasnameyek netewî de cih bigrin, nasnameya olî li paş dihiştin an di bin sistemek pozitivîst de parastin an vegotina nasnameya olî dijwartir bû ku wek nîşaneyek modernbûnê ew li paş dihiştin? Lê sedem her çi be wan di bin nasnameya netewî de xwestin ku nêzikahiya di navbera xwe (êzidî) û ermenan de ber bi hemû kurdan ve berfirehtir bikin. Yek ji lehengên *Dimdimê* Sîmonê Fileh e. Mîrê Şemzînanê wî ji bo ku hawarê bigihîne, wî wek qasid dişîne Kela Dimdimê. Mîr dema vê daxwaza xwe jê re vedibêje wî wisa îqna dike “Sîmon tu dibînî Rom ci tîne serê me! Wan li Diyarbekirê Fileh û Kurd qir kirin, ew welat zeft kir. Niha jî ji wir de tê (r.131).” An em li gotinêن Xano ku ji Xaçoyê Hostebaşî re dike, binêrin, “...Tu dizanî Kurd û Fileh dostêن hev ên zemanêن kevn in. Kela min jî Xaçparêzan çêkir...” Bi teswîrkirina bajarê Kela Dimdimê re aşitî û aramiya bajêr ku hemû milet dikarin tê de bi rihetî bijîn tê

¹¹⁸ Boyik, h.b., r. 21.

kirpandin. Bi rastî ev kirpandin û dostaniya gelên kurd û filehan, di peywenda nivîsandina vê romanê de dikare wek nîşaneyek tunebûna aşitî, aramî û dostaniyê, bê xwendin. Bi taybetî dikarin wek nîşaneyê pirsgirêkên di navbera kurd û filehan de bêñ xwendin. Nivîskar dîsa bi refleksa perwerdekirina gel midaxeleyî nîqaşêñ di navbera herdu gelan dike û ji wan re rabirdûyek aram ava dike da ku dahatûyek çêtir ava bikin. Heta ku dikare bîranînê nebaş ji nav bîra civakî dineqîne.

Di romana *Dimdimê* de jî, wek romanêni beriya wê ku hatiye qal kirin, tenê dengê vebêjer tê me. Em qet nifûzî derûniya lehengan nabin. Ka dema şervanek diçe hawara mîrektiya Şemzînanê gelo bi çi hestan tevdigere. Xwe çawa îqna dike ku biçe seferek ewqas zor û zehmet. Ew qet xwe bi xwe napeyivin; dengekî wan ê hundirîn nîne? Qet endîşe an teredudêñ wan çenabe? Xanoyê her daîm xwedî feraset qet ji tiştekî aciz nabe, nakeve nav fîkr û ramanan? Bi qewlê Alan¹¹⁹ mirovêñ di kelê de bi mehan dorpeçkirî, bê nan û av dimînin û ji giregiran bigre heta kesêñ ji rêzê hemûyan bi biryarek tund tevdigerin ku kelê teslîm nekin. Lê ka haletîruhê tu kesî bi me xuya nake. Dengekî cuda an derûnî nayê me. Gava ku êdî av naçe kelê, ji eşâ tîbûnê gel mirinê jî li ber çavê xwe radigire û diçin ber çem ku avê vexwin leşkerên Şah tîran bi ser wan de direşînin. Di vê halî de jî nivîskar li hemberî haletîruhê lehengêñ xwe bêdeng dimîne. Ya din, dema êdî tu çareya xilasbûnê namîne, Xano gazî diwanxaneya xwe ku gelek mîrxas jê kêm bûne, dike û ji dêvla ku teslîm bibin û têkevin destê neyaran biryara teqandina kelê distînin. Li sê ciyan barût dîkin binê hîmê kelê û diteqînin; agir bi kelê dikeve û bi rojan dişewite. Ev bobelata mezin tenê bi çend hevokan û wek ku berhemîke dîrokî be bi zimanekî dûz tê vegotin. Ne navêñ wan lehengêñ mîrxas hene, ne hestêñ wan hene.

Li gor vegotina Têmûrê Xelîl¹²⁰ pirtûkxaneya Ereb Şemo pir dewlemend bû. Gava pirtûkek siyasî dixwend û didît ku mileten din çawa serxwebûna xwe bi dest xistine, ew cih bi qelemeke sor nîşan dikir û li ber jî dinivîsî: “Kurd gerekê çav bidine wana”, “Kurd gerekê dostêñ wiha ji xwe re peyda bikin”, “Ji bo kurdan riya tek û tenê ev e...” û yên din. Ne zehmet e ku mirov bibîne Ereb Şemo wek rewşenbîrekî gelê xwe hişê wî bêtir bi siyasetê û pirsgirêkên siyasî tijî bû û serê xwe bi kêmasî û pêdiviyêñ kurdan gelekî êşandibû. Pêşekiya wî ya ewil ew bû bi rêbaza xwe realîzma sosyalîst

¹¹⁹ Alan, h.b., 137.

¹²⁰ Têmûrê Xelîl: “Erebê Şemo, Rûspîtiya Gelê Kurd”, *Kovara W*, hej. 15, r.29-30. Diyarbekir, 2007, r. 30.

hemû aliyêni jiyanê ronî bike, mînakêni baş raxîne ber çavê gel, rêya rast nîşanî wan bide. Romana *Dimdimê* jî perçeyek ji hewldanan ronîkirina dîroka kurda ye.

4. Tosinê Reşîd (1941-)

a.Jiyan û Berhemên Wî

Tosinê Reşîd yek ji wan nivîskaran e ku li derveyî welat jiyanâ xwe derbas kiriye/dike. Di sala 1941ê de li Komara Ermenistana Sowyetê di malbatek êzidî de hatiye dinyayê. Di sala 1959an de li Înstîtûtiya Perwerdeyê, Fakulteya Fîzika Matematîkê dest bi xwendina bilind dike. Di 1975an de dibe doktorê kîmyayê. Bi salan li Zanîngeha Eriwanê mamostetî dike. Di sala 1963an de tevî Gêrgiyê Xudo, Zurbê Emir û Tîtalê Efo yekemîn komeleya kurdî li Yekitiya Sowyetan damezirandiye.

Yekemîn gotara wî di rojnameya *Riya Teze* de di sala 1961ê de çap bûye û paşre helbest û çîrokên wî jî tê de çap bûne. Helbestên wî wek dîwan di sala 1981ê li Berlînê, di sala 2004an de li Hewlîrê, sala 1983 û 1987an de li Eriwanê çap bûne. Li Tiflîsê ji bo şanoya kurdî du pîyesen bi navê *Xecê û Siyamend* û *Tîrêj* nivîsandiye. Di sala 2000î de pirtûka wî ya kurteçîrokan bi navê *Şeva Bê Xew* li Stockholmê hatiye çap kirin. Pirtûkek din a bi navê *Min Bêriya Şevê Spî Kiriye* li Stenbolê û li Duhokê di sala 2005an de, romana wî *Mestûre* jî di heman salê de li Duhokê û di sala 2010an de jî li Diyarbekirê hatiye çap kirin. Ji bo *Mestûreyê* ji aliyê weşanxaneya Arasê hatiye xelat kirin. Lêkolîna wî ya li ser ola êzidiyan *Êzdiyetî, oleke hê jî nenaskirî* di sala 2004an de li Stockholmê,

di sala 2010an de li Diyarbekirê hatiye çap kîrin. Ji sala 1993yan û vir ve li Awustraliyayê dijî.

Tosinê Reşîd wek ku ji jînenîgariya wî xuya dibe tevî jiyana wî li derveyî welat derbas bûye/dibe, cihê çapbûna berhemên wî ji bo nîşaneyâ bênavendîbûna wêjeya kurdî mînakek berbiçav e. Elbet ev bênavendîbûn an bêmekanî mumkin e ku wek hokerek derî-wêjeyî li ser berhemên wî bandor kiribe. Tosinê Reşîd nifşê duyem ê nivîskarêن Qefqasyayê jî temsîl dike. Lê wek yên beriya xwe Ereb Şemo, Heciyê Cindî an Eliyê Evdirrehman jiyana wî hemû di bin rejima Yekitiye Sowyetan de derbas nebûye û ew derfet bi dest xistiye ku berhemên xwe bikaribe li derveyî Ermenistanê çap bike û belav bike.

b. Mestûre

Lehenga *Mestûreyê Mah Şeref Xanim Mestûre Erdelanî* (1805-1848) ya helbestvan û nivîskara kurd e. Mestûre Erdelanî li bajarê Sinê ji dayik bûye û li Silêmaniyê mezin bûye. Ji malbata Erdelan e ku demek dirêj li Sinê desthilatdarî kirine. Wek dîroknasek jina kurd jî tê naskirin. Berhemek wê ya dîrokê ku li ser malbata Erdelanî hatiye nivîsin jî heye. Dîvana wê bi navê *Dîvan-i Masturah Kurdistanî* bi farisî û kurdî ye. Berhema wê ya dîrokî bi navê *Mêjûy Erdelan* (Kronika Doma Ardalan: Tarikh-i Ardalan) bi farisî ye. Di sala 1919an de Nasirxan Azadpûr ew li Sinê çapkiriye. Mamoste Hejar Mukriyanî ew wergerandiye kurdî. Kurdiya wê di sala 2005an de li Hewlîrê ji aliyê Weşanê Arasê hatiye çapkirin. Berhema wê ya sêyem *Ser'iyyat* bi farisî hatiye nivîsandin. Newîd Neqşebendî ew wergerandiye kurdî û bi vî navî di 2005an de li Hewlîrê ji aliyê Weşanê Arasê hatiye çapkirin¹²¹.

Avrom Fleishman dibêje ku nivîskarê romanên dîrokî dîrokê ji nû ve vedibêjin da ku çirokeka ji ya dîroknasan, pêxemberan an hunermendêن din rasttir çêbikin. Çiroka wan ji aliyê vebestîtiya (bağlılık) bi diyarokan (olgular) ve ne ku rasttir e, lê ji aliyê entelektuelî bêtir qebûlbar e; ji ber ku bandora gerdûnî ya perçeyên dîrokî destnîşan dike¹²². Belê di her romaneye dîrokî de bi ihtimaleke mezin ev refleks heye ku Fleishman destnîşan dike. Lê di wêjeya kurdî de romanên dîrokî ne ku bi armanca vegotineke rasttir têن nivîsandin. Ew bi xwe bi armanca vegotina bûyerek dîrokî têن nivîsandin: Bi gotineke din ew bi xwe “dîrok” in. Tosinê Reşîd di hevpeyvîneke xwe de

¹²¹ <https://www.facebook.com/ImcTvDirok/posts/365483053552854>

¹²² Vgz. Köroğlu, h.b., r. 219.

vê armanca xwe wisa tîne ziman: “Min jî xwest romanekê li ser jiyana jineke kurd a ronakbîr, ser mîrgeheke kurdan a bi hêz û li gor dewranê pêşketî, binivîsînim. Wî rûpelê dîroka me, bi rêya wêjeyê bigihînim xwendevanan.”¹²³ Ji ber ku Mestûre Erdelanî ne ku di nav gel de nayê naskirin lê ew di nav xwendevanên kurdî de jî gelekî kêm tê naskirin. Taybetî ji bo Bakurê Kurdistanê em bi rihetî dikarin bibêjin ku tenê ji aliyê kêm kesan bi nav tê naskirin, li bakûr tu berhemên wê yên çapkirî nîn in; heta jînenîgariyek birêkûpêk jî nîne. Lewma Tosinê Reşîd bi heqî romana xwe wek amûra ragihadina rûpeleke dîrokî dibîne.

Tosinê Reşîd di heman hevpeyvînê de vê jî dibêje: “Gelek caran romanên dîrokî ji bo hisênetewî xurt bikin têni nivîsandin”. Ji xwe di romanên heta vêga me nirxandin jî ev refleks her daîm eşkere bû. Ji bo *Mestûreyê* em dikarin li xurtkirina hisênetewî îspatkirina hebûnekê jî zêde bikin. Ji ber ku di hevpeyvîna xwe de wisa didomîne:

Ez li Ermenistane mezin bûme... Gelek ermeniya ji bo gelkujiyê ermeniya yên salêن 1893 û 1915an kurd tawanbar dikirin. Bi giştî ew bawarî serdest bû, wekî kurd koçer in û li pey xwe tu nirxekî çandeyî nehîştine. Tê bîra min yekî nivîsî bû, wekî ‘ew cîhêñ kinîse (dêr) û xwendingehê me lê bûn, niha kurd pezê xwe lê dicêrînin’. Û ev yek ji me gelekan re bibû komplêks. Ji ber vê jî gava min ji Qanatê Kurdo bihîst, wekî nîveka yekemîn ya sedsaliya XIX. de jineke kurd a şâîr û dîroknûs hebûye û di wê dewranê di nav gelên cîran; tirka, ereba, farisa, ermeniya, gurca û azariyan de jinênu usan tune bûne, *per û baskê min şîn bûn*. Min êdî dixwest berhemekê li ser jiyana Mestûrê binvîsim.

Tosinê Reşîd wek nivîskarekî li Ermenistanê mezin bûye û ji nîfşê duyem e û helwesta netewî didomîne, bi romanek xwedî lehengeke jin bersivekê dide iddiayê di derheqê kurdan de. Ev bersiv ne tenê îspatkirina hebûnekê ye; ew bi lehenga jinek kurd a helbestvan û dîroknas hewldaneke îspatkirina şaristaniyê ye jî. Lehenga wî ya jin ew nêrîna romantîk ya di derheqê jinênu kurd de dupat dike. Ew dîtina romantîk ku di vegotina siyasî û dîrokî ya kurdan de tê dubarekirin ew e ku jinênu kurd ji yên cîranênu wan tirk, ereb û farisan her tim azadîtir û bêtir xwedîdesthiltdar bûne. Di civaka kurd de jin gelek caran digel rolênu dayik, hevjînê wek serokeşîr û şervan jî hatine teswîr kirin. Şirovekirin an rexnekirina vê teswîrê di nav sînorênu vê xebatê de cih nagre. Lê tenê em

¹²³ Hevpeyvîna Fatma Savci ya bi Tosinê Reşîd re <http://www.rudaw.net/kurmanci/art/3680.html>. 1 Çileya Paşîn 2012.

guh bidin kurdzana îtalî Mirella Galletî¹²⁴. Li gor wê netewperwerên kurd di belavbûna vê modela jinêñ kurd ku di literatura Rojavayî hatibûn destnîşankirin de tevkarî kirin û li ser manendiyêñ di navbera jinêñ kurd û ewrûpî de sekinîn. Bi saya vê modelê xwestin manendiyêñ mîratgeriya çandî ya di navbera civaka Rojava û kurd de destnîşan bikin û li ser tevgera netewî ya kurd a li Rojava konsensusek berfirehtir bi dest bixin. Ji ber ku rewşenbîrên Rojavayî dema li civakêñ Rojhilatî dinêrin, cihê jinê ya di nav civakê de yek ji pîvanêñ wan ên şaristaniyê ye. Lewma ev ne tesaduffî ye ku ew modela jina kurd a dayik, serokeşîr û şervana azad û xwedî desthilatdar bû xaleke girîng ji bo netewperwerên kurd ku divê bi taybetî bê destnîşan kirin. Ya din di gelek tevgerên netewperwer û modernîst ên li derveyî Rojava meseleya jinan û rola wan a civakî bûye/dibe meseleyek navendî. Tevgera netewperweriya kurd jî ne li derveyî vê helwestê ye.

Heta neha di vegotina dîrokî ya li ser jinan de bêtir qala jinêñ kurd ên azad, serokeşîr, şervan hatine kirin. Lê jinêñ di warê çand û wêjeyê de serkeftî bûne zêde nehatine rojevê. Mestûre ji vî alî ve xwedî cihekî taybet e ku ew ne ku di warê desthilatdariyê an şervaniyê de derketiye pêş. Wê xwe di warê wêje û zanyariyê de îspat kiriye, berhem afirandine û navê wê gihîştiye heta roja me. Ev nirxa wê zêdetir dike. Mirov ew çax bêtir fam dike ka çima per û baskê T. Reşîd şîn bûne. Jineke ku di nîvê yekem a sedsala 19mîn de jiyaye karibûye derkeve derveyî rolêñ ku civakê li wê ferz kiriye û bibe helbestvan, dîroknas û xwendinhez. Jineke wisa di heman demê de wek nîşaneyek tolerekirina civakê tê dîtin. Ew hemû civakê temsîl neke jî, tevî jiyana di quesra Erdelaniyan, temsîleke baş a awayê jiyana arîstokrasiya kurd e. Bi gotineke din bersivek e ji bo vegotina di derheqê kurdan de ku gelek kurd jî di vê baweriyê de ne, ku kurd ne bajarî ne, koçer in, çanda wan bêtir devkî ye û di dîroka civakî ya kurdan de cihekî girîng ê nivîsê nîne: Ü lehengê ku kurdê bajarî, aristokrat, xwendin û nivîshêz temsîl dike, ne mîr e jî, jin e.

Romana *Mestûreyê* ji romanên din ên ku heta vêga em li ser sekinîne, ya herî bêtir li ser derûniya lehengêñ xwe hûr bûye û hewldaye yek yek wan ji aliyê derûniya wan bi xwendevan bide naskirin. Serleheng Mestûre bi xwe, mîrê wê Xosro Xan, bavê Xosro Xan Emanallah Xan, Husêñ Qulî Xan ê evindarê wê yê yekem bi teswîrên derûnî

¹²⁴ Mirella Galleti, “Kürt Toplumunda Kadınların Rolü Üzerine Batılı Tasvirler,” di nav Shahrzad Mojab, 2005, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, de, wer. F. Adsay, E. Uşaklı, S. Kılıç. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, r. 290.

di hişê xwendevan de dikare wek şexsên rasteqîn cih bigrin. Bi saya vebêjer xwendevan dikare dengê lehengan ên hundirîn bibihîzin û bêyî ku bên îdealîzekirin dinyaya wan a herî şexsî tevî kîmasî an zeafêن wan texeyul bikin. Ya din, di dewreke dîrokî de li gor şert û mercan teswîrêن şiklgirtina lehengan yek aliyê romanê yê xurt e. Di tevahiya romanê de tenê qewimandinêن bûyeran bi serê xwe dernakevin pêş û lehengan di bin siya xwe de nahêlin. An leheng tenê bi kirinêن xwe dernakevin pêş, ew gelek caran bi serê xwe tenê dimînin û em li wan guhdarî dikan.

Tosinê Reşîd wek nivîskarêن kurd ên Qafqasî ji êzdiyatîyê dûr nesekiniye û wek nîşaneyâ berdewamî an kûrahiyekê dîroka ola êzdiyatîyê bi bîr dixe. Lê dîsa jî êzdiyatîyê binav nake; wek rojperestiyê binav dike:

Bi sazbendiyê derketina rojê silav dikirin û bi sazbendiyê roj verê dikirin... Ev kevneşopî hê berî dewrana îslamiyetê li bal kurdan, li bal bapîrêن kurdan, medan hebûye. Ew ji dewrana perestina rojê dihat, ji wê dewrana gava ku kurd gişk rojperest bûn (r.9).

Ji ber ku em dizanin T. Reşîd kitêbek bi navê *Êzdiyetî, oleke hê jî nenaskirî* nivîsandiye, em fam dikan ku ew qala êzdiyatîyê dike. Berovajiya Ereb Şemo û Eliyê Ebdilrehman bibîrxistina êzdiyatîyê ji aliyê nivîskar dikare wek nîşaneyek peywenda dewra wî bê xwendin. Reşîd wek nivîskarekî vê dewrê êdî xwe mecbûr nabîne ku cudatiya xwe ya dînî dayne aliyekî û bi pirraniyê re bibe yek. Wek netewperwerekî kurd dixwaze tevî vê cudatiya xwe wek perçeyek ji vê netewê bê naskirin. Ji xwe ev li dor sî salêن dawî ye ku ji aliyê rewşenbîrekî eşkerekirina bawerîyan wek nîşaneyek paşverûtiyê nayê dîtin û xwe îfadekirina bi rêya nasnameyêن olî, tevî yênetewî, hê bêtir qebûlbar e.

Mestûre, meseleya jinan jî bêyî ku têkeve dafika romantîzm an îdealîzekirinê, di dewreke dîrokî de bi awayekî realîst bi cih dike. Her çiqas têkiliya Mah Şeref Xanimê û bavê wê ya gelek nêz û bi hevaltî, wek têkiliyek derveyî dewra xwe xuya bike jî mirov dikare vê ku ew yek ewlada bavê xwe ye û qet birayê wê jî nîne, girê bide. Digel vê bavê wê Ebûl Hesen Beg cihê jinan a di nav civakê de wisa teswîr dike:

...di vê dinyayê de, Xwedê xera bike, ciyê her yekî ji berê de kifşkiriye. Tu baş î, ne baş î, tu jîr û zîrek î, yan nezanî... gişk yek in. Eger tu bixwazî li gor zanebûn an zîrekiya xwe lingêن xwe bavêjî... dinya wê gişk wê ji te re bibe dijmin... tu çiqasî jîr û zîrek bî, tu nikarî ji wî sînorê derkevî. Û ew sînor gelekî ji sînorênen kur'an tengtir e (r.13).

Lê Mah Şeref Xanimê di nav derdora xwe de ew jin bû ku dîsa jî ev sînorêng teng têra xwe fireh kiribû û nivîsandina dîroka malbata xwe ji xwe re wek peywrekê didît ku tiştekî ne ji jinan dihate hêvikirin û ne wek karê wan dihate dîtin. Mah Şeref Xanimê wek jinek zanyar, afirîner, xwedî berhem û wek qadeke marjînal bi dîrokê re eleqedar bûye, ji bo jinêng sedsala 21. û sazkirina nasnameyek zayendî wek modelekê hatiye pêşkeşkirin.

Di romanê de mijarekî ku nivîskar xwestiye herî zêde li ser bisekine şerên navxweyî û bêtifaqî, şerên Îran û Romê yên li ser axa kurdan e. Di vegotinêng bi hûrgilî yên şerên desthilatdariyê yên di navbera mîrgehan de, di navbera birayan de, ap û biraziyan de, heta di navbera bav û kur de û ya xirabtir, di van şeran de alikariya Şahê Îranê ku şeran xurttir dike, de ew perspektîf an pirsgirêkên îroyîn xuya dike. Malbata Erdelaniyan ji dêvla ku li axa xwe xwedî derkevin nehêlin Îran û dewleta Osmanî têkevin welatê wan û hêzên xwe bikin yek, ew bi alikariya Şahê Îranê ji bo desthilatdariya şexsî hevdû qir dikin û dawiya xwe tînin. Xwendina teswîrêng şerên navxweyî gelek caran şerên navxweyî yên di demeke nêz de an perçebûna siyaseta îroyîn tîne bîra xwendevan û dike ev wek berdewamiya şerên wê demê bêng şîrovekirin, wek ku tiştek zêde nehatibe guhertin û hesteke xurt bi xwendevan re çêdiye ku divê êdî ji bêtifaqî û şerên navxweyî ders bê girtin, ev berdawamî qut bibe û rê li ber vê qederê bê girtin. Bi gotineke din ew teswîrêng dûr û dirêj ên şerên di navbera bav û kur, di navbera birayan de, di navbera ap û biraziyan de an di navbera mîrektiyan de tevî daxwaza nivîskar a rexnekirina siyaseta rabirdûyê, çêkirina bîrek civakî ku bikaribe bi vê danehevê (birikim) midaxeleyî siyaseta îroyîn bike bi hêsanî xuya dike.

Sedema ku nivîskar giraniyê dide ser bêtifaqiyê û şerên navxweyî, daxwazek îroyîn a avakirina dewletek serbixwe ye. Ev wek kîmasiyekê tê dîtin û rewşa mîrektiyan dewra sedsala 19mîn wek yek sedem tê destnîşan kirin. Mesele ev e ku wek pirsgirêkek dîroknasiya netewperwer tê ji bîr kirin ku netew û helwesta netewî bi xwe têgeh an rewseke modern e û yekgirtiya netewî jê re dînamîzmek hundirîn an şert û mercêng civakî, çandî, siyâsî û aborî lazim e. Ev ne girêdayî şexsiyata serokeşiran an niyeta mîrektiyan e. Heta ku dînamîzmek civakî, siyâsî, çandî an aborî nîn be, eşîr an mîrektî wê dewreke pre-modern de li gor berjewendiyêng xwe tevbigerin. Ji ber ku ew hestêng netewî ku bi milyonan mirov li dorê dicivin û hemû berjewendî û aîdiyetêng xwe yên malbatî, eşirtî, şexsî û komî li aliye kî datînin di wê dewrê de di nav kurdan de tiştekî nedîtî ye, ne tenê di siyasetê de di çanda civakê de jî bi qasî em dizanin tu nîşane hê nînin. Di dîroka netewperweriyê de tevî dînamîzma civakî, rewşenbîren wê civakê hene

ku vê fikrê di nav civakê de diparêzên û ew bîra civakî, aîdiyetên netewî, çandek netewî hwd. belav dikan û netewê saz dikan. Yek ji nîşaneyên dînamîk an ramanê netewî, roman tê destnîşan kirin. Rola romanê ya giranbiha di şêwandin û sazkirina karakterên netewan de bi awayekî berfirehî tê qebûl kirin. Ahmadzade¹²⁵ ji Anderson neqil dike ku honak, wek alametî farîqeya netewên modern, bi bêdengî û bi berdewamî dinizile nav rastiyê û wê dide şêwandin. Huxley hê jî wêdetir diçe; bi gotina wî romanûs û helbestvan “bi piranî” îcatkerên netewê xwe ne¹²⁶. Ew bi naveroka berhemên xwe netewê teşwîq dikan, didin şêwandin, meşrû dikan an mantiqekê didin wê.

Di wê dewrê de ku di *Mestûreyê* de mevzûbehîs e, ew peywenda ku tê de roman bê nivîsandin qet nîne. Jê re hê sed sal divê. Elbet hebûn an tinebûna romanê wek şertê tekane nikare bê qebûl kirin an em nikarin bêjin ku beriya romana kurdî netewperweriya kurdî nîne. Lê di helbestê de jî hê piştî têkçûna Mîr Bedirxan (1806-1869) em nîşaneyên netewperweriya kurdî di risteyên Hecî Qadirê Koyî (1815-1897) de dibînin. Li vir ne mumkin e ku Ehmedê Xanî neyê bibîranîn. Ehmedê Xanî di dawiya sedsala hivdemîn û destpêka sedsala hîjdemîn de pêdiviya tifaqa kurdan, girîngiya zimanê kurdî ku ji aliyê gelek kesan wek dîtinê pêşeng ên netewperweriya kurdî tê qebûl kirin, di dîbaçeya *Mem û Zînê* de anîbû ziman. Lê berdewamî nîne. Heta Hecî Qadirê Koyî -bi awayekî nivîskî- em nabînin ku dibaçeya *Mem û Zînê* bala tu kesî kişandiye û piştgiriya fîkr û ramanê Xanî hatiye kirin an hatiye belav kirin. Em werin ser kovar û rojnameyan ku di dîroka netewperweriya kurdî de bûne amûrek girîng, divê em li bendî sala 1898an bin. Li gor cîranêن xwe derengmayina kurdan a di vî warî de ji vê beramberkirinê xuya dibe: Rojnameya erebî ya yekem di sala 1828an de, ya tirkî di sala 1832an de û ya farisî di sala 1848an de derketiye¹²⁷.

Di *Mestûreyê* de tevî ku di wê dewrê de peywendeke muxayileya netewî nîne, hewldana avakirina dewleta Kurdistanê û yekitiya kurdan heye. Di sala 1821ê de Bedirxan Beg dibe mîrê mîrgeha Botanê. Împeretoriya Osmanî di vê demê de hêza wê sist bûye û Mîr Bedirxan dixwaze vê derfetê bikar bîne, bi rêya avakirina serxwebûna Kurdistanê ji bin darê Osmaniyan derkeve. Ji bo avakirina dewleteke serbixwe divê ewilî yekitiya kurdan pêk bîne. Waliyê Kurdistana Sinê Xosro Xan, Mîrê Hekariyan,

¹²⁵ Ahmadzade, *Ulus ve Roman*, r. 22.

¹²⁶ Nql. Ahmadzade, h.b., r. 22.

¹²⁷ Amir Hasanzade, *Kurdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, wer. İ. Bingöl. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005, r. 345.

Fermandarê Wanê Mehmûd Xan, Fermandarê Mûşê, Hîzanê û Qersê li Cizîrê dicivîne. Di civînê de biryara avakirina Kurdistana serbixwe tê girtin. Pişti avakirina Kurdistana serbixwe kî wê hikumdariya kîjan perçeyî bike, biryar ji bo vê jî tê girtin. Li gor biryara ‘yekitiya pîroz’ li ser amadekariya şer jî biryar tê girtin: wek avakirin û nûjenkirina kelehan, peydekirina cebirxaneyan, çêkirina top, tiving, şer û mertalan, ji bo fêrbûna hostatiya eskeriyê şandina xortan bo Ewrupayê (r.174-192).

Ev tevgera Mîr Bedirxan ne wek ku nêzî du sed sal berê pêk hatibe, lê wek ku îro pêk bê hatiye vegotin. Wek Mîr Bedirxan ne mîrek be lê wek pêşengetê netewî ku bi hest û baweriyê îro tevbigere hatiye teswîr kirin. Mîrên kurdan di wê demê de ji hemû aîdiyet û berjewendiyê xwe yên feodalî rizgar bûne û li ser dewletek serbixwe difikirin, dixebeitin. Aîdiyetê xwe yên olî jî danîne aliyekî. Hemû kurdêñ di bin darê Êran û Osmaniyan de dikarin bi yek armancê bibin yekpare û bêñ ba hevdû. Bi gotina Mîr Bedirxan “Divêt em berjewendiya Kurdistanê di ser kesîtiya xwe re bigirin, di ser berjewendiya malbatêñ xwe re bigirin (r. 189).” Helwesta netewî ku bi perspektifa îroyîn li rabirdûyê dinêrin û netewê di kurahiya dîrokê de jî -wek ya îro, hê îro jî çiqas yekpare ye ew jî biguman e- wek yekpare be tesewir dike, di romana T. Reşîd de serdest e û anakronîk xuya dike.

Siyaseta Siltanê Osmanî Mehmûdê II. ya navendîbûnê ku destpêka modernîzasyona împeretoriyê tê qebûl kirin, armanc dikir hemû mirektiyan ji hêz bixe û navenda xwe xurt bike. Em dikarin serhildana Mîr Bedirxan, wek mîrekî xwedîhêz, bertekke li dijî vê siyasetê binirxînin. Ji ber sedemêñ ku li gor hat qal kirin ji hestêñ netewî bêtir armanca berfirehkirina qada hukimdariyê, li dijî împeretoriyê mezinkirina hêza mîrektiyê rol leyistiye. Bi gotineke din çîma aktorêñ serhildanê kurd in, zehmet e ku mirov wê wek serhildanek netewî binirxîne. Ji xwe di romanê de peyva *welat* di wateya axa ku netewek -an miletek- li ser dijî hatiye bikaranîn. Tê zanîn ku heta serdema modern *welat* tenê cihê jidayikbûnê nîşan dide, ne ku axa netewek li ser dijî û bi hestêñ siyasî bi wê ve girêdayî ne¹²⁸. Zêde ihtimal nîne ku di dema Mîr Bedirxan de bi peyva *welat* hemû axa ku kurd li ser dijîn hatibe qest kirin.

Mîr Bedirxan di nav axaftina xwe ya ji mîrên din ên kurd re wisa dibêje “Ta kîngê destê Osmaniyan û eceman wê li ser serê me bin. Ev mîr û xanêñ li vir rûniştî, her yek hêja ye bibe padişahê Kurdistanê, ji bo çi gerek em *di bin destêñ biyaniyan* de

¹²⁸ Afsane Najmabadi, “Sevgili ve Ana Olarak Erotik Vatan: Sevmek, Sahiplenmek, Korumak,” di nav, Aysegul Altınay: (ed.), *Vatan, Millet, Kadınlar*, de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2004, r. 134.

bimînin (r.187)." Li vir bikaranîna peyva *biyanî* gelek balkêş e ku ev cudabûna di nav civaka împeretoriyê de li ser hîmê etnîkî an netewî dide rûniştandin. Rast e, ev dewr dewra serhildana gelên balkanî ne. Gelê yewnan serbixwebûna xwe ûlan kirine. Cûdabûna etnîkî êdî ketiye nav Împeretoriya Osmanî, lê tê zanîn ku di sistema osmaniyan de civak ne li ser himêñ etnikî lê li ser hîmêñ olî ji hevdû cuda dibûn. Lewma ji ber hin sedemêñ din jî hestêñ netewî ewilî di nav xeyrî-musliman dest pê kir. Belavbûna hestêñ netewî ya di nav gelên ne-tirk û misilman de hê derengtir e. Ev teqabilî nîvê duyem ê sedsala 19mîn dike. Bi gotineke din, di dewra Mîr Bedirxan de di nav gelên misilmanan de –di nav kurdan de- naveroka peyva *biyanî* bi awayekî sosyolojîk divê bi ewqas zelalî nikaribe li ser hîmêñ etnîkî ava bibe.

Di vê romanê de, bi saya Mestûre Xanimê, bi giştî rismê civakeke ku nivîskar texeyul dike an daxwaz dike li hemberî me ye. Wek jineke marjînal, jiyana Mestûre Xanimê jî nîqaşan li ber rolêñ zayendî yên civakî vedike. Nivîskarî an dîroknaşî, digel ku her tim wek karêñ mîran hatine qebûlkirin êdî bûne/karibûye bibe karê jinekê. Bi qasî ku tê zanîn li Rojhilata Navîn ew yekem jina dîroknaş, dikare ji bo jinêñ kurd ên îro bibe dîrokek îlhamdar. Li gor texeyula civakî a nivîskar elbet ev jina kurd ku ji bendêñ xwe yên civakî rizgar bûye, divê endamêñ civakek serbixwe bin. Nivîskar meseleyêñ jinanî û netewî qet ji hev dûr nexistiye. Ev her du mijar wek rikberêñ hevdu ku her tim di pêşbaziyê de bin, di romanê de nehatine bicihkirin. Ev civaka azad û serbixwe ku jinêñ wê tê de dikaribe azad be, tenê bi tifaq û yekitiyê gengaz e. Astengiya herî mezin ên li pêş serxwebûna welêt jî û jinan jî, ev in.

5. Mehmed Uzun (1953-2007)

a. Jiyán û Berhemên wî

Serpêhatiya nivîskariya Mehmed Uzun ê ku di sala 1953yan de li Siweregê hatiye dinyayê, li diyasporayê, li Swêdê dest pê kiriye. Ji 1977an ve, heta bi meha tebaxê a 2006an ku vegeriya welêt li Swêdê jîyaye.

Nivîskarekî pirziman, pirçand e, xebatêñ wî bi kurdî, tirkî û swêdî ne, bi van zimanan berhemên edebî afirandine. Salêñ dûdirêj endametiya lijneya Yekitiya Nivîskarêñ Swêdê kiriye. Di kulûba PEN a Swêdê û ya navnetewî de, bi awayekî çalak xebitiye. Endamê Yekîtiya Rojnamegerêñ Swêdê û Cîhanê bû. Nivîsêñ wê yên pexşanî jî, di kovar û rojnameyêñ cihê de, nêzî bîst zimanan hatine weşandin.

Ji ber romana xwe ya bi navê, “Ronî Mîna Evînê-Tarî Mîna Mirinê” û kitêba pexşanî “Nar Çiçekleri” di bihara 2001ê de hate darizandin, lê berat kir. Heman salê, Yekitiya Weşangerêñ Tirkiyê, xelata ku her sal dida, ya bi navê “Xelata Îfadekirina

Raman” û ji ber ked û xebata wî ya pêşvebirina romanê, Enstîtuya Kurdî Ya Berlînê, “Xelata Edebiyatê” danê. Ji ber helwesta wî ya di warê azadiya edebiyat û gotinê, wî xelata herî girîng a Skandînavyyayê “Torgny Segerstedt” a bi navê “Xelata Pênuşa Azadiyê” û di sala 2002yan de, ji bo keda ku di ber çanda Swêdî de daye, xelata Akademiya Swêdê ya bi navê “Xelata Erik Lundeberg” wergirt. Di sala 2005an de xelata rûmetê a Herêma Kurdistana Iraqê û xelata rûmetê a Şaredariya Diyarbekirê wergirt.

Tevî zimanê kurdî bi zimanê tirkî û swedî jî nivîsandiye. Bi kurdî heft roman nivîsandiye: *Tu*, 1985; *Mirina Kaleki Rind*, 1987; *Siya Evînê*, 1989; *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, 1991; *Bîra Qederê*, 1995; *Ronî Mîna Evînê-Tarî Mîna Mirinê*, 1998; *Hawara Dicleyê*, 2002. Berhemên wî yên ji bilî romanen ev in: *Destpêka Edebiyata Kurdî* (lêkolîn) 1992; *Hêz û Bedewiya Pênuşê* (ceribandin), 1993; *Världen i Sverige* (Antolojiya Edebiyatê, tevî M. Grive), 1995; *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, II Cild, 1995, *Nar Çiçekleri* (ceribandin), 1996; *Ziman û Raman*, Hevpeyyîn, 1997; *Dêngbêjlerim* (ceribandin), 1998; *Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözçükler* (ceribandin), 1992; *Mirina Egîdekî* (destan-zêmar), 1993; *Ruhun Gökkuşağı* (Keskesora Ruh-vebêj), 2005; *Küllerinden Doğan Dil ve Roman* (Ziman û Romana Nûvejiyayî-Hevpeyyîn)¹²⁹.

Ji heft romanen wî sê yên dîrokî ne. Du ji van *Siya Evînê* û *Bîra Qederê* romanen biyografîk in; her yek li ser jiyana kesekî ava bûne. Ji ber ku herdû jî bi heman endîşe an armancê hatine nivîsandin, lehengên wan jî hevçax in û ji aliyê vegotinê jî dişibin hevdû, ew ê bi hevdû re bêñ nirxandin. Ji aliyê naverokê ve di navbera herdû romanen de hin cudatiyêñ ku, bi taybetî yên *Bîra Qederê*, hene wê cihê bêñ nirxandin.

b. Siya Evînê û Bîra Qederê

Siya Evînê ku lehengê wê Memdûh Selîm Beg e, dikare wek vegotineke li ser hevbandoriya di navbera civak û takekes de bê xwendin. Memdûh Selîm Beg yek ji wan rewşenbîrêñ kurd e ku serpêhatiya wî ya siyasî di destpêka sedsala 20mîn de li Stenbolê dest pê dike. În ku helwesta xwe ya mixalif didomînin her yek bi deverekekê ve belav dibin û bêyî bigêhînin armanca xwe jiyanek nîvcomayî didomînin. Lewra em dikarin bêjin Siya Evînê minakek ji piraniya rewşenbîrêñ dewra xwe ye. Bi awayekî giştî ev rewşenbîrêñ kurd ji wan nifşen destpêkê ne ku di dibistanêñ modern ên li Stenbolê xwendine. Tevlî jiyana çandî û entelektuelî bûne; ji çand û siyaset û qewimandinêñ

¹²⁹ Ji destpêka vê kitêbê ku ji aliyê weşanxaneyê hatiye nivîsandin hatiye veguhêztin: Mehmet Uzun, *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*. Bütün Yapıtları-Söylesi, Weşanen İthakî, İstanbul, 2008.

dinyayê haydar in. Di nav wan qewimandin û guherînên mezin de rewşenbîrên kurd jî di nav hişyarbûnekê de ne û bi xebatêne komeleyî, partiyî û kovarî li ser navê kurdan dixwazin gotina xwe bêjin û bibin aktor. Lê piştî damezirandina komara Tirkiyeyê ji xeynî tirkan tu derfeta miletêne din nema ku li ser navê miletê xwe bipeyivin, li mafêne xwe xwedî derkevin an bibin aktor. Wek rewşenbîrekî kurd Memdûh Selîm Beg jî di nav sînorêne komara Tirkiyê de derfetêne wî namîne ku xwe bigêhîne armanca xwe û di ser de jî tê nefî kirin. Jiyana xwe li Antaqiyayê ku bajarê Suriyê di bin hakimiyeta fransiyen de ye, didomîne. Li vir ew dil dikeve keçeve çerkez û li welatê xeribiyê evîn ji wî re dibe stargehekê û wateyekê dide jiyana wî; piştî têkçûneke siyasî, evîn wî careke din bi jiyane ve girê dide. Bê teredûd biryara zewacê dide û pê re dergîstî dibe, lê di heman demê de yek ji damezrênerên partiya Xoybûnê ye û wek nûnerê partiyê ji bo serhildana Agiriyê tê peywirdar kirin. Digel ku bi dergistî ye û divê di demeke nêz de bizewice jî, berpirsiyariya xwe ya siyasî derdixe pêş; çûyina ji bo serhildanê tercîh dike û diçe. Vegera wî, li gor hesabê wî gelekî dereng dikeve. Heta ku vedigere dergistiya wî bi yekî din re zewiciye. Ji xwe serhildan jî têk diçe. Di jiyana wî de bi derbekê du têkçûnen xedar pêk têne: Ya evînî û ya siyasî. Du tişte ku ew bi jiyane ve girê didan bi carekê ve ji jiyana wî derdikevin.

Romana Uzun ya duyem a dîrokî *Bîra Qederê* ye. Lehengê wê Celadet Elî Bedirxan ê neviyê Mîr Bedirxan e. Ew jî hevçaxê Memdûh Selîm Beg e û jiyana wî li Stenbolê dest pê kiriye. Di sala 1922yan de ew û birayê xwe Kamiran Elî Bedirxan mecbûr dimînin ku biçin Almanyayê. Lê ew jî divê evîna xwe li dû xwe bihêle û biçe. Li Almanyayê di nav şert û mercen pir dijwar de xwendina xwe didomîne û di sala 1925an de ji wê derê jî diçe Qahireyê. Îdî nikare vegere ne Stenbolê ne jî Kurdistanê. Paşre diçe li Surî li Şamê bicih dibe. Tevî kurdêne nefikirî yên li Surî, Lubnan û Iraqê di damezrandina partiya Xoybûnê de cih digre. Partî ji bo hemûyan dibe çirûska hebûn û rabûnê; bûye stêrka şevêne reş, hêviya heyamên tarî (r.204). lê ev hêvî zêde nadome. Ew jî diqurmiçe. Serhildana Agiriyê ku pêşengiya wê partiya Xoybûnê dike, di sala 1930an de têk diçe. Piştî ku li komara nû ya Tirkiyê de ji bo kurdan tu derfetêne xwe-îfadekirinê namîne û serhildanê li dijî rejima nû jî, wek serhildanê Şêx Seîd û Agiriyê, têk diçin û dema guherandinê mezin çûye, dem dema xwecihgirtina rejimên nû ne. Di siyasetê de ji bo kurdan qada manevrayê jî nemaye, komara Tirkiyê û dewletêne kolonyal ên li herêmê berjewendiyêne xwe êdî kirine yek.

Di sala 1932an de Celadet hêviya xwe êdî di nivîsandinê de dibîne. Biryar dide, binivîsîne. Dilê wî heye kovareke kurdî derxîne. Dîsa li Şamê civata kurdî ya rewşenbîr

û têkoşeran li xwe dicivîne. Ew Haco Axa û sê kurên xwe, Ekrem û Cemîl Begên Cemîlpaşa, Elî Axayê Zilfo, Bozan Begê Şahîn, Osman Sebrî, Memdûh Selîm Beg, Hemze Begê Muksî û hîn çend kesên din in (r.231). Îdî hebûna xwe û gelê xwe di nivîsandin û xebatên çandî de dibînin. Derman berhem, û eser, afîrîn û avahî bûn (r.232).

Piştî salan li Şamê bi dotmama xwe Rewşen Xanimê re dizewice. Ji aliyê aborî ve bi zehmetiyan re rû bi rû dimîne. Kar û barê çandî ku xwedî misyoneke giran in û debara malbatekê, barê jiyanê li wî giran dikin. Celadet Elî Bedirxan neviyê Mîr Bedirxan dest bi çandiniya pembo dike. Di sala 1951an de dema ji bo avderxistinê li ser bîrekê dixebite dikeve bîrê û dawî li jiyana wî û li romanê tê.

Bîra Qederê û *Siya Evînê* du romanên Uzun in ku bi endîşeya jibîrbûyina du lehengên girîng ên dewrekê û bi armanca çêkirina bîra civakî û dîrokî hatine nivîsandin. Uzun wek kurdekî bakurî encax li diasporayê derfeta xwendin û nivîsandina kurdî bi dest xistiye. Bêyî ku bi zimanê kurdî perwerde bibe, piştî temenê xwe yî bistî bi kurdî roman nivîsandiye. Digel ku beriya Uzun jî romanûsên kurdî hebûn, em dikarin bibêjin ku kurdêñ bakur romana kurdî bi yên wî nas kirin û xwendin. Salêñ 1980 û 1990an ew sal in ku kurdêñ bakurî bi awayekî girseyî meseleya xwedî derketina zimanê kurdî û tesewira nasnameyî ketiye rojeva wan a çandî û siyasî. Bi gotineke din romanên Uzun vê tespîta Ömer Türkeş bi heq dike. “Romana kurdî di pey lêxwedîderketina kurdan a nasnameya xwe ya çandî dest pê dike.”¹³⁰ Uzun di hevpeyvîneke xwe de dibêje “Ji bo çêbûna hişmendiyeye netewî roman dikare roleke girîng bileyize. Dibe ku kurd ne yakpare bin, lê di ziman de dikarin bibin yekpare.”¹³¹ Ü di sazkirina nasnameyek netewî de rola romanê tîne ziman. Bi taybetî *Siya Evînê* û *Bîra Qederê* de Uzun, wek amûrêñ texeyulkirin û zindîkirina bîra civakî ya netewê kurd, di dîroka wêjeya kurdî de wê her tim xwedî ciyekî girîng be.

Di romanûsiya Uzun de dîrok bi xwe meseleyek her tim li pêş e û di nivîskariya wî de bûye motivasyoneke girîng. Beriya ku di nivîskariya xwe de girîngiya dîrokê bîne ziman balê dikşîne ser pêwendiya di navbera dîrok û honakê, ji bo wêjeyek hêja xurtbûna honakê wek şert datîne. Lê ew bi xwe jî destnîşan dike ku endîşeyek wî heye ku bi rêya wêjeyê bi xendevanêñ xwe dîrokê bide fîrkirin û azmûnêñ dîrokî neqil

¹³⁰Ömer Türkeş, “Zimanek Dîroka Wêjeya Wî Zimanî Ye”, wer. Z. Yaş. Kovara W, hej.13, r. 57-60, Diyarbekir, 2007.

¹³¹ Mehmed Uzun, *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, İthaki Yayınları, Stenbol, 2008, r. 262.

bike¹³². Ev pir pêwîst e, ji ber ku tiştê mirovan ji heywanan cuda dike, bi şertê ku mirov lê tesîr bike, dîrok e. Dîrok diho, îro û sibe ye. Yanê rabirdû, niha û paşeroj e. Hêza pêkanîn û afirandinê dide mirov. Li rabirdû xwedî derketin, pêşketin, nûkirin, çêtirkirin bi dîrokê mimkun e¹³³. Ewqas ku tevgerek rewşenbîrî ku bi dîroka xwe nizanibe, wê li gor xwe şîrove nekiribe tu şensa wê ya serkeftinê nîn e¹³⁴.

Lewma pêwîst e azmûnên Memdûh Selîm Beg û Celadet Elî Bedirxan divê bê vegotin. Ew ku qet neketine nava kitêbên dîrokê, jiyana wan nehatiye vekolandin û li ber jibîrbûyinê ne. Herdu roman serpêhatiyêن wan ên trajîk, lê ewqas jî mînakêن pêşeng ên ronakbîriya kurdan, vedibêjin. Di jiyana xwe de, digel hemû hewldanêن xwe tenê bi tekçûn û hêvîşikestinan re rûbirû mane. Qene ji aliyê nifşen nû divê bêن nas kirin. Tevî bibîrxistinê jiyana van lehengan, ev roman ji nifşen nû re ku di dema wan de jî xebatêن jidil û îdealîst pêwîst e, dikare bibe model. Taybetî xebatêن wan ên çandî ku ji bo pêşketina ziman û wêjeya kurdî re bûne dibistan, rê û rîbazek din an tekoşîna netewî dest nîşan dikan. Di tesewirkirina netewekê de dîroknûsî çiqas xwedî rolek mezin be, romanêن ku bikaribin wê dîrokê populer bikin jî pêwîst e.¹³⁵ Ev herdu roman ji vî alî jî giring in, ji ber ku di nasandina Memdûh Selîm Beg û Celadet E. Bedirxan de cihê wan nikare bê înkarkirin.

Di herdu romanen de binê mehzena çandî ya herdu lehengan tê xêz kirin. “Di çentê Memdûh Selîm Beg de Ehmedê Xanî, Firdewsî, Omer Xayam, Fayette, Rousseau, Shakespeare, Voltaire, yanê Rojhilat û Rojava” bi hev re ne (r.33). Frengîya Bedirxan, zanebûna wî li ser çanda Ewropî, lê zanebûna wî ya li ser çanda gelêrî a kurdî û çanda Rojhilatî jî tê binxêzkirin. “... ji tiştêن ku Celadet Elî Bedirxan, şagirtê gotinêن Xeyam, Xanî û Ovidius, hevalbendê gotinêن Goethe, Lamartine û Baudelaire dikir ev bû...”(r.224). Hezkirina Rojhilat û Rojava di warê muzikê de jî derdikeve pêş:

Her çend stran û destanêن kevn kêfxweşî didin Memdûh Selîm Beg, ewçend jî musîka nûjen kêfxweşî didiyê. Bi qasî destana Binevşa Narîn, mûzika Yvette Gilberts û Eric Satie jî dilê wî bi firê dixe. Ew ji dengê vî dengbêjê kal jî hez dike, ji dengê kemança Xezalê jî. Li gora wî, stranêن eşîran û mûzika salonan hevûdu temam dikan. Ew mîna hev in û herdu jî kêfxweşiyê didin (r.159-160).

¹³² H.b., 112.

¹³³ Mehmed Uzun, *Siya Evînê*, ç. 1, İthaki Yayıncılı, İstanbul, 2011, r. 151.

¹³⁴ Vgz. Türkçe, *Romana Yazılan Tarih*, r. 142.

¹³⁵ H.b., 141.

Di romana *Hawara Dicleyê* de jî em ê bibînin ku di romanên Uzun de binxêzkirina çeşîtdariyê pir berbiçav e. Ev ji teswîrên mehzenên çandî yên lehengan bêtir, wek encama perpesktîfa îroyîn dikare bê şîrovekirin. Uzun, wek nivîskarekî ku bi salên dirêj li Rojava, Swêdê jiyaye û tekamûla xwe ya çandî, siyasî li wê derê temam kiriye, gelekî di bin bandora çanda wê de, bi taybetî pirçandîtî û çeşîtdariyê de, maye. Lê ew refleks pê re çêbûye ku ji aliyekî nedûrketina xwe ya ji çanda Rojhilat nîşan bide û li aliyekî din pêwistiya hûrmetkirina li hemberî çandên cûda û çeşîtdariyê wek modeleke rewşenbîriya îroyîn pêşniyar bike. Dibe ku di rastiyê de jî herdû leheng xwedî hişmendiyek senteza rojava û rojhilat be lê dîsa jî ev binxêzkirin ne tenê tespîtek aîdî wê dewrê ye. Ew bêtir vegotinek normatif e û ji bo nasnameya entelektuelî ya siyasetmedar û rewşenbîran modeleke îroyîn e. Îcar Uzun di romanên xwe de vê modela îroyîn dixwaze di dîrokê de jî piştrast bike. Ya din, dibe ku ev helwesta Uzun tenê wek nîşaneyek daxwaza qebûlkirina wî ya wek nivîskarekî “gerdûnî” bê şîrove kirin. Ya na di ev teswîrên ku li jor hate neqil kirin de, nivîskar rave nake ku ew nivîskar û mûzikvanê Rojhilatî û Rojavayî çawa têna ba hevdû, hemanên wan ên hevpar ci ne, di xwendevan an guhdarvanê xwe de kîjan hestan hişyar dikan, lehengên wî çima ji herduyan jî hez dikan. Nivîskar/vebêjer tenê dîtina lehengên xwe dibêje û vedikişe, hewl nade ku xwendevan îqna bike, bi ravekirin an teswîrên kûr bike an ew nivîskar û mûzikvanan bi xwendevanê xwe jî bide hez kirin, di wan de meraqekê çêbike. Bi pêşqebûleke ku xwendevan jî hemû navan baş nas dikan û bi mezînbûn an bi girîngiya wan hem fikir bin tevdigere.

Bîra Qederê û *Siya Evînê*, ev herdû romanên ku li pey bîreke civakî digerin, li pey hemanên nasnameya kurdan ên îroyîn in jî. Ji bo nîqaşen nasnameyî an netewî yên îroyîn, bi taybetî *Bîra Qederê* xuya dike ku ev nîqaş tenê ne yên iro ne, ew di dîrokê de jî rehênen xwe berdane. Ev nîqaş, di tarîskirina nasnameya kurd de li ser rola zimanê kurdî ye. Li gor lehengê romanê Celadet E. Bedirxan yekbûna kurdan bi yekitiya zimanê kurdî çêdibe. Îddia dike ku mileten bindest heyîna xwe ji serdesten xwe bi ol û ziman diparêzin. Lê dema ola mileten serdest û bindest yek bin, dimîne ziman. Lewma Celadet E. Bedirxan dikeve pey gotinê kurdî, çîrok û destan û alfabeyek nû. Ji xwe tişte Celadet E. Bedirxan daye naskirin xebatên wî yên li ser ziman in, ne ku ew tenê newiyê Mîr Bedirxan e ku bi malbatî di dîroka çandî û siyasî ya kurdan de rolek mezin leyistine. Bi vî aliyê xwe ev roman, di vegotina xeleka endîşeyê li ser ziman ku ji dewra Ehmedê Xanî û vir ve heta iro bûye sedema dilêşiyê, qonaxek girîng e. Bi gotineke din ew perçeyek ji bîra çandî ye ku xwendevanê xwe li ber nîqaşen îroyîn

xwedî danehevek çandî, dîrokî û siyasî dike û dide zanîn ku ew bi xwe xwedî dîrokekê ye.

c. *Hawara Dîcleyê*

Romana dawîn a Uzun, *Hawara Dîcleyê* dewra Mîr Bedirxanê Cizîrî ji xwe re kiriye bingeh. Roman bi dewr, bi serencama mîrê Cizîra Botan, bi mekanên (Cizîr, Girît, Şam) xwe romanek dîrokî ye. Lê bi tevger û hişmendiya lehengên xwe û ji aliyê sosyolojîk ve ji pîvanêن romana dîrokî dûr dikeve. Di *Hawara Dîcleyê* de, wek reaksiyonek li dijî serdema xwe, helwesta romantîk, hesreta rabirdûyek pak û rexnekirina îro bi awayekî eşkere xuya dike û ev jî dike ku rabirdûyê ji “îro” re bike qurban. Dem, mekan, şexsiyet û bûyer her çiqas dîrokî bin jî nivîskar bi perspektîf û pîvanêن îro û ji bo îro dinivîsîne. Wek ku Türkeş ji bo romanên Amin Maalouf dibêje, di romana Uzun de jî nîşaneyên nêrînek modern a siyasî, civakî û çandî heye ku di şibaka îro re li rabirdûyê dinêre. Rabirdû tenê çarçoveya şêweyî tijî dike, lê hedefa nivîskar îro ye. Lewma rabirdûyê ji peywenda xwe derdixe û wê dixe nav peywendeke modern. Ev helwest rê li ber anakronîzmayên kûr vedike û serdema modern ber bi rabirdûyê ve dirêj dibe. Bi gotina Hobsbawm di romanek dîrokî de “rabirdû bi xwe tê îmha kirin”¹³⁶.

Di *Hawara Dîcleyê* de, ji dêvla ku jiyan, atmosfer, pêwendiyên mîrovî û hişmendiya dewrekê di hişê xwendevan de zindî bike, tiştê ku xwendevan dixwaze bibihîze, pirsgirêkên civaka îro, teswîr û temenniyên îroyîn ku di dilê wî an yê xwendevan re derbas dibin derdikevin pêş. Di *Bir Romanın Hatıra Defteri*¹³⁷ (Rojnivîsa Romanekê) de eşkere dike ku ew hewl dide ku xwendevan romanê (*Hawara Dîcleyê*) wek neynika îro têbigihê û bîxwîne, yanê divê xwendevan hêvî neke ku ew ê di wê neynikê de rabirdûyê di hişê xwe de zindî bike an texeyul bike. Vebêjer Biro ku bi xwe dengbêjekî wê dewrê ye bi taybetmendiyên rewşenbîrekî sedsala 21mîn hatiye xemilandin û dikare wek model jî bê qebûl kirin:

Ji xwe bi uslûb û dinyaya hîsî ya dengbêjekî herêmî ne mumkin bû ku romaneyeke dûr û dirêj wek vê romana ku neha ez dinivîsînim bê nivîsandin. Divê Biro bibe alter-egoya rewşenbîrekî modern, eyn wek Homeros, Ovidius, Xanî, Heyam... Roman wê tenê

¹³⁶ H.b., 115.

¹³⁷ Mehmed Uzun, *Bir Romanın Hatıra Defteri*, İthaki Yayınları, Stenbol, 2007, r. 30.

dernekeve ser rêwîtiyeke ber bi rabirdûyê de, di heman demê de wê di navbera Rojhilat û Rojava de here û were¹³⁸.

Uzun, dema Mam Sefoyê Ermenî, şêwirmendê Mîr Bedirxan, bi me dide nasandin, zimanên ew pê dizane rêz dike ku ti ziman nîne ku ew pê nizane: Ermenîkî, kurdî, osmanî, farisî, erekî, italî, frensî, ingilîzî û hinekî yewnanî û latînî (c.I., r.50). Tam mirov meraq dike ku ew çawa ewqas ziman fêrbûye, em fam dikin ku ew li hemû dinyayê gerîya ye û li Stenbol, Venedîg û Parîsê xwendîye, dinya dîtiye, war û welat dîtiye. Îlmên cihê, tevî hemû kitêbên miqedes ên cihû, file û misilmanan xetim kiriye. Tevî ilm û zimanan wan seray û sultanê osmanî, padişahê faris, eşîr, serokeşîr û şêxên ereban, mîr û mîrektiyê din ên kurd, hemûyan kite bi kite nas dike. Ger ku em li gor şert û mercêñ wê dewrê li vê tarîfê binêrin, ev ji tarîfa dewrekê bêtir temeniya mirovdewletekî bi vî rengî xuya dike. Hê di destpêka sedsla 19mîn de xwendina li Rojava wek îro di nav civakê de ne ewqas tiştekî maqul û rûniştîye. Ev li gor hişmendîya îroyîn referansek têra xwe maqûl e. Lê di wê serdemê de tevî xeyrî-muslîman, Împeretorîya Osmanî hê tam derîyê xwe ji Rojava re venekirîye ku kesek ji Cizirê rabe, li Venedîk û Parîsê bixwîne û bi hemû zimanê Ewrûpî bizanibe. Hê di sala 1829an de împeretorî cara yekem çar ciwanan ji Stenbolê ji bo xwendinê dişîne Ewrûpayê. Tê zanîn ku Mîr Bedirxan hay ji teknolojiya rojavayî hebû û ji bo xurtkirina mîrektiyê û artêşê dixwest hin ciwanan bişîne Rojava. Bi îhtimalek mezin wê ev jî li dor tarîxa li jor (1829) be. Dibe ku planek wisa hebe lê di derheqê pêkanîna wê de tu agahî nîne. Sînorêñ fireh ên zanyariya Mam Sefo jî balkêş e: Ji osmanî û farisan, du hêzên mezin ên heremê ku kurd di nav sînorêñ wan de ne, heta eşîr û şêxên ereban, mîrektî û eşîren kurdan. Modelek îdeal e ji bo mirovdewletekî ku bikaribe dost û neyarê xwe bi kite kite nas bike. Elbet em bi sînorêñ zanyariya wî dizanin, lê em bi hûrgiliyêñ zanyariya wî nizanin, an em nizanin ewqas zanebûn çawa, li kuderê bikaraniye an çawa kêrî mîrektiya Botan hatiye. Di romanê de meseleyek din ya îroyîn ku tê de rû dide, toleransa lehengan ya bêşînor û derî-zeman e. Taybetî ji aliyê olî ve lehengên serekî yên wek vebêjer Biro, Mam Sefo û zarokêñ wî Migo, Armê, xanima wî, keça Apê Xelef Gulîzer, hezkirîya wî Stêr tu ferqê nakin di navbera olê xwe û yên din. Ji Hemê pê ve, ku ew jî derî-zeman an têra xwe anakronîk e, tenê ola xwe nade pêş ji wan re hemû wekhev in. Mam Sefo ku Ermenî ye, hemû kitêbên pîroz xitim kirîye. Biro bi xwe, misilmanekî ku berê êzidî bûye pir rihet pesnê Qewlê Êzidîyan jî dide, gelek caran ji

¹³⁸ H.b., r. 34-35.

Tewratê referansan dide û qala Quranê jî dike. Ne ku tenê qal dike bawerîya xwe bi wan tîne. Dema Biro dike bi Stêra nestur re mahra xwe bibire, ji bo nîşaneyâ wekhevîyê gazî keşeyekî nastur û melayekî dike. Biro û hevalê xwe Migo li kitêbxanê Tewrat, Zebûr û Încila Lûqa her sê bi hev re li ber wan vekiriye (c.I, r.290). Di gelek cihan de geh vebêjer pesnên Tewratê dide û referansan jê dide (c.I, r.244), geh lehengên wî, Mam Sefo (c.I, r.250), her tim Tewrat li ber vekiriye û îlhamê jê distîne. Dîsa vebêjer Biro wisa qala xwe dike:

Dewsa mele, xoce, seyda û rîhsipiyê Cizîra Botanê ku bi zimanê tiredîn dipeyivîn, hozanên mîna Maro, Naso û alîmên mîna Keso ku bi zimanê yewnanî û latînî dipeyivîn ji xwe re kiribûn mamosneyê heyatê û bêyî ku ji zimanê wan fahm bike, serê xwe bi gotin, rêz, hikaye û serpêhatiyê wan diêşand; Tewrat, Avesta, Zebûr, Încîl, Quran, Mishefa Reş, ku tiredînê me dikarîbû bi zimanê ku pê dizanîbû bixwenda, ne mîna kitabê dînî yên kevnare, lê mîna hedîs û hedîseyê roja xwe didît û ji wan, ji bo bûyer û qewimînê roja xwe ders û tecrûbeyê insanî derdixist... (c.II, r.61-62).

Digel ku bi zimanê wan nizane ev hemû kitêbên pîroz çawa dibe ku bi hîkaye an serpêhatiyê wan serê xwe biêşîne û ji wan ders û tecrûbeyê insanî derxîne, ev gelekî muphem e. An bi zimanê hinekan dizanibe jî ev kîjan in û dersên çawa ji wan derdixîne? Mirovekî wek Biro tenê demeke kurt li Medresa Sor xwendîye çawa dikare an çawa gîhîştiye wê mertebê ku çavkaniyê zanyariyê wê dewrê *mele, xoce, seyda û rihsipiyê Cizîra Botanê* red bike û berê xwe bide klasîkên yewnanî, latînî û hemû kitêbên pîroz? Li vir tevî ku sînorê romana dîrokî hatiye îhlal kirin û nivîskar peywîrek daye ser xwe û pêşniyara xwe ya toleransa civakî ya di dilê wî de ye radixîne ber xwendevanê xwe. Bi gotineke din modela civaka ku ew dixwaze tê de bijî dixwaze di dîrokê de piştrast bike an ji bo alikariya xwe gazî cepxaneya dîrokê dike.

Halbûkî dema em li dîroka împeretorîya Osmanî dinêrin, digel ku hemû ol û komên etnikî di nav hev de bi sedan salan jiyane, ev nayê wê wateyê ku ew ewqas xwedîyê asoyek firehtir bûn an bi rihetî kitêbên pîroz ên hevdû xetim dikirin û ji wan bawer dikirin, hemû ol û kitêb li ba wan wekhev bûn. Bilakîs, berîya serdema modernîzmê sînorê herî hişk ku di navbera cimaetan de hebû, yên olî bûn ne yên netewî an etnikî. Her cimaetê nasnameya xwe bi hêmanê olî tarîf dikirin, sînorê xwe datanîn û her kesî bi sînorê xwe û yên din dizanibûn. Ya girîng ew bû ku sînorê hevdû îhlal nekin. Ji ber ku her cimaetê di nav xwe de jiyana xwe didomand û di bin

desthilatdarîya xurt ya împeretorîyê de, li nik hevdû dijiyan, lê ne di nav hevdû de. Her cimaeta olî di nav xwe de pêdiviyên xwe yên çandî, perwerdehî û medenî çareser dikirin. Ya herî girîng çanda împeretoriyê ya siyasî jî pêwîst neditît ku çandek standart an homojen li ser tebayêن xwe ferz bike û an wek netew-dewletan çandekê li ser çanda din bigre û yên din asîmîle bike. Kengî di serdema modern de, derîyê împeretoriyê vebûn, jiyana nûjen, çanda siyasî ya nûjen sînorêن di navbera cimaeten xira kirin û reqabeta sîyasî, çandî dest pê kir, pevçûn destpêkir û pirsgirêka asîmîlekîrin û hiyerarşıya çandan ket rojevê. Ji wê çaxê û vir ve ye ku yanê bi asîmîlekîrinê û vir de pêdivî bi toleransê çêbûye. Dibe ku ji ol û baweriyên hevdû hurmet nîşan didan, lê ne di wê astê de ye ku hemû kitêbên olî daynin ber serê xwe û wan xitim bikin. Ev ji anakronîzmayekê pê ve ne tiştek e.

Uzun, di vê romana xwe de rasterast van têgehan bikar nayne jî, wî di neynika wekhevî, pirçandîtî û bihevrebûna cûdatîyan re ku bi taybetî di salêن 1990an de ketine rojevê, civaka sed û heftê sal berê tarîfkiriye. Dibe ku bandora salêن jiyana wî ya li swêdê ku paytextê pirçandîtiyê ye, derbas bûye hebe. Di nav vê çanda siyasî û di bin siya niqaşêن demokrasiya nûjen de li dîrokê nêriye û civak û pêwendiyên civakî bi awayekî anakronîk teswîr kiriye. Malbata vebêjerê romanê Biro di wextekê de bi darê zorê bûne misilman. Qala hûrgiliyên vê nayê kirin, lê malbata wî di vê bûyere de hatine kuştin, ew sêwî maye û çavê wî yê kor jî encama vê ye. Vega ew bi xwe misilman e û vê ji xwe re nake mesele. Digel ku misilman e jî, dilê wî bêtir ber bi êzidîyatîyê ve diçe. Gelek caran xwe wek êzidî jî tarîf dike, lê elbet ji hemû olan re rêz digre û hemû li ba wî bi qedr û qîmet in. Di serdemeye ku ol li ser nasname û hişmendîya mirovan ewqas bi bandor e, misilmantiya bi darê zorê qet di derûniya wî de nabe sedema gengeşî, bêhizûrî an endîşeyekê. Madem ewqas wekhevî an tolerans hebû malbata wî çîma bi darê zorê bûne misilman? Em nizanin. Misilmantiya wan tiştekî ji rêzê be jî çîma di dilê wî de êzidîyatî cihekî girîng û nostaljîk digre?

Li vir jî em dikarin bi riya vegotinêن vebêjer Biro re bibînin ku, bilindkirin an biqîmetkirina çand û ola qedîm bibînin. Bi gotineke din, hewildana bibîrxistina ola qedîm û cihgirtina wê ya di bîra civakî ya îroyîn de mevzûbahîs e. Madem bi aliyekî ve netew li ser bîr an rabirdûyeke hevpar ava dibe, divê ev ola qedîm jî tê de cihê xwe bigre. Ji xwe di vegotina netewperweriya kurdî de, bi taybetî ji aliyê netewperwerên sekuler ve, ev meyleke xurt e ku dîroka netewa kurd bi sedan salan dibe beriya dewra misilmantiyê û ew dibe hêmanekî xurt a netewperweriyê ku kurdan ji netewên din cuda dike. Êzdiyatî ku tenê di nav kurdan de belav bûye, kurdan dike xwedî taybetiyek yekta

û aſfrenerê çandeke qedîm jî. Ji aliyekî ve, êzidî wek civatek ku li derveyî olên xwedî-kitêb an îlahî mane û wek şeytanparêz, bêol hatine qebûl kirin, di dîrokê de zor lê hatine kirin ku bibin misilman û bi zordariyê mezin re rû bi rû mane. Bilindkirin an biqîmetkirina êzidî û êzdiyatîyê dikare wek rexne û lêborîneke rewşenbîrî jî bê xwendin. Ger em guh bidin Uzun bi xwe jî wê mesele hê zelaltir bibe: “Min di kitêba Layard¹³⁹ de beşa di derheqê nesturî-keldaniyan de xwend. Xwedê, ev çi zulm e. Wê romana min bibe rexneyek tûj a zulma ku kurdan kirine. Zulma ku zaliman kirine¹⁴⁰. ”

Dîyalogek vebêjer Biro ya bi Migo, kurê Mam Sefo û birê hezkirîya wî Armê re heye, ewqas anakronîk e ku mirov bawer nake li Kurdistana iro jî de derbas bibe. Biro di heman demê de him ji Gulîzera keça Apê Xelef, him ji Armê hez dike. Gelek caran bi herduyan re şâ dibe. Ev mesele ji bo wî nabe sedema ti alozîyan, ji bo herdu keçan jî. Lê dema Stêrê ku nestûrî ye û wê ji qetlê xelas dike, nas dike û dilê wî dikeve wê, bi Migo re dişewire ku ka çi bike. Migo heta dawî bi awayekî sakîn lê guhdarî dike û wek zanayekî derî zeman diçe kîtebekê tîne. Kitêb qala mesela Parîsê Truwayî ku ji nav sê jinan; Hera, Afrodît û Athenayê ya herî bedew hildibijêre, dike. Migo bi vê çîrokê jî û bi dîroka Truwayê jî tevî detayan pir baş dizane û dikare şîrove bike. Bi referansa vê çîrokê ew pêşniyar dike ku Stêrê hilbijêre. Di civakek pre-modern de di rewşa Gulîzerê û xweha wî Armê de ji aliyê malbatan tiştekî anormal nîne û mesele diqede.

Qetla nesturan a li Hekkarê ji aliyê Nurulah Beg tê pêk anîn ku sedemên wê bêtir sîyasî ne, vê teswîra civaka xwedî tolerans û wekhev xira dike. Digel ku ji bilî nesturî-kildaniyan pê ve bandor li ser xeyrê-muslîmên din nake, bûyerek gelekî trajîk e. Helwesta nivîskar a li dijî vê bûyerê tenê ji agehdarkirinê îbaret e. Ne li ser sedemên wê ne jî li ser hûrgiliyên wê diseleine. Elbet nivîskar ne mecbûr e ku hemû bûyeran bi hûrgilî ji me re vebêje. Lî ji bo ruhê dewrekê derbasî xwendevan bibe mirov li bendê ye ku di nav pêwendiyên lehengan de an li der û dora mîr rastî hin sedeman bê. Wisa xuya dike ku ev bûyera trajîk ji bo ders jê bê girtin, bi gotina nivîskar ji bo deynekî wicdanî¹⁴¹ û ji bo rexneya li îro hatiye qalkirin, lewma pêwîst nebûye ku li ser sedeman bisekine.

Yek ji lehengan, Hemê ku tenê lehengê neyênî ew e û hevalê zaroktîyê yê Biro ye, dikeve nav rêxistinê ku neyartîya xeyrê-misliman dike. Navê rêxistinan *Hedef* û *Riya Rast* in. Ev herdu rêxistin bi tevger û armancê xwe pir dişibin rêxistinê İslâmî

¹³⁹ Austen Henry Layard, 2000, *Ninova ve Kalıntıları*, wer. Zafer Avşar. Stenbol:Avesta.

¹⁴⁰ Uzun, *Bir Romanın Hatıra Defteri*, r. 64.

¹⁴¹ Mehmed Uzun, *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, İthaki Yayınları, Stenbol, 2008, r. 15.

yên radîkal ên îro. Dawa şerîtetê dîkin û bi dû filehan û yên wek wan nafikirin, ketine. Lê em dîsa li dîrokê vegezin ev serdem û wek projeyek endezyarîya civakî, dawa şerîtetê û îdeolojîya Îslamî hê gelekî ji hevdû dûr in. Çawa dibe, di taliyê de, Hemê ji vê rîyê vedigere tê ser rîya Êzdîyatîyê ku her tim bi nostaljîyekê, wek ola bav û kalan û qedîm tê qalkirin. Heta difikire ku îcar rîexistinekê li ser navê êzidîyan ava bike û tola wan hilîne. Vebêjer wisa qal dike ku wek sed û şêst-heftê sal berê ji bo armancekê rîexistinbûn tiştekî pir ji rîzê be. Barê rexneya civakî ku nivîskar daye ser milêñ xwe dîsa zor dide nivîskar û dide pêşıya qaîdeyêñ romana dîrokî û estetîka wêjeyî. Nivîskar di hevpeyvînek xwe de Hemê wisa tarîf dike:

Wek Biro û Stêrê, Hemê jî karakterekî ku min afirandiye. Ev pirr pêwîst bû, ji ber ku civaka kurdan, wek civakêñ girtî yên din, derdê kesêñ wek wî pirr dikşîne... Di nav civakêñ wek ên kurdan de hesûdî, fesadî û neyartiyek bêsinor heye... Li dora min jî gelek Heme hene¹⁴².

Dîsa ne ku di dîrokê de wisa ye, lê ji ber endîşeyêñ îroyîn û texeyula nivîskar a dahatûyê, Mishefa Reş di nav rîza hemû kitêbên pîroz de cihê xwe digre: Quran, Tewrat, Avesta, Încil û Mishefa Reş. Mishefa Reş jî wek kitêbên din li her pirtukxanê de an malê de peyda dibe û dikare bê xwendin. Di rastiyê de dema em Mishefa Reş dinêrin, Mishefa Reş ne kitêbek wek ên din e, tenê 15-20 rûpel e û tê de meselên dûr û dirêj nîn in. Di wê tarîxê de Mishefa Reş li holê nîne jî. Di dawîya sedsala 19mîn û di destpêka sedsala 20mîn de ji aliyê mîsyoner û gerokan ve tê çapkiran. Li ser resenbûna wê jî gelek nîqaş hene. Kitêbek pîroz a din jî, Avesta ye. Mam Sefo û kurê wî Migo ku Ermenî ne, Biroyê ku di nav misilmantî û êzdîyatîyê de diçe û tê ji xwe qet cudaşîyê naxin navbera kitêbên pîroz û Avesta jî tevî wan e. Wek Mishefa Reş, Avesta jî mirov dikare di hemû pirtûkxaneyan de peyda bike.¹⁴³ Lê dîsa Avesta jî di nîvê sedsala 19mîn de hê nû ji aliyê oryantalîstan ve hatîyê deşîfre kirin û li Fransayê hatîye çapkiran. Ew iştimala ku li girava Girîdê an li Kurdîstanê ketibe pirtukxaneyan nîn e. Uzun, wek şexs

¹⁴² Uzun, *Bir Romanin Hatira Defteri*, r. 146.

¹⁴³ Remezan Alan jî di nivîsa xwe ya bi navê *Romanek û Têkçûna Masûmiyetekê* de bi rîya romanek din a Uzun *Mirina Kalekî Rind* û lehengê wê Kalo bal kişandîye ser vê mijara kitêbên pîroz û zanebûna leheng a “bêsinor”: Ew ê ku tiryakiya pirtûkan bû; li Stenbol, Qahîre, Bexdayê mabû û edebiyat tehsîl kiribû; ku bi qasî kurdî tirkî, farîsî, erebî û yewnaniya klasîk dizaniya; dil dabû felsefa Rindiyan û wek derwêşekî hemû Rojhilata Navîn, Behra Spî, Afrikaya Başûr dîtibû; pir xweş li bilûrê dixist; ji zimanê xwe gelek çîrok, efsane û destan dizaniya; di dawîya emrê xwe de li gundekî ku çivik lê nedigotin wiq bicî bûbû û mahna jiyanê bi dest xistibû; û li ber sekeratê jî ji gundiyyêñ belengaz xwestibû ku jê re ji Tewrat, Zebur, Încîl, Quran û Zend Avestayê bixwînin û beriya nefesa dawî jî bi wan re helbestêñ Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Firdewsî xwendibû (!). Alan, h.b., r.206.

bi dîrokê çiqas baş dizane an nizane, em bi vê nizanin. LÊ nivîskarekî ku barê romanek dîrokî dabe ser milê xwe elbet li ser hin meseleyan divê lêkolîn kiribe. Xuya ye ji zanebûn an nezanebûnê bêtir, pêdivîyên îroyîn, daxwaza dîrokek nostaljîk û kûr, temennîyên civakî dikarin sedemên vê anakronîzmê nîşan bidin. Ji ber endîşeyên îroyîn ku ev roman hatiye nivîsandin û nivîskar pêdivî bi zanebûna wî bi dîrokê çenebûye.

Ji ber heman sedemê ye ku, ji Hemê pê ve, ew jî amûreka rexneya li civaka îro ye, lehengên nebaş an neyênî tune ne. Dikare bê gotin ku Uzun, bi giştî, ji lehengên xwe pir hez dike û qet qêmîş wan nake ku aliyekî wan ê neyênî nîşanî xwendevan bide an ji afirandina lehengên neyênî hez nake. Ne tenê ji aliyê niyetê, ji aliyê kesyatê jî tu zeafên wan nînin. Bi salan an bi qewimandinan re jî di kesayet, fîkr û ramanên wan de guherîn çenabe. Lehengek di serê romanê de çawa be, wisa dimîne. Ji xwe nivîskar anîbû ziman ku ew ji bo îro dinivîsîne¹⁴⁴.

Di *Hawara Dîcleyê* de bi awayekî eskere qala “yên din”ên kurdan nayê kirin. Neyarêن kurdan zêde nayên binav kirin. Ji romanê din ên dîrokî ku em li ser sekinîn, cudatir peyvên wek *welat* (kêm caran) an *Kurdistan* jî nehatiye bikaranîn. Digel ku di dema împeretoriyê peyva Kurdistan ne peyveke qedexe an marjînal bû jî, nivîskar ji bikaranîna vê peyvê dûr sekiniye. Cizîra Botan ku mekanê sereke ya romanê ye wek perçeyek ji Mezopotamyayê tê qal kirin. Di hevpeyvînekê de mekanêن romanê wek Mezopotamya, Anadolu û Derya Spî nîşan dide û binê pirçandî, pirolî û pirzimaniya romanê xêz dike¹⁴⁵ û dixwaze romana wî ne tenê wek ku tenê li ser kurdan û li ser erdnigariya kurdan be, bê naskirin. Her çi qas xwe wek nivîskarekî kurd tarîf bike jî, bi taybetî di *Hawara Dîcleyê* de meyla xîtabkirina girseyek mezin a xwendevanan serdest xuya dike. Lewma dijayetiya siyasî ya îroyîn di navbera kurd û tirkan de naxwaze derkeve pêş. Gotina wî “Ez dixwazim bibim nivîskarekî aîdî dinyê”¹⁴⁶ di sînorêن mekanêن romanê de jî xwe xuya dike. Ev daxwaz bi *Ronî Mîna Evînê*, *Tarî Mîna Mirinê* ve herku diçe xurt dibe û wek pirçandîtî, pir zimaniyê ku meseleyên di rojeva siyasetê de ne, dihewîne û ber bi Mezopotamyayê fireh dibe. Wek ku nivîskariya dinyayî an gerdûnî bi firehiya sînorêن mekana romanê ve girêdayî be, Uzun, ji ser zemîna ku divê nigên xwe bide ser dişemite û rê li ber muphemî, surveyî (yüzeysellîk) û anakronîzmê vedike.

¹⁴⁴ H.b., r.30, 146.

¹⁴⁵ Uzun, *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, r. 27.

¹⁴⁶ H.b., r. 29.

Ji vegetina “nivîskarekî dinyayî” armanca gihîştina zêdetir xwendevan jî dikare bê famkirin. Girêdayî vê Uzun sînorêن xwendevanêن xwe jî berfirehtir dike. Ew, ji nivîskarêن din ên ku mijara vê xebatê ne, cudatir, tenê xitabî kurdan nake. Ev helwest bi taybetî di *Hawara Dicleyê* de berbiçav e û ji pirsgirêkên nasnameyî an netewî betîr giranî li ser sazkirina modeleke civakî ya nû an cûda ye. Çawa ku di romanek dîrokî ku mekana wê Kurdistan e, lê wek sînorêن erdnigarî Kurdistan nayê bilêvkirin, wek berdewamiya vê helwestê dikare bê xwendin. Ji xwe Uzun di vegetinêن xwe yên siyasî jî de ji peyva Kurdistanê dûr disekîne.

Ji bo analîzkirina hişmendîya serdemekê roman bi xwe amurek girîng e. Lê *Hawara Dicleyê* ji hişmendîyek dîrokî bêtir ji bo analîzkirina hişmendîya dawiya sedsala 20mîn û destpêka sedsala 21mîn û niyeta nivîskar materyalan dide ber destê me. Ev rast e ku romanêن dîrokî di derheqê dewra nivîsandina xwe de xwedî vegetinek siyasî, civakî û çandî ye. Wek berhemek wêjeyî bi rewşa civakî ve girêdayî ne. Mesele ev e ku di bin navê romana dîrokî de, bi rêya anakronîzmên beloq dîrok “îmha kiriye” an cih ji dîrokê re nehiştiye.

Ji her sê romanêن Mehmed Uzun ku hatin nirxandin di *Bîra Qederê* û *Siya Evînê* de nivîskar bêtir hewl daye xitabî xwendevanêن kurd bike. Çêkirina bîrek civakî û bibîrxistina perçeyek ji dîroka wan derdikeve pêş. Qaideyên romana dîrokî ji bo armancêن îroyîn nehatine qurbankirin. Nivîskar di serdema ku leheng tê de jiyane tevgeriya ye; di navbera diho û iro de neçûye nehatiye. Lê di *Hawara Dijleyê* de bi giştî qaîdeyên romana dîrokî hatiye qurbankirin. Nivîskar, ji bo ku di dîrokê de ji perspektîfa xwe ya îroyîn û texeyula xwe ya bo dahatuyê re paşpiştan peyda bike, dekora dev ji dekora dîrokî berdaye û civakek li gor daxwazêن xwe di wir de bich kiriye. Derfet nemaye ku em civaka serdema 19mîn di romanê de bibînin an hîs bikin. Ewqas ku hin hemanêن wek ku dîrokî be –kitêbên pîroz- hatine bicikirin jî ji rastiyê gelekî dûr in. Rastî jî ji bo daxwaz an texeyulêن xwe berovacî kirine û bi gelek awayan ji estetika romana dîrokî dûr ketiye.

6. Jan Dost (1965-)

a. Jiyan û Berhemên wî

Jan Dost di sala 1965an de li Sûrî li Kobanê ji dayik bûye. Ji sala 2000î û vir ve li Almanyayê dijî. Xwendina xwe li bajarê xwe heta lîseyê qedandiye. Li zanîngeha Helebê beşê biyoloiyê bêyî ku temam bike xwendiyeye. Demeke dirêj e li ser Ehmedê Xanî û Mem û Zînê lêkolînan dike û di encamê de şerh û wergera erebî li Şam û Dihokê (1995/2008) û ya kurmancî jî li Stenbolê (2010) çap kir.

Jan Dost wek lêkolîner, wergêr, helbestvan û romanûs tê naskirin. Romanên wî *Mijabad*, 2004; *3gav û 3darek*, 2007; *Mîrname*, 2008 û *Martînê Bextewer*, 2012 ne. Kitêbên wî yên helbestê, *Kela Dimdim*, 2011; *Sazek Ji Çavên Kurdistan Re*, 1994; *Dîwana Jan*, 2010 ne. Werger û lêkolînen wî, *Mem û Zîn* bi erebî, 1995; *Şiir We*

Şueraa, bibliyografya li ser helbestvanê kurd yên kevn û nû, 1991; *Mehabad Ber Bi Olimpiyada Xwedê De*, wergera helbestên Selîm Berekat, 1996; *Bedayiulluxe*, wergera ferhenga Kurdî-Erebî bo farisî, 1997; *Elhedîqe el Nasiriyye*, wergera ji farisî bo erebî, 2002; *Sirûda Baranê*, helbestên Bedir elsseyyab wergera ji erebî, 1995; *El Durr El Semîn fî şerhî Mem û Zîn*, werger û şîroveya *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* bi erebî, 2006; *Mem û Zîn bi kurdiya îro*, 2008; *Mem û Zîn*, çapa fermî, Dar el zeman, Şam, 2008; *Adat û Risûmatnameê Ekradiye*, Nûbihar, 2010; *Mem û Zîn, şîrove û bi kurdiya îro*, 2010; *Ferhenga Kurdistanî*, kurdî-kurdî, 2010.

Roman û helbestên wî tenê bi kurdî hatine nivîsandin. Lê lêkolînê wî bi kurdî û erebî ne. Wergerêne wî ji kurdiya kevn, erebî û farisi ne. Berhemên bi awayekî legal an ilegal li gelek bajarêne wek Stenbol, Bonn, Şam, Bêrûd, Hewlêr, Dihokê hatine çapkiran.

b.Di nivîskariya Jan Dost de Aciliyeta Dîroknavîsiyê

Her çar romanêne wî jî yên dîrokî ne. Ya yekem *Mijabad* ku cara ewilî di sala 2004an de li Diyarbekirê hatiye çap kirin, mijara xwe ji dewra Komara Mehabadê ya li Rojhelatê Kurdistanê ku di 1946an de hat damezrandin, lê di heman salê de hilweşîya jî, digre. Ya duyem, *3 gav û 3darek* ku di sala 2007an de li Stenbolê hate çap kirin, mijara xwe ji serhildana Şêx Seîd a di sala 1925an, digre. Mijara *Mîrname* ku romana wî ya sêyem e û li Stenbolê di sala 2008an de çap bûye, li ser Ehmedê Xanî û dewra wî ye. Romana wî ya çarem *Martînê Bextewer*, mekanê wê Almanyaya serdema navîn û Rojhilat e, lehengê wê Martîn yekî alman e ku li dû kitêba *El Ifade fî Iksîr el Se'ade* yê ber bi Rojhilat ve derdikeve rîwitiyekê. Ev roman di nav xebatê de cih negirtiye, ji ber ku dema ev xebat dest pê kir û xilas jî bû ew hê çap nebûbû.

Jan Dost tevî xebatêne xwe yên lêkolînî yên li ser Mela Mahmudê Bazidî û Ehmedê Xanî û destana Kela Dimdimê, wek romanûsekî tenê romanêne dîrokî nivîsandiye. Xebatêne wî yên li ser Bazidî û Xanî ku dikevin nav dîroka wêjeya kurdî jî xuya dikin ku bala Dost ji îro bêtir li ser rabirdûyê ye. Ya rast ne ku bala wî ne li ser îro ye, bilakîs ji ber pirsgirêk an pêdiviyêne îroyîn ew bêtir bala xwe dide rabirdûyê. Di neynika pirsgirêk an pêdiviyêne îroyîn de li rabirdûyê vedigere. Bi vî aliyê xwe Dost di nav wêjeya kurdî de xwedî cihekî taybet e. Dîrok ji bo wî amûra herî girîng a sazkirina îro û dahatûyê ye û wî fêrkirina dîrokê, balkışandina ser dîrokê û bibîrxistina dîrokê ji

xwe re kiriye armanca yekem û romanûsiya xwe ji bo vê armancê terxan kiriye. “Ez bi xwe dixwazim sozdarê tarîx û civaka kurmancî bim.”¹⁴⁷ dibêje Dost.

Dost girîngiyeke bêhempa dide dîrokê. Di dewra modern de ji bo sazkirina vegotinên siyasî û çandî, biheqî an bi neheqî, dîrok her tim wek hîmekî hatiye qebûl kirin û heta di dewra rewşenbîriya Ewrûpayê de gelên bêdîrok an ên bi dîroka xwe nizanibin di hiyerarşıya gelan de li ciyekî nizm hatine bi cih kirin. Dost bi gotina xwe ya bi îdîa “Diroka kurdî bingeha hebûnê ye, hebûna me ya îro.”¹⁴⁸ vê girîngiyê piştrast dike. Ji ber vê girîngiya dîrokê ew materyalên xwe yên dîrokî zêde li bin guhê hevdû naxîne û ji leheng an bûyerên rasteqîn bi dûr nakeve. Lewma dikare bê gotin ku di nav romanûsên kurd yê herî zêde ji anakronîzmê dûr e, ew e. Elbet mijarênu ku hildibijêre û xalênu ku vegotina romanênu xwe li ser ava dike bi meseleyên îroyîn re pêwendîdar in. Lê ew bi awayekî hosteyî ji pîvan û perspektîfa îroyîn dûr disekine û meseleyên civaka kurd ên kronîk di nav peywendênu xwe de li ber çavan radixîne.

Wek sozdarekî dîrokê, endîşeya Dost a herî mezin a di romanûsiya wî, di nav civaka kurd de û bi taybetî di nav rêvebirênu siyasî de kîmasiya dersgirtina ji dîrokê ye. Ew vê xalê wek sedema herî mezin a têkçûna tevgerênu siyasî ya kurdan dibîne. Lewma dibêje “Ez bûyerên dîrokî dikim roman da ku em ji dîrokê îbretê bigrin. Bi rîya romanîn dîrok bê xwendin û em dersan jê bigrin”¹⁴⁹.

Di heman hevpeyvînê de hêvî dike ku hemû bûyerên dîrokî yên girîng bike roman. Wek nivîskarekî ku ji ber rewşa siyasî ya Sûriyê mecbûr maye li diasporayê bijî û berhemên xwe biafirîne, ev rewşa wî rîya nivîskariya wî diyar dike û armancênu xwe yên siyasî qet ji bîr nake û di romanûsiyê de jî ji meseleyên siyasî yên mezin danakeve. Bi mînakênu ji dîroka kurdênu Rojhelat sedemên têkçûnan bi dîroknezaniyê ve girê dide. “Şahî İranê Şah Safewî gazî begênu Kela Dimdimê kirin, Şah Nasirê Kaderî gazî Hemze Axa yê ku piştgiriya Şêx Ubeydullah dikir, kir, Şah Pehlewî gazî Simko Axa kir, ew xapandin û dan kuştin. Keza bûyera Abdurrahman Qasemlo jî wisa ye. Heman tişt bi heman awayî hate dubare kirin.” û dipirse ka “Çima pêşewayên kurd dîrok nexwendin û îbret jê negirtin.”¹⁵⁰. Ne tenê pêşewayên li Rojhelat, yên li Hewlêr û Silêmaniyyê jî bi vî awayî rexne dike û wek sedema neçareserkirina maddeya 140î ya di derheqe Kekukê de,

¹⁴⁷ Hesenê Dewrêş, “Heppeyvîn bi Jan Dost re”. Netkurd, Pûşber 2011.

¹⁴⁸Cemil Oğuz, “ Ehmedê Xanî çîma dev ji nivîsê berda”,

<http://www.diyarname.com/yedek/modules.php?name=News&file=article &sid=1845>, 16 Nîsan 2012.

¹⁴⁹ Firatnews.eu, <http://www.beroj.com/h.asp?k=1818>. Adar 2012.

¹⁵⁰ H.m.

bi dîroknezaniya serokan ve rave dike. Tinebûna zanîngehek kurdî li Amedê, tinebûna rojname û weşanxaneyan li Qamişloyê, nedurustkirina peykerê pêşewa Qazî Mihemmed li ser çiyayê Xezayî, hemû encamên nexwendina dîrokê ye”¹⁵¹. Bi awayekî din “Dîroka kurdî bingeha hebûnê ye, hebûna me ya îro” ye li gor Dost.

Dost dîroknûsiya kurdî ya îro tatmînkar nabîne û vê wek sedemek din a nivîsandina romanên dîrokî destnîşan dide. Ew bi îddiaya nivîsandina dîrokek rasttir û “careke din û bi çavekî din” dinivîsîne¹⁵². Li gor wî, dîroka kurdan a ku di rûpelên pirtûkên tarîxê de tenê rêzkirina bûyeran e û an dîroknûs bi cesaret nêzikî mijarêne mezin nabin. Şîroveyên wan seqet in. Tenê qaşilên dîrokê nas dikin, kakil nas nakin. Lewma ew bi îddiaya ku bi rêya romanen tefsîreke nû ji têkçûn û şikestin û rabûn û vêketina agirê serhildanan re bibîne, dinivîsîne. Her çi qas ew bibêje ku ew tenê pirsan diteqîne, ne ku bersivan dide, em ê bibînin elbet di romanen wî de bersivên wî jî hene. Ji ber ku binşu’ura wî ya siyasî her dem di romanen wî de serdest in. Ji xwe ev tê qebûl kirin ku romanûsên romanen dîrokî dema berhemên xwe diafirînin balê dikşînin ser dîrok, siyaset û çanda serdema xwe. Ji ber ku romanen dîrokî wek vegotinên çandî bi qasî ku berhemên estetîkî ne ew qas jî “ji aliyê binheşıya siyasî têr şêwandin”, ew tekstên civakî û siyasî ne jî. Ji xwe bi qewlê Jameson “estetîk bi xwe îdeolojîk e” û her cûre afirandinên estetîkî ku ji bo nakokiyên civakî wek “çareserî”yên şêwazî an xeyalî têr pêşkeş kirin di eslê xwe de kirineke îdeolojîk in¹⁵³.

Ew di hevpeyvînek xwe ya din de kirina xwe ya îdeolojîk bi awayekî zelaltır eşkere dike¹⁵⁴. Wek armanca nivîsandina xwe hewldana avakirina hişekî netewî derdixe pêş. Bi gotina wî bi xwe, hişekî netewî yekgirtî de keviyan (yên perçebûyî) nêzikî hev bike, an keştiyekê saz bike da ku kurdên ji hev qut bûne û qetiyane bigihîne hev. Ev gemiya ku Dost dikare ava bike û vê armancê bi cih bîne wêje ye. Di heman demê de wêjeya wî dozkirina (amaçlamak) şoreşike di mejî de, di xwendinek nû ji dîrokê de, di warê çand û hunerê de, di şêweyê fikirandina pirs û aloziyan de, ye (di heman hevpeyvînê de).

¹⁵¹ Hesenê Dewrêş, h.m.

¹⁵² Kenan Kirkaya, Davut Ozalp, “Jan Dost: ‘pîvanên tendurustiya wêjeya miletekî xwendevanên wî ne,’” Dost, http://www.jandost.com/hev_dicle.html, 04 Nisan 2012.

¹⁵³ Halim Kara, “Mazinin Edebî Temsili: Tarihsel Romanda Fatih’ın Karakterizasyonu.” di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayıncılığı, İstanbul, 2011, r. 338.

¹⁵⁴ Kenan Kirkaya, Davut Ozalp, h.m.

c. *Mijabad*

Mijabad yekem romana Jan Dost e. Dîroka dewreke nêz, dewra Komara Mehabadê bi rêya rojnívîsekê di hişê xwendevanê xwe de dide jiyandin. Serleheng û vebêjerê romanê Badîn wek ciwanekî Behdînî, ji destpêkê heta dawiya Komarê şahidê hemû pêvajoyê ye. Di rojnívisa vebêjer de em ne tenê bûyerên dewra wî, lê bi rêya paşvebirinan ve em car bi car li bûyerên rabirdûyê vedigerin. An bi rêya bîranînê dilşewat ên lehengan re geh li qetla ermenan, geh li Yekem Şerê Mezin ê Cîhanê, geh li serhildana Şêx Mehmûd, geh li serhildana Agiriyê, geh li komkujiya Dêrsimê vedigere. Ne ku bûyer li pey hev rêz dibin, lê di nav muxayyîleyek netewî de bi hunandinek hosteyî û helbestkî. Navê romanê çi qas wek mekanê romanê Mehabadê tîne bîra mirov jî, mekan hemû Kurdistan e. Leheng, her yek ji perçeyek û bajarekî Kurdistanê ne û rabirdûyek wan a hevpar heye û ji bo dahatûyek hevpar dilê wan lê dikeve.

Vebêjer an serlehengê romanê Badîn bi xwe ne ji Kurdistana Rojhilat e. Ew endamê netewekî muxayyel e, ew netewê ku bi sînorêni siyasî û çandî ji hevdû veqetiyaye. Bi rêya jiyana Badîn nivîskar sînorêni siyasî yên ku di navbera kurdan de hatine xêzkirin rakiriye û sînor û neteweya muxayyel a yekperce ava kiriye. Bavê wî Ûnisê Amedî û hevalê wî Remoyê Diyarbekirî ji Yekem Şerê Mezin ê Cîhanê direvin û têni Diyarbekirê. Li vê derê bi keça Entranîkê ermen re dizewice ku ji şer reviyaye û derbasî aliyê rusen bûye. Badîn hê di zikê diya xwe de, Şêx Mehmûd li Silêmanî hikumdariya xwe ïlan dike. Ûnis jî tevî şervanê Şêx Mehmûd dibe. Roja ku Badîn ji diya dibe ew jî di şer de tê kuştin. Badîn jî di emrê xwe yî ciwan de tevî rêexistinêni siyasî dibe û wek mamoste û peşmergeyê Barzanî di damezrandina Komara Mehabadê de cihê xwe digre. Bi hilweşandina Komarê re evîna wî û jiyana wî jî hildiweşe.

Yek ji lehengan Heme Reşîdê Dêrsimî, di sala 1939an de efserek û du serbazê tirk kuştîye, reviyaye hatiye Silêmaniyê. Di sala 1946an de em wî jî li Mehabadê dibînin. Nûredîn Zazayê ku bi eslê xwe kurdekî Bakurî ye lê li Şamê dijî li zindana Musilê derdikeve pêş me. Bi qaçaxî sînor derbas kiriye hatiye da ku şoreşê nas bike û agahiyêni li ser şerê azadiyê ku Barzanî li dar xistibû bibe ji kurdên Sûriyê re, lê pişti çend saetan hatibû girtin (r.134). Qedrî Beg, kurê Cemîl Paşayê Diyarbekirî ji Sûrî têni Mehabadê ku silavekê li Komarê bidin (214). Barzanî û Pêşewa û wezîren komarê dibînin, serdana pêşmergeyan dike. Mujde, evîndara Badîn li Bazîdê hatiye dinyayê. Bavê wê Zilfoyê Celalî di nav rêexistina Xoybûnê de şervanê serhildana Agiriyê bûye. Di dema şer de wê û diya wê dibe Xoyê û teslîmî kevnedostê xwe yî Kerîmê Şikakî dike

û careke din wan nabîne. Diya wê jî li Mehabadê ber bi şekeliya (lehî) ava baranê de diçe. Mujde li ba Kerîm mezin dibe; ew û Badînê Amêdî di dema Komara Mehabadê de li vî bajarî biryara zewacê distînin û ev biryar jî wek Komarê naçe serî. Entranîkê ermen, kalikê wî ji Diyarbekirê ye; di Şerê Mezin de ji eniya Sarıqamışê reviyaye û niha li Mehabadê dijî.

Ji bo avakirina hişekî netewî ku ew keviyên ku Dost di hevpeyvîneke xwe de gotibû ku dixwaze nêzî hevdû bike, hin ji wan di warê çandî de ne. Dema Badîn li eniya Seqizê şer dike wezîrê çandê Menaf Kerîmî dixwaze Badîn îqna bike da ku dev ji pêşmergetiyê berde û karê çandî bimeşîne. Ev kar çapkirina kitêbên dibistana seretayî û weşana radyoya Mehabadê bi devoka Behdînî ye da ku dengê komarê li tevaya Kurdistanê belav bibe. Menaf dibêje “niha Komar muhtacî mejî ye bêtir ji tivingê” (r.151) ku “qelem û xencer”a Celadet Elî Bedirxan tîne bîra mirov. Lewma ji bilî şerê Komarê an nîqaşen siyasî bûyer û qewimandinên çandî her dem wek perçeyek ji jiyanê cihê xwe digrin. Hemû kovarênu ku wê demê derdikevin qala wan tê kirin. Hevalê Badîn Sadiqê Behadînê Amêdî kovara *Jînê* ku li Silêmaniyê derdikeve li ber wî radixe û pêşniyar dike ku helbestên xwe jê re bişîne (r.37). Li Silêmaniyê dema leheng qala Şêx Mehmûd dikan qala xwendina xwe ya *Bangî Heqê* dikan (r.33). Jale ji Bexdayê tevî nameyê hejmarek kovara *Gelawêjê* jî ji bo Badîn bi rê dike (r.64). Nûredîn Zaza ji Badîn re qala *Hawarê* dike û pesnê civaka edebî ya li Şamê dide. Beriya wê bazirgenekî ji kurdên Sûrî kovara *Hawarê* bi xwe re anije û Badîn ji wê fêrî tîpê latînî bûye; pê helbestan jî dinivîsîne. Helbestên xwe dide Zaza da ku di *Hawarê* de biweşîne (r.135). Zaza ji zanebûna wî ya tîpê latînî gelekî kêfxweş dibe û ev yek herdulan bêtir nêzî hev dike. Ji xwe beriya ku Zaza nas bike jî Badîn *Hawar* û *Jîn* dida ber hevdû û bêtir ji *Hawarê* hez dikir (r.37). Bavê Mujdeyê rojnameya *Agiriyê* ya serhildanê bi xwe re tîne malê û dixwîne (r.68). Di çapxaneyekê de sohbeta li ser mekîneya çapê tê kirin. Li vir mekîneya Şêx Mehmûd tê bîra vebêjer ku Şêx Mehmûd pê nameyan dinivîsand ku alikarî ji dewletên mezin dixwest û qet nedigîhaştin tu navnîşanan. Vêga *Hawarî Niştîmanî* li çapxanê li ber çapê ye (r.97). Kerîm û Badîn li Mehabadê diçin çayxaneya Las û Xezal¹⁵⁵ û li wê derê Menafê Kerîmî dibînin ku rojnameya Kurdistanê di destê wî de ye, dixwîne (r.19).

Yek hêmanên bingehîn ên hişekî netewekê wêje ye. Di *Mijabadê* de tevî leheng, mekan, rojname û kovarênu ku wek nîşaneyê hişê netewî kar dikan, wêjeyek netewî jî

¹⁵⁵ Las û Xezal: navê du lehengên çîrokek gelêrî ne.

cîhê xwe digre. Beriya her tiştî nivîs xwedî hêzek mezin e; ew qas ku tenê ew zora mirinê dibe (r.74). Vebêjer Badîn bi xwe tevî rojnívîsê û helbestan dinivîsîne. Her tim bi kitêba re heşîr neşîr e. Ji wêjeya kurdî agahdar e. Gazinan dike ku ka çîma dîwanên Cizîrî, Feqiyê Teyran, *Mem û Zîna Xanî* li Mehabadê peyda nabin. Li Silêmanî û Hewlîrê û Kerbela her wiha ye û li Amêdiyê jî çavê wî li berhemên Hacî Qadir, Herîq, Salim û Nalî nakeve. Di vî warî de “heremên Kurdan weke giravê ji hev qut di deryayekê de ne, pêwist e kelek û gemî û qeyik hebin xelkêngiravekê bîghîne giraveke din” (r.98). Ev kelek, gemî û qeyikêngiravekê bîghîne giraveke din çî ne? Ev desthilatdariya siyasî ye? Dewletek serbixwe ye? Bi awayekî eşkere bersivan nade. Lê di vê gazine de ev pirs jî veşartî ye ku xelkêngiravekê ew qas ji hevdû ne hayedar bin, ew ê ka çawa bibin netew û li ser dahatûyek hevpar bifikirin? Gelo ev roman wê yek ji wan be ku hişmendiya netewbûnê çêbîke û bike ku xwendevanê wê netewê texeyul bikin?

Hevalê Badîn Sadiq Behadînê Amêdî ku mamosneye cografyayê ye di nameya xwe ya ku ji Helepçeyê nivîsandiye de dibêje ku ew li ser edeba kurdî ya klasîk gotaran dinivîsîne, bi taybetî li ser helbestvanen kurmanc (r.107). Armanc dike ku Şêx Ehmedê Cizîrî, Xalid Axayê Zîbarî û Şêx Nûredînê Birîfkanî bi kurdêngor soran ku bi ziman û wêjeya kurmancî re eleqedar nabin û hêjayî naskirinê nabînin, bide nas kirin. Ew jî dipirse çîma ew qas bend û sînor hatine danîn û kî danîne? Di nav sohbetekê de wezîrê çandê Menafê Kerîm li hember gazine bi vî rengî soz dide wan ku di rojêng pêş de ew ê “li her yek helbestvanekî bigerin û toza salan ji ser dîwanêng wî hilînin û hemû berheman *bi hemû zaravayan çap bikin*”. Ji xwe ew roj nayêng ku komar vê armancê pêk bîne û hê jî dawî li van gazine nehatiye ku ew ji vê romanê re bûne mijar.

Amurê mirovatiyê yê herî girîng ku wan di vê alemê de biserketî kiriye, aqil e. Aqil rê li ber rizgarî û azadiyê vedike. Lê bi rîya aqil e ku mirov dikarin heqîqetê vesêrin jî. Dikarin rûpoşan çêbîkin û nehêlin dengê rastiyê bê. Bi çêkirina qeyd û bendan dikarin dengê dilê xwe nebihîzin. Aqil ew amûran bi mirovan dide çêkirin da ku ser neheqî an çewtiyan binixumînin an wan meşrû bikin. Lê kesêng dîn, nizanîn rûpoşa çêbîkin û heqîqetê vesêrin. Tiştê nayê hesabê wan nizanîn meşrû bikin. Ew ji qey û bendêng aqil azade ne û dengê dilê xwe guhdarîng dîkin an bi ya dilê xwe dîkin. Orf, adet, îdeolojî û berjewendiyêng şexsî û rojane nas nakin. Lewma tîrs jî li ba wan nîne; tîrs nînbe pêdiviya wan a xwe parastinê jî nîne. Lewma di *Mijabadê* de gelek rastî an rexne ji aliyê Emîral Axayê dîn ve tê gotin. Emîral Axa wek dînekî bawer dike ku “Mehabad bê derya nabe”, komar bê derya nikare li ser xwe bimîne. Tenê bi satilan avê dide hev û

bera çemê Sablaxê dide da ku çem mezin bibe û bibe derya û komarê bike giravekê û tanqên Heme Riza nikaribin bêñ. Ew bi dînbûna xwe qet hêvî nake ku wê temenê komarê dirêj be. Li gor Emîral Axa “çiya hîç in”. Ew qet baweriya xwe bi çiyayêñ ku di nav kurdan de bi azadî û serhildanan ve tê eynî kirin û pê pişta xwe xurt dikin, nîne. Tenê ew e ku pesnê çiya nade û wan bê qîmet dike. Dost vê gotina ku bi dînekî dide gotin wisa rave dike: “Çiya tenê hebûna kurdan neparast, paşketina wan jî parast... Divê kurd xwe ji dêvla çiya xwe bispêrin çiyayê aqil û mejî da ku bikaribin xwe bi xelkê bidin qebûlkirin. Di her şoreşekê kurdî de çiya hebûn. Lê siyaseta Ataturk ji çiyayê Dêrsimê, planêñ Pehlewiyan ji çiyayêñ Mehabadê xurttir bûn. Di her çiyayekî me de têkçûna şoreşekê heye”¹⁵⁶. Di berdewamiya hevpeyvîna xwe de tîne ziman ku nivîskar bi xwe jî ji dînêñ (bi aqil) in û di hêlanekê de ye ku di navbera dînbûn an baqiliyê de diheje.

Dost di hevpeyvînêñ xwe de tîne ziman ku ew tenê dixwaze pirsan “biteqîne”, lê ew bersivêñ wan jî diteqîne. Nivîskarekî ku meseleyêñ siyasî û civakî ji xwe re kiribe mijar, nikare bi xwe ku bersivan nede. Ji xwe gotibû ku ew dixwaze dîrokê ji nû de binivîsîne. Tevî pirsan bersivêñ wî hene ku ji nû de dinivîsîne. Dema li bersivan digere di nav çarçoveyek fireh de dinêre û hewl dide rê li ber nîqaşa li ser binyada civaka kurd veke. Ji nirxandina bûyerêñ empîrîk û tevgerêñ şexsan derbas dibe û li sedemên binyadî dinêre. Wek mînak, eşîrtî yek ji ev sedemên têkçûna Komarê ya binyadî ne ku bi tevgerêñ serokeşîrekî an endamên eşîrekê nikare bêñ rave kirin. Di nav civaka kurd de çanda eşîrtiyê serdest e û “her serokeşîrek, kesekî din ser xwe re nabîne, bedena wî di bin ebaya komarê de dixwire” (r.160). Kerîm gelekî ji eşîre hez dike û di civatan de dibêje “Eger rojekê Şikak komarekê li Şino û Urmîyê ava bikin, ez dev ji Mehabadê berdidim” (r.158). “Serokên êl û eşîran bawerî bi wan nabe, tenê berjewendiyêñ wan di serê wan de digerin, hayê wan ji xebatêñ netewî nîne” (r.165). Di bin vê lêgerîna sedemên binyadî de pêşniyara dîroknûsiyekê jî heye. Beriya ku bigêhînin encaman divê analîzek civakê ya sosyolojîk bê kirin û bandora sedemên civakî yên li ser tevgerêñ mirovan bê tehlîl kirin.

Axaftinêñ Emîral Axa yên ku li ser deryayê di nav bersivêñ ji bo pirsêñ li ser têkçûna Komara Mehabadê ye. Tinebûna deryayê kurdan bêtir muhtacî dewletên mezin dikin û ev dewletna jî her tim li gor berjewendiyêñ xwe tevdigerin. Gotina Emîral Axa “Derya, ne derya be Komar hîç e” (r.20) ku di xwe de bêhêvîtiyek mezin dihewîne, ji

¹⁵⁶ Kenan Kirkaya, Davut Ozalp, h.m.

ber ku ev rastiya erdnigarî nikare bê guhertin. Gelo ev tespîta bêhêvîtiyê ye an bangek ji bo lêgerîna rêbazên nû ye? Bersiva vê ne diyar e.

Babeteke din ku xwendevan gelek caran rû bi rû dimîne, rexneya li kurdan bi xwe ye. Bêyî ku pirs bê kirin nezanî û îbretnegirtina kurdan bi qasî nedurustbûna dewletên mezin sedemên têkçûn û bindestiyê ye. “Ji xwe peyman kurdan dixapînin, baweriyan wan bi sond û pêymanan bûye bela serê wan... Em zû dixapin zû.” Ev ji ber kêmasiya bîra civakî û bêparbûrna perspektîfa dîrokî ye. Nezanîna dîrokê ye ku ew baweriya bi peymanê dewletên mezin re naşikê û her tim tê dubarekirin, wek di hevpeyvîneke xwe de dibêje “Me eger qenc peymana Lozanê xwendibûya, em nediketin xefka peymana Cezayîrê... Em kurd miletékî dîroka xwe naxwînin, xelk dîroka me dixwînin.”¹⁵⁷ û lewma werîs lehengekî nas e ji bo kurdan, me dît geh di xewnan de ye, geh wek baranê ji jor de dibare û dikana werîsan her tim çalak e, navê weris û pêşewayê kurd li ba hevdû ne û di her dewrekê de di hustiyê pêşewakî de ye.

d. 3gav û 3darek

3 gav û 3darek romana duyem a Jan Dost e. Nivîskar, di vê romanê de serhildana Şêx Seîd kiriye mijar ku serlehengê wî Şêx Seîd bi xwe ye û bin-navê kitêbê ji Şeva dawî di jiyana Şêx Seîdê Kal de ye. Roman tenê ji destpêkê heta dawiyê serpêhatiya serhildanê venabêje. Ji zaroktiya Şêx Seîd dest pê dike û bi têkçûna serhildanê û bidarvekirina Şêx Seîd re bi dawî dibe. Şeva dawî ku Şêx Seîd tînin ber sêdarê û sê gav dimîne ku werîs têkeve hustiyê wî hemû jiyana Şêx tê ber çavên wî. Bi saya vê teknîka hûnandinê nivîskar dikare bi hêsanî di nav zaroktî an xortanî û wê şeva dawîn biçe û bê. Jiyana Şêx bi her alî ve, malbat, evîn, dema feqetiyê, serhildan tê de, hemû di hişê wî de an di ber xwendevan re derbas dibe. Ji bilî dema serhildanê, bi qismî ji be, xwendevan diçe 60-70 sal beriya serhildanê ji.

Nivîskar di hevpeyvîneke¹⁵⁸ xwe de xwendevan hişyar dike ku wî Şêx Seîdekî bi xeyalê xwe afirandiye. Ew Şêx Seîdê romanê ye, ne yê dîrokê ye. Sedema vê ji wek bêderfetbûna lêkolînkinren li ser serhildanê destnîşan dike. Ji xwe di romanûsiya wî de bi awayekî giştî, digel ku dîrok ji bo wî ewqas girîng e, estetîka wêjeyî nabe qurbana vegotina bûyeran. Ew ji çawaniya wêjeyî ya berhemê tawîz nade û vegotina wî ya alegorîk, zimanê helbestkî xwendevan dikare bikşîne nav xwe. Di dawiyê de herî zêde

¹⁵⁷ Kenan Kirkaya, Davut Ozalp, h.m.

¹⁵⁸ Cemil Oğuz, h.m.

tama wêjeyî li dewsê dimîne. Di romana kurdî de ew kêmasiya teswîrên derûnî yên lehengan di romanên Dost de ji holê radibe.

Metafora tîbûnê ku ji zaroktiya wî heta ber sêdarê dev ji wî bernadeye, her tim bi wî re ye. Geh di zaroktiya xwe de dema ku bêyî destûra dê û bavê xwe û bêyî paşîvê rojî digre tîbûn gelekî zora wî dibe. Geh dema feqe bû bi hevalên xwe re ava şor vedixwarin da ku keçek bedew di xewna xwe de bibinin. Keçika dihat xewna wî jî tasa vala dida destê wî. Evîndara wî Perîxanê dema dike ji bo wî satilek av ji bîrê bikşîne dikeve xwarê û ev dibe dawiya jiyana wê. Ji xwe ji vir û wê de qet tûcarî tîbûna wî naşike; her tim tî ye. Pêncî sal e tîbûna wê nîvroyê bûye dirdirk bi giyanê wî ve, bûye çolek di devê wî de û bi tu avê nayê şikandin. Bûye pirseke şor ku dixwaze ji Xwedê bike û tu rê nabîne. Ne ava hezar kaniyên sar çemên rewan û ava zemzemê tîbûna wî naşkîne û didome heta ber sêdarê (r.115). Dema leşkerên tirk wî û hevalên wî li ser pira çemê Mûradê derdest dikan, meha rojiyê ye û hê fitara xwe venekirine. Beriya ku bînin ber sêdarê di hepsê de tî ye. Heta hevalekî wî gazî leşkerên ku wî dibe ku Şêx tî ye. Lê deng naçe wan. Vêga li ber sêdarê jî tî ye û tî diçe dinya din, ba Xwedê.

Di romanê de tîbûna Şêx ewqas baş cihê xwe girtiye ku dikare bi hêsanî wek bêparbûna kurdan a azadî û serxwebûnê, bêsiûdiya wan, bêçarebûna wan û hemû kêmasiyên wan ku her dem bi wan re ne, bê şîrovekirin. Çawa ku di jiyana wî de tîbûn dev ji Şêx bernade û her tim devî wî zuha ye, têkçûn jî dev ji kurdan bernade; her tim giyanê wan zuha dike û situxwar dihêle. Mirov dikare bibêje heta kurd azad û serbixwe nebin, wê bêsiudî û bêçaretî dev ji lehengên romana kurdî bernedin. Ya na çîma mirov li ser çemê Muradê tî bê derdestkirin û li ber çemê Dicleyê tî bê darvekirin.

Çemê Dicleyê haya wê ji tîbûna Şêx nîne. Çawa ku haya gelek êl û eşîran ji serhildana wî tinebe an guhê xwe şîma kiribin, haya kaniyên Firat, çemên Zê û Xabûr, çemên Seblax û Ciwanro jî ji wî û tîbûna wî nebûn (r.52). Dema yên herî nêz haya wan ji wî tinebin, elbet wê haya Thames û Seinê û Volga jî ji wî tinebe. Haya dewletên xwedyî ev çeman jî ji kurdan û ji derd û azarên wan nedibû. Seyid Riza, Simkoyê Şîkakî, Şêx Mehmûdê Silêmaniyê hawara wan de nehatin. Îcar kurd wê çîma gazinan ji dewletên mezin bikin.

Xidirê Botî û Xalisê Bedlîsî du lehengên dîn in ku ji ber rastiyên biaqilan hew debar kirine û ji rastiya vê alemê xwe bi dûr xistine an aqilê wan ewqas bêaqilî hilnegirtiye. Lê kakila “rastiyê” di deste wan de ye, wek Emîral Axayê Mijabadê. Şêx Xidirê Botî li Mûşê dema feqetiya xwe de nas kiriye. Ew bi xwe ji Cizîra Botanê ye. Piştî têkçûna Mîr Bedirxan pêxwas û peya bere xwe daye hatiye Mûşê. Li gor gotina wî

ev bîst sal e her ûn tê ber mizgefta Eladîn Beg û gwîzênu ku ji keşkula xwe derdixe diavêje ser qubeyê mizgeftê. Li bendê ye ku gwîzênu wî li ser qubê bisekine. Kes rojekê jê napisse ka çima wisa dike. Cara ewil Şêx vê pirse jê dike. Nabêje ew gwîz gwîza Bedirxan Paşa ye, gwîza mîrê Botan, ya hêviyên wî yên pelixî ye. Di tevahiya romanê de peyva têkçûnê nayê bikaranîn. Şûna wê “gwîz li ser qube nesekîne” an “gwîzê qub negirt” tê bikaranîn. Ev peyva tal ku di dîroka kurdan de peyva herî zêde cihê xwe girtiye, bi qubnegirtina gwîzan şenber dibe. Xidirê Botî çareseriya qubegirtina gwîzan jî li cem wî heye: “Eger xwediyyê gwîzan bi hev re li ber qubekê rawestin û gwîzênu xwe biavêjin ser dê qûb di bin gwîzan de bimîne” (r.175). Şêx dema li ber sêdarê Seyid Riza, Simkoyê Şikakî, Şêx Mehmûdê Silêmaniyê ku nehatibûn hawara wan tîne bîra xwe, ev peyva Xidirê Botî jî tê bîra wî.

Xalisê Bidlîsî hevalê Şêx yê feqetiyê ye. Bi qelûnkişıya xwe dihate nas kirin. Di qetla ermenan de jina wî ya ermen tê kuştin û ew jî ji alema “biaqil”an bar dike. Îcar ew di nav cilên Xidirê Botî de ketiye dewsa wî û hewl dide gwîza xwe li ser qubê bide sekinandin. Çawa ku taliya serhildanan neguheriye û encam tê dubarekirin, vêga dînênu kurdan jî hevdû dubare dikin û berdewamiya xwe pêk tînin. Rawestina gwîzan a li ser qubê ji bo “biaqil”an tiştekî ne gengaz e; wek ku ji bo hin kesan azadî û serxwebûn tiştekî ne gengaz û bêhêvîtî be. Lê çawa bersiv li ba Xidirê Botî hebû, li ba Xalisê Bidlîsî jî heye. Hin caran “sûc sûcê qubê ye.” Lê dikare bêñ dûz kirin jî: “Ma çawa nasekinin... bes divê qub dûz bibin!... qub girikên hevîr in, bi tîra zorê dûz dibin” (r.121). Ew dizane ku mirov dema li çareserîyan bigere divê rûpoşen ser rastiyê ku aqil ew dane ser, wan rake û bi awayekî tazî bibine. Astengiyên li ber rêya azadî û serxwebûnê hatine raxistin jî wek giroverbûna qaban in. Çima qub neyê dûz kirin û çima tiştên ji bo netewê din gengaz in, ji bo kurdan ne gengaz bin? Bi sedsalan e ku serdestên kurdan û kurdên bi serdestan dixapin van rûpoşan nas nakin. Lewma gwîzênu wan qubê nagire û tenê tiştên li ber çavênu xwe dibînin. Yênu ku dikarin “ji ya xuya dibe derbas bibe” an jê wêdetir biçe jî “aqilê xwe winda dikin”. Hê di dema feqetiyê de Xidirê Botî wek ku dengek ji kûrahiya dîrokê de bipeyive û naxwaze ew bê dûbarekirin şîret li Şêx kiribû: “Kurê min, ...weke mîrê me neke, şopa romiyan ji ser singa welatê me hilîne, ne ji ser mecidîyan.” (r.63) Ger hemû yên “biaqil” wek Xidirê dîn bifikiriyana, gelo wê rewş hê wisa ba? Di tevahiya romanê de ev pirs her dem li ber guhê xwendevan olan dide.

Piştî biryardayina serhildanê de vebêjer bêhêvîtiyê bi gwîzênu Xalisê Bidlîsî ifade dike. Şêx û Yûsif Begê ji komeleya Istiqlala Kurdistan (Azadî) li hev civiyan e. Şêx

pêşniyara Azadiyê dipejirîne ku agirê serhildanê vêxîne. Li vir rastî Xalis tê. Çawa ku Xalis dike ber wî de were şerwalê wî yê botanî li kevirekî digere, dilikume û bi dev de tê xwarê. Tûrê wî jî dikeve xwarê û gwîzên tê de jê dipekin (r.153-154). Pêşbînek neyênî ya li ser serhildanê dikare ew qas bi awayekî kurt û zelal û estetîkî bê vegotin!

Mijareke din ku di romanê de rû dide meseleya dîndariyê ye. Hin netewperwerên sekuler dema ku li ser sedemên biserneketina kurdan nîqaş dikin digihêjin wê encamê ku di rêya azadî û serxwebûnê de dîndariya kurdan sedemeke mezin a biserneketina wan e. Bi rêya vê tehlîlê rexnegirtina li dîndariyê bûye hîmeke girîng di vegotina netewperweriya kurd de. Li gor vê vegotinê, kurdan ji azadiya xwe bêtir girîngî dane selameta dînê islamê û hêz û qaweta xwe di ber rêya islamiyetê de xerc kirine. Hestê umetiyê rê li ber hestênetewî girtine û kurdan xwe wek neteweke ji tirk, ereb û farisan cuda nehesibandine. Her tim xwe wek perçeyek ji umeta islamê dîtine. Lewma ger kurd ne misilman bûna wê berî demek zêde serbixwe bibûna. Di romanê de rûdana ol yek ji pirsên nivîskar in ku li ser dîrokê, bi gotina wî, dixwaze biteqîne. Jan Dost di hevpeyvîna xwe ya bi Fatma Savci re¹⁵⁹ bi vê vegotinê re neliheviya xwe tîne ziman. Li gor wî ev nikare bibe bersivek rast û esasî. Dipirse ka çima tirk bi misilmantiya xwe çûn heta deriye Wîenayê? Hindik mabû deryaya spî bibe deryaya osmanî, lê çima Selaheddînê Eyyubî yê kurd çima imperetoriyek kurd di bin sîbera islamê de danemezirand? Dikare ev pirs jî li gotina Dost bê zêdekirin ku çima digel hemû ereb misilman in (tenê sedaneyek piçûk ne misilman in) ew qas netew-dewletên wan hene û her netew tevî misilmantiya xwe li ser axa xwe serxwebûna xwe diparêzin? Di romanê de vebêjer/nivîskar li hemberî ol û dîndariyê bi mesafe ye. Dibe ku hin gotinê wî hin kesan aciz bike an zêde wêrek bê dîtin. Heta dikare li dijî ol û xwedê bêñ nirxandin. Wek mînak: "...li jor xwedayekî destheşt û devmirî û çavbibend û guhşimakirî." (r.79), "...eşîrên mezin nebûn stûn û xwedê jî nabe stûn." (r.22), "Gelo ji van sêdaran jî mezintir e xwedê." (r.41). Ev gotinêن Şêx bi xwe ne. Lî wek şêxekî bi tenê û pêşengê serhildanek têkçûyî ku dibîne di 46 sêdaran de 46 hevrîyên wî li ber çavêñ wî yek bi yek têñ darvekirin, tene sê gav maye stuyê wî têkeve werîs nikare ku gazinan ji Xwedê neke. Gazinêñ hêvîşikestinê ne ku belkî wî her tim bawer kiribû ku Xwedê alikariya yên di cihê teng de dike. Wek hatibû gotin li hemberî Xwedê bi mesafe ye, li ber sêdarê û piştî ewqas qewimandinêñ nebixêr wî heqî di xwe de dibine ku di derheqê Xwedê de pirsan bike. Lî tu nîşaneyêñ nebawermendiyê nînin.

¹⁵⁹ Hevpeyvînek li gel nivîskar Jan Dost, http://www.jandost.com/hev_savci.html. 04 Nîsan 2012.

Rexne ji ol bêtir li dîndaran û li şîroveya wan a olî tê kirin. Ol bi xwe nikare bê sûcdar kirin, lê yên ku wê şîrove dîkin divê bêñ rexnekirin. Gelek caran ku behsa serhildana Bedirxan Paşa dibe, ev wek rabûna li ber weliyulemrî û derketina ji dîn tê şîrovekirin (r.87). Hin mela dan û stendinêñ bi rûsan re li dijî şerîetê dibînin (r.87) bêyî ku li berjewendî an pêdiviyêñ xwe yên siyâsî bifikirin. Serê xwe zêde naêşînin ku fam bikin ku ew dewlet in û her dewlet, işê wan ne bi dîn e lê bi siyasetê ye. Ew dikarin şerê ji yê dînê xwe jî bikin, dikarin dîn ji bo siyaseta xwe bike hincet jî. Bi van axaftinan re ew pirsên ku her tim li ber guhê xwendevan dikeve lê pêdîvî nîne ku bê gotin ev in: Lê çîma osmaniyan nedigotin filan dewlet ne misilman e û pêwendiyêñ xwe yên siyâsî datanîn? Osmaniyyêñ ku xelîfetî jî di destê wan de bû, êrîş dibirin ser qewmêñ misilman û axa wan dagir dikirin. Kurd çîma dîn her tim di aleyhê xwe de şîrove dîkin û haya wan ji bayê dînyê nîne?

Şêx Seîdê ku Dost teswîr dike xwe ji astengiyêñ dîndariyê xilas kiriye û wek miletêñ din dikare berjewendiyêñ miletê xwe bide pêşıya ola xwe. Rojekê, beriya ku bêñ derdest kirin, li ber çemê Mûradê Şêx pirsa “quble li ku ye?” wek “Semta Diyarbekirê bigre, quble li wir e” (r.198) dibersivîne. Lê gelek sal berê Xidirê Botî jî gotibû “Mîrê me li Şama şerîf e, berê xwe dide Botanê û nimêj dike” (r.62). Şêx li ber sêdarê tîne bîra xwe ku hê heft salî bû bi zora bavê xwe azan dabû, “hemû mirîdêñ tekiyeyê rabûbûn nimêjê. Lê tivingan ji bo kurdan azan dan, hemû nehatin nimêje. Ew nimêj li mizgeftan bi destnimêjek sivik bi avê yan jî bi axê dibû, lê nimêja azadiyê? Destnimêjek bi xwînê jê re divabû, loma jî her kes nehat” (r.35-36). Ya na dîn negotiye ku nimêja azadiyê nabe an bi tivingan azan nabe. Ma miletê din her tim wisa nakin? Ew çîma bi kurdan ewqas zehmet hat, pirsek ji pirsên vebêjer ev e.

Di romanekê dîrokî de kitêba li ser dîroka kurdan, *Şerefnameyê* jî cihê xwe girtiye. Şêx Seîd vê kitêba Şerefhanê Bidlîsî cara ewil li Mûşê li ba seydayê xwe dibine. Cara ewil fîr dibe ku tarîzek kurdan a nivîskî heye. Seydayê wî ji Quranê bêtir bi ser de xwar dibe. Beramberkirina bi Quranê ne ew e ku wê dike şuna Quranê, lê girîngiya ku nivîskar/vebêjer dide tarîxê destnîşan dide. Çawa ku tarîx hebûna miletekî be, *Şerefname* jî hebûna kurdan destnîşan dike, wek ku Quran hebûna misilmanan destnîşan bide. *Şerefname* pirek yekta ye di navbera diho û îro de, ya duyem nîne. Lewma ew ewqas bi qîmet e li ba seydayê Şêx. Ev ji bo Şêx jî di navbera rabirdûyê û dewra wî de dibe pirek. Ger em ji bo hestêñ netewî û sazkirina îro û rabirdûyê de girîngiya dîrokê bînin bîra xwe, di çêbûna hestêñ Şêx yên netewî de, tevî şîroveyêñ dînyadîtî yên

seydayê wî, rola vê kitêbê heye. Bi gotineke din, nivîs û kitêb nifşan nêzî hevdû dikan, danehevekê pêk tînin ku rê li ber fîkr û ramanên nû vebin, bi taybetî jî kitêbên dîrokî!

Di romaneye dîrokî de perçeyêن bûyerekê ku ji bo vebêjê têñ neqandin, bi awayekî bi îro ve têñ girêdan. Di dawiya romanê de, dadger ji Şêx daxwaz dike da ji bo eskerêñ dewletê yêñ hatine kuştin lêborînê bixwaze ku dilêñ dayikêñ wan rihet bibin. Şêx bi pirsekê bersiva wî dide “Dê kî lêborînê ji dayikêñ bi hezaran kesêñ ku wan leşkeran kuştine bixwaze?” (r.206). Ev diyalog ji wê dewrê bêtir di îro de cihê xwe digre. Ji xwe ji bo rexnelêgirtina lêborînêñ îroyîn ev rêz hatine nivîsandin. Ev baş piştrast dike ku dîrok jî romanêñ dîrokî jî ne bi minasebeta vegotina rabirdûyê têñ nivîsandin, lê ew bêtir ji bo vegotina îro têñ nivîsandin. Ne îro be an ne dahatû be, dîrok ewqas nabe mijara eleqeyê û nîqaşan.

e. *Mîrname*

Mîrname romana sêyem a Jan Dost e ku serlehengê wê Ehmedê Xanî ye. Vê carê Dost ne bûyereke dîrokî lê helbestvanekî ku di dîroka wêjeya kurdî de xwedî ciyekî taybet e, hilbijartiye. Piştî *Mestureya* Tosinê Reşîd ev roman jî li ser şexsiyetekî wêjeyî ye.

Hûnandina wê ya serkeftî, tama nepeniya polisiyeyê tevî şêweya nivîskar a vegotinê di nav romanêñ kurmancî de wê datîne cihekî taybet. Roman bi awayekî polyphonic (pir-dengî), yanê tenê vebêjerekî romanê nîne lê her beşek ji aliye vebêjerekî din ve tê vegotin. Her vebêjer yek ji lehengêñ romanê ne jî. Beşa ewil ji aliye şexsê sêyem, lê bîst û yek beşê din her yek ji aliye yekî/yeke tê vegotin, navê vebêjeran di heman deme de sernavê beşan e jî: Teymûrê Fasiq, Emerê Xiznedar, Şengê, Hecî Zuhdiyê Bazirgan, Buharî, Mele Ferîd, Mîrza Sebrî, Dengbêj Dostoyê Ormewî, Recebê Terzî, Xalidê Çolaq, Sofî Heyderê Qersî, Şêx Seyfeddinê Cubbeşîn, Hekimê Fille, Mele Salihê Cizîrî, Selahaddînê Sehhaf, Selîmê Nalbend, Bengînê Dergevan, Şemsoyê Qewwal, Mirovê rûgirtî, Mîr, Mele Ismaîlê Bazidî. Piştî van hemûyan nameya Xanî ya ji mîr re nivîsandibû, cih digre. Her vebêjer bi nêrîna xwe, bi hestêñ xwe, li gor paşxaneya xwe, li gor zanebûna xwe û li gor tebeqeya xwe pêzanêñ xwe vedibêjin. Hemû Xanî nas dikan, bi awayekî pêwendiyêñ wan bi wî re çêbûne. Hin ji wî hez dikan, hin jê didexisin, (wek bavê Şengê) hin karê wî bê qîmet dibinin, hin ji tevgerêñ wî û ji *Mem û Zînê* aciz in.

Dost di hevpeyvînêñ xwe de dibêje ku wî xwestiye li ser ihtimala kuştina Xanî hin pirsan bike. Para vê pirsê jî tê de heye ku heta beşa dawiyê rûpel li ber xwendevan

ewqas zû diherike. Lê perspektîfa ku rê li ber vê pirsê vedike heta em bêjin ew perspektîfek îroyîn e. Sedemên muhtemel ên kuştina Xanî ku tê xwestin bê rojevê xwendevan rasterast tîne dixe nav civak û siyaseta îroyîn. Pişti xwendina kitêbê peyvên hêrî zêde di bîra mirov de dimîne an peyvên esasî yên romanê ev in: Pêwîstbûna desthilatdariyekê lê desthiltdariyek aso fireh, ji rexneyan re vekirî, ji nav tirkî, farisî, erebî û kurdî hilbijartina nivîsandina bi kurdî, rewşenbîrênu ku bikaribin ji bilî berjewendiyênen xwe yên şexsî temsîliyeta civaka xwe bikin, li du heqîqetê bigerin, biparêzin, bibêjin û lazim be li hemberî desthilatdariyê rabin. Pêwîstbûna xwenaskirina kurdan û wek netewekê (peyva netewê nayê bikaranîn lê ew tê qestkirin) xwedîlêderketina li hebûna xwe, naskirina “yên din” û li dijî wan yekbûn. Ev hemû meseleyênen îroyîn in û her tim li ser tênen nîqaşkirin. Dost di hevpeyvîna xwe ya bi H. Dewrêş¹⁶⁰ re armanca nivîsandina romana xwe bi awayekî dilvekirî û ji dil eşkere dike. Wisa dibêje: “*Mîrname* ji dîrokê wêdetir romana îro ye. Xanî û dema wî behane ye. Ez Xanî me, tu Xanî yî û her nivîskarekî dilrast Xanî bi xwe ye û nikare nameya xwe bigihîne mîr!” Wek ku Remezan Alan¹⁶¹ di nivîsa xwe de diyar dike mebestyarî (amaçsallık) her tim berbiçav e û roman bûye amûrê vegotina gazinênen îroyîn.

Di nameya ku navê xwe daye romanê û di dawiya romanê de hatiye bicihkirin de, her çiqas hemû nayê xwendin jî, berpirsiyariyênen rewşenbîrekî ku civaka xwe temsil dike, xuya dibe. Xanî li vir rexneyênen pir tûj li mîr dike û wî hişyar dike. “Ji roja ku te mîrîtî bi çar hezar floriyênen zêr ji paşayê Wanê kirî û fermaneke sultanî pê deranî, min dizanîbû ku tu ne layiqê textê mîrîtiya Serhedan û.” (r.225) “Zulm û zora ku li xelqê dikî, pişta wan bi xûkî û bacan hatî şikandin...” (r.226) “Eceman jî kurmanc dane ber tîrê... em di nava wan de bûne berxê kîrê...” (r.227). “Eger te destek dabûya min, dê min Bazîd bikira bajarekî weke bajarêd ereb û ecem û romiyan. Cihê ilm û edebê, cihê medrese û mizgeftan û... (r.227)” Ev nameya ku xuya ye bûye sedema kuştina wî de Xanî wek rewşenbîrekî dewra modern tevdigere. Xwedî pêşniyazên siyasî û çandî ye; şâşî û neheqiyênen ku mîr kirîye/dike bi awayekî eşkere dibêje û wî vedixwîne ser rîya rast. Ev tam kirinênen ku ji rewşenbîrekî modern tênen hêvî kirin û wek berpirsiyariyênen wî/wê tê qebûl kirin. Li gor perspektîfa modern li hemberî desthilatdariyê rewşenbîr li ser navê civakê an gel dawa heqîqetê dike, hesaban ji desthilatdariyê dipirse, li ber natewe. Ev nayê wê wateyê ku Xanî bi xwe ne şexsiyetekî wisa bû. Lê mirov bi guman

¹⁶⁰ Hesenê Dewrêş, “Hevpeyvîn bi Jan Dost re”, *Netkurd*, 6 Pûşber 2011.

¹⁶¹ Alan, h.b., r. 173.

e ku bi vî awayî be. Ji ber ku her fikr û raman di nav peywendek civakî, çandî û siyasî dikare bê fam kirin; bi dînamîkên xwe yên civakî têne ravekirin. Di romanê de delîlên vê peywend û dînamîkan nînin. Lewma bi nêrînek dîrokî û sosyolojîk ev helwesta Xanî ya di nameyê de anakronîk xuya dike. Ji xwe nivîskar gotibû ku ev romana îro ye. Ji ber vê ne pêwîst e em vê meseleye bêtir ji hevdû veçirînin.

Rexneyek ku Alan li *Mîrnameyê* dike ev e ku anakronîzme fikrî heye¹⁶². Divê ev jî bê gotin ku di romanê de gelek meseleyênu ku wek yên îroyîn xuya dikan, bingehek wan di *Mem û Zîna* Xanî de heye. Sedema nivîskar ku ev mesele bi rihetî ew ji xwe re kiriye mijar, ristên Xanî bi xwe ne. Ji aliye kî ve ji bo xwendevanê ku dibaçeya *Mem û Zînê* xwendibe gelek mijar dikare anakronîk xuya nebe. Tê zanîn ku ji bo Xanî “em” û “ew/yên din” zelal e; “kurd” li aliye kî û “tirk,ereb û ecem” li aliye kî ne: *Zora me nedibirin van tirkan.. Bindest û perişan û şikestî/Bo tirk û ecem dikan perestî!, Binêr ji axa ereb ta gurcan/Welatê kurdan bûye wek bircan*¹⁶³. Dibe ku Dost pişta xwe bi rihetî dabe van ristan dema Xanî şîret li Recebê Terzî dikir. “Em li vir dûra hane ji Roma reş û finasên wan xelas nebûne, tu berê xwe didî memeleketê wan! Ma tu nizanî ku hindî mirov dûrî Romê be nêzîkî xwedê ye!” (r.98). Receb diçe û tevlî artêşa osmanî dibe û piştî gelek serpêhatiyan vedigere tê Bazidê. Bi xwendina *Mem û Zînê* re digihêje vê encamê: “... ku madam şer e, divê li dijî Romê be ne ji bo wan be.” (r.111). Ku ji bo nivîskar dema Xanî behane be ev behaneyek têra xwe derfet dide nivîskar.

Nivîsandina bi kurdî mijarek din e ku bi xwendevanan re (yên ku berhemên Xanî nas dikan) pir aşina tê, ji ber ku mijareke ku îro herî zêde tê nîqaşkirin û ji kêmasiya wê gazin tê kirin. *Mem û Zîn* û berhemên din ên Xanî ku bi kurdî hatine nivîsandin Ehmedê Xanî îro li ber dilê her kurdekî gihandiye mertebeya herî bilind. Lê beşa ku li ser mebesta nivîsandina *Mem û Zînê* bi zimanê kurdî, giliyên wî ji demê û xelkên zemanê xwe (beşa 6.) Xanî her dem kiriye pêşengê zimanperwer/kurdîperweriyê. Malikên wî yên li ser zimanê kurdî îro wek ala zimanperweriyê kar dikan. Lewma meseleya ziman jî bêyî teredûda ku têkeve nav anakronîzmê bi rihetî li ser hatiye rawestandin. Emerê Xiznedar ku karê jiberkirina Xanî ya Quranê li wî hatiye spartin, tevî dersên Quranê, serpêhatiyê kurmanca, tarîxa Bidlîsê û gelek mijarêni bi vî rengî fêrî Xanî dike. Li vir

¹⁶² Alan, h.b., 173.

¹⁶³ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, ç. 1, bi kurdiya îro: Jan Dost, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008, r. 36-37.

*Şerefname*¹⁶⁴, wek amûreke sazkirina hişmendiya dîrokî, careke din derdikeve pêşberî me. Bi vê kitêbê re perçebûna kurmancan û nelihirkirina serokên wan, bêdewletiya wan bala Xanî dikşîne. Ew pirsa ku qet nehatibû bîra mamosleyê wî, dike: Çima *Şerefname* bi farisî ye? Gerçî Emerê Xiznedar, bi mînak ji wî re bêqîmetbûna kurdî jî vegotibû. Berê behsa Şukriyê Bidlîsî kiribû ku çawa bi kurmancî dinivîsand û kesî guh nedidayê, pişt re bi farisî û tirkî nivîsandibû û di civata siltan Selîm de cih girtibû. (r.36-37). Buharî helbestvanekî kurd e ku kurmancî biçuk didît û nedixwest qesîdeyan bi kurmancî binivîsîne. Bi saya şîret û handanê Xanî, dest bi nivîsandina bi kurdî dike. Beriya vê Xanî rojekê jê dipirse: “Ma heta kengî tê bi zimanê romiyan binivîsî! Tu ji kê re dinivîsî keko!... ji kurmanciya xwe bawer be û bi dayika xwe re wefadar be!...” (r.63).

Desthilatdarên kurd ên dewra Xanî ji xwe qîmetê kurdî li ba wan nîne. Wek rexneya ku li siyasetmedarên îro tê kirin, mîr û derdora xwe bi qîmetnedayina berhemên kurdî û bêtéhemuliya wan li hemberî fîkrêna cuda tên súcdarkirin. Çima ku pesnê Mîr nayê dayin û rexne lê tê kirin Mîr ji *Mem û Zînê* aciz dibe, di şevbûhêrkan de naxwaze lê guhdarî bike. Şîroveya wî ya di derheqê şeytên de, erotîzma di navbera Tacdîn û Sitiyê de ji aliyê nehezkiriyên wî li ba mîr tê gîlî kirin, ew û berhema xwe her tê bêqîmet kirin. Di her dewrê de desthilatdarî ji rexne û fîkrêna cuda aciz dibin û li gor peywenda her dewrê bi awayekî têna ceza kirin jî. Elbet ev li gor civakê û awayê desthilatdariyê ji hevdû cuda ne. Lê ev rexneyê li Xanî têna kirin jî hemû rexneyê iroyîn in ku li rewşenbîran têna kirin. Gelo di dema Xanî de bi rastî rexneyê wisa lê hatin kirin an na, em bi vê nizanin û bi qasî zanebûnê me tu delîlên bi vî rengî nînin. Dibe ku bê gotin ku ev roman e û nivîskar dikare teserufêna wisa bike. Lê ewçax nivîskar ji ìmajeke şaş ya di derheqê dewrekê de dibe berpirsiyar. Gelek ji xwendevanên romanên dîrokî di heman demê de ne xwendevanên jîr ên dîrokê jî ne. Gelek caran zanebûna wan a di derheqê dîrokê de di nav sînorêna romanên dîrokî de dimîne. Heta wan dikarin têxin dewsa berhemên dîrokî jî. Ev malûm e ku berhemên dîrokî ku bi zimanekî akademîk û ziwa têna nivîsandin nikare bi zimanê wêjeyê têkeve hevrikiyê û ya

¹⁶⁴ Ev balkêş e ku pişî di *3gav û 3darekê* û *Mestûreyê* di romanekî dîrokî de *Şerefname* careke din derdikeve pêşberî me. Ev berhem ku dikare wek destpêka dîroknûsiya kurdî bê qebûl kirin bi rêya wêjeyê danasîna wê jî tê kirin. Ji ber ku ew wêjeye ku heta vêga dikare herî zêde bigihêne ber destê xwendevanan. Lewma ji amrazbûnê xilas nabe.

din ji xwe berhemên li ser dîroka kurdan jî gelek kêm in an digihêjin gelek kêm xwendevanan. Îcar ev barê romanên dîrokî girantir û girîngtir dike.

Vegotinek din a îroyîn lê hêza xwe ji malikên Xanî digre vegotina li ser dîn e. Şîroveya Xanî ya misilmantiyê ne ummetî ye. Ew kiriye nav kirasê kurdayetiyê û kiriye malê xwe da ku li ber sernuximantina kurdayetiyê bê girtin û li ser navê biratiya misilmanan nebe amûra xwe-biyanîbûna kurdan. Xanî gotibû ku “Bila kurmanc bibin yek, da ku rom û ecem xulamiya wan bikin!” (r.84). Di romanê de jî Xanî di xutbeyê de dua ji xelîfe re nake. Qaîdeyên xutbe gotinê diguhere û li şûna ku bibêje gelî misilmanan dibêje: Gelî kurmancan! Ev helwestek îroyîn e ku netewperweriya kurd ji mela û alimên dîndar hêvî dikin.

ENCAM

Yekem romana kurdî ya dîrokî *Xatê Xanim* di sala 1959 de, bîst û çar sal piştî romana yekem a kurdî *Şivanê Kurmanca* hatiye weşandin. Li gor temenê romana dîrokî ya di wêjeya dinyayê de û ya netewên cîranan, tirk, ereb û farisan de, ev temenekî gelekî kurt e. Digel vî temenê kurt, di romana kurdî ya dîrokî de ji destpêkê heta îro gelek guherandin çêbûne. Di destpêkê de ji bo romanûsên ji Qafqasyayê (Ereb Şemo, Eliyê Ebdilrehman) ji endîşeyên wêjeyî û estetîkî bêtir qaîdeyên realîzma sosyalîst li pêş bûn. Teswîrên derûnî û cudatiyên takekesî cih nedigirtin. Lê di van romanen de realîzma sosyalîst ji kurdewariyê ne bêpar bû. Netewperweriyek ku îro dihate hêvî kirin di dîrokê de dihate bicih kirin, lê qaîdeyên sosyalîzmê jî lê dihate bar kirin. Di romanen dîrokî de ku ji aliyê kurdên bakurê Kurdistanê li diasporayê hatine nivîsandin de vegotina bûyerên dîrokî serdest bû. Di wan de endîşeya fêrkirina dîrokê, sazkirina

hişmendiyek dîrokî û bîrek civakî her daîm li pêş bû. Wek ku ne roman bin lê berhemên dîroknûsiyê bin ji teswîrên derûnî, takekesbûna lehengan bêpar bûn. Otorîteya nivîskar ya îlahî nedîhişt dengê lehengan bi xwe bê. Her dem nivîskar dipeyivî.

Bi Tosinê Reşîd re tevî ku teswîrên derûnî kete nav romana kurdî ya dîrokî, teswîrên dewrekê di rabirdûyê de jî di hişê xwendevanan de şenber bû. Di dawiya salên 1980an de bi Mehmed Uzun re hûnandina wêjeyî, zimanê wêjeyî kete nav romana kurdî ya dîrokî. Lê Uzun di dawiya romanûsiya xwe de di romana xwe de xwest ku di dîrokê de bi her awayî civakek îroyîn bibîne. Ji teswîra dewrekê bêtir wî hewl da hêvî û daxwazêن xwe yên çandî û siyasî di rabirdûyê de bibîne. Lewma ew anakronîzmaya beloq kir ku zimanê wêjeyî an estetîk li paş bimîne.

Bi romanûsiya Jan Dost re, mirov dikare bi heqî bibêje ku deriyekî nû li ber romana kurdî ya dîrokî vebû. Di her romanê de hûnandinek cuda û serketî, bi taybetî di *Mijabad û 3gav û 3darekê* de zimanekî helbestkî û alegorîk ku bi kêm peyvan gelek tiş vedigot û di hişê xwendevanê xwe de dem û mekan zindî dîkir, tîrbûnekê dide berheman. Vegotina xwe ya estetîkî di romana dawîn de jî domand, lê ew bi şewaza xwe ya pir-dengî bêtir berbiçav bû.

Piştî ku di bîst salên dawîn de di warê siyasî û çandî de guherîn çêbûn, di wêjeyê jî de ji aliyê çendahî û çawaniyê ve danehevek çêbû. Di encama vê danehevê de pêwendiyêن di navbera rewşenbîrên kurd û desthilatdariya kurd de, yanê ne tenê kurd û yên din lê nakokî û pirsgirêkên di nav civaka kurd bi xwe jî di romanen de cih girtine.

Bi awayekî giştî di romanen kurdî yên dîrokî de fêrkirina dîrokê, sazkirina bîrek civakî û dîrokî serdest e. Çawa ku di dîroknasiyê de pêdiviyêن îroyîn rolek mezin dileyize, di romanê de jî ev taybetî didome. Bi taybetî li Bakurê Kurdistanê bi kurdî herî zêde berhemên wêjeyî têن xwendin û ji bo rewşenbîrên kurdan ji qadêن din bêtir, wêje qada xwe-îfadekirinê ye. Lewma wêjeya kurdî, barê bêparbûna kurdan ya ji saziyên fermî jî hildigire û gelek mebestan dide ber xwe. Yek ji wan jî, çêkirina nasname û hişmendiyek kurdî ye. Pêşveçûnên siyasî her çiqas zêde bibin, barê wêjeyê dikare siviktir bibe û berê xwe ji mijarêن girecir bidin ber bi mijarêن cûr be cûr, hûrgilî û aliyêن cuda yên bûyerên dîrokî.

Di romanen Eliyê Ebdilrehman û Erebê Şemo de mijara romanekê her çiqas di dewrek pre-modern de derbas bibe jî civaka kurd bêtir şiklekî modern li civakê hatiye barkirin. Di dewreke ku peyva ‘netew’ê hê nînbû bi hêsanî wek netew qala kurdan tê kirin. Lehengêن wan jî wek takekesêن civake modern hatine teswîrkirin. Ew piranî, bi taybetî lehengêن erêni, ji hemû aîdiyetêن xwe yên malbatî, eşîrtî û dînî rizgar bûne; tenê

xwe aîdî netewa xwe dibînin ku li gor dewra xwe zêde anakronîk disekeinin. Peyva ‘Kurdistan’ê jî wek welatekî ku sînorên wê diyarkirî be tê behskirin. Ev sînor ji kuderê dest pê dike û li kuderê xilas dibe nayê famkirin. Digel vê temsîla kurdan û welatêwan Kurdistanê ya yekperçe, her çiqas li hemberî yên din, tîr an faris, tê şerkirin jî, ev temsîl di nav herikandina bûyeran de nedihatîn dîtin. Di şerekî li hemberî tîr an farisan de perçebûna kurdan derdiketin pêş. Şer him lokal dima him jî hêzên herêmeke lokal di nav şer de dihatin dîtin. Di vegotina her şerekî de her tim kurahî an berdewamiyek dîrokî jî hatine temsîlkirin.

Di romanê Eliyê Ebdilrehman û Erebê Şemo de endîşeyê rewşenbîrên civakek sosyalîst jî berbiçav bûn. Ji teswîra hiyerarşıya civakek feodal dûr sekinîne û çîn û tebeqeyê civakek sosyalîst di dewreke pre-modern de hatine bicîhkirin. Ji dêvla peyvîn axa û serokeşîr, serkar hatiye tercîhkirin. Mirovên ji rêzê jî wek kedkar hatine binavkirin. Lehengê kurd, ji bilî Mehmûdê Mêrekanî yê *Dimdimê*, qet bi awayekî neyêniyîne nehatine teswîrkirin. Wek rol-modelên civakekê ji neyêniyan azade bûn û bi her awayî şexsiyetê kamil bûn. Lehengê bi halê xwe yê zêde îdeal di her yek romanê de dikare bê dîtin û wek anakronîzma dikare bê binavkirin.

Tevî Eliyê Ebdilrehman û Erebê Şemo, di romanê Mehmed Uzun û Jan Dost de jî lehengê ermen û bi giştî yên xeyrî-muslîm bi awayekî pir erêni tê temsîlkirin. Her tim dostaniya wan a ji bav û kalan tê bênxêzkirin. Gelek caran pir zana û jîr tê temsîlkirin. Ermen li hemberî dewleta osmanî an tîr her daîm li aliyê kurdan e. Ji bo avakirina iro û dahatuyeke aram, nakokiyêni di navbera xeyrî-muslîm û kurdan ku berê çebûbin jî zêde kur û dûr naçin. Ev helwest tevî ku dikare wek daxwazek lêborînê bê xwendin, dikare wek daxwaza hevalbendiya ermen û kurdan an hevalbendiya mexdûran a li dijî dewleta tîrkan jî bê xwendin.

Wek romanê Jan Dost, Ereb Şemo û Tosinê Reşîd, di piraniya romanan de wek bertekke li dijî perçebûyinê hewlek çêkirina texeyulek Kurdistanê heye. Kurdistan ne welatekî yekperçe be jî, bi rîya çûn û hatinêni di navbera perçeyan de, bi bijrtina lehengê ji her yek perçeyî, di hisê xwendevanan de texeyula welatekî hevpar û netewekê tê çêkirin.

Xaleke herî berbiçav ev e ku di hemû romanan de kurd bindest in û li dijî vê rewşê di nav hewldana bidestxistina azadiyê de ne. Ya li derveyî vê nirxandinê dimîne, *Mîrname* ye; lehengê li dijî ‘yên din’ ne di nav hewldanekî ye. Nerazîbûna wî ne li dijî hêzên ‘yên din’ ne; ew ji desthilatdariya xwe ne razî ye û wek rewşenbîrekî berpirsiyar li hemberî desthilatdariyê derdikeve. Lê taliya wî jî têkçûn e. Tenê *Xatê Xanimê* de

lehang digihêje armanca xwe û bi têkçûn dawî nabe. Ji bo berterefkirina têkçûnan e ku dîrok bûye mijar. Bi rêya çêkirina rabirdûyek netewî, berxwedêr û bi bibîrxistina şexsiyetên qehreman tê hêvîkirin ku bîrek civakî û nasnameyek netewî bê sazkirin da ku ji rabirdûyê ders bê girtin û dahatûyek azad jî bê sazkirin.

Rûdana perspektîfa îro an jê wêdetir, di rabirdûyê de bicihkirina daxwaz an rediyeyên îroyîn anakronîzmek mezin a di romanên kurdî yên dîrokî de ye. Di dîrokê de mebesta piştrastkirina texeyulên îroyîn an ên li ser dahatûyê rê li ber tehrîfkirina dîrokê vedike. Ya herî girîng, ew temsîla ku nivîskar li gor daxwaz an armancê xwe teswîr kiriye, di serê xwendevan de dikare wek rastî cih bigre. Jê dêvla ku xwendevan ji dîrokê dersê bigre, temsilên anakronîk dikare îro bi xwe tehrîf bike.

ÇAVKANÎ

Âbîdînî, Hasan-i Mîr: *İran Öykü ve Romanının Yüz Yılı*, C. I., II., wer. Derya Örs. Nüsha Yayınları, Ankara, 2002.

Adsay, Fahriye: *Kültürel Sınırların Edilgen Taşıyıcıları, Kadınlar: Viranşehir Yezidileri Örneği*. Teza Masterê ya neçapkirî. Diyarbekir: Zanîngeha Dîcleyê, 2011.

Ahmedzade, Haşim: *Ulus ve Roman*, wer. A. Ziya Gundoğan, Weşanên Periyê, İstanbul, 2004.

Ahmedzade, Haşim: *Romana Kurdî û Nasname*, wer. F. Adsay, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2011.

Alakom, Rohat: *Bir Türk Subayının Ağrı İsyani Anıları*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol. 2011.

Alan, Remezan: *Bendname: Li ser ruhê edebiyatekê*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2009.

Altug, Fatih: “İstinat Duvarı Olarak Cezmi: ‘Tarihe Müstenit Hikaye.’” Di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.

- Anderson, Benedict:** *Hayali Cemaatler*, wer. İ. Savaşır. Metis Yayınları, İstanbul, 1995.
- Antakyaloğlu, Zeynep:** *Roman Kuramına Giriş*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2013.
- Armstrong, Nancy:** *How Novels Think: The Limits of Individualism from 1719-1900*, Colombia University Press, New York, 2005.
- Assmann, Jan:** *Kültürel Bellek*, c. 1, wer. Ayşe Tekin. Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2001.
- Bavê Nazê:** “Hevpeyvîna bi Erebê Şemo re ya berî 25 salan.” *Kovara W*, hej. 15, r. 31-40, Diyarbekir, 2007.
- Belge, Murat:** *Genesîs, “Büyük Ulusal Anlatı” ve Türklerin Kökenî*. İletişim Yayınları, İstanbul, 2008.
- Benjamin, Walter:** *Son Bakışta Aşk*, amad. Nurdan Gürbilek, Metis Yayınları, İstanbul, 2008.
- Bozarslan, Hamit:** “Türkiye’de (1919-1980) Yazılı Kürt Tarih Söylemi Üzerine Bazı Hususlar”, di nav Abbas Vali: ed., *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, wer. F. Adsay, Ü. Aydoğmuş, S. Kılıç. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005.
- Burke, Peter:** “History of Events and the Revival of Narrative”, di nav G. Roberts, ed., *The History and Narrative Reader*. London & New York: Routledge, London, 2001.
- Connerton, Paul:** *Toplumlar Nasıl Anımsar*, wer. A. Şener. Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 1999.
- Çamlibel, Yılmaz:** *Gilidax Bêxwedî Nîn e*, Weşanên Deng, Stenbol, 2005.
- Çamlibel, Yılmaz:** *Biro: Romana Serhildana Agiriyê*, Weşanên Deng, Amed, 2010.
- Dost, Jan:** *Mijabad*, Weşanxaneya Avesta. Stenbol, 2004.
- Dost, Jan:** *3 Gav û 3 Darek: Şeva dawî di jiyana Şêx Seîdê Kal de*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2007.
- Dost, Jan:** *Mîrname*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008.
- Dost, Jan:** “Pêşgotin”a *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, amad. Jan Dost, Weşanxaneya Nûbihar, Stenbol, 2010.
- Ehmedê Xanî:** *Mem û Zîn*, bi kurdiya îro: Jan Dost, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2008.
- Eliyê Ebdilrehman:** *Xatê Xanim*, Weşanxaneya Belkî, Diyarbekir, 2004.
- Eliyê Ebdilrehman:** *Şer Li Çiya, Şêx Zayir*, vgz. Hejarê Şamil. Weşanên Perî, Stenbol, 2011.
- Emre, İsmet:** *Roman ve Siyaset, Metin Tahilleri*, Anı Yayıncılık, Ankara, 2010.
- Eskerê Boyik:** “Erebê Şemo (1897-1978)”. *Kovara W*. hej.15, r.17-26. Diyarbekir, 2007.
- Ereb Şemo:** *Dimdim*, Lîs, Diyarbekir, 2007.
- Felski, Rita:** *Edebiyat Ne İşe Yarar*, wer. Emine Ayhan. Metis Yayınları, İstanbul, 2010.
- Gellner, Ernest:** *Uluslar ve Milliyetçilik*, wer. B. Ersanlı, G. Göksu Özdoğan. Hil yayınları, İstanbul, 2008.
- Gögebakan, Turgut:** *Tarihsel Roman Üzerine*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2004.
- Gürbilek, Nurdan:** *Kör Ayna, Kayıp Şark: Edebiyat ve Endişe*, İstanbul, Metis, 2007.
- Hasanpour, Amir:** *Kürdistan ’da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*, wer. İ. Bingöl. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005.

- İhsan Nurî Paşa:** *Ağrı Dağı İsyani*, Weşanxaneya Med, Stenbol, 1992.
- Jameson, Frederic:** *Modernizm İdeolojisi*, wer. K. Atakay, T. Birkan, Metis Yayınları, İstanbul, 2008.
- Jameson, Frederic:** *Siyasal Bilinçdışı*, wer. Yavuz Alogan, Mesut Varlık. Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2008.
- Jusdanis, Gregory:** *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür: Milli Edebiyatın İcadi*, wer. T. Birkan, Metis Yayınları, İstanbul, 1998.
- Lukacs, György:** *Tarihsel Roman*, wer. İ. Doğan. Epos yayınıları, Ankara, 2008.
- Kara, Halim:** “Mazinin Edebî Temsili: Tarihsel Romanda Fatih’ın Karakterizasyonu.” di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.
- Köroğlu, Erol:** “Milli Hakikat” Üzerine Tezler: Attila İlhan’ın Gazî Paşa’sında Tarihyazımı ile Tarihsel Roman Arasında Sınır İhlalleri”, di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*. De, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.
- Kutlay, Naci:** “Romana Kurdi”, *Kovara War*. hej. 5-6, r.125-135, Stenbol, 1998.
- Lukacs, György:** *Tarihsel Roman*, wer. İ. Doğan. Epos yayınıları, Ankara, 2008.
- Galleti, Mirella:** “Kürt Toplumunda Kadınların Rolü Üzerine Batılı Tasvirler,” di nav Shahrzad Mojab, 2005, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, de, wer. F. Adsay, E. Uşaklı, S. Kılıç. Weşanxaneya Avesta, Stenbol.
- Moran, Berna:** *Edebiyat Kuramaları ve Eleştiri*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2009.
- Najmabadi, Afsane:** “Sevgili ve Ana Olarak Erotik Vatan: Sevmek, Sahiplenmek, Korumak,” di nav, Ayşegül Altınay: (ed.), *Vatan, Millet, Kadınlar*, de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2004.
- Opperman, Serpil:** *Postmodern Roman Kuramı, Tarihyazımı, Yeni Tarihselcilik ve Roman*, Phoenix Yayınları, İstanbul.
- Ordîxanê Celîl:** *Kürt Kahramanlık Destanı Dîmdîm*, wer. İ. Kale, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2001.
- Parla, Jale:** *Don Kişot’tan Buguine Roman*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2010.
- Ranajit, Guha:** *Dünya-Tarihinin Sınırında Tarih*, wer. E. Ünal. Metis Yayınları, İstanbul, 2006.
- Têmûrê Xelîl:** “Erebê Şemo, Rûspîtiya Gelê Kurd”, *Kovara W*, hej. 15, r.29-30. Diyarbekir, 2007.
- Tolstoy, Leo:** *Savaş ve Barış*, wer. A. Tokathî, Sosyal yayınıları, İstanbul, 1984.
- Tosinê Reşîd:** *Mestûre, Serê Wê Hêjayî Tacê Bû*, Weşanxaneya Ronahî, Diyarbekir, 2010.
- Traverso, Enzo:** *Geçmişî Kullanma Kılavuzu*, wer. I. Ergüden, Versus Yayınları, İstanbul, 2009.
- Traverso, Enzo:** *Savaş Alanı Olarak Tarih, 20. Yüzyılın Zorbalıklarını Yorumlamak*, wer. Osman S. Binatlı, Ayrıntı Yayınları, İstanbul.

- Türkeş, Ömer:** “Romana Yazılan Tarih”, di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*. de, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.
- Türkeş, Ömer:** “Zimanek Dîroka Wêjeya Wî Zimanî Ye”, wer. Z. Yaş. *Kovara W*, hej.13, r. 57-60, Diyarbekir, 2007.
- Uslu, Mehmet Fatih:** “Greenblat’ın Yeni Tarihselci Eleştirisi,” di nav, Z.eynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*. İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.
- Uzun, Mehmed:** *Hawara Dîcleyê*, Cild I. Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2001.
- Uzun, Mehmed:** *Bîra Qederê*, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2002.
- Uzun, Mehmet:** *Hawara Dîcleyê*. Cild II, Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2003.
- Uzun, Mehmed:** *Bir Romanın Hatura Defteri*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2007.
- Uzun, Mehmed:** *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2008.
- Uzun, Mehmed:** *Siya Evînê*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2011.
- van Bruinessen, Martin:** “Adile Hanımdan Leyla Zana’ya: Kürt Tarihinde Siyasi Liderler Olarak Kadınlar,” di nav Shahrzad Mojab, *Devletsiz Ulusun Kadınları*, de, wer. F. Adsay, E. Uşaklı, S. Kılıç Weşanxaneya Avesta, Stenbol, 2005.
- Watt, Ian:** *Romanın Yükselişi: Defoe, Richardson ve Fielding Üzerine İncelemeler*, çev. F. Burak Aydar. Metis Yayınları, İstanbul, 2007.
- White, Hyden:** *The Content of the Form: Narrative Discourse and Historical Representation*, Baltimore & The Johns Hopkins University Press, London, 1990.
- White, Hyden:** “The Historical Text As Literary Artifact”, di nav Geoffrey Roberts, *The History and Narrative Reader*, London&New York: Routledge, 2001.
- Yavuz, Hilmi:** *Yazın Üzerine*, Bağlam Yayınları, İstanbul, 1987.

ÇAVKANIYÊN INTERNETÊ

- “Hevpeyvînên ligel helbestvan û nivîskar Jan DOST”
[//www.jandost.com/hev_deng.html](http://www.jandost.com/hev_deng.html), 01 Nisan 2012.
- A. Şengül, J. Gülgen**, “Reşad Ekrem Koçu’nun Tarihi Romancılığı”, Pûşber 2012.
- Cemil Oğuz**, “ Ehmedê Xanî çîma dev ji nivîsê berda”,
http://www.diyarname.com/yedek/modules.php?name= News&file= article &sid=1845_16
 Nisan 2012.
- Fatma Savcı**, “Piştî dîroka Mesture Xan bihîst per û baskên Tosinê Reşîd şînbûn”
<http://www.rudaw.net/kurmanci/art/3680.html>, 01 Sıbat 2012.
- Firatnews.eu** <http://beroj.com/h.asp?k=1818>. Adar 2012.
- Haluk Öztürk**, “Romaneye dîrokî: Biro -Romana serhildana Agiriyê”,
<http://www.niviskar.se/kurdi/224.html>, 01 Sıbat 2012.

Hesenê Dewrêş, “Hevpeyvîn bi Jan Dost re”, *Netkurd*, Pûşber 2011

<http://www.aku.edu.tr/AKU/DosyaYonetimi/SOSYALBILENS/dergi/VIII2/asengul.pdf>

Husoyê Emîn, “Kurd êdî dîroka xwe bi xwe dinivîşînin,” <http://ararat-welat.blogspot.com/search/label/Makale>, 03 Nîsan 2012.

Kemal Erol, “Tarih - Edebiyat İlişkisi ve Tarihî Romanların Tarih Öğretimine Katkısı”, <http://jlesite.org/sayilar/1%282%29/erol.pdf>, 05 Pûşber 2013.

Kenan Kirkaya, Davut Ozalp, “Jan Dost: ‘pîvanên tendurustiya wêjeya mîletekî xwendevanên wî ne’” http://www.jandost.com/hev_dicle.html, 01 Nîsan 2012.

Lokman Polat, “Romana Serhildanê ‘Şer Li Çiya’”,
<http://www.diyarname.com/news.asp?Idx=5584>, 30 Çirîya Paşîn 2012.

Necla Morsünbül, “Gilîdax Bêxwedî nîn e!” <http://www.bydigi.net/sinirsiz-muhabbet-burada/31534-gilidax-bexwedi-nin-e-yilmaz-camlibel.html> 01 Sibat 2012.

Nihat Gultekin, “İhsan Nurî Paşa (1893-1976)”, <http://ararat-welat.blogspot.com/2010/11/nihat-gultekin-ihsan-nuri-pasa-1893.html>, 02 Sibat 2012.

Ernst Renan, What is a Nation, <http://ig.cs.tu-berlin.de/oldstatic/w2001/eu1/dokumente/Basistexte/Renan1882EN-Nation.pdf>

Sedat Adıgüzel, “Bakı-1501 Romanının Tarihsel Boyutu Üzerine Bir İnceleme”,
http://www.sosyalbil.selcuk.edu.tr/sos_mak/makaleler/Sedat%20ADIG%C3%9CZEL/ADIG%C3%9CZEL,%20Sedat.pdf, 02 Pûşber 2013.

